

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê gişti

Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar 28, sal 7

Zivistan: 1998



Şerdîn abonetiyê (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 80 DM

Amerika, Austaralia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Bişar Îsa

Çapa bergê:

Jakobsbergs Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres:

NÜDEM, Box: 177

177 23 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-580 131 62

8-583 564 68

NAVEROK

- 4 Sebri Botanî jî çû ◆ FIRAT CEWERÎ
- 7 Peyman ◆ SEBRÎ BOTANÎ
- 8 Term ◆ FERHAD SHAKELY Werger: Elişer
- 23 Çarîn çarenûsek ◆ H. KOVAN BAQÎ
- 24 Şîretên Ahiqar ◆ Werger: HEMîD KILIÇASLAN
- 37 Tol ◆ ALAN OSMAN
- 38 Biranînê min (2) ◆ REFîQ HILMÎ Werger: ZIYA AVCI
- 52 Bigirî hibira pénûsa min ◆ RÊNAS JIYAN
- 53 Hevind ◆ CELADET ALî BEDIR-XAN
- 71 Name ◆ ARJEN ARÎ
- 72 Felsefe û edebiyat ◆ N. ZAXURANÎ
- 80 Xumam ◆ CEMîL DENLÎ
- 81 Olof Palme (3) ◆ MIHEMED DEHSIWAR
- 86 Ma dibéjin mirî ◆ EDIP CANSEVER Werger: ABIDÎN
- 90 Siwan ◆ GUY de MAUPASSANT Werger: SERDAR ROŞAN
- 98 Şiroveya Diwana Melayê Cizîri ◆ MELE EHMEDÊ ZİVINGÎ
- Werger: EMîN NAROZÎ
- 105 Di romanê de xeyal û taswîr ◆ DILBİXWîN DARA
- 109 XELATA NOBEL YA EDEBIYATÊ
- 110 Sê şev û sê roj ◆ LALEŞ QASO
- 116 Mêrxasiya Mûso ◆ ŞEREFXAN CIZÎRÎ
- 130 Şerefnameya bi kurmancî û bîra mîli ◆ ROJEN BARNAS
- 135 DANASINA KITEBAN

SEBRÎ BOTANÎ JÎ ÇÛ



FIRAT CEWERÎ

*Ser dikim, ser naxwazim
Welatê xwe dixwazim*

Sebri Botani

Min hê di salên xwe yên xortaniyê de navê Sebri Botanî bihîstibû, lê min tiştekî wî nexwendibû. Min bihîstibû ku ew li başûrê welêt dijî û şîrên xweş dînivisîne, lê min şîrên wî nedîstibûn. Sal di ser hev re buhurîn û ez li Swêdê bi cih bûm. Min li Swêdê hê bêtir navê Sebri

Botanî bihîst. Lê min îcar berhemên wî jî peyda kirin û xwendin. Pişti ku min dest bi weşandina kovara Nûdemê kir, rojekê telefonek ji min re hat. Dengê di telefonê de xwe bi "Sebri Botanî" da naskirin û dixwest were sere-dana min. Ji kêfan dilê min di sînga min de hilnedihat. Ez çüm pêsiya wî û min ew anî malê. Ew hefteyekê mîvanê min ma. Hefteyekê peyivî; behsa kurdan, behsa zimanê wan, behsa edebiyata wan kir; behsa serîhildan û serokên kurdan kir; behsa şexsiyetên kurdan kir. Digoooot û digot. Carinan ji nişkê ve radiwestiya, çavêن xwe berdidan xaleke nedîyar, xayiz dibû lê dîsan dihat ser hişê xwe û dewam dikir. Hera tu bibêji ew kurd bû, kurdîtiya wî ya pak di her gotin û tevgera wî de diyar dibû. Wî gelekî kêfa xwe ji xebatê me re dianî, xwe dilşa hîs dikir û carinan di nav re digot: "EZ bi şans im, va ye min evqas berhemên bi kurdî dîtin, lê ev yeka ha xewna Celadet bû, wî dixwest van xebatan bi çavêن xwe bibîne."

Sebrî Botanî xwe dida ber hevdemên xwe û xwe ji wan bişanstir didît. Lê li ber wan diket, li ber şîret û daxwazên wan diket, li ber armanc û hêviyên wan yên pêşerojê diket, li ber tehb û keda wan diket û digot: "Ez hê ji fêhm nakim bê çima kurd bi zimanê xwe naxwînin û nanivîsinin, çima xortêñ kurdan mîrasa rewşenbîrêñ xwe nadomînin, bi zimanê serdestêñ xwe dipeyivin û nikarin xwe ji çand û toreya serdestêñ xwe rizgar bikin?" Wî ev yeka ha dişiband vîrusekê û ji bo kuştina vê vîrusê jî hewcedarî bi pispor û operatorêñ baş didît.

Apê Sebrî kalekî xortane, xortekî xwedî tecrûbe, tecrûbeyên bi dîrokeke nenivîsandî ve xemilandî bû. Ew gurekî xwendinê bû. Rahîşa kîjan kitêbê heta ku xelas nekira dev jê bernedida. Gava mîvanê min bû me nivînê wî li kitêbxaneyê danî bû. Ez û ew li kitêbxaneyê rûdiniştin û me carinan heta destê sibehê sohber û devjenkî dikir. Ger em êvarf li ser kitêbekê bi peyiviyana û em wê şevê hebekî zû razana, dotira rojê sibehê zû apê Sebrî ew kitêb xelas kiribû û bi min re li ser naveroka wê dipeyivî. Ger ji kitêbê û zimanê wê hez kiriba, di nava her sohbetê de behsa xweşîya wê kitibê dikir; na, heger jê hez nekiriba, ew dida ber pêla rexneyan.


Ew derwêşekî ziman û edebiyata kurdî bû. Li derekê çirûskek pêkera, ew çirûsk di dilê wî de dibû tîrêjîn xurt û pê giyanê wî şâ û ges dikir. Wî her rêzeke bi kurdî mîna rêzên Quranê pîroz didît, her kitêbeke bi kurdî li ba wî mîna Quranekê bû. Li gora gotina wî ew ji sala 1944an ve di nava çalakiya nivîsandinê de bû û ji wê salê ve şîr jî bûbû şîrîkê jiyana wî.

Ji xwe jiyana wî bi xwe bûbû şîr, bûbû roman; lê şîr û romanên bi trajediyan ve miş... Ew ketibû şeran, di serihildanan de cih girtibû, derketibû serê çiyan, hatibû girtin, işkence dîtibû, birçî mabû; lê tu tişt bi qasî jiyana biyanîstanê bi wî zehmet nehatibû, tu tişti bi qasî jiyana koçberiyê ew neêşandibû. Loma ew pir dilte-nik bûbû. Dilê wî yê tenik hew li ber xwe da û wî mîna bi sedan rewşenbîrêñ kurdan, ji welatê xwe dûr, li biyanîstanê sefê xwe dani.

Mîna ku wî bi vê yekê dizanibû, loma gava ew mîvanê min bû, wî xwe dixist şû-na Celadet Bedir-Xan, Memduh Selîm, Kamran Bedir-Xan, İhsan Nûrî, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza û gelek rewşenbîrêñ din û gava trajediya wan bi bîr dianî, gava behsa wan dikir, xwe nedigirt, girî diket qırıkkê û mîna zarokekî dikir îskînî.

Niha, gava ez Sebrî Botanî bi bîr tînim, gava behsa wî dibe, ez xwe nagirim, girî dikeve qırıka min.

Bi hêviya ku wê sala nû me ji girî, trajedî û koçberiyê û rizgar bike, ez nûsala we ji dil pîroz dikim... ↳




SEBŘÍ BOTANÍ (1927-1988)

PEYMAN

Soz bit sozê naşkênim
Her bimînim rastperwer
Ger laşê min seranser
Pirt pirt bikin bi xencer
Evîndarê Gulê me
Bi can û bîr û bawer
Jana evîna Gulê
Girtiye can û ceger
Şox û şepalê dilber
Destê çepel maye li ser
Pir fihêt e ji bo min
Ger nestînim Gula zer.

SEBÎ BOTANI

TERM



FERHAD SHAKELY

*Ji zîndana tenhayiyê heta işaretet çav
Deşta bêkenar ya bêdengiyê
Befî girtiye.
Bi vê şevîniyê
Hawarek weke loriyan deng dide
Hawara bendiyekî tik û tenê ye.*

Ew çend rojên destpêkî baştir bû, lê ji serê vê sibê pê ve termê bavê min bîhn girtiye. Gelek nexweş e, gelek zehmet e ez bi vî awayî behsa bavê xwe bikim, behsa termê wî bikim, lê ez çi bikim, wiha ye. Niha ew termek e bîhn ji girtiye. Bîhna wî ne ji wan e mirov xwe lê neban bike û guhê xwe nedê, bîhneke tûj û giran e, ez wisan hîs dikim genî bûye, di nav demar, rah û masûlkeyên min de ji belav dibe. Ez bawer dikim ji kesekî din re ev bîhna han gelek girantir e, gelek nexwestir e. Ji bo ku termê bavê min e, ez nikarim, ez newêrim, ji dil

bêjim, bîhna wî wiha ye. Ji bilî vê ji ez naçar im bi vê bîhnê re, bi vî termê re bîjîm, lê kesekî din, dikare jê dûr bikeve û xwe jê rizgar bike. Kesek nayê xwe bi zorî bi bîhneke wiha gêj û mêt bike.

Di destpêkê de her tenê termek bû, termekî hişk û req, ku çiqas diçû girantir dibû û hilgirtina wî zehmet dibû. Wî ez gelek aciz kirim, mirina min hat ber çavê min, lê ci hal be min ew gi-hand vir, min ew gihad vî ciyâ han. Eê ji niha şûn ve ez ê ci bikim. Ci li wî bikim û ci li xwe bikim!!

Ew êvara em ketin rê, bavê min xurt û sax bû. Qet nişana nexweşiyekê û aciziyekê pê ve diyar nebû. Bi xwe hîs bi tiştekî ne dikir û min ji tiştek jê derne-xist. Ez nizanim ji bo ci pê xweş bû ji êvarê ve bikeve rê. Min hez dikir em beyaneke zû derkevin û em roja xwe ya yekê dirêj bikin û em çend qonaxan bi-

meşin. Wî bi awakî din lê nêrîbû. Plana xwe bi awakî din çêkiribû. Wî dixwest em roja yekê zêde aciz nebin. Em êvarekê bikevin rê û piştî şes-heft seetan bigihîjin şikevtê. Ew şeva xwe li wir derbas bikin. Wî vê roja yekê ji bo xwe lê xwes kirin, ji bo xweamadekirinê danibû, ji bo ku ling û piyên me nerm bin û di hemû warekî de em xwe ji bo wêriya dûr û dirêj amade bikin. Vêca bi rastî baş jî hesêb kiribû, çunkî eger me wiha nekiribûya, eger me wekî min lê binêrîbûya, me wisan bikiribûya, em difewitîn. Hê roja yekê em ê bi temamî aciz bûyina û dê wê riyê çavê me bitirsandiya. Lê nêrîna wî ew bû, ku em roja yekê xwe bi tu awayî nêzîkî acizî û zehmetiyê nakin, em li dijî wê riya dirêj û zehmet ranebin, tenê em ê xwe hicebibînin û çav, dest, pê û pişta xwe, hemû ruhê xwe hîn bikin û em ê xwe ji bo roja pişt te û ji bo rojêñ bêñ re amade bikin.

Ev jî, ev fikrîn han jî feyde nedan me, em cardin tê de çûn. Cardin hemû tişîn me xera bû. Di rastiya xwe de ew bi xwe tê de çû, ne ez. Ew yeka nediket û nehatibû bîra yek ji me, qewimî. Min bîra hemû tişî kiribûya lê bîra mirinê, mirina bavê xwe, nekiribû. Ez dibêjim ew tê de çû, lê bi rastî yê tê de çûyî ez im, ne ew e. Ew mir û rizgar bû, lê yê çiqas barê giran ê vê dinê heye li ser milan e, ez im. Ew ez im ku serê dinê lê hatiye hev û ez nizanim ez ê ci bikim. Cihêtiyeke şiklî ew e ku ew miriye û ez

sax im, lê sed xwezî bi wî, sed xwezî bi hemû miriyan, qet nebe carek e, dimirin û temam. Ez jî nebixêra ruhê xwe sax im û dijîm, lê tu hêviyek di dilê me de tune, ez tu ronahiyê ji tu milekî ve nabînim û nayê dîtin.

Bavê min gelek zû mir. Min bawer nedikit her wiha zû mirin bîhnê lê biçikîne Ez behsa temenê wî nakim. Ez behsa wê dikim ku gelek zû ji taqt û qudûm ket û temam bû. Ji temen têra xwe xwedî temen bû. Ew di ser şesî re bû. Germî û sermiya jiyanê gelek dîtbû. Vê carê gelekî li ber xwe neda. Roja me ya pêncan bû. Bi şev bavê min mit. Eger ew şev bimaya û bigihîstiya sibê, me pê diavêt roja şesan, lê ew wê şevê temam bû. Mirina wî ji nişka ve bû. Rojêñ destpêkî gelek baş bû, gelek jî gur bû. Tenê roja dawiyê, roja pêncan, westiyayî dixuya. Min his kir wekî beriyê gav navêje û pêş nakeve. Car caran radiwesta û bîhneke baş dida û vêca dikeve rê. Ez jî ji ber dilê wî pêş nediketim, min nedixwest his bike ku ez pê hesiyame ew betiliye. Min jî xwe paş dixist û gavêñ xwe girantir dikirin. Êvareke dereng bû me da newaleke kûr. Sorayî di asoyê rojavayê de nemabû. Êdî dibû em rawestin, dibû em çavê xwe li ciyekî wisan biggerînin ku em bikarin şeva xwe tê de bibin serî. Roja borî jî her me wisan kiribû. Ew êvar bavê min ne wek carêñ din bû, rengê wî têk çûbû. Dema ku em li ber kendalekî rûniştin nefeseke kûr kêşa û tiştek negot, min

dizanîbû jan û xemeke zêde û mezin di dil û hinavê wî de peng xwariye, lê ew ji wan nebû zebûnî û bêdesthilatî bi rûçikê xwe bide xuyakirin. Ez gelek pê ketim ku pariyek nan bixwe, qemçek av vexwe. Tiştek nexwest. Ji min re got, tu nanê xwe bixwe, ez niha tiştekî naxwim. Negihîst sibê. Her eynê wê şevê û eynî li wî ciyi mir. Mirina wî jî gelek ecêb bû. Min kesekî nedîtibû wiha bimre.

Ev çar roj in ku ez bi termê bavê xwe re dijîm. İro, vê êvara han, ev şeva han çar rojên temam e. Lê her tenê Xwedê pê dizane ew ci çar roj bûn. Ya hatiye serê min ne ji wan e mirov bikare neqil bike û ne ji wan e behsa wê bê kirin.

Eger min bizanibûya dê ev yek bê serê me û ez ê van rojan bibînim, min ev rê ne dida ber xwe û min ne xwe û ne ji bavê xwe tûşî van hemû bedbextî û malwêraniyê nedikir. Eê dê min çawanzanibûya, ez ne falavêj im û ne jî xeybzan im. Min digot ku dê deh—panzdeh roj bikêşê û em ê bi xweşî bigihîjin qonaxa xwe. Bi rastî bavê min ji min zêdetir hez dikir. Her bi xwe vê riyê helbijart. Ez bi fermanderiya bavê xwe perwerde bûbûm. Ez ji gotinêni wî dernediketim, ji min re bigotiya here ser wê bilindahiyê xwe bavêje xwarê, min xwe diavêt. Eger min hez ji vê hatinê nekirkibûya, min dikarîbû ez wî bi awakî tê bigihînim, lê li min xweşî hatibû, ji ber vê min tu gotin di pêşberî gotinêni bavê xwe nekirin.

Her şeva yekê dema ku me berê xwe da şikevtê, min hîs kir ku rewşa bavê min ne wek berê ye, dev û zimanê wî guherîne û bi awakî din bi min re diaxive. Berî niha em tenê kur û bav bûn, kur û bavekî ku her çend em gelek nêzîkî hevûdu jî bûn, lê cardin sînorek di navbera me de dima, sînorek ku ne min dikarîbû ez jê derbas bibim û ne wî dixwest jê bibore. Niha, wekî mirov bêje bavê min guh nedida wî sînorî. Min wekî dostekî dihesiband û pirs jê dikir. Min yekser wisan hesiband ku dixwaze bi min bide fehm kirin ku niha êdî em du hevalên seferî ne. Em du rîwî ne û dibê em xweşî û nexweşiyê xwe li hev parve bikin. Ay bavo can! Bila em ne pênc rojan, bila pênc salan bi hev re di rîwîtiyê de bûna. Bila ci zehmet û serêşî hene para min biketina tenê tu nemiribûya. Niha xemêni min ne yek didu ne, li milekî derdê herî giran ê mirina bavê min, li milekî din jî bavê min, termê bavê min, bûye barekî giran û ketiye ser milê min. Rizgariya min jî jê tune. Ez ê ci lê bikim, ma qet dibe ez her wiha wî di vê çolê de di cih de bihêlim, ez ê ji kê re di cih de bihêlim û piştî ci?! Êdî rewş ne welê ye ku bi poşmanbûnê ji vî derdi re çareyek bê dîtin. Eger roja rîwîtiya me ya yekê, min bizanibûya dê ev yek bê serê me, em ê gelek bi hêsanî vegeyana, ji ber ku em hê nêzîk bûn û dûr neketibûn.

Lê niha vaye em neh roj in di rê de ne û em gelek dûr ketine. Em neh roj

in di rê de ne! Belê rast e, neh roj in, lê ne riya neh qonax rê ye, çunkî tenê ew pênc rojên em bi hev re bûn, hemû rojê, em riya qonaxek rê dimeşîyan. Em ewqas rê dimeşîyan, ku mirovekî dikarîbû rojekê bimeşe. Lê ji wê roja bavê min miriye heta niha min nekarîbû ez ewqas bimeşim. Dema ku em bi hev re bûn, em baş dimeşîyan û rê li ber me diçû, lê niha ew tenê bi min nabe, çunkî ez tenê me. Eger em bêjin ez ji ber tenêtiya xwe nikarim baş bimeşim, îhtîmal e ew ne rast be; li milekî, dema ku mirov bi tenê be, zilamekî tenê bi serê xwe be, siviktir e û dibê baştir birmeşe û paş de nemîne, li milekî din jî ez ne te-nê me. Niha jî ez û bavê xwe bi hev re ne, her wekê roja yekê û ew pênc rojên em bi hev re dimeşîyan, lê niha êdî bavê min ne xwe bi xwe ye, belko termê wî ye, termekî ku bîhn girtiye û dibê ez wî hilgirim heta em bigihîjin şûnewarekî, ciyekî. Vaye çar roj in ez û ev termê han di rê de ne, lê ew riya em van çar rojan meşiyane, ne riya çar qonax rê ye. Îhtîmal e em tev bi ser hev riya qonaxek rê meşiyabin. Na. Yê ku dimeşe ez im, ne bavê min e. Ew êdî termekte e û nikare bimeşe. Termek e û bîhn jî girtiye. Lê dibê hem ez bi xwe bimeşim, û hem termê bavê xwe jî hilgirim û gav bi gav ji vî cihî veguhêzim cihekî din.

Roja yekê hindik mabû ku ez bêhêvî bim û teslîm bim, ez gelek westiyabûm, ez nizanim çawan bû ez bi ser ketim! Ez wa bizanim her evînî û siyaneta min a ji

bavê min re hat hawara min, hekene ez ketibûm, lê çi heye ez rojên pişt re baştir bûm. Ew şeva bavê min mir, li serê sibê serê dinya min li min hat hev. Ez bi şev raneketibûm, yek saniye xew çiye neketibû cavên min. Ez li pêşmiqabilê termê bavê xwe bûbûm reben û pepûk. Ez nav û navan re digiriymam û hinek car ji min dixwest serê min rehet bibe ku ez bikaribim bifikirim. Ne dibû. Min nedikariya ez tiştekî bikim. Ez bê his û kerr bibûm. Ez perişan bibûm. Min nedikarı ez bîra raketinê jî bikim, xewa çi. Min çawan dikarîbû ez di wê newal û kendalê de, di wê çolê de, li teniştê termekî, ew jî termê bavê min, xewa min bê. Ez çaverê bûm roj derkeve. Min digot ku eger roj derkeve, dê êdî hemû tiş hêsanter be. Min wisan dizanibû her ew roj tenê ye û bes. Ez dikarim bi rojekê xwe bigihînim ciyekî, yan bavê xwe bigihînim ciyekî û bi awakî çareseriye kî jê re bibînim, ji termê re.

Min wê şevê bi hezar halan derxist sibê, şeveke dûr û dirêj, şeveke tarî, şeveke tijî xem, tûndik û girfn. Hinek car min wisan dizanî agir ketiye dilê min, hinavê min, qirika min. Car caran ez bi kul û dil digiriymam. Ez ji bavê xwe re digiriymam. Li ser termê wî digiriymam. Girîna min ne tenê ji ber ku ew bavê min bû, ji cih û awayê mirina wî re bû. Îhtîmal e eger li mal bimiriya, li ser ciyê xwe, li ser nivînê xwe bimiriya, bi vî awayî eziyet nedida min. Ku di wê çolê de û di wê şeva tarî de, min bavê xwe bi

bîr dianî, min termê wî bi bîr dianî, min bêkesî û bedbextiyê bi bîr dianî, kiziniya janeke germ û tûj ji hinavê min dihat xwarê. Hawar ji min bilind dibû û ez bi kul digiriyam. Ez demek baş digiriyam. Piş te hêdî hêdî girîna min dissekinî û ez hêmin dibûm. Wî wextî min dixwest ez bifikirim, min dixwest ez bifikirim ka ez ê sibê ci bikim, min nedikarî, nedibû. Sibe hat. Ew sibeya ez bêsebir li hêviyê bûm û min dizanîbû her bi hatina wê dê deriyek li min vebe, hat. Lî gelek dereng hat.

Taze şefeqê avêtibû, berê hilatina rojê, min li rûyê bavê xwe nêri, min niha êdî bastır û zelatir ew didît. Kizîn ji cergê min hat, careke din girînê serê dilê min girt, girîneke ji carêن din kûrtir, ji carêن din germitir, gelek germtir. Rûyê wî ji zebûniyê, ji bêpariyê û ji bêdest hilatiyê tişî bû. Ji wî jî bê desthilattir, ji wê jî zebûntir ez bi xwe bûm. Em herdu ji bêkes û bêdesthilat bûn. Her wişan ez nû têgihîştibûm ku mirina bavê min ci li min dike; liser rojên min ên niha û li ser dahatiya min jî. Min ew şeva xwe ya dirêj li pêşberî û li pêşberî term bir serî, bêyi bi wî awayî bîr lê bikim. Min dizanîbû bavê min miriye, lê cardin wişan dihat pêş çavên min, wekî bêjin tiştekî wişan neguherîbe. Ew her li ciyê xwe bû, ew ciyê êvarê ku me şeva xwe tê de derbas kir. Ew êvarê ji bo bîhvedanê li wir rûniştibû, ji bo şeva xwe bibe serî, niha jî her li wî ciyî, di şûna xwe de, raketibû. Lî niha bi awakî

din bû. Min dizanî êdî bûye roj û dibê em biçin, dibê ez termê bavê xwe hilgirim, bibim û em biçin ciyekî din.

Dema ku êvarê me berê xwe da vî ciyî, min dizanî ew gelek westiyaye. Her bi zû ji bo raketinê ciyê xwe xweş kir. Ji raketinê re! Mimkun e ji bo mirinê ciyê xwe xweş kiribû. Mimkun e pekiya bû dilê wî û wî jî xwe ji mirinê re amade kiribe. Min hez dikir ew biaxive, lê min dizanî ji ber westandinê lê xweş e bûhna xwe vede. Yek û dû caran serê xwe li vî milî û li wî milî zivirand. Gelek rehet nefes distand, gelek li ser xwe bû, gelek bêdeng bû. Carekê bangî min kir, bi navê min bangî min kir:

— Belê, bavo can.

— Tu ci dikî...?!

Min dikir ku ez bersîva wî bidim, min bala xwe dayê ew destê ku di dema pirsa xwe de hinek bilind kiribû, nizm bû û ket teniştâ wî. Ez ber bi wî ve çûm. Min baş bala xwe da ser û çavên wî, min li singê wî nêri ka gelo di dema nefes sitadinê de radibe û rûdine yan na?! Bavê min miribû. Bê hîs, bê deng û bê hereket. Mimkun e eger yekî din di ciyê min de bûya, bawer nedikir, nedixwest bawer bike, lê ez yekser tê gîhiştirm, her yekser minzanîbû ku ew miriye. Bi hemû tiştî ve diyar bû ku miriye. Ew ji wê nebû ku ez ber bi şâsiyê ve bibim, yan şikek ji min re çêke.

Ji wê rojê, ji wê seetê şûn de tiştek di dilê min de bû girê; gotina wî ya dawiyê ku guhê min lê bû, ji pirsa dawiyê,



mebesta wî ci bû? Gelo wî dipirsî, di dema pîrsa xwe de, ez bi ci ve mijûl bûm û min ci dikir, an mebesta wî ew bû ji wir şûn de, ji bo dahaşû ji bo pêşerojê, ez ci bikim û niyeta min ew e ez ci bikim!!

Bavê min bi vî awayî bû. Berî jî wisan bû. Gelek car gotinek digot, min nedîzanî mebesta wî ci ye. Gotin bi awakî wisan digot ku mirov dikarî bi çend awayan tehlîl bike. Pişt te qasek şûn de, yan ez hêdî hêdî bi mebesta gotina wî digihîstîm, an bi xwe cardin bi gotineke din û bi awakî din ez tê digihandim, lê ev car êdî ne wisan e. Êdî cw tune ku min têbigihîne. Ez jî heta roja bimrim, ez ê di dilê xwe de bibim û bînim û bi hemû awayî tehlîl bikim. Feydeya wê jî tune. Eger ez rast jî tehlîl bikim, êdî ew nemaye ku heta dilê min xweş bike ku ez baş tê gihiştîme yan na.

Bêyî ez bifikitim, her eynê wê beyanê, min bityar da ez bimeşim; termê bavê xwe hilgirim û bimeşim. Min dixwest herçî hê zû ye ez ji wê newal û kendalê derkevîm û bikevîm ser riya xwe û bimeşim. Min destê xwe avêt termê bavê xwe û ew hilgirt, min ew bi himbêzkî hilgirt. Gelek giran nebû. Ez hêdî hêdî bi çèle û çepen newalêkê ve derketim jorê. Li jorê deşteke fireh, hişk û rast û rewan hebû, riyekê pahn a ax li rexê newalê re derbas dibû. Min bi yek bîhnî term hilgirt û heta ez negihiştîm ser rê min ew danenî erdê. Lê nefes li min çikiyabû. Min termê bavê xwe li

wir hêdî hêdî danî ser wê erda hişk û ez bi xwe jî li teniştî wî rûniştîm. Ez di dilê xwe de ketim fikra hezar û yek bîran. Baş e ez ê niha berê xwe bidim ku, ez ber bi kîjan riyê ve biçim. Di destpêkî de em ber bi kîjan riyê ve diçûn, niha jî her cardin ez ber bi wê riyê ve bimeşim an ez di paş de vegekim? Gelek li min ecêb bû ku berî, beriya ez term hilgirim û ji kendêl derkevîm çawan ez nefikirîbûm. Bêyî ez bizanîm ez ber bi ku ve diçim, min ew term ji bo ci hilgirtibû.

Min nedîzanî ez berê xwe bidim kîjan milî, ez vegekim, ew riya ku em pê de hatine, ez di paş de vegekim, an ez her dewam bikim û bimeşim. Di destpêkî de dema ku me dest bi meşa xwe kir, em ber bi vî milî ve diçûn. Lê wî wextî ez û bavê xwe bi hev re bûn. Wî ev tê hilbijartibû. Bi xwe gotibû em ê ber bi vî milî ve bimeşin. Niha bavê min miribû, nedîkarî riyekê dayne ber min, ne dikarî bêje dê tu wiha bikî. Niha dibû ez bi xwe bityar bidim. Bityara yekê ya pişti mirina bavê xwe bidim û wî bi cih bikim. Ev ji min re ne hesan bû, ez ku bi fermanên bavê xwe perwerde bûbûm, êdî ji nişka ve kesek tunebû ez guhê xwe bidimê û bi gotina wî bikim. Êdî dibû ez bi xwe bityar bidim û bi xwe jî bi cih bikim. Êdî ji nişka ve dibû ez bi xwe rê bibînim. Ez fikirîm ku di paş de vegekim, her bi eynê riyê re ku em hatibûn, bi wî awayî jî ez paş de vegekim, em vegekin; ez û bavê xwe çawan hatibûn, bi wî awayî jî vegeriyana,

her ceynê bi wê riyê re, lê vê carê dibû tenê ez rê bibirîm, çunkî bavê min mîribû, êdî niha termek bû, dibû bê hilgirtin û ciyê wî bê guhertin. Min dizanî eger ez bi wê riyê te vegeirim, pênc roj rê li pêsiya min e. Lê ew pênc rojên ku em herdu meşiyabûn, ez û bavê xwe, em meşiyabûn, niha dibû, ez termê bavê xwe jî hilgirim. Ne tenê pênc roj, ez panzdeh rojan jî nedigihîştîm ew ciyê ku em jê hatibûn. Vêca çîma ez ê vegeirim?! Bavê min bi xwe ev riya han hilbijartibû, bi xwe dixwest em bi vê riyê re bimeşin, niha jî dibê ez li gor wî bikim. Ez ê her bimeşim. Ez nizanim divê ez çiqas bimeşim, dê ji min re û ji me re çiqas bidomîne. Min nedizanî em ê bigihîjin ku, divê em bigihîjin ku; lê dibû em bimeşin, ji vir dûr bikevin, dibû ez bigihîjm ciyekî, bavê xwe, termê bavê xwe, bigihînim ciyekî.

Min termê xwe hilgirt û ez ketim rê. Cardin min himbêzkî hilgirtibû. Min herdu desten xwe li navtenga wî alandibû, ser û milê bavê min diket ser milê min ê rastê. Bi vî awayî meş rehet nebû. Gelek car bêyi ez ber pê xwe bibînim ez dimeşiyam. Baş bû ku rê rast bû, tırsa min a ketinê tunebû. Min nedikarî ez bi vî awayî bidomînim. Bavê min zêde giran nebû, termê bavê min ewqas gitran nebû, lê cardin ez diwestiyam, dibû ez wî car caran daynim erdê û bîhneke baş bidim, pişt re ji nû ve hilgirim û bikevim rê. Hera nîvroyê û heta qasek pişti nîvroyê jî bi vî awayî ez di rê de

bûm, ez qasek dimeşiyam û pişt re min termê bavê xwe didanî erdê û bîhneke baş dida. Min dixwest bi van bîhînvedanan hêz û taqetek bê ber min û cardin bikevim rê... Lê pişti nîvroyê, êdî taqeta min nemabû; bêxewiya şeva borî, birçitî, girîn û xem û hilgirtina termekî, termê bavê xwe. Min dizanî ku ez dikim êdî ji çeng û başkan bikevim, ji herdu ejniyên çokên min ji ber arhanê jê tîr dîbarîn. Ez gêj dibûm û car caran ku pişti bîhînvedanê min dixwest ez rabim piyan, çavên min reş dibûn. Di dema meşê de jî hînek caran ez nîvruhî dibûm. Min dizanî nabe ez bi vî awayî bidomînim, ez nikarim bi vî awayî bidomînim, dibê ez li ciyekî rawestim û ji vî zedetir neçim. Dibû ez râkevîm û bîhneke baş bidim, ji bo ku ez xwe ji rojên bêñ re amade bikim. Ne dibû ez hema bi yekcarî rawestim û term daynim erdê, dibû ez bigihîjm ciyekî, penayek, bikarim şeva xwe lê derbas bikim. Li wan nêzîkahîyan ne newal û ne jî kendalek hebû. Tenê li dûr, girek, girekî biçük dihat dîtin. Dibû ez bigihîjm wir, termê bavê xwe bigihînim wir û vê şeva xwe li wir derbas bikim. Lê heta ez gîhîştîm wir û heta ez hilatim jorê, ruhê min ji pozê min hat xwarê û min hezar car daxwaz û xweziya mirinê kir. Min hêzir dikir ku ez ê zû bigihîjm wir û pişt re ez ê baş bîhna xwe vedim; lê çi heye ez êvareke dereng gîhîştîm ber pêşkêñ wî giri, serkevtina wê ji tevan zedetir ez westandim. Gir ewqas bilind

nebû, lê bi termekî ve min nedikarî ez bi ser bikevim. Dibû ez bi awakî din wî hilgirim. Ji beyana sibê ve bû ku ez ketibûm rê û min term bi himbêzkî hilgirtibû. Niha ku min dixwest ez derkevîm jorê, giraniya termê bi awakî wisan diket ser milê min ku ber bi jêr, ji jêr ve min pal dida ber. Eger min zêde hewil nadeya min dikariya ez bikevim xwarê. Min vê carê ew pişt kir. Di temamê ji-yana xwe de cara yekê bû ez bavê xwe li pişta xwe dikim. Gelekî nexweş bû, gelekî zehmet bû. Nayê bîra min ku min bavê xwe di saxiya wî de pişt kiribe. Ez dizanim, min kal ú pîr ú zarokên biçûk, ji bo derbaskirina ji av ú çeman li pişta xwe kiribûn. Ev li ba min ecêb û zehmet nebû, lê ci heye niha hilgirtina termê bavê min li min gelek giran dihat. Xwezi min bavê xwe bi salan bi zindî bidaya pişta xwe. Lê ez naçar nebûma di vê kurteriya han de termê wî bi vî awayî hilgirim.

Li serê gir, yek-du komên ji keviran hebûn, kevirên biçûk û mezin komê serhev kiribûn û tenişte wan çal bû, erd bi awayî goreke teng, wekî sengerekê hatibû kûr kirin. Li gor min ew ji bo çeberan bi xwe hatibûn çêkirin, lê ne çeperên şer, çeperên nêçîrê, bi vî awayî ku nêçîrwan di wê çalê de xwe biveşere û lûleya tivinga xwe têke nav keviran, an deyne ser keviran, nêçîrê bike. Bêyî ez bifikirim min termê bavê xwe danî nav çalekê. Mimkun e ji ber ew çal wekî goran hatibû kolandin, gor dianî bîra

mirov. Min nedikarî ez li rexê termê bavê xwe rakevim. Gelek xewa min dihat, ez gelek westiyabûm. Min dizanî dibê ez baş rakevim, toleya bexewiya şeva borî û aciziya iro vekim. Ez rabûm û çûm û min xwe li rexê koma keviran berda erdê. Min hîs dikir ku min bavê xwe tenê hiştiye. Min wisan dizanî ku ew koma keviran sînorek e ketiye navbera nin û bavê min. Li gor min wisan bû ku bi vê dûrketinê ew rêz û evîna min a li hemberî bavê min kêm bûye. Lê dibû ez rakevim, dibû ez baş rakevim, ji bo ku ez sibê baş bimeşim, ji bo ku rojekê zûtir termê bavê xwe bigihî-nim ciyekî.

Dema ku beyana sibê ez ji xew hişyar bûm, tirseke ecêb ez girtim, tirseke bê mîsal, temamê bedena min dileriziya. Min çawan karlbû, min çawan wêriyabû wî termî, termê bavê xwe, wisan bi tenê, di wê çolê de, di cih de bihêlim? Çawan dilê min razî bûbû?! Wisan dixuyê ji ber westandinê min melheza tiştekî nekiribû, baş e eger dirindek, canawarek, termê wî bixwariya, yan perçek jê vekiriya, dê niha min ci bikiriya! Wê çaxê dibû heta mirinê min li xwe loman bikiriya; lomên kêmhişiyê û kêmjîriya xwe bikim. Tiştek bi termê bavê min nehatibû, lê bi bîranîn, bibîranîna wê ku ihtiimal bû tiştek lê bihatîya, ji serif hera piyê min ez dilerizandim. Hinek mûrî (mûristang) li ser term bûn, li ser kincê bavê min diçûn û dihatin, ew gelek bi hişyarî diçûn, car caran ji diseiki-

nîn, wekî tu bêjî bîhna xwe vedidan û pişt re cardin dikerten rê. Min li rûyê ba-vê xwe nêri, min guherinek tê de nedît. Li gor min hinek, gelek kêm, ji berê mortir dihat xuyakirin.

Wê rojê ez qederekî meşiyam. Ez ni-zanim ez çend seet û çend qonaxan meşiyam. Lê ji bo ku ez newestiyanbûm û şeva beriyê ez baş raketibûm û min bîh-neke baş dabû, ez rehettir dimeşiyam û term hêşantir dihat hilgirtin. Diyar e ez seranserê wê rojê wisan nebûm; ez tenê danê sibê gurtır bûm û pêwistiya min zêde bi rûniştinê û bîhnvedanê tunebû. Pişti nîvroyê min hîs kir ku navmilên min û baskên destê min diêşin, pişta min, piştmaziya min eziyetê didin min. Lê cardin ez nesekinim, heta dereng, heta êvareke dereng di rê de bûm. Diyar bû ku ez ji ciyê xwe yê do gelek dûr ketibûm, çunkî ev ciyê han bi dar û av bû, hêşintir bû. Giya, tewrî û deviyên biçûk li herdu milên rê hebûn û çiqas diçû zêdetir ji dibûn. Bi eksê do, iro qet bîhna min ji teng nebû. Do car caran min xwe bi xwe fikra bavê xwe dikir û li jiyana, li bêçaretiya û bêkesiya bavê xwe dikir, kelên girînê dihatin min û rûndik ji çavên min dihatin xwarê, lê çi heye wisan dixuya ku iro ew hemû ji bîra min çûbûn; ne girîna min dihat, ne gu-nêhê min bi min û ne ji bi bavê min dihat û ne dilê min tişî dibû. Heta min hîs dikir ku ew tirs û sewma termê bavê min a do hebû, iro nemaye... Dema ku ez ji bo bêhnvedanê rûdiniştüm min

term bê xem didanî erdê, bêyi wekî do, gelek lê hişyar bim û guh lê bim ez ca-wan wî didanim erdê.

Roja sisiyan min bêyi gotin, bîryar da ku êdî ez wî hilnegirim. Şev sar bû. Ez çend car ji ber sermayê hişyar bûm. Min xwe baş pêça bû, lê cardin ji ez dicemidîm. Serê sibê hemû bedena min diêşiya. Min dizanî ku êdî ez nikarim termê bavê xwe hilgirim. Dibû ez riye-ke din bibînim. Dibû bi çi awayî dibe bila bibe gerek e ez wî bigihînim ciyekî, ciyekî dûr, ciyekî ku ji vir gelek dûr be. Yekser min melheze kir ku dibê ez bi çi awayî be tiştekî peyda bikim, tiştekî du-rust bikim, wî termê daynim ser; dar-bestek, kaşedarek û bi wî awayî ez dikarim wî di pê xwe de kaş bikim. Min dizanî ku eger ez wiha nekim ez ê li ser destan bimînim û ez nagihim tu ciyî.

Li van nêzîkahîyan tiştek nedihat dî-tin ku bi kêt bê ez tiştekî jê çekim. Lê do serê êvarê, berî ez bigihîjim vir, ez li nava qamîş û daristanekê re derbas bûm. Ew tişten ji min re lazim in li wir bi dest dikevin, dibê li wir bi dest bike-vin. Min nedizanî ez ê çi ji termê bikim. Ji xwe nedibû ez wî ji nû ve hilgirim û riya du seetan paş de vejerim. Eger min bixwestiya ji min nedikarî ez wî li se-ranseri wê riyê hilgirim. Dibû ez wî di cih de bîhêlim. Her ceynî li wê çolê, heta ez vejerim di cih de bîhêlim. Min nedizanî dê çiqas bikêse. Qet nebe dê şeş-heft seet lê biçe. Dibû ez van şeş-heft seetan term li vê çolê di cih de

bihêlim. Ez gelekî ditirsiyam tiştek bê serî. Çîma dibê tişrek bê serî? Ji xwe do êvarê jî ji bo raketinê ez gelek jê dûr ketibûm. Ew jî her di cih de hiştin bû. Heta beyana sibê ne min serek lê da û ne jî agahê min lê hebû.

Min ew di cih de hişt û ez çûm. Ez danê nîvroyê vege riyam û min darêne darbestê bi xwe re anîn. Darêne darbesata çi, du darêne bi girê yên qahîm û hatibûn rastkirin, li herdu seran û naverasta wê, li çar-pênc ciyan meliyên qamışan ser hatibûn raxistin û bi şivên nerm pê ve hatibûn girêdan. Dişibiya merdiwenan. Merdiwenek ku lingên wê qasek ji hev dûr bin. Min piştîniya bavê xwe ji pişa wî vekir, feyda wê hebû. Min paltoyê wî derxist û term danî ser darbestê. Min palto bi awakî wisan li ser raxist ku ser, çav û rûyê wî bigre, pişt re min bi piştîniyê baş bi darbestê ve girê da û işk jî da. Min ewqas işk dabû, term bi darê ve bûbû yek perçê. Edî ez dilgerm bûm ku ez ê bikarim di pê xwe de kaş bikim. Min tenê dikarî ez serê darêne darbestê bigrim, ji erdê bilind bikim û kaş bikim. Serê bavê min li aliyê serê merdiwenê bû, herdu piyên wî jî li aliyê herdu piyên merdiwenê bûn. Eger min bi vî awayî di pê xwe de kaş bikiriya, tenê herdu piyên darbestê bi erdê re kaş dibûn. Piştî bîhînvedaneke baş ez ketim rê û min term û darbest bi hev re di pê xwe de kaş kirin. Dema ku herdu lingên darbestê bi erdê re kaş dibûn dengekî gelek nexwes jê dihat. Lî çi dibe

bila bibe ji term hilgirtinê gelek xweştir bû, ji ber ku siviktir bû, gelek siviktir jî bû. Hêdî hêdî ez hînê deng û xişiniya daran jî bûm. Car caran ew destê min ê diqerimî, min ew diguherand, bi destê din dikêşâ.

Bi vî awayî ez du seetan meşiyam, lê min hîs kir ku nava lepêñ min digizgizînin. Min term danî erdê, li nava destê xwe nêri, berboq dabûn. Berboqeke mezin. Min dizanî dê ew min aciz bike. Beriyê hatibû serê min. Dest ku berboq da, bi taybetî eger nava lepêñ te be, dibê tu karekî pê nekî, hekene giranî dikêve ser û ew diteqîne. Berboq eger berriya gîhiştinê biteqe êşke wisan dide dilê mirov te'rifâ wê ne mimkun e, bi taybetî eger hewa sar lê bide, edî wekî dil û milakê te wekî bi kêrê bê rewatin bi wî awayî lê tê. Tu çareya min tunebû. Demekê tenê min bi destê cepê kêşâ, lê çi heye ew gelek zû qerimî. Min dît ku ev wiha nabe, ez gelek berilim. Min dest bi fikra çareseriyeke din kir. Dastmaleke min a mezin hebû. Min anî her serek wê bi serê darekî darbestê ve girê da. Vêca min serê xwe tê re kir. Niha ew destmal diket ser singê min. Vê carê di ciyê destan de min darbest bi singê xwe dikêşâ. Ev baştir bû. Ji bi destkêşanê baştir bû, ger çend giraniyeke zêde dixist ser singê min û car caran serê daran jî li navmilê min diketin. Qasekê jî ez bi vî awayî meşiyam. Nefesa min çikiya bû. Min gelek zêde xwîdan dabû. Min edî nedikarî ez ji vê zê-

detir biçim. Nêzîkî avabûna rojê jî bû. Ez sî-çil gavan ji rê dûr ketim û min li ber palekê darbest danî erdê û ez rûniştim. Ez ewqas betilî bûm, bi rûniştinê re xewê ez girtim. Min melheza termî kir, termê bavê min, ez ji darbestê vekim û deynim ser erdê? Ez ji ber çi jê vekim, ew ne sax e heta ez bêjim dê şev bîhna xwe vede. Her bi darê ve bimîne baştire, ji ber ku bi vî awayî ji sibê re hazir e, pêwîst nake ez careke din bi gitêdan û qahîmkirina wî ve mijûl bim. Ez dikarim yekser wî rakêsim û bikevîm rê. Min term li wir di cih de hişt û hinêkî ji wir wê ve min xwe berda erdê û ez racketim. Min serê sibê hêdî hêdî xwe da hev û xwe hazır kir ku ez termê bavê xwe hilgirim û bikevîm rê, lê ez bizdiyam. Du-sê gav mabûn ku ez bigihim ba term, min bîhnek seh kir, bîhneke tûj û giran. Min wisan hîs kir ku sing û gewriya min ji bîna genî tijî bûye. Termê bavê min bîhna girtibû. Gelek nexweş bû, gelek giran bû, ku ez bawer bikim termê bavê min bîhna girtye. Bîhneke wisan jê dihat min nekarî ez heta ew ciyê ku ez hatibûm pê ve pêş ve biçim, bîhneke wisan nebû ku mirov bikare xwe li ber ragire. Serê min gêj bûbû. Ev çi roj bû ez ketibûm? Çima dibû ev hemû tişt bênen serê min! Ji ber çi min di serî de fikra van tiştan nekiribû? Her eyne ew toja, ew şeva ku bavê min mir, ji ber çi min fikra wê nekir ku ev term e îro be sibê be her dê bîhna bikevê? Term, nabe demeke dirêj li derive

bimîne, bi taybetî di vê çolê de û di vê riya dûr û dirêj de ku min dabû ber xwe. Min melheze kiribû, lê nedibû ez termê bavê xwe li vê deşt û çola xalî bi-hêlim, dibû ez bigihim ciyekî û bigihim avahiyekê. Niha ji li min xerab qewimî bû; beriya ez bigihim ciyekî, beriya ez bigihim avahiyekê, termê bavê min bîhna girtibû. Cardin nabe ez wî li vir di cih de bihêlim û biçim. Dê ez ê çi bikim, ez ê çi bi vî termî bikim! Çi bi vî termî bikim ku bîhna jî girtye! Taze nabe ez wî wekî do û pêr hilgirim û bikêsim. Lê ji bo çi armancê? Ez ê ku ve biçim, bibim ku! Ez ê heta ku di pê xwe de bikêsim, ez ê heta ku bikarim di pê xwe de bikêsim!

Çiqas diçû bîhna term girantir dibû. Armanca min çi dibe bila bibe, dibê carêkê ez xwe li ber vê bîhna han ragirim, ez xwe li hemberî vê bîhnê ragirim, hekene ez nikarim tu karê bikim. Dibê ez bikarim xwe lê nêzik bikim, heta ku ez bikarim çareyekê lê bikim. Min piştiniya xwe ji pişta xwe vekir û serekê wê bi darbestê ve girê da. Ev êdî çareseriya dawiyê bû. Min dest bi kêşanê kir, lê min çiqas dikarî ez jê dûr disekinîm. Min dizanî ev bi ser nakeve, çunkî eger ez bi vî awayî bikêsim, dê hemû darbest li ser erdê, li ser rê re kaş bibe. Vêca ew dikare çiqas li ber xwe bide, ez nizanim. Lê min baş dizanî ku bi kêşanê, dê darbest biderize, ji hev û du bikeve û xirduxaşî be. Çareke din jî tunebû, dibû ez wiha bikim, heta ez bigihim ciyekî

baştır, ciyekî ji vir baştır û musaîtir be.

Ez ketim rê û min term û darbest di pê xwe de kêşa. Bi saya piştîniyê ez pênc-şes gavan jê dûr bûm, feyda vê ji hebû, bîhn her dihat, lê hinek kêmtil bû. Term, iro ji do girantir bû, ihtiîmal e ku hemû bi erdê re kaş dibû ji ber wê ye. Deng jî guherî bû, do wextî min dikêşa xişexîş jê dihat, dengê iro wekî tepetepê bû.

Min nêzîkî du seetan bi vî awayî dewam kir, min hîs kir ku dengê kêtşandînê jî guherî ye; xirexirek jê dihat. Min ji dûr ve li term nêri, ji ber bîhnê min nedikarî ez nêzîk bibim. Min tiştek fehm nekir. Cardin ez ketim rê. Ez qasekî çûm, ew deng hê jê dihat. Ez sekînîm. Min serê piştîniyê danî erdê û ez ji dûr ve li çarmedorê termî zivirîm; yek ji wan çewen xwarê ku min pê melyîen qamışê bi darêñ darbestê ve girê dabû, qetiyabû. Niha herdu piyên bavê min, lib lib, bi erdê re kaş dibûn. Li ser erdê û bi ser rê re, hem şûna serê herdu daran û hem ji herdu piyên bavê min di-xuyan. Ev herdu serên vî milî û wî milî yên darêñ darbestê bûn, yên ortê jî yên piyên bavê min bûn. Min li bavê xwe nêri, min dît ku tenê ferek sol di piyan de bû, fera din ketibû. Gelo dibû li ku ketibe! Mimkun e hê di deshpêkî de, ku xişexîş dest pê kir, ew ketibe. Li ku di-be bila bibe, ez ê êdî taze ci lê bikim; nexo ji vir şûn ve ez ê biçim li pê ferek sol bigerim. Min di dilê xwe de hîs dikir ku ev li hemberî bavê min sivikiye-

ke, ku bi vî awayî piyên wî yên rût ji derve, bi erdê re kaş dibe. Cardin min serê piştîniyê git destê xwe û milê riya xwe girt. Piş re, dema ku ez ji bo bîhn-vedanê sekînîm, min dît ku fera solê din jî ketiye. Niha herdu lingên bavê min li ser erdê rût wekî du silqesorêñ bi herî bûn.

Ji avabûna rojê re gelek nemabû, roj nêzîkî ciyê bûbû, ku darbest ji hevûdu ket. Hemû şax, qamış û giyayêñ li ser perçê perçê bûn. Piştînî, piştîniya bavê min ku min pê term bi daran ve girê dabû, sist bûbû. Termê bavê min ketibû erdê. Ev hemû bi carekê li ser hev qewimîn. Edî ez bi temamî ji hêz û ta-qet ketim. Min edî nedikarî ez ji vê zede biçim, min edî nedikarî ez term bi-kêşim, ji ber bîhna wî min nedikarî ez xwe nêzîk bikim. Li milekî ez gelek betili bûm, min nedikarî ez bifikirim jî. Ez çûm, bîst gav li milê din rê rûniştîm. Min nedizanî ez ê ci bikim, ez şeva xwe li vir derbas bikim an qasekî din jî biçim! Ez çawan biçim! Gelo term li ber xwe dide ez wî bê darbest bi pê xwe ve bikêşim! Ev ciyê han ji bo derbaskirina şevê ne musaît bû. Dibû bi ci awayî be, ez qasekî din jî biçim û ji vir dûr bikevim. Qet nebe ez term bigihînim besteciyeñî û ji naverasta vê riye dûr bixim. Lî ya ez ji hemû tişti zêdetir jê ditirsîyam ev bû; çawan, ez ê ciyê vî termê çawan biguherînim?! Ez wî çawan ji vir dûr bixim?! Ez wî çawan bikêşim?! Min dizanî tu çara wê tune, dibê ez mil bi-

dim ber, karekî giran bikim. Ez li hêviya ci bûm?! Ez hêdî hêdî ber bi termê ve çûm û nêzîkî wî bûm. Dibû ez bîhna xwe bigrim û pozê xwe hişk bişidînim. Eger ez hê ji dûr ve bîhna xwe bigrim ez pê re nagihim bi bîhnekê xwe bigihînim term û dar û qamîşan jê vekim û cardin jê dûr bikevim. Dibû ez hewil bidim çend caran biçim û bêm. Pênc-şes gav mabûn ez bigihmê, min hişk pozê xwe girt û ber bi wî ve çûm. Cara yekê min destê xwe gihad darekî. Ew gelek rehet hat ber destê min û min ew ji piştîniyê, qamîşê û şivên daran kêşa û ez dûr ketim. Dema ku min destê xwe ji pozê xwe da alîkî û nefes sitand, gewriya min tijî bîhn bû, bi bîhna termê. Gelek ecêb e. Bîhn ne tiştekî wisan e bê dîtin. Mimkun e dema ku mirov barek ar hilgire, ser û milên mirov di ar de bimîne û ar binîse nav cil bergê mirov. Min wisan hîs dikir ku bîhn niştiye nav cil û bergên min û hemû ruhê min bîhn girtiye. Min liba darê din jî eynî bi wî awayî derxist. Tenê ma ku ez bikarîm piştîniyê jî jê vekim. Qamîş û şaxên daran rehet bûn, bi xwe ji hevûdu ketibûn. Bi sê-çar caran çûn û hatinê min gitêkîn piştîniyê jî vekirin. Ez ji ber bîhnê gêj û şas bûbûm, dilê min serûbi-nî bûbûm. Min dikir ez vereşim. Dibû ez dûr bikevim û bîhnvedim. Dema ku min ji dûr ve jî nefes distand, min dizanî ku ew hewayê paqij jî bîhn girtiye. Min di dema bîhnvedanê de melheze dikir, niha vê carê ez ê ci bikim; bi piş-

tîniyê qahîm girê bidim û di pê xwe ve bikêsim, an dev jê berdim her di ciyê xwe de bimîne heta ez çarekê jê re bibînim?! Dema ku ez rabûm piyan min rast milê rê girt. Min got ka ez carekê herim van derûdoran biceribînim, ez bizanîm ka ciyekî baştir bi dest nakeve. Ez demeke baş meşiyam. Nîv seet zêdetir bû. Ev meşa han li min gelek xwes hat. Rê nerm bû. Niha ku min term jî nedikêsa, min hîs dikir ku ez virtî-vala dimeşim. Feyde tunebû; çunkî ciyekî baştir li ber çavên min neket. Dibû ez vejerim, biçim ba termê. Dinê bi temamî tarî bûbû, eger ez rê bi rê neçûbûma ez bawer nakim ku min bikaribûya ez bêm ba termê bavê xwe. Ez nizanim çiqas mabû ez bigihîjim balê, min hîs kir bîhna termê tê pozê min, ba ew dianî. Dema ku ez lê nêzik bûm, êdî ku bi çav jî ferq dikir, min xwe ji ser rê da alîkî, sî-çil gav ji wê wêdetir ez rûniştîm. Min nedizanî ez li hêviya ci me û ez ê ci bikim. Di vê tariya han de tiştek jî nedihat kirin. Evarê min dixwest ez term qasekî ji rê dûr bixim, lê niha min dev ji wê jî berda. Bila her li wê be, heta bibe roj, wê çaxê dibê ez zêdetir bikarim li ser tiştekî bifikirim. Xewa min nedihat, xewa min revî bû. Min dizanî şeveke dûr û dirêj li pêşıya min e. Ez naçar bûm, dudilî bûm, pest bûm, têkilî reşayıya vê tarîşevê bûbûm.

Tu dibêjî ev tarîşeva han perjînek bû li çarmedorê daristana mirinê hatiye kêşan; aliyekekî li devê rê û rêbaran vekiriye,

wekî çar çiqlêñ darê, wekî devê gorrê û wekî serê rimê, li jor ve jî te digot gidışen reş in xwe li giyayêñ reş û tarî rapêçane. Ez li kîjan mîlî dinêrim tarî ye ku, pêl li ser pêlê, serî heta biniya erdê di nav xuma bêagahî û nezanînê de reş di-be. Min dixwest ez vê perdeya sitûr a şevîniyê hildim û serê xwe bikêsim nav razxaneya renga reng a rojan. Min dix-west ez bi destê xwe li ser nexşeya dahatî ya ne diyar nîgara rêceriyekê bikêsim ji serê tilyên piyên min dest pê bike û serê wê yê din, wekê nîlûferê, xwe heta serê çima herî bilind a xeyalê bialine. Ya min didit heykela bîranînê bû di tabûta bêdengiyê de çavê xwe kiribû pençeyê stêrkan ê pirr nazik ên ku jiyanâ sîrişt a nazik dilorandin. Xeyal rayeleke şin a hevrîşm bû, herdû serên zemanê bi hev ve girê dida û li ber çavêñ me li damena kirasê şevê dialî. Xeyal termê pîremêreki bû li rexê rîyeke ax, di çolevaniya şevê de, bê naz, ketibû; termekî bîhngirtî, bi şinebayekî têkelî nava bîhna xweş a şev û şeyboyê dibû.

Termê bavê min hê di ciyê xwe de bû, ji vir ve wekî topeke reş û xumam dihat dîtin, lê car caran bîhna wî digihîst pozê min. Hemû bi ser hev neh roj beriya niha bû ku em ketibûn rê, em ji bo armanca sefereke dûr û dirêj ketibûn rê. Wê çaxê bavê min bi rêk û pêk bû, gelek gûrr û ges bû, gelek jî dilgerm bû, lê ci heye niha termekî hişk û req bû. Termekî bîhngirtî bû. Niha ya ji bavê min mayî ew topa reş bû ku ketiye rexê

rê û van deveran tîjî bîhna kiriye. Bîhne-ke tûj û giran, ez wisan hîs dikim ku qirişa min xitimandiye û belavî nava demar û masûlkêñ min bûye. Ew kesî li ser wê riyê ye ne bavê min e, termê ba-vê min e, termekî bîhngirtî ye. Nabe ez bêjîm ew bavê min e. Bavê min miro-vekî bi rêk û pêk bû û zindî bû, lê ew niha termek e, termekî bîhngirtî. Ez niha naçar im biçim. Dibê ez wî li vir li vê çola han bîhêlim. Dibê ez biçim û bigihîjim ciyekî, bigihîjim avahiyekê. Axir hera dinê ava ye ez li muqabilê ter-mê destê min li ber rûyê min rûnanim. Eger feyda wê hebûya dê min bikiriya, lê ez dizanim bêfeyde ye. Ez dizanim ez nikarim wî bigihînim tu ciyekî, dibê ez biçim û wî di cih de bîhêlim, qet nebe nûçeya mirina wî bigihînim ciyekî. Gava ez li herdu seriyêñ vê rî difikirim, dibînim ku agahê kesekî, ji tu milekî ve bi me tune, ne ji min û ne ji bavê min. Me nû ew serî terk kiriye, lê em hê negihîstine serê din. Tenê riyek li ber min maye; dibê ez biçim, dibê ez bigihîm ci-yekî, bigihîm avahiyekê. Gelo niha ferqa min û bavê min ci ye? Tu ferqek me tune. Rast e ew miriye û ez sax im, lê agahê kesekî bi me herdukan jî tune. Heta ez negihîm ciyekî ne mirina wî û ne mayina min tiştekî ifade nakin. Niha tenê ez dizanim ku ew miriye, lê kî dizane ku ez sax im! □

Ji tîrmeha 1996an heta 06/01/1997an.

Ji soranî: ‘Elişer

ÇARİN ÇARENÜSEK

Zîn

Yezdana bîhuşa Xanî
lîloza lénûseke devdirûti
li eywana du ling
ez,
setrenc û mîr
di ferek sol de,
Beko,
pace, du çavêن te û xencera pozxerdel di ya din,
hespa min a kumêt,
li pişta keleha şikesti kabab davêje
bi wezîrê bindeman re -xwedanê çarenûsa min-
û pîra du diran, ji serdeman re
çiroka heza min û te dixwîne.

Mirîşka me li rezê Xanî dicêriya -her êvar-
û yek rojê lingsikesû venegeriya,
lê lîlozê
hingê bazikên rezê Xanî hate şikandin
li beyaniyek xiniz
çarînçarenûsek li ber lingê Dîcle
di zikê royê de temirî.

H. KOVAN BAQI

ŞİRETÊN AHÎQAR

Wergera ji tirkî: **HEMÎD KILIÇASLAN**

Ev in şiretêن Ahîqar, yên ji bo perwerdekirina xwarziyê xwe Nadan gotine.

Ez, Ahîqar bi zanebûn û şiretên min, baweriya min ew bû ku Nadan ê şûna min bigire û di xizmeta qirêl de be. Lê belê guhê xwe neda peyvên min, di ser guhê xwe re avêtin û digel vê jî xerabî bi derûdora min re kir. Bê dil şewatî, li mitovên mezin, jîr û zana da, manegiyêن min û hêstirêن min yên baş dikuşt, wenda dikir. Dema min dît kurê min Nadan dev ji van karan bernade, min jê re got;

"Kurê min Nadan, êdî nêzikî malê min mebe." Min çîroka; çav dilovaniyê ji qezenga ku dest pê ne westiya be, nakin, jê re got û qiralê min Senharîb, gava peyvên ku min gotin,bihîst ferman kir: "Heta ku Ahîqar sax be kes nikare dest bide ser malê wî." Gava Nadan ev peyvên min bihîstin, ji kumreşîya li mala min mayina birayê xwe Nabuzerdan, dest bi paşgotiniya min kir: "Bavê min Ahîqar pîr bûye, li ser piyê qebrê ye, xuruşî ye, peyvên wî yên hêja nemane. Belkî jî, malê xwe bide Nebuzerdan û min ji mala xwe derxîne."

Ez, Ahîqar, gava min ev gotinê han bihîstin, min got; heyfa hozaniya min ku la-wê min Nadan ew wergerandin xerabiyê. Gava Nadan gotinê min bihîstin, qeherî, çû huzûra qirêl û derhaqê min de bi xerabî fikirî, ji dijminê mîrê min Senharib re du name nivîsandin:

Yek ji qiralê Aylam û Farisan, Ahî yê kurê Hameslim te:

"Silav ji Ahîqar, katib û mohrdarê qiralê Asûrê.

Gava ev nameya ket destê te, xwe kar bike û were Asûrê. Ez ê te derbasî Asûrê bikim. Tu yê welêt bê şer bistînî."

وَمَا أَنْتَ بِحَمْدِهِ حَمْدٌ وَمَا سُبْحَانِهِ سُبْحَانٌ وَمِنْ حَمْدِهِ
وَلَا حَمْدٌ لِلَّهِ إِنْ وَلِيَ حَمْدَهُ الْأَكْبَرُ حَمْدًا وَمِنْ حَمْدِهِ أَحَدٌ
وَمِنْ بَعْدِهِ حَمْدٌ [مُذْكَرٌ فِيهِ] وَبَعْدَهُ حَمْدٌ هُمْ مُحْمَدٌ حَمْدٌ
حَمْدٌ طَوْبَةٌ حَمْدٌ جَانِبُهُمْ [سُرْطَانُهُمْ] حَمْدٌ (4:18) وَمُذْكَرٌ بَعْدَهُ
حَمْدٌ بَعْدَهُ حَمْدٌ [مُذْكَرٌ فِيهِ] وَمِنْ حَمْدِهِ (11:20-9:9) وَمِنْ حَمْدِهِ ۖ

Nameya din; "Ji mîrê Misrê, Fir'ewn re:

"Silav ji Ahîqar, katib û mohrdarê qiralê Asûr û Nînowayê.

Roja 25ê meha tebaxê were başûr, deşta Nîsrînê, ez ê te bê şer derbasî Nînowayê bikim û tu yê welêt bistîne."

Nivîs, li gor destnîvîsa min nivîsin û mothr kir, li koşkê danî. Nameyek, wek ku ji hêla mîrê min Senharîb hatibe nivîsandin, ji min re nivîsî:

"Ji Qiral Senharîb:

Silav li katib û mohrdarê min Ahîqar.

Gava ev nameya gîhîste te, leşker kom bike û were çiyayê Sîsê. 25ê meha tebaxê, ji wir ber bi başûr ve li Deşta Nîsrînê, were pêrgî min. Dema te dît ku ez nêzîki te bûm, leşker bixe rewşa şer da ku nimnînendeyên qiralê Misrê, Fir'ewn, hêbeta leşkerên me bibînin."

Ev nameya han, Nadan bi du eskera ji min re şand. Ü her du nameyên din, wek ku lê rast hatibe û dîtibe, girt û bir li huzûra qirêl xwend. Gava qiral guh li xwendina wan bû, bi qêrîn got:

"Ya Xwedayê min, ci xerabiya min gîhîstibû Ahîqar ku weha li min bike." Nadan ji qirêl re got: "Xema mexwe. Roja di nameyê de bi nav bûye, em ê herin Deşta Nîsrînê. Eger rast be, tu ci bêje, wek emrê te dibe."

Kurê min Nadan, bi qiralê hêja re li Deşta Nîsrînê, hatin ba min. Dîtin ku min leşkerekî giran daye hev. Dema min qiral dît, her wekî di nameyê de hatibû nivîsandin, min leşker li hemberî wî rêz kir. Gava qiral çav li vê rewşê ket, gelekî tarsiya. Kurê min Nadan jê re got: "Tu bi selametî vegere serayê, ez ê Ahîqar bînim huzûra te." Pişti qiral çû mala xwe, Nadan hate ba min: "Her tişt bi rêk û pêk bû, qirêl pirr pesnê te da û ferman kir: bila îzna leşker bide, herkes here cihê xwe û (tu), bi tenê were ba min."

Li ser fermana qirêl, ez çûm huzûra wî; Gava çav li min ket, berê xwe da min û got: "Ey nivîkarê min Ahîqarê ku tore û perwerdebûna Asûr û Nînowayê girtiye. Ma weha ye? Min, tu ji kerametê re vegetand. Belê te bi dijminê min re li hev kir." Nameyên li ser navê min hatine nivîsandin û bi mohra min mohrkirî, dane min.

Gava min name xwendin, zimanê min li hev geriya, hestiyên min jan dan. Min xwest ez peyvin bi hozanî bibêjim. Bi min re derneket. Bi ser de, kurê min Nadan; "Pirê nezan! Deseñ wî girê bidin, lingê wî di qeydê xin û ji huzûra qirêl bibin." Gava weha got, qirêl berê xwe guhert û ji hevalê xwe Yebûsmek Meskin re got: "Ahîqar bibe bikuje. Serê wî sed erînî ji cendekê wî bi dûrxâne." Dema weha got, min tuyê xwe bi erdê xist û ji qirêl re: "Herûher hebe qiralê min. Ez zanim min tu xerabî bi te nekikiye. Belê te kuştina min ferman kir. Bila ferma te bi cî bê. Bi tenê ferman bike, min li ber deriyê mala min bikujin û cendekê min veşterin." Dostê min qiral ji Yebûsmek Meskin re got: "Here Ahîqar li ber deriyê wî bikuje û cendekê wî bide gorkirin."

Wê gavê min, Ahîqar, xeber da jina xwe İşfegnî, da ku ji êla min 1000 qızêr resgi-rêdayî (cilêş şînê lixwekirî), vehewîne û bîne pêrgî min. Beriya ku ez bimrim, li pêş çavê min bila li ser min ax û figanê bikin, şîna min bigermin. Ji hevalê min Yebûsmek û Feratiyan re xwarin û vexwarinê hazir bike. Gava harin, were ber derî û wan dawerî malê bike, ez jî, ez ê wek mîvan werim mala xwe."

Kebaniya min İşfegnî, ji ber gelekî têgihîştî bû, her tişte min gotibû, pêkanî. Hat pêsiya me, em vexwendin malê û bi xwe xizmeta me kir. (Mêvanan) xwarin, vexwarin, serxwes bûn, li erdê di xew re çûn. Wê gavê ez, Ahîqar, çûm ba Yebûsmek Meskin û min jê re got: "Li a Xwedê binêre bira, dostaniya me bîne bîra xwe bila destê te li kuştina min negere. Bavê Senharîb, Serhaddûn, tu jî, ji bo kuştinê teslimî min kiribû. Belê min tu nekuşt. Lewra tu sîcê te tunebû. Heta ku qiral li te getiya, min tu veşart. Gava min tu bir huzûra wî, gelek xelat dane min. Tu jî min bi saxî veşêre û bi qencyê were min. Ji bona ziyana qirêl negihêje te, bila saxmayina min belav nebe. Di zîndana min de yekî mustehaqê kuştinê ku navê wî Manzîfen e, heye. Cilê min lê ke, Feratiyan li dijî wî hisyar bike da wî bikujin. Ji ber ez bêguneh im, bila ez neyêm kuştin.

Gava min ev tiştên ha gotin, dilê hevalê min Yebûsmek, bi min şewitî. Cil û bergê min, li wî qûlê di zindanê de bû, kirin, Feratiyên ku serxwes bûbûn, hisyar kirin û ew kuştin. Serê wî 100 erînî ji cendekê wî bidûrxistin û cendekê wî binax kirin. Di pişt re, li Nînowayê, bi jina min, İşfegnî re, di bin sivdera xaniyê min de, bi fireya 3 erînan û bi dirêjaya 5 erînan, cîhekî veşartinê ji min re çekirin. Nan û av danîn ber min û çûn xeber dane qiral Senharîb, gotin katib Ahîqar hate kuştin. Dost û meri-

vêñ min, gava mirina min bihîstin, girîyan, jinan ruyêñ xwe qelaştin. "Heyfa te Ahîqarê katib û hakim, heta dunya hebe, kî yê wekî te sincê dora gêdûkê welatê me be." Wê demê Senharîb ji kurê min Nadan re got: "Here di şîna bavê xwe Ahîqar de rûnê, di pê re were ba min." Kurê min Nadan gava hat, ne xema min xwar, ne jî ez anîm bîra xwe. Bes, hinck merivêñ tiral û sergerde vehewandin, bi kêfxweşî xwarin li ser sifra min da wan. Xulamên min yên hêja û cariyeýen min ta-zî kirin û ışkence li wan kir. Bê şerm, xwest bi jina min Îşfegnî re karê jin û mérän bike. Min jî di jêr de, guhdariya fixanên nanopêj û avkêşên xwe dikir.

Çend rojan di pê re, hevalê min, Yebûsmek Meskîn rîya xwe bi min xist. Nan û av ji min re anî û li ber dilê min da. Gava ew ê ji ba min bi rê keta, min jî wî re: "Min li huzûra Xwedê bîne bîra xwe û ji min re dua bike. (û bêje) Ya Xwedayê rast û dadmend û her qencî ji dest derdikeve, dengê qûlê Xwe, Ahîqar bibihîze! Dema gayêñ dermale wek berxên bermakê, ji te re dikirin qurban, bila bê bîra Te. Avêti-ne bîreke tarî. Li ber Te digere, (lê were tehmê) wî xelas bike Xwedêyo."

Qiralê Misrê, Fir`ewn, bi kuştina min, Ahîqar, şâ bû û nameyek weha ji Senharîb re şand:

"Qiralê Misrê.

Slav li Senharîb, qiralê Asûr û Nînowayê!

Dixwazim koşkekê li navbera erd û ezmên ava bikim. Li muhendizekî ku bersiva her gotinêñ min bide, bigere, bibîne û bişîne. Eger tu merivekî werengî ji min re bişîne, ez ê (bac) cizya sê salan ya Misrê bidim hev û ji te re bişînim, ger tu merivê ku bersiva her pîtsêñ min bide, neşîne, bi şandiyarê min re cizya sê salan ya Asûr û Nînowayê bide hev û ji min re bişîne."

Gava ev nameya li huzûra qirêl hate xwendin, (qirêl) bangî şahyar û giregirêñ welêt kir û ji wan re got: "Kî yê ji we here Misrê û bersiva her pîrsêñ qirêl bide, koşka ku dixwaze jê re ava bike û cizya sê salan ya Misrê bîne?" Gava Şahyaran ev bihîstin, bersiva qirêl dan: "Qiralê Hêja. Tuzanî, ne bi tenê di dema te de, di dema bavê te Serhaddûn de jî, girêkên weha ançax Ahîqarê katib dikarîbû vekira. A vaye kurê wî ku weke wî fêri zanînê bûye û hozan e." Gava Nadan guhdariya wan kir, li ber qirêl, bi qêrîn: "Ji bilî (xeyrî) insanan, Xwedê jî nikare vana pêk bîne!" Li ser vê, bêhna Qirêl gelekî teng bû, ji kursiya xwe daket, bi xemgîniyeke mezin: "Heyfa te,

Ahîqarê hakim. Bi gotina zarokan, min tu wenda kir. Ax!.. nuha, hina te ji min re bianiya, min ê ew berberî zêran bikirana.”

Gava hevalê min, Yebûsmek Meskîn ev bihîstin, li ber qirêl xwe tewand û got: ”Qiralê Hêja, Kesên fermaña qirêl bişkîne, malê mirinê ye. Ez li dijî emrê dewletê meşiyam. Serê min li ber şûrê te ye, lewra, Ahîqarê ku te, fermaña kuştina wî dabû, nuha dijî.” Dema guh li van bû, kêfa Qirêl hat: ”Yebûsmek were, bipeyive. Bipeyi-ve Yebûsmek, camêrê jîr ku bîra xerabiyê nabe. Eger rastî wek ku tu dibêjî be û tu Ahîqar bi saxî ji min re bînî; ez ê 100 talantê zîv, 50 talantê erxuwan diyarı bidim te.” Li ser vê Yebûsmek ji qirêl re: ” Qiralê Hêja, ez bextê te dixwazim, di huzûra te de tu gunehê min î din tunebe, vê ya li min neke bar.” Di cî de qirêl destê xwe da yê û li ereba xwe siwar bû hat ba min. Gava ciyê ez tê de veşartî vekir, porê min dabû ser milên min û rîha min gîhiştibû nava min, laşê min tev di nav axê de, nenû-kê min wek yên qertelan, ez li huzûra qirêl tewiyam. Qirêl gava ez (di wî halfî de) dîtim, giriya û bi xemgînî ji min re got: ”Ahîqar, ne min bi te kir, lawê te, bi te kir, sûcê wî ye. Wê gavê min bersiva wî da û min got: ”Piştî ku çav li ruyê te ketim, ez, wek ku tu xerabî nebûye qebûl dikim.” Qirêl, ji min re got: ”Here mala xwe, porê xwe kur bike, xwe bişo, veşo, 40 rojî ıstîrehetê bike û paşê were ba min.” Ez çûm mala xwe, 30 rojî derneketim derive. Piştî bêhna min hate ber min, ez çûm huzûra qirêl. Qiral ji min re: ” Tebihîstiye ku qiralê Misrê ci ji min re nivîsiyê?” Bi bersivê: ” Ji wî alî de xema mexwe. Ez ê herim Misrê, koşka wî ava bikim, bersiva pîrsên wî bidim, cizya Misrê ya 3 salan bînim.” Qiral, bi van bersivan kîfîkweş bû, ziyafetek mezin da. Gelek qurban da şerjîkitin, xîlat bela kir. Cî, di ser mîvanan re, da hevalê min Yebûsmek Meskîn. Piştî vê, (min) nameyek ji jina xwe, İşfegnî re şand: ”Gava ev nameya kete destê te, bila nêçîrvanên min du (çêlikên) qertelan bigrin. Li ba yên ketenê dihûnin, her tayek, bi qandî tiliya qeraqûckê qalind û hezar erînî dirêj sênexan (ben) ji min re bihûnin. Bila xerat, ji her du çêlikên qertelan re 2 qefesan çêbikin. Du zarokên hê devê wan nagerin, bispêre Übail Tûbaşliuma, bila wan fêri <kilsê, heriyê, kevirâ, qermîta bidin muhendizên vala> bike.”

Min (ji qirêl re) got: ”Ferman bike da ez herim Misrê” Gava emir kir, min leşker bi xwe re hilanî, ez çûm. Gava em gîhiştin qonaxa pêşî, min her du çêlikên qertelan derxistin, sênex bi piyêwan ve girêdan. Zarok li wan siwar kir û bi hewa xist. Zarokan wek ku fêr bûbûn, bang dikirin: <kilsê, heriyê, kevirâ, qermîta bidin muhendizên vala>. Di pê re , min ew daxistin.

Gava em, gihîştin Misrê, em çûn ber deriyê qirêl. Şahyarêñ qirêl, xeber danê: "Va ye, merivê ku qiralê Asûrê şandiye hat." Qirêl ferman kir ku koşkekê bidin min. Roja din, ez çûm huzûra wî. Qirêl, berê xwe da min: Gava pîrsî: "Navê te çi ye?" Min got: "Navê min Abîkom e, ez ji gêrîkên welatê xwe, yê herî kêm im" qirêl, ji min re: "Min xwe kêm kir ku Mîrê te merivekî kêm ji min re şand. Xem nake Abîkom, here qonaxa xwe û sibê were ba min." Ü ji şahyarêñ xwe re got: "Sibê sor li xwe bikin." (Roja din, qirêl) Ketenê tenik li xwe kir û ferman kir ku ez werim huzûra wî: "Abîkom, ez dirûvê çi didim û şahyarêñ min dişibihin kê?" Min bersiv da: "Qiralê hêja, tu dişibihî Bîl û wezîrên te ji dişibihin kahînan." Dîsa ji min re got: "Here qonaxa xwe, sibê were ba min." Ü ji şahyarêñ xwe re got: "Sibê ketenê sipî li xwe kin." Wî ji kincêñ sipî li xwe kir û li ser textê xwe rûnişt. Ferman kir da ez herim huzûra Wî. Ji min pîrsî: "Abîkom, Ez dirûvê çi didim û wezîrên min dişibihin kê?" Min bersiv da: "Qiralê hêja, tu dişibihî rojê û şahyarêñ te wek tîrêjên wê ne." Dîsa ji min re got: "Here qonaxa xwe, sibê were ba min." Ü ji şahyarêñ xwe re got: "Sibê kincêñ reş li xwe bikin û wî ji xwe, mor girêda, li gora fermana wî, gava ez hatim huzûra wî, ji min pîrsî: "Abîkom, Ez dirûvê çi didim û şahyarêñ min dişibihin kê?" Min bersiv da: "Qiralê hêja, tu dirûvê heyyê û wezîrên te, dirûvên stêrkan didin." Dîsa ji min re got: "Here qonaxa xwe, sibê were ba min." Û ji şahyarêñ xwe re ferman kir û got: "Sibê kincêñ rengareng, li xwe bikin dergehêñ perestgehan bi perdeyêñ sor binuxêmin. Wî ji qedîfe li xwe kir. Ü cardin li gora fermanê, gava ez çûm huzûra wî: "Abîkom, Ez dirûvê çi didim û wezîrên min dişibihin kê?" Min bersiv da: "Qiralê hêja, tu dişibihî nîsanê û wezîrên te ji dişibihin kûlîlkên wê" Di dû re, qirêl ji min re got: "Cara yekê, te ez şibandim Bîl û şahyarêñ min şibandin kahînan. Cara duda Ez bûm roj û şahyarêñ min tîrêjên wê, cara sisîyan, ez bûm heyyê û şahyarêñ min stêrik. Ka nuha ji min re bibêje Abîkom, mezinê te, Senharîb dişibihe çi?" Bi bersiva xwe: Qiralê Hêja, Tu li cihê xwe rûnişti, (li mala xwe), behsa mezinê min Senharîb li te nake. Mîrê min Senharîb, dişibihe cwrê reş û wezîrên wî, wek brûskên wan ewran in. Gava bîkwazin ji baran û aviyê terezê çedikin, gava bîqeherin, nahêlin roj hilê û tîrêjên wê digrin. Dikarin nehêlin Bîl derkeve kolanê û kahînen wî bigerin, heyyê ji hilatinê û stêrikan ji çîrûsandinê vedike." Gava qirêl ev tişt bîhîstîn, aciz bû û berê xwe da min: "Tu bi serê mezinê xwe kî, ji min bêje, navê te çi ye?" Min bersiva Wî da; "ez mohrdar û katibê Senharîb, qiralê Asûr û Nînowayê, Ahîqar im. Qriêl, ji min re: "Min bîhîst ku mîrê te, tu kuştîye." Min jê re: "Ez dijîm, qiralê hêja, Xwedê, ez, ji tiştêñ ku ji destêñ min derneketine, xelas kîrim." Qirêl, ji min re: "Here mala xwe, Ahîqar. Ji şahyarekî min, gotinek ku neham."

tiye bihîstin, ji min re bibêje." Wê gavê ez tûniştim, fikirîm û min nameyek weha nivîsi:

"Ji qiralê Misrê Fir'ewn, Slav li qiralê Asûrê, Senharîb. Qiral hewcedarî qiralan, bira hewcedarî birê dîbin. Vê demê, ji ber pereyên gencîneyên min kêm bûne, diyariyên min jî hindik in. Ji kerema xwe re, ji gencîneyên xwe, 900 talant zîv ji min re bişîne. Ez ê di pê re li te vegerinim." Min ew nameya pêça û xiste destê xwe, derna qirêl ferman kir, ez derketim huzûra wî û min got: "Belkî di vê nameyê de, tiştekî ku te nebihîstiye, hebe." Gava min li huzûra şahyarê wî xwend, li got ferманa qirêl, (teva bi hev re) bi dengê bilind gotin: "Me teva ev bihîstiye." Min jî ji wan re: "A va ye, Misir 900 talantî deyndarê Asûrê ye." Qirêl, peyy guhert, ji min re got: "Ez dixwazim, di navbera erd û ezmên de, ji erdê 1000 erînî li jor, koşkekê ava bikim." Min, derhal çêlikên qertelan derxist, (pişti) ben bi nigên wan ve girêda, zarok li pişta wan siwar kir û bi hewa xist. Zarokan: <kilsê, heriyê, keviran, qermîtan bidin muhendizên vala>.

...Min rahişt darekî li şahyarên qirêl da, ta ku ji hev bela bûn. Gava qiral çav lê ket, bi bêhntengî ji min re got: "Tu dîn buyî Ahîqar! Kes nikare tiştekî ji van re derxîne." Min got: "behsa mîrê min Senharîb nekin, eger li vir ba ya, karîbû di rojekê de du koşk ava bikira." Qirêl, ji min re (got): "Ahîqar, dev ji koşkê berde, sibê were ba min." Siba din, gava ez çûm huzûra wî, (gote min): "Ahîqar, ka ji min re bibêje; hespê mîrê te li Nînowayê şîhiya, mihînên me li vir, ji ber dengê wî, beravêtin, tê çi maneyê." Ez wê gavê ji huzûra qirêl derketim. Min ferman li xulamên xwe kir ku pisikekî ji min re bigirin. Li kolanên bajêr, min bi daran lê xist. Gava misrî çav li min ketin, gîhandin qirêl, gotin: "Ahîqar kêmâniyê tîne ser welatê me, lewra pisikek girtiye û li kolanê welatê me bi qarmeçiya lê dide." Qiral li min geriya, gava, ez çûm huzûra wî, ji min re got: "bi çi rûyi, tu haqaretê li me dikî?" Min got: "Vi pisikê we, ziyanêke mezin daye min. Mîrê min dîkek dabû min. Dengê wî gelekî xweş bû. Gava bang dida, min zanibû ku Mîrê min li min digere, ez diçûm dergehê wî. Şevê din, ev pisika çûbû Asûrê, serê dîkê min jêkir û vegeeria." Qirêl, ji min re: "Li gora min, tu zû pîr bûye û xurufî ye. Ji vir heta Asûrê 360 fersah rê ye. Di şevekê de wê çawa ev pisik here, serê dîkê te jêbike û vegere?" Min got: Ji Misrê heta bi Asûrê ku 360 fersah rê be, çawa, li vir mihînên we, ji şîhîna hespê Mîrê min berdiavêjin.." Qirêl ku evana bihîstin, li ber xwe ket, lê peyy guherî, ji min re got: "Ahîqar, ka ji min re bibêje; li serê sutûnekê, duwanzde darêن çamê hene. Her da-

reke çamê, sî toterîk (tekerlek) û her toterîkek benekî sipî û yekî reş pê ve, ci ye?" Min lê vegerand: "Surûna tu dibêje, sal e. Duwanzde darêن çamê, 12 mehêن salê ne. Sî toterîk, nîşana 30 rojêن mehan in. Benê sipî û yê reş jî , şev û roj in." Qirêl got: "Ji toza qiraxa çem, pênc bena ji min re birêse." Min gotê: "Fermanê bide, ji gencîneya xwe, bila benekî ji tozê, ji min re bînin da ez, benekî wek wî çebikim." Qirêl ji min re got: "Eger te, ev çênekirin, ez cizya Misrê nadim te." Di pê re qiral ji serayê derket û çû. Min jî, di dîwarê rojhilat de 5 qul vekirin. Gava tîrêjên rojê, di wan qulikan re kete hundur, min toz tevrakir. Tîrêjên rojê di qulikan re dihate hindur, bi tozê ve dibûn wek ben bêne ristin. Min ji qirêl re got: "Mîrê min, ferman bike da van bena bidin hev, ji bo ez yê nuh li şûna wan birêsim." Qiral û şahyarên wî gava gotinêن min bihîstin, matmayî man. Carek din qirêl, ferê berdê eş yê ser da anîn û ji min re got: "Ahîqar, vî berdê şkestî ji bo min pev bidrû." Min, wê gavê berdê binî da anîn û li ber qirêl danî. Min got: "Qiralê hêja, ji ber ez xerîb im û alavêن min ne bi min re ne, ferman bike da kevnîfîroş werin. Ji vî kevirê ku wek yê din e, bila ta bibirin, da ez jî derhal bidrûm." Qiral keniya û got: "Roja Ahîqar hate dinyê, li huzûra Xwedê, pîroz bel ji bo ku min tu sax dît, ez ê şayıyeke mezin çebikim."

Piştî vê, cizya sê salan ya Misrê da min, ez di cî de vege riym ba Mîrê xwe Senhabîb. Hat pêsiya min, şayıyeke mezin lidarxist û ez di ser lawêن xwe re girtim. (Ji min re) Got: "Tu ci ji min dixwazî, bixwaze Ahîqar." Min xwe tewand û ji qirêl re got: "Qiralê hêja, daxwaza min ev e; hevalê min Yebûsmek Meskîn û kurê min û min şîretêن delal lê kiribûn, ferman bike, da teslimî min bikin. Ji ber ku Yebûsmek Meskîn heyata min xelas kir û kurê min Nadan jî perwerdekirina min ji bîr kir." Qirêl bi ferma na teslimkirina kurê min Nadan re, got: "Here Ahîqar. Tu ci bi kurê xwe Nadan dîkî, bike. Kes nikare wî jî nav destê te derxîne." Min wê gavê kurê xwe Nadan anî, bi zincîrek 20 talantî giran ve, girêda û mohrkir. Min ew sinê kir. Hezar dar li pişta wî û hezar dar jî li ser milê wî xistin, ew li ber deriyê hewşê danî û ji xulamê xwe Nabû re got ku bi pîvan, nan û avê bidêyê û baş lê miqate be. (Min got) Di ketin û derketina min de, her tiştê ji devê min derket binivisîne.

A van e peyvê min yê dawî ku min ji kurê xwe Nadan re gotin:

- 1- Kurê min, kesên ku ji guhêن xwe nebihîzin, wê ji pişt serê wî de, pê bidin bihîstin.

Kurê min Nadan, zîvirî, ji min re got: "Bîna te çawa ji lawê te teng dibe?" Min got:

2- Kurê min, min tu li ser kursiya keramerê da rûniştandin, lê te ez ji kursiya min avêtim. Bes, paqijiya min ez xelas kirim.

3- Kurê min, tu bû wek dûpişkê bi tahtê vede. Te bi dilê min î tije veda.

4- Kurê min, tu bû wek bizina dara simaqê dixwar. Dara simaqê ji bizinê re got:
"Tu çîma min dixwî, (ma ne) bi koka min, iyarê te debax dîkin." Bizinê lê vege-
rand: "Ez, di jiyanâ xwe.de, te dixwim, piştî ez mirim, bila te ji kokê de hilkin."

5- Kurê min, tu bû wek yê kevira davêje ezmên. Ma te ji xerabiya xwe şerm nekir?
Min elb bi elbê da. Ez ê çawa bijîm?

6- Kurê min, tu bû wek yê ku didît hevalê wî ji serma dilerizî û wî ji kunê avê bera
ser serê wî dida.

7- Kurê min, xwezî gava ez bimrama, te şûna min bigirta. Lê tu zanibe; ger dêla
berêz 7 erîn be, nabe manegî (hespa kihêl). Ü pirça wî wek livê be, bi laşê miro-
vên paqij ve na nûse.

8- Kurê min, te hîzir kir ku tu li şûna min be, tu yê bibî xwediyê xanî û malê min,
mîratxurê min. Lê te, destê xwe ji Xwedê kir. Ji ber vê, guh neda dengê te.

9- Kurê min, tu bû wek şerê ku serê sibê li kerê rast hat û got: "Tu bi xêr hat Korîs
beg." Kerê ji lê vegerand, got: "Ev bixêrhatina ku te da min, bila li wî yê ku êvarî
pêwend bi piyêñ min ve girêda, re be, da min rûyê wî nedîtibaya."

10-Kurê min, feqek li ser sergo hatibû vedan. Gava serçe çav lê ket, jê pîrsî:

- Feqik, tu li vir çi dikî?

Feqê: Ez dua ji Xwedê re dikim.

-Ew çi di devê te de ye?

Feqê: Nanê mîvana ye.

Gava serçe nêzîkî lê kir, bi stuyê wê girt. Bi perepitandina xwe re, (serçe):

"Eger nanê mîvanê te ev be, dengê te neçe wî xwedayê tu jê te dua dikî."

11-Kurê min, tu bû wek gayê bi şer vê girêdayî, ku şer lê vege riya, ew xwar.

12-Kurê min, tu wek sipi ya genim e. Bi min, ne tiştek e, lê embarê qirala xera dike.

13-Kurê min, tu bû wek beroşa ku ji teniyê binê wê xuya neke, lê çemilên zêrîn jê re hatibe çêkirin.

14-Kurê min, tu bû wek erdê bîst elb ceh lê hatibe çandin û li bênderê bîst elb ceh jê hatibe hilanîn û wek cotkarê ku ci çandibe, wî hilîne, li te hat. Cotkar, ji zevi-yê re: "Ma te ji xerabiya xwe şerm nekir, (xerabiya te, bi te ma) elbê, elb da, ez ê çawa bijîm?"

15-Kurê min, bi min, tu bû wek kewê di ber xwe dida, da ku ji mirinê xelas bibe û bi dengê xwe, hevalê xwe têwerdi ke.

16-Kurê min, tu bû wek cunegayê ku nikaribe xwe xelas bike û hevalê xwe diajo selaxanê.

17-Kurê min, tu bû wek kûçikê di kûreya camkiran keve, germ bibe û bi wan de bireyi.

18.Kurê min, tu bû wek berazê here hemamê û gava kortalek çiravê bibîne, ji hevalen xwe re bibêje: "Werin, em avjeniyê bikin."

19-Kurê min, min (bi) tiliya xwe xiste devê te, te tiliya xwe xist çavê min. Ez ê çima te xwedî bikim.

20-Kurê min, kûçikê nêçîra xwe bixwe, dibe xureka guran. Destê kar neke, ji enîçkê tê jêkirin, çavê nabîne, qiralk derdixin. Te ci qencî kir ku dilê min ji te re bixwaze û razî be.

21-Kurê min, ...

22-Kurê min, min rûyê qirêl rê te da, tu gîhand kerametê. Lê te xwest xerabiye bi min bike.

- 23-Kurê min, tu bû wek dara ku bêje; "(Doxa) Bivirêne we ne ji min baya, hûn nediketin ser dilê min."
- 24-Kurê min, tu bû wek çêlikên dûvmeqeska (hechecîka), ji hêlîna xwe bikevin û li pisîk rast bêñ ku ji wan re bibêje: "Ne ji min baya, hûn ê li belayeke mezin rastbihatana." Ü (çêlik) bizîvirin jê te bibêjin: "Na xwe ji ber vê, te em xistine devê xwe."
- 25-Kurê min, tu bû wek pisîka ku jê re bibêjin: "Dev ji diziya xwe berde û bi dilê xwe di mala qirêl keve" Pisîk li wan bizîvire: "ger çav û guhêñ min ji zîv bin ji, ez dev ji diziya xwe bernadim."
- 26-Kurê min, tu bû wek marê di nav avê de, li dêr siwar be. Çaxê gur çav lê ket, got: "Xerab li xerêb siwar bûye, lê belê, yê ji herduwa xerabtir, wan diajo." Mar lê vegerand: "Eger tubihata vir, tu yê gunehê bizinêñ ku te xwarine, bidaya."
- 27-Kurê min, min, bizina ji bo serjêkirinê birin selexanê dît. Ji ber roja wê nehatibû, bi saxî vegeriya, zarok û neviyêñ xwe dît.
- 28-Kurê min, min, dahşikêñ ku dayika xwe kuştine dîtin.
- 29-Kurê min, min her tiştên şêrfin bi te da xwarin, te têr nexwar. Belê te, nanê min tevli axê bi min da xwarin.
- 30-Kurê min, min gulyaxêñ bêhnxwêş di (laşê) te dan, lê te, çermê min bi axê gurand.
- 31-Kurê min, min tu wek dara çamê xwedî kir, te bi xerabiya xwe jiyana min xwar kir, ez serxwêş kirim.
- 32-Kurê min, min tu wek bircekê ji xwe re mezin kir, ku li hemberî neyaran, min xwe tê de biparazta. Lê tu, gava te dijminê min dît, te, ez şikenandim.
- 33-Kurê min, tu bû wek koremişkê ji bo rojê bibîne, derkeve ser ruyê erdê û qertel çav lê bikevin dadine, bibin.

Nadan li min zîvirî, got: "Bavê min, Ahîqar, tu ji van tiştan dûr û, ez xwe dispêrim dilovaniya te, Xwedê ji di gunehêن însanan dibuhure. Ez ê seyistiya manegiyêن te bikim, bibim şivanê berazên te, bila navê min bi xerabî bê gotin, min bibexşîne. Ez, zîvirîm ser (wî):

34-Kurê min, te dara xurmê ya li rexê avê anî bîra min. Gava xwedî hat wê bibire, (got): bela xwe ji min veke, ez ê saleke din sêvan (bigrim) bidim te." Xwediyê wê jê re got: " tu di fêkiyêن xwe de bi ser neket, di tiştên ne yên te bin, tu ê çawa bi ser bikevî?"

35-Kurê min, gava ji gur re gotin, "tu çima li dû kerîyan diherî?" got: "Toza wan dermanê çavê min e." Ü dema gur şandin dibistanê, her mameste jê re digot: "Bibêje A,B." Gur digotê "Berx, kar."

36-Kurê min, min tu perwerdeyî hebûna Xwedê kir, lê tu li hemberî qûlêن wî rabû û li wan da. Çawa ji ber paqijiya min ez sax kirim, ew ê te jî wenda bike.

37-Kurê min, serê kerê di sêniyê de anîn ser sifrê, bi xwe gindirî ket nav axê. Dibêji ku keramet qebûl nekiriye, ew ji xwe, di enir e.

38-Kurê min, te çîroka, (jê ket û pê ket) ji ya jê zaye re, dibê "kuro" û ji yê ew afirandiye re dibê "qûlo", temam kir.

39-Kurê min, meseleya ku dibêjin, "bi çeplê xwarziyan bigrin û li kevir xin" rast e. Xwedayê ez sax kirim, Ew ê doza navbera me jî hel bike.

Di eyñî demê de Nadan, wek meşkê nepixî, teqiya û mir.

40-Kurê min, yê qencyî bike, xêrê dibîne. Yê xerabiyê bike, cezayê wê dibîne. Yê çalê ji hevalê xwe te bikole, bi bejna xwe dadigire. □


Not: Me di hejmara Nûdemê ya 27an de beşê pêşî ji "Şîretên Ahîqar" weşandibû, lê me bi navê "Hayqat" weşandibû. Li gora agahdariya şarezayêن asûriyan, divê "Ahîqar" be û ne "Hayqar" be. Em rast dikin û ji xwendevanêن xwe lêborînê dixwazin.

TOL

Xwînên nîvisokan
meyandî ne, çığa sar in
dengêñ kurdêñ xiniz
di kewarêñ kurtêlan de
bençkirî ne, pir xewar in
Ü rûpelêñ ruwê te spî ne
sîng vekirî, bendewar in
û ruwê te, striyekî zixtok e
li nav kavîlê gewdê min
seyrançî ne, gerok e
û ruwê te
xwîn ji min miçiqand
tif ji dijmin miçiqand
tifê xwîn biriqand
û coka xwînê
coka tifê xeniqand
gola cokan bû xelekç
û gewdê min
bo ruwê te
bo razêñ evîna me
bû kelekek
û ruwê te ma ola min
ma armanca tola min.

ALAN OSMAN

BÎRANÎNÊN MIN (2)



REFÎQ HILMÎ

Jiyana Şêx Mehmûd. Şêx Mehmûd, kurê Şêx Se'îd ê Hefid ê (Xwedê jê razî be) kurê Kak Ehmedî Şêx e. Dîroka vê xanedana han nêzîkî 150 sal berê niha dest pê dike, ku bi taybetî teqabulê dewra hukûmeta "Bebe" dike. Kak Ehmedî Şêx kurê Şêx Marufê Nûdî ye. Ev zatê han murşid û mezinê Terîqeta Qadirî bû. Bi Xwedanasî, Xwedaperestî û başiyê hatibû naskirin. Ji ber vê, xelkê Kurdistanê bi çavekî hurmet û prestij lê dinêrî û gelekî ji jê hez dikirin. Bi dereceyek wisan ku gelek ji wan, bi taybetî xelkê gundan û eşîretan, bi "keşf û keramet" ên wî ve hatibûn girêdan û bi serê wî sond dixwarin. Merqeda Şêx Ehmed a bajarat Silêmaniyê bûbû ziyaretgaha pi-raniya xelkê. Ji ber vê, nesla Kak Ehmed (Hilmî) ji meqamê dînî yê bab û bapîrênen xwe parek mezin wergirtibû û di rîza nesleke pîroz de dihat hesibandin. Ji bo vê, li Kurdistanê xwediyyê nav û şohreteke mezin bû... Ev xoşewistî û prestija han ji Kak Ehmedi Şêx re ji kur û neviyên wî re, bi tayebtî ji Şêx Mistefayê Neqîb û Şêx Se'îdê babê Şêx Mehmûd Se'îd re mabû. Jîrî û hêjatiya Şêx Mehmûd her di piçûktiya wî de hatibû dîtin û nav û dengê wî di nav gund û eşîretên Kurdistanê de belav bûbû. Ji bo ku ji bingeh de bi rehim û şewqet û azayeti navê wî belav bûbû û şohreta bab û bapîrênen wî û nîfûza xanedana wî ya dînî gelek kîrê wî hatibû û gîhîş-

tibû derecuya herî bilind. Ji ber van sebeban êdî ew jî gav bi gav pêş ket û heta di cîhana siyasetê de jî kêm û zêde wekî navekî naskirî ket ser ziman. Hê lawekî nû yê têgîhişî bû ku carekê li dijî Eşîreta Cafan a mezin û carek din jî li dijî eşîreta dîr û aza Hemewend sekinî bû.

Bi kurtî çi di hêla azayetî û leşkerî de û çi di hêla ji ber sebebê nifûza dînî ya bab û bapîrên xwe, nifûza Şêx Mehmûd a dînî û dînyayî çiqas diçû ber bi geşbûnê ve diçû û stîrka bextê wî jî roj bi roj bilind dibû.

Ji bili vê, Sultan Ebdulhemîdê duyem ê Osmanî li gor rê û siyaseta dabû ber xwe û li ser dimeşıya, Şêx Se'îd ê Hefid ê Kak Ehmed dawetê Stenbolê kir, Şêx Se'îd ji derveyê hinek xizm û kesên derûdoran xwe, Şêx Mehmûd ê kurê xwe jî bi xwe re biribû. Bi vî awayî Şêx Mehmûd di temenê xwe yê zaroktiyê de demekê jî bûbû mîvanê padîşahê Osmanî û koşk û seraya saltanatê.

Wî çavê xwe di jiyanek bilind a aristokratî û gelek debdebe de vekiribû.

Sultan Ebdulhemîd her wekî ku ji dûr ve nav û deng û şohreta Kak Ehmed baş sehkiribû, wisan dixuya ku bi çûna Şêx Se'îdê Hefid ya Stenbolê, xwe nêzîkkirina vê xanedana han hê zedetir kiribû serê xwe. Ji ber vê, berî ku ew vejerin Silêmaniyyê her yek ji wan kesên derûdoran Şêx Se'îd bi berat û hexşîş perrû kiribû. Ji derveyê vê jî şifra muxaberata dizî dabû Şêx Se'îd, ku di wextê tengî û pêwistiyê de bikare bi telgrafê pê re muxaberatê bike. Ev mezintirin perrû bû ku sultanekî Osmanî yê wekî Ebdulhemîd dabû re yetekî xwe. Her wekî ji aliyê padîşahekî de dayîna vê, belgeyek mezin jî bû ji cî û meqamê bilind ê Hefidê Kak Ehmed re. Ji ber vê, ew muteserrif û serokleşkerên ku li Silêmaniyyê bûn an dişandin wir, bêguman xwe ji xezeb û xeyda Şêx Se'îd diparastin û diketin bin nifûza wî. Hinek ji van diketin nav rewşek wisan ku bê pirs û raya Hefid pê xwe nedîavêtin avahiyên xwe.

Vêca tu şik di vê de tune ku memûrên biçûk bûbûn leyîstika şêxan û beşek bêqîmet ên ji xelkê ji bo qazanc û merama karên xwe bi bê berat û bê beşşîş diketin nav rêzên nukeran. Lê tucar û axa dijminê vê xanedana han bûn û di bin re şûrê xwe ji wan re tûj dikirin.

Çiraya kê heta hetayî vêketî maye? Her wekî ku çawan ew cî û meqamê bilind heta hetayî ji Ebdulhemîd re nema, bi wî re çîrîskên bextê vê xanedana han jî ber bi jariyê ve çûn. Dema ku li Tirkîyê Şoreşa 1908an qewimî, leşkerên Mehmûd Şewket Paşa ji Selanîkê meşîyan ser Sultan Ebdulhemîd û Stenbol girtin. Ebdulhemîd ji ser textê padîşahî rakirin û şandin Selanîkê. Vêca Komeleya Yekîti û Pêşkevtin (İttîhad û Terakkî Cemîyetî) hat ser kar û hukum kir destê xwe. Pişî vê ji bo qâhîmkirina ciyê piyê xwe, li seranserê welatê Osmanî, bi taybetî ew kesên ji

xelkê yên dijminê derûdora Ebdulhemîd bûn, berhev kirin û bi wan şubeyên (li-qên) Ittihad û Terakkiyê dan avakirin. Tu şik tê de nîn e ku avakirina van şubeyên Ittihad û Terakkiyê di welatên dûr de, bêhêzkinin û nehîştina wan kesan bû ku meyêldarê Ebdulhemîd bûn.

Şubeya Ittihad û Terakkiyê ya Silêmaniyê jî, ku bi taybetî ji nexwazên xanedana Şêx Se'îd, yanî bi destê hinek tucar û zabitên ku nû ji dibistana herbiyê derketibûn hatibû avakirin, meyla azadî û dijîtiya kesên xwedî nifûz dikirin. Ji ber vê, bi ceb-heya şexan re ketin dijminatiyê û dest avêtin hukûmetê li dijî wan han dan. Vêca gelek bi ser de derbas nebû, bi riya şube û karbideşten wê re, ku endamê komeleyê bûn, bahane derxistin û Şêx Se'îdê Hefid û hinek kes û derûdora wî bi Şêx Meh-mûdê qehremanê vê behsa han, di bin çavdêriya hêzeke mezin a hukûmetê de anîn Mûsilê.

Li Mûsilê heta demekê wextê xwe rehet derbas kirin. Her dem li hêviya wê bûn ku dewr biguhere û vegerin Silêmaniyê. Wan nedizanî ku ji bo rojên bêñ bext û ta-lihekî tarîfir ji wan re hatiye amadekirin û gelek bûyerên din li pêsiya rojên wan ên mayî de hene.

Karbideşten Ittihad û Terakkiyê yên Mûsilê, li firsetekê digerîyan ku ji kuştina Şêx Se'îd re bikin bahane. Ji ber vê, di destpêkê de hewil didan û dixebeitîn ku berê xelkê Mûsilê ji wan vejetînin, wekî dihat gotin, gelek tiştîn nerewa û derew bi wan ve girê didan û di nav xelkê de belav dikirin. Şûmî û siya rojên bedbextiyê li wan nêziktir kirin. Gelek bi ser de derbas nebû, bajarê Mûsilê di derheqê van xerîb û lêqewimîyan de agirê fitneke mezin hilkirin...

Kuştina Şêx Se'îd ê Hefid û Şêx Ehmedê kurê wî

Di sala 1326ê hicrî de (destpêka sala 1908ê mîladî) roja duyem ê Cejna Qurbanê⁽¹⁾, Şêx Mehmûd, Şêx Ehmedê birayê wî û Bahâ Efendi⁽²⁾ yê hevalê wan, li mala Mustefa Beg ê qaymeqamê eskerî mîvan bûn. Mala Mustefa Beg li ser Meydana Ba-bu'l-Tuwab bû, ku wê çaxê ciyê seyran û civînan bû.

Dema ku ew ji mala Mustefa Beg derdiketin ji meydanê derbas dibûn, li gor go-tinan, Bahâ Efendi serxwêş dibe û li jineke nav temâşevanan dabanceyê dikişîne. Lê jînik dest bi qêjîn û hawarê dike. Li ser vê hinek ji temâşevan ên ji xelkê Mûsilê digihîjin hawara jînikê. Bi Bahâ re dest bi şer dikin û dixwazin wî bikujin. Vêca Şêx Ehmed û hevriyên wî jî dikevin nav şer û şer diçe digihîje kêşana xencer û da-bancan. Di vê navê de çend kes birîndar dibin. Li ser vê, xelkê Mûsilê hêdî hêdî

kom dibin û dest ji kar û barên xwe berdidin. Heşameteke gelek zêde li derûdora Şêx Ehmed û hevriyên wî berhev dibin û wan dixin tengiyê. Wê navê re ku hinek cendirmeyên kurd li wir hazir bûne, alîkariya wan dikin. Dewriyên siwarî (siwarê devan) yên ku gelek ji wan kurd bûne, bi ser vê bûyerê de tê. Şer giran dibe û ji herdu milan jî hinek kes têن kuştin û birîndar kirin. Li ser vê, hejmara xelkê berhevbûyi hê zêdetir dibe û beşê piraniya xelkê dest diavêjin çekan û derûdora cendirman digrin. Dema ku şev bi ser de tê, cendirme xwe digihînin qonaxa hukûmetê. Roja din sibê xelk cardin nasekinin, bi çek dimeşin ser qonaxa hukûmetê û ji bo toleya xwe vekin daxwaza cendirman ji wali dikin. Wali cendirman nade destê wan. Vêca daxwaza Şêx Ehmed û hevriyên wî jê dikin. Wê wextê wali⁽⁴⁾ di ciyê ku tedbîreke ji tefandina vî agirî re bibîne, ji xelkê re dibêje: "ew li vir nîn in, herin û bi xwe wan bibînin". Vêca ev heşameta han davêje ser mala Şêx Se'îd⁽⁴⁾ û derûdora wê digrin. Wali vê navê re careke din bi benzînê diçe ser agir. Di ciyê tedbîrekê bistîne û vê heşameta han belav bike û agirê fitne û fesadiyê bitefne, sê kesen bi nav û deng ên ji xelkê Mûsilê dibijêre⁽⁵⁾ û wan dişîne pê Şêx Se'îd û bi navê parasitina wî li "ciyek" bangî ba xwe dike. Şêx Se'îd jî baweriya xwe pê tîne û bi wan re berê xwe dide qonaxa hukûmetê.

Di vê navê re bi navê parêzgeriyê gurubek esker jî didin balê. Lê li gel vê jî, dema ku digihîn ber deriyê qonaxa hukûmetê bi emrê Tabur Axasî⁽⁶⁾ deriyê qonaxa hukûmetê tê girtin û Şêx Se'îd ji der ve dimîne. Tam vî navî re mirovek ji nav vê heşameta han kevirekî mezin li serê Şêx Se'îd dixe û dikuje.

Piştî vê bûyerê çend kesen din jî êrîşê dibin ser wî kesî ku tenê bi serê xwe bi Şêx re bûye û bi xencer wî jî dikujin. Bi vê jî ev agir nayê tefandin. Ev heşameta han vêca berê xwe dide mala Şêx Se'îd. Ew kesen di hindurê xanî de wekî şeran li hember vê êrîşa han a dirinde û wehşane disekekinin. Lê di netîceyê de Şêx Ehmed jî dikujin. Pişt re berê xwe didin ew xaniyê ku mirovên Şêx Se'îd li wir in. Deriyê xêni dişkînin û dikevin hindur û çi kêsen li wir dibînin, dikujin. Baha Efendî, ji ber agirê vê fitne û fesadiyê hê roja ewil xwe diveştere û rizgar dibe.

Lê, li vir noqteya herî girîng a hewcâyê ızahetê ye behsa tunebûna Şêx Mehmûd e. Di nav van hemû bûyeran de çawan navê wî tune? Min bi xwe jê seh kiriye ku ew di nav van bûyeran de nebûye. Lê çawan û ji ber çî? Mannoste Xulamî li El-Duhaya de dibêje ku, Şêx Mehmûd jî li mala Mustefa Beg bû. Lê piştî vê ne di bûyerâ Babu'l-Tuwap û ya li ber deriyê qonaxa hukûmetê, ku babê wî tê de hat kuştin û ne jî wextê êrîşanîna heşameta xelkê ser mala Şêx Se'îd û kuştina Şêx Ehmedê birayê wî, navê Şêx Mehmûd derbas dibe. Ev yek jî me digihîne vê qeneetê ku we-

kî min bi xwe jê seh kiriye, ew di vê bûyera han de tunebûye. Xwediye Muqedde-ratu'l-Iraq'u'l-Siyasiyye, ku wisan dixuyê gelek kîna wî ji şexan re hebûye û bi taybetî di derheqê Şêx Mehmûd de nekariye xwe ji zimandirêjiyê biparêze. Ev herze-kariya ku ji Baha li hemberî jinekê qewimiye, ızafeyê Şêx Mehmûd dike.

Lê diyar e ku karekî bi vî awayî zaroktî ji însanekî bêemsal û hêja yê yekî wekî Şêx Mehmûd gelek dûr e û Şêx Mehmûd kesekî wisan bû ku hê di zaroktiya xwe de çavê xwe berdabû mezintî û seroktiyê. Em vê jî deynin milekî; em çawan dikarin bawer bikin ku ew bi xwe bibe sebebê fitneyek wiha û pişt re bab û birayê xwe di nav wî agirî de bihêle û xwe veşere? Belê wekî Mamoste Xulamî dibêje: mim-kûn e ku Şêx Mehmûd berî vê bûyera han ji mal derketibe û çûbe mala Xidîr Hemewendî⁽⁷⁾ û di wextê bûyerê de nekaribe yan wî nehîştibe vegere ba birayê xwe. Lê tu carê û tu wextê nayê bîra kesekî ku qehremanekî wekî Şêx Mehmûd, di esna-yê vê bûyerê de ji bo xelasiya serê xwe çûbe mala Mehmûd Xidîr û xwe veşarti-be⁽⁸⁾. Çunkî Şêx Mehmûd, di hemû qonexek jiyanâ xwe de bi azayetî navê wî derbas bûye û di meydana hemû bûyer û serpêhatiyan de bi camêrî, netirsî û nebezî hatiye naskirin.

Lê rastî ci dibe bila bibe, bi vî awayê hovîtiyê, pişti qewimandina vê bûyera han a xwînavî, di dîroka bajarê bi nav û deng, Mûsilê de rûpeleke reş a herî qirêj hat nivî-sandin ku tu carî neyê jibîrkirin...

Vegera Şêx Mehmûd ya Silêmaniyê

Dengê kuştina Şêx Se'îdî Hefid û Şêx Ehmedê kurê wî ya li Mûsilê, li hemû milekî Iraqê û hetta li seranserê axa Osmanî, tesîreke gelek giran û mezin kir ser xelkê, bi taybetî ser xelkê Silêmaniyê, Kerkûk û bajarê din ên Kurdistanê.

Ji ber vê, tirs ket dilê hukûmeta Mûsilê û Şêx Mehmûd û darûdestên wî ragirtin û nehîştin ji Mûsilê derkevin. Dema ku eşîret bi vê bûyerê hesiyan, xwestin pêşî hukûmet hêmin bibe û pişt re bi riya mezinên Kerkûkê daxwaza Şêx Mehmûd û birayên wî bikin. Wan ev daxwazî gîhandin hukûmetê û gotin ku, eger ew neyên berdan û ew venegerin Silêmaniyê, dê eşîret bimeşin ser Mûsilê û tola Şêx Se'îd û Şêx Ehmed ji xelkê wî bistînin. Li ser vê, wilayetê birtyara berdêna Şêx Mehmûd û birayên wî û şandina wan da. Wan rojan kelîneke mezin ket nav ehlê bajarê Hew-lîrê û Kerkûkê. Eşîretên derûdora Kerkûk û Silêmaniyê ketibûn nav nerehetiyek bêbinî. Jin, mîr, mezin û biçûk vê bûyera han diaxiftin. Tu behs û meselek din nemabû.

Li her ciyê dengbêjan bi kurdî, tirkî û farisî kilamên şîn û girînê yên gelek bi kul û derd distran û xwenda û zarokan jî ev ji ber kiribûn û bi dilûcan ji hev re dixwendin. Eşayîr û ahalî mijûlê xwe amade kirinê bûn ku li pê Şêx Mehmûd biçin. Bi rastî bûyera Kerbelayê nû bûbû. Xelkê Mûsilê bûbûn zindiq. Dema ku xeberê nêzîkbûna şexan li Kerkûkê belav bû, wê şevê heta beyanî xew neket çavê gelek kesan. Eşîretên derûdora Kerkûkê jî hişk bûbûn û mabûn. Jin, mîr, kur, keç, mezin û bicûk, efendî, mela, şexen terîqetê, derwêş, kesen nav bazaran, memûrên hukûmetê ref bi ref di hatin û çûnê de bûn. Bi hezaran filama û def amade kiribûn. Ez bi xwe di wan rojan de li Kerkûkê xwendewanekî Hucreya Mele Teqî bûm. Min pê danîbû salên xwe ya dehan. Mamostê me şâîr bû. Marşeke gelek dirêj bi me dabû jîber kirin. Berê gîhîştina şexan min ji ew kesen berhevbûyi yên hejmara wan bi hezaran re xwend. Ew roja Şêx Mehmûd gîhîşt Kerkûkê temamê xelkê û piraniya eşîretan ji serê beyana sibê bi piyan û siwarî ketin rê û qasê çend saetan ber bi pêşewaziya wî ve çûn. Dengê Allahuekber û gurmîna çepik û defan têkilî nav girîn û şînê bûbû.

Bi rastî dêmena wê deştê ya wê rojê wêneyek ji mehşerê bû. Tekya Şêx Eliyê Talebanî û ya Seyîd Ehmed van mîvanan di navbera xwe de parve kirin. Şêx Mehmûd çû tekyayê û Şêx Qadirê birayê wî li xaneqayê ma. Dema ku Şêx Mehmûd gîhîştte Kerkûkê hejmara eşîretan du carî zedetir bû û fikra berpakirina şoreşekê kirin serê xwe. Di vî hali de Reşîd Paşa kirin waliyê Mûsilê. Tenê rojekê li wir ma û pişt re xwe gîhande Kerkûkê. Dilê Şêx Mehmûd xweş kir û bi hêzeke mezin ve bi xwe re bir Silêmaniyê.

Di rojek wiha de hatina Reşîd Paşa feydek mezin bû. Lê li gel vê jî, dema ew vege riya Mûsilê dest avêt girtina wan kesan ku tiliya wan di kuştina Şêx Se'îd de hebû û gelek ji wan bi kuştin an xeniqandinê tawabar kir.⁽⁹⁾ Pişt re jî cardin di nav re gelek bûyerên bicûk û mezin qewimîn û Kerkûk û Silêmanî her ji wan rojan şûn de ji têkelhevî û şoreşê rizgar nebûn...

Pişti vegera Şêx Mehmûd ya Silêmaniyê

Muddetek pişti ku şêx vege riyan Silêmaniyê, li Kifrê babê Bahâ Efendî hat kuştin. Qewitiya vê kuştina han dikirin ser Şêx Mehmûd. Li ser vê hukrnê sê sal ceza jê re hat dan. Lê Şêx Mehmûd xwe neda dest û li derûdora Silêmaniyê û li gundan dima. Hukûmet jî bi rastî nediket pê û çavê xwe ji vê veşartinê û nehatina wî ya bajêr digirt û lê nedigeriya. Li gel vê jî nifûza Şêx Mehmûd roj bi roj ber bi xurtbû-

nê ve diçû û stérka bextê wî ji nû ve ber bi serkevtin û ronahiyê ve diçû.
Ji ber vê, hukûmet hêdî hêdî jê ket şikê û tırsa wê yekê jê dikir ku ew dê bi riya eş-
retan re muqawemetekê pêk bîne û tola bûyera Mûsilê bistîne...

Şerê Cihanê Yê Yekem û Şêx Mehmûd

Wekî tê zanîn, Şerê Cihanê yê Yekem di rûyê welîehdê Awusturya û Macarîstanê de hilket. Ev welîehdê han, ku bi xwe û jina xwe ve ji bo ziyaretê çûbûn Sîrbîstanê (Yugoslavya) li wir ji aliyê wan kesan ve hat kuştin ku dijminê Awusturya û Macarîstanê bûn û li Sîrbîstanê rîveberiya siyaseta wan dewletan dikir.

Vêca ji ber kuştina welîehd, hukûmeta Awusturya û Macarîstanê bi Sîrbîstanê re ketin şer (1914) û ev şerê han hêdî hêdî fireh bû û nêzîkî hemû dînyayê da ber xwe. Dêrma ku hukûmeta Osmanî têkelî vî şerî bû, ji bo ku ew beşek ji welatê Osmanî bû şer ket Iraqê ji. İngîlîzan ji Besrayê dest pê kirin û di pê yekûdu de 'Omare, Kut û Bexdayê girtin û di sala 1918an de gîhîştin Kerkükê. Lê berî ku bigîhîjin sînorê lîwaya Kutê, siwarêñ eşîretên kurdan û ereban li Şu'eybe şerek û du şer bi ingîlîzan re kirin. Şêx Mehmûd bi xwe û bi leşkerékî ji hezar siwarêñ kurd pêkhatî, alîkariya leşkerên tîrkan kirin. Reşîd Paşa yê xelkê Silêmaniye û muteserrifê kevin ê mintiqê û çend mirovîn kurd ên bi nav û deng di vî şerî de hatin kuştin. Ci di van şeran de û ci ji di şerê hêzîn tîrk ê li dora Pencuyîn bi rûsan re, Şêx Mehmûd mîranî û azayetiya xwe dabû nîşan û rûs ji sînorê Iraqê dûr xistibû û kiribû milê din yê Iranê. Bi vî awayî piştî Şerê Cihanê yê Yekem, nav û dengê Şêx Mehmûd gelek belav bû û ji aliyê gelek kesan ve dihat naskirin. Lê di şerê tîrkan û rûsan de, careke din tîrkan Şêx Mehmûd qehirandin. Serleşkerê tîrk, piştî ku di şer de bi alîkariya Şêx Mehmûd û hêzîn eşîretên kurdan biserketin û rûs şîkandin û heta nav axa Iranê birin, kurdan bi tuhmeta talanê tawanbar kirin û çend serokeşîretan dan ber şeşîrân. Li ser vê bûyerê, Şêx Mehmûd li dijî serokleşkerê tîrkan rabû û bi xwe û bi leşkerêñ kurdan ve vegeriya nav sînorê Silêmaniye. Piştî vê, tîrk carek din tûşî êrişâ rûsan bûn û vê carê nekarîn xwe li ber wan ragirin. Îdî ji wir şûn de sînorê Iraqê bê parastin ma û Şêx Mehmûd ji vegeriya ser sînor û êdî paşde nevegeriya Silêmaniye û li gundê xwe li derveyê bajêr bicîbû. Vê bûyerê tîrk xîstîn nav endîse û tengiyê. Lê wan rojan gelek bêhêz bûbûn û nedixwestin deriyekî din ê serêşiyê li ber wan vebe. Ji derveyê vê ji di 7ê nîsana sala 1918an de di bin serokatiya General Marchal de hêzeke ingîlîzan gîhîşt Kerkükê. Şêx Mehmûd bi tîrkan te bi tevayî têk çûbû û tu hêviyek wî ji wan nemabû. Ji ber vê, Şêx Mehmûd xwest ku berî gîhîşti-

na ingiltzan li Silêmaniyê, ji wext û firsetê îstîfade bike. Pêşî, bi mirovên bi nav û deng ên wê rojê yên Silêmaniyê re lihev kir û namek bi dizî ji Nilson û mezinê hêza ingilîzan re şand Kerkûkê. Di vê nameya xwe de daxwaz ji wan kir ku, di navçeya Silêmaniyê de bi hinek îmtiyazan ve bîryara damezirandina hukûmeteke kurdî bidin. Bi xwe jî (yanî Şêx Mehmûd) bîryar da ku li ser navê ingilîzan û di bin çavdêriya wan de serokatiya vê hukûmetê bike.

Wilson, bersîva Şêx Mehmûd dide û dixwaze di vî warî de beyanekê belav bike.⁽¹⁰⁾ Di vî halê han de û piştî bicîhiştina Kerkûkê çend rojan, leşkerê tîrkan vedi gerin Kerkûkê. Behsa nameya Şêx Mehmûd, bi riya yek ji wan mezinê xelkê Kerkûkê re digihîje serleskerê tîrkan. Li ser vê, tîrki qewîtiyê li Mustefa Begê qaymeqamê eskerî û serokdeşkerê tîrki yê li Silêmaniyê dikin ku li hemberî Şêx Mehmûd komployekê amade bike. Mustefa Beg, bi fêl û fendan û bi bahana hinek mesele û tedbiran Şêx Mehmûd bangî ba xwe dike û pişt re wî digre û di bin çavdêriya hêzêke mezin de dişine Kerkûkê. Şêx Mehmûd li wir dikin hepisxanê û piştî dadgeheke şîklî ya eskerî û li ser qewîtiya taybetî ya serleskerê giştî yê hemû hêzên dewleta Osmanî ya Iraqê, bi cezayê idamî tawanbar dikin. Lê vê carê jî ji mirinê rizgar dibe. Çunkî tîrki berî her tiştî di idamkirina Şêx Mehmûd de dudil bûn. Mulaheza rojên bêñ, rojên teng û reş dikirin. Wan sebebê vekişîna leşkerên ingilîzan ji Kerkûkê didan ba leşkerên sondxwaran a li cephâ Franseyê û bi hêvî bûn ku leşkerên ingilîzan hêdî hêdî, ne tenê ji Kerkûkê, belkê ji hemû Iraqê paş de bikişê. Wan ev yeka han jî xeyal dikirin û dixwestin ku hemû ciyêñ ji destê wan derketî yên berê cardin têxin destê xwe. Ew ji wê ditirsan ku çerx ber bi barek din ve vegere, ew (yanî tîrki) careke din jî û bêyî êdî ji Iraqê derkevin, tê de bici bibin. Vêca di rojek wiha reş de, dûr nebû ku bi bahana tolesitandina idama Şêx Mehmûd, eşîretên kurdan pê leşkerên şikestî yên tîrkan bikevin û wan şerpeze bikin. Li gel vê jî, gelek ji tîrkan dûr nebû ku piştî hinek ih û mih û anîn û li ha û li wir, ji nişkave Şêx Mehmûd idam bikin. Lê bextê wî alîkariya wî kir, 'Elî Ihsan Paşa ku nû hatibû ciyê Xelîl Paşa û bûbû serleskerê Ordiya Şeşan li Iraqê, fîkir kir ku di rojek wiha de ji Şêx Mehmûd îstîfade bike. Çunkî ev 'Elî Ihsan Paşayê han, yek ji wan serleskerê mezin û yê herî bi nav û deng ê tîrki bû ku li Iranê li hemberî rûsan çend şerîn gelek azayane kiri-bûn û di dema jarî, şikestî û bêhêziya leşkerên tîrki de jî şandibûn Iraqê. Li ser pêwîst bû bi hiş û bi siyaset hereket bike, ji ber vê ji Mûsilî Şêx Mehmûd bangî ba xwe kir.

Li wir dilê wî vekirî û wî aş kir. Armanca wî ew bû ku di wan rojan de, heta bi xwe bi leşkerê xwe ve li hemberî ingilîzan mijûl bibe, Şêx Mehmûd di herêma Si-

lêmaniye de bi eşîretên kurdan ve teniştê rojhilata hêzên tîrkan biparêze û Silêmaniye nede dest û hera di wextê pêwîstiyê de ji bikare bi xwe û bi eşîretên kurdan ve alîkariya leşkerê tîrkan bike. Ji ber vê, piştî mîvandariyeke baş û bi gelek xelat û beratan ve, ew kir serleşkerê milisan û bi qewtitî û talîmateke pêwîst şand Silêmaniye. Ji bo vî karfbû û rêxistina hêzên eşîretan, bêşike 5000 lîreyê zêr a Osmanî pêkhatî ji dayê. Ji derveyê vê, 'Elî Ihsan emir da serleşkefê tirk ê li Silêmaniye ku ci çek û sîlehêن bikare pêwîstê Şêx Mehmûd be bidê. Vêca piştî hemû van bûyeran, li ser qewl û bîryaran bi 'Elî Ihsan Paşa re, Şêx Mehmûd di çîrya paşıya sala 1918 an de vegeriya Silêmaniye û dest bi cîbicîkirina ew karên jê re hatibûn sipartin kir...

Vegera ingilîzan ya Kerkûkê

Cara yekem dema ku ingilîz hatin Kerkûkê û girtin, qet neketibû bîra Şêx Mehmûd ku dê careke din tîrk vegerin û Kerkûkê bigrin. Ji ber vê, wekî me li jorê got, namek ji Wilson re şandibû. Di vê nameyê de ji bilî ew tiştên ku me behs kirin, ev yek ji gotibû: kurd gelek bi serkevtina Inilîzan xweş in û hêviya wan ev e ku ji bin hukmê tîrkan rizgar bibin û bi saya hukûmeta ingilîz dilxwes bibin û ew ji wekî ereban bikevin nav xweşiyê. Ev rîcaya han ji ji wi kiriye ku êdî bi tu awayî rê nedin tîrkan ku ew careke din vegerin vî welatê. Eynî wan rojan reisêñ Hemewend ji namek ji ingilîzan re nivîsandibûn û tê de gotibûn ku bi pêşkêkirina heywan û dexil ew armadene alîkariya leşkerên ingilîzan bikin. Çunkî wê çaxê, bi rastî goşt û nan baştirîn diyarı bûn ji ihtiyaciyan re. Lê vegera tîrkan li Kerkûkê bû sebebê têkçûna hemû tiştî. Şêx Mehmûd wekî ku me got, li Silêmaniye girtin û şandin Kerkûkê. Gelek ji wan ku bi şandina nameya berê re hemfikir bûn, avêtin bendixanan an ta-wanbar kirin. Hinekan ji bazdan û Silêmanî terk kirin. Hemewendî ji dev ji ingilîzan berdan û dijminatiya wan kirin. Bi vî awayî piştî girtina Kerkûkê çend rojan vegera ingilîzan û paşdekeşana leşkerên wan ji wir, ji xelkê li wir re bû sebebê gelek xerabiyen. Bi taybetî Şêx Mehmûd û kurd, bi vê yekê ketibûn davikeke mezin.

Ci nav û deng û şohretek ingilîzan hebû, bi vê paşdekeşanê re wenda kirin, wekî Hemewendant gelek kesên din pişta xwe dan wan. Gotinek din ji dihat gotin ku, di cepheyên din ên şer de, bi taybetî li Fransayê leşkerên sondxwaran li hemberî Alman an xerab şikestine û paşde kêşane. Ji ber vê, wisan dihat hêzirkirin ku dê leşkerên ingilîz ji ji Iraqê paşde bikişe û biçe cepheyek din. Ji ingilîzan re eşkere bû ku bi vê paşdekeşanê navê wan xera bû û li Kurdistanê û li Iraqê qîmetek wan nema. Ji vê yekê ketin tirsê ku ji hemû milan ve berê xwe bidin wan û li hemberî wan

şoreş û têkelheviyek mezin a gelempêrî rakin. Ji ber vê, bîryar dan ku xwe hazir bikin û ji bo paşde sitandina îtibara xwe, bi çi awayî dibe bila bibe Kerkûkê bistînin. Vêca tam van rojan de bû ku dewletên sondxwar mutarekek belav kirin û şer dan sekinandin. Lê dema ku di cebheyên din de şer sekinî, êdî tîrsa hêzên ingilîzan ne-ma û di cepha Iraqê de xwestin ji zeman îstîfade bikin û di hengama muzakereyên aştiyê de leşkerên xwe di cebheyên şer de -bi taybetî li Wilayeta Mûsilê - gavek zê-detir pêş de anîn. Ji ber vê, êriş anîn ser Kerkûk û Hewlêrê û bê şer girtin. Pişti vê di cî de dest avêtin anîna ew dexil, dan, pez û dewarênu ku leşkerên tîrkan berhev-kiribûn û lê pêra negihîstibûn ku bigîhin ser û bixwin. Dema ku 'Elî Ihsan Paşa ji nişkave xeberên mutarekeyê seh kirin, nehatibû bîrê û fewcek (boluk) eskerê xwe li Silêmaniye hîstibû û nekêşabû Mûsilê. Wî wisan hêzir dikir ku ev fewca eskerî ji wir dûr ketiye. Çunkî ew di wê baweriyyê de nebû ku bi awakî zû ingiliz vegeerin Kerkûkê û wê bigrin. Di milekî din de jî li hêviya Şêx Mehmûd bû ku ji milê rojhilat ve, yanî ji milê Silêmaniye ve û bi hêzên eşîretan ve êrişê bîne ser hêzên ingilîzan û firset nede wan bênen pêş ve. Eger vê jî nekare yan mecal nekevê, bila tenê rabe û vê teniştâ wî biparêze û Silêmaniye nede dest. Bi vî awayî dixwest ku heta netice-yek bê sitandin, cî di pê ciyan de bênen terkkirin û Kerkûk di destê hêzên tîrkan û ingilîzan de bimîne. Piş re jî dê rewş li ser qerarekê bisikine û bi milekî re li hev dike, herêma Silêmaniye di destê tîrkan de bimîne û nekeve destê ingilîzan. Eynî van rojan bû ku bi hêviya nûkirina dostayetiyê bi Şêx Mehmûd re unvana "Neqîb" tiyê danê û navê Şêx Mehmûd bû Şêx Mehmûd Neqîb.

Lê wekî me di pêş de got, ji nişkave di 31ê çîtya pêşî ya sala 1918an de mutareke hat imzakirin. Êdî tu çara 'Elî Ihsan Paşa nema û bi telgrafê emir da muteserrifê Silêmaniye ku idareya lîwayê bide destê Şêx Mehmûd û bi xwe jî bê Mûsilê.

Şêx Mehmûd bi vî awayî bû muteserrifê Silêmaniye û bi navê hukûmeta Osmanî idareyê girt destê xwe. Muteserrifê tîrkan yê wan rojan ê Silêmaniye 'Elî Riza Begê xelkê Konyayê bû. Bi wî re, mirovên dewletê yêne tîrkan û xeyrê kurd Silêmaniye terk kirin û çûn Mûsilê. Fewceke eskerên tîrkan û hînek cendirmeyên di bin fermandertiya Salih Begê tabur axasî de, hê li Silêmaniye bûn. Lê dema ku rewş gîhişt vê derecveyê, Şêx Mehmûd careke din destê xwe ji tîrkan şûşt û hêviya wî ya vege ra wan nema. Ji ber vê, dev ji rêxistina wê hêzê (hêza milis) berda û vege riya ser sewda berê. Vê carê jî fikirî ku di muqabilê hînek qewl û îmtiyazan, Silêmaniye teslimê ingilîzan bike. Lê nameya vê carê bi Izzer Topçî (Izzet Fate) û Ehmed Faiq (Fayiq Tapo) re, raste rast şand Kifrê. Di muqabilê ew îmtiyazên ku ji bo xwê û kurdan şert danibûn, ingilîzan ew dawerî Silêmaniye kirin. Ingilîz ku ji tertîbata 'Elî Ihsan

Paşa ya bi Şêx Mehmûd re agahdar bûn, bi xwe re ne didîtin û nedixwestin ku he-ta dema wê neyê biçin Silêmaniyê. Ji ber vê, bi vê nameya Şêx Mehmûd gelek kîfweş bûn û ji Wilson re şandin. Bi xwe jî bersîva "belêtî" yê nedanê û jê daxwaz kirin ku çaveriya emrê Wilson ê hakimê 'am be...

Hatina Major Noel ya Silêmaniyê

Nameya Şêx Mehmûd ya vê carê ji aliyê ingilîzên Kifrê ve, ji Wilsonê hakimê 'am ê Iraqê (nûnerê dewleta Birîtanya li Iraqê) re hat şandin. Ji ber vê, Wilson şand pê Major Noel ê ku yek ji wan zabitên ingilîzan ê şarezayê herêma Kurdistanê bû. Wilson, ew li ser navê xwe û bi qewîtiyên taybetî ve şand Silêmaniyê. Noel, bi he-yeteke biçûk⁽¹¹⁾ û di riya çiyayê navhera Kifrê û Çemçemalê re berê xwe da Darakelê.⁽¹²⁾ Dema ku behsa çûna Noel ya Darakelê, li Silêmaniyê belav bû, ew fewca eskerî ya tirkan ku li Silêmaniyê mabû, ci kurdên tê de bûn fewcê terk kirin û kincêñ kurdi li xwe kirin. Hinekên din jî ji tırsan xwe veşartin. Yen tirk û xeyrê kurd jî bûn ketin tırsê û nedizanîn ka dê çi bikin.

Şêx Mehmûd, bi temamê mirovên maqûl ên naskirî yên cure cure yên wê dewrê yên Silêmaniyê re, di mala xwe de civînek çêkir û ew têgîhandin ku heyeteke ingilîzan bi rê de ye û tê Silêmaniyê. Ji wan daxwaz kir ku di nav xwe de çend mirovan bijêrin û ji bo pêşwaziya wan bişînin. Piştî munaqeşe û râberizîneke kurt, heyetek rê xistin û çûn pêşwaziya ingilîzan. Ingilîzan di destpêkê de nexwestin bêñ nav Silêmaniyê. Tırsa wan ji wê fewca eskerî ya tirk ya Silêmaniyê hebû. Çunkî wan tu hêzek bi xwe re neanibûn. Hêvî bûn ku Şêx Mehmûd li Darakelê bibînin. Lê dema ku Şêx Mehmûd heyet şand, ew îkna bûn û hatin Silêmaniyê...

Hukumdarê Kurdistanê

Dema ku M. Noel bi vî awayî bi hêsanî û bêdeng û asteng hat Silêmaniyê, di cî de bi alîkariya Şêx Mehmûd, dest pê kir eskerên tirk şand Mûsilî ba 'Elî Ihsan Paşa. Piştî vê, M. Noel li gor wê qewîtiya ji Wilson sitandibû, di roja yekem a çîrya paşî ya sala 1918an de, li ber deriyê qonaxa hukûmetê (Dergayê Seray) civînek mezîn çêkir û xelk, eşraf, mezin, tucar, serokên eşîretan û ji hemû sinif û tebeqeyên xelkê tê de beşdarbûn. Bi navê nûnerê dewlera Birîtanyayê li Iraqê (yanî bi navê hakimê 'am) bi farisî gotareke dûr û dirêj xwend⁽¹³⁾ û di vê gotara xwe de ilan kir ku Şêx Mehmûd ji aliyê nûnerê dewlera Birîtanya yê Iraqê ve Hukumdarê Kurdistanê hatiye naskirin.

Noel û Wilson dixwestin ji nifûza Şêx Mehmûd îstîfade bikin, di vê herêmê de bê hêzeke eskerî nifûza ingilîzan rûne û bi saya Şêx Mehmûd siyaseta hukûmeta Birîtanyayê idare bikin...

Her eynî êvara wê rojê ahalî û mezinên bajêr li mala Şêx Mehmûd berhev bûn û hukumdar hat pîroz kirin. Ez bi xwe (nivîskarê vê bîranînê) bi Ehmed Axayê Ker-kûkîzade re di vê pîrozkirina han de hazir bûm. Ji bilî vê, bîryar hat dan ku Noel di bajarên Kurdistanê yên din de jî (Kurdistana Iraqê) dest bi avakirina teşkilat bike û ji bo rêxistînî û idareya van bajaran ji Kurdistanâ nû re çi pêwîst be bike. Mehê 15.000 rupiye maaş ji hukumdar re hat tespit kirin.⁽¹⁴⁾ Bîryar hat dan ku li Silêmaniyê teşkilateke wekî teşkilata berê ya lîwayî damezrinin. Seyîd Omer ê mamê Şêx Mehmûd bikin muteserrif, mamê wî yê din Hacî Seyîd Hesen jî bû hakim an bi gotinek din "Reisê Sher'i" Şêx Qadiîe birayê wî jî bû serfermanderê leşker. Seyîd 'Elî (Bismillah) jî nehatibû bêpar kirin, ew jî bû komiser. Bi vî awayî, beşê pîraniya xizim, kes û mirovên hukumdar û derûdora şêxan, her yek bi awayekî li gor rewşa wan, karek an maaşek ji wan re hatin dayîn.

M. Noel, navê "Hakimê Siyasî" li xwe kir. Di avahiya mekteba 'idadî ya zemânê tîrkan de rûdinişt. Ji sînorê der helîm, selfîm, hêmin û şarezayê orf û adetên xelkê kurd bû. Bêşînor hurmetâ hukumdar digirt, ji xwe re katibekî biçûk an xizmet-karekî jî bê emir û rizayê Şêx Mehmûd tayîn nedikir. Wan deman Silêmanî ji boşahiya xelkê bûbû wekî mehşerê. Hejmareke gelek zêde ji suwarên eşîretan, gelek gundî û xelkê derûdora Silêmaniyê û gundiyan Şêx Mehmûd, rêz bi rêz û ji her mili de berê xwe didan vî bajarê han ê biçûk. Kulan, çayxane, bazar, malê mezin û dewlemendên Silêmaniyê ber bi boşahiya xelkê ketibûn. Birinc û genimên enbarên dewletê, ku ji tîrkan mabûn, hemû zexîreya ku di enbarên Şêx Mehmûd de hebûn, dikirin xwarin û zat û bi riya aşçîxana hukumdar li xelkê dihat belav kirin. Ji milekî din jî, M. Noel mijûlê çareserkirina giranî û birçitîyê bû. Hêdî hêdî ji Kerkûkê û ji Bexdayê şekir, çay û arvan digîhand Silêmaniyê û belaş li feqîr, hejar û memûran belav dikir. Ev tiştên han ên xwarinê, wê çaxê li Silêmaniyê qit bûn û bi dest nediketin. Ji ber vê, her ci tiştên ku ji feqîr, hejar û memûran paş de dima, bi riya bele-diyeya bajêr dikirin nav bazarê û bi bahayekî kêm ji xelkê din ên mayî re dihat dan. Bi vî awayî xelkê bajêr û gundan, feqîr, hejar û lêqewimî ketin di nav xweşî û jiyanekî hinek baş. Noel bi vê tenê nema. Ji ber ku hinek rupiye, banqinot û qederek zêde lîreyê tirk ê zêr jî tijand nav Silêmaniyê û bi bê destlerzin bi ser serokeşîretan û derûdora hukumdar de belav kir. Vêca qet nepirse; xulaman, xizmetkaran û karkestan, dayikan, maman û xidaman serê xwe bilind kirin û ji xwe re pê kêf kirin. Her

yen bi navê tiştekî maaş, berat û pêwîstiyêن wan hatin tespit kîrin. Xulam bi xenceran ve, dayîk û xidam bi germiya xîşrên xwe ve ketin nav pozbilindiyê. Şarwal û miradxanî, posî û egalêن bi sûrme, hevrişmêن şexan û derûdora wan, dêmenek din dabûn Silêmaniyê. Piştî dewrek rût, tazî û birçtiyek mirinî, jiyanekê wiha têr û tijî û dêmenen têr û tesel, xweşî û şahî -her çendin jê bexîlî kîrin jî tê de hebû- lê cardin ciyê sipasê bû. Çunkî, qet nebe, bîranîna hejarî, rûtî, birçti û kesen xwîn ji wan zûwabiyân, termen hêşînbûyî yên miriyên nav mizgeftan, kavil û wêraniyên do ji bîra wan dibir û hêviyên jiyana wan nû dikir. Lê wekî kurd dibêjin: derûdora nefam ber bi xeyîdiyê ve çûn û ji hedde xwe derketin. Hukumdarê Kurdistanê jî li gor wê hewayê dimeşîya. Bi roj bi revdên xulaman û derûdora xwe re berê xwe di da deşta Kanêskan û bi seyran, henek û kîf rojên xwe derbas dikir. Bi hêvî bû ku dê ev dem heta hetayê bi vî awayî bimeşe. Xwedê bi qudraeta xwe dê Kurdistanâ mezin jê re çêke û ew jî tacâ hukumdartiyê têxe serê xwe!!

Şêx Mehmûd û Konferansa Aştiyê

Şêx Mehmûd tenê tiştekî baş ji Kurdistanê re kîr, ew jî ew bû ku mezbeteyek bi xelkê û eşîretên vê herêmê da imza kîrin û Şerîf Paşayê kurd ji bo doza hiqûqê kurdan di nezdê Konferansa Aşti ya Parîsê de berpirsiyarê kurdan da xuyakîrin. Nivîsandin û rêxistina mezmetê li mala hukumdar pêk hat. Ji bilî hukumdar, çend serokeşîretên bi nav û deng, hinek ji xwendevanên têglihişti û M. Noel û ingilîzekî din jî li wir bûn. Lê gelek mixabin min navê wî nenivîsandiye û nayê bîra min. Ez bi xwe, nivîkarê mezbetê û ya nameya taybetî bûm ku ji Şerîf Paşa re dê bîhatiya şandin. Ew dê ji Parîsê re bi Reşîd Kaban⁽¹⁵⁾ û Seyîd Ehmedê Berzencî⁽¹⁶⁾ re bîhatiya şandin. Ev, ji bo kurd û Kurdistanê di nezdê Konferansa Aştiyê de karekî siyasi yê Şêx Mehmûd bû. Lê gelek mixabin, ku em ê di dawiyê de behs bikin, vê jî ciyê xwe negirt û netîcek neda. Çunkî ev heyera han nikarîbû biçe Parîsê û name û mezbete negîhiştin destê Şerîf Paşa...

Ji soranî: ZIYA AVCI

(15) Li gor gotina mamosî Ebdulne'îm el-Elamî ku di El-Dihaya el-Sîlas de dibêje: bi xwe di nêz de şahidê vê bû-yerê bûye û ev hedîsa han di roja duymen a Cejna Qurbanê de qewimiye û du roj domandiye. Tahir el-'Emîri di Muqqederatu'l-Iraq el-Siyasiyye de dibêje: vê hedîsa han di roja yekem a Cejna Qurbanê de dest pê kiriye û sê şev û sê rojan ajotkiye.

- (2) Bahâ Efendi wê navê te li Mûsilî başkaribê Rejî bûye. Kurê Ebdullah Efendiyê Haci İbrahim Efendi yê xelkê Kifrê ye.
- (3) Waliyê Mûsilî yê wê çaxê Ferîq Paşa yê xelkê Helebê bû ku bi xwe jî endamê Partiya İttihâd û Terakkiyê bû.
- (4) Şex Se'îd û kurên xwe li xaniyê Mehmed Paşayê Sabuncî yê li ser Caddeya Serayê û li hemberî mekteba 'eda-diya kevin ku niha kirine Saneyê Şerqiyye, bûne. Lê kesen derûdora wan li xaniyekî nêzîkî xaniyê Şex Se'îd bûne ku ew xanî bi xwe jî yê Mehmed Paşa bûye.
- (5) Ew se kesen han ev bûne: Reşîd Efendiyê Omerî, Şex İbrahim Rumi û 'Eli Efendi yê imamî Mizgefta Nebî Şîr.
- (6) Wê demê ji fermandarê taburê re, yanî ji amir fewca cendirman re "tabur axası" digorin.
- (7) Ev, Xidir Hemewendê ku mamoste Mu'im behsa wi dike, Mehud Xidir û Hemewendi ye, wê çaxê ew li Mûsiê bînbaşiyê cendirman bû.
- (8) Li gor gotina mamoste 'Ebdu'l-Mu'im el-Elâmi, Şex Mehmedî di dema êrişanına xelkê ya ser mala Şex Se'îd û kuştina birayê wî, ew li mala Xidir Hemewendi bûye. Pişti êrişker ji wir diçin mala Haci Mehmed Çîlîcadır, ew ji mala ku li wir in xwe digihînin qonaxa hukûmete.
- (9) Ji bo dûr û direj behsa kîrinê Reşîd Paşa û navê wan kesen hatine gitin û bi destê xwe tawânî idamkirinê daye wan û encamên vê bûyera han, binêre: kitêba El-Dihaya el-Selas ya mamoste 'Ebdulne'îm el-Xulami.
- (10) Loyalties Meapotamia Voleume II, 1919-1920 A personal Historical Record. By Sir Arnold T. Wilson, M. P.
- (11) Qasê ku ez dizanîm, ev heyeta han ji Major Noel, du doktor, muhendisek û ji çend neferen ingiltzan pêk habîbûn û aşçiyek û çend xizmetkar ji bi wan re bûn. Lê tê gotin ku Major Danlis ji bi wan re bûye.
- (12) Gundekî Şex Mehmedî e, riya nîv seet ji Taslîce yê dûr e û dikeve ser riya Çemçemal û Silêmaniye.
- (13) Major Noel gelek baş farisî û fransızî dizanî. Li Iranê gelek mabû. Wilson ji nav bi hezaran zabitan ku di warê siyasetê de xizmeta Britanya Mezin kiribûn, ji Lichmen, Soane û Noel gelek razî bû û gelek methê wan dikir. Ew dibêje ku çirokên serpêhatiyê Noel dikarin bi cildan kitêb tijî bikin û gotina xwe bi vi awayê didomîne: xwezi rojekê ji rojan wan binivisanda. Li gor Wilson; mîrant, zîrckî û karzanîna van hersê zabîten han ciyê sis pas û methê ne. Şarezatiya Lichmen di nav welatên ereban de li ser Iraqê, yê Soane li ser Kurdistanê û yê Noel ji li ser erdê Iranê, ji Britanya Mezin te gelek bi feyde û bi qîmer bûn.
- (14) Li gor gotina hinek ingilîzan, Şex Mehmedî kiribûn nûnerê hêzen Britanyayê yên li Kurdistanê.
- (15) Reşîd Zekî Kaban, xelkê Silêmaniye bû. Di dema Osmaniyan de yuzbaşî û di Mekteba Ruşdiyye ya Eskerî de marmosteyê me yê matematikê bû. Demên dawiyê de ez ji bi mamoste Reşîd Zekî te li 'Edadiyeyî Mulkîye de marmosteyê fransiziye bûm.
- (16) Seyîd Ehmedê Berzencî ji berê de Mekteba 'Edadiyeyê de mamoste bû. Wê dewrê bûbû katibê taybeti yê Şex Mehmedî. Di dewra hukumartiya duyem a Şex Mehmedî de bû mudînê Parastina Gîşû (emna gîşî), pişti wê di hukûmeta Iraqê de bû mudîr, pişti re ji bû qaymeqam û pişti re ji kar û barê hukûmetê derket û kîrin naşîbê Silêmaniye.

BIGIRÎ HIBIRA PÊNÛSA MIN

Kîşfa hêmayên estû ji
ne bes e êdî ji bo bextewarîyê
spîçolki, bê ekl û eşqiya eşq
di lîwanêni riya kâdizan de dixurice, dixurice
û xwe li biyanistanan digire
her spêd
ez qam dikim xwîna qeşagirtî
bigirî hibira pênûsa min, bigirî

çêja baranên çèlesrîn
di devê min
lîtav
minminîkên pola
daqûl têr li ser lêvên min ên qeşa
ji çîçekên hoste
kedi dikim janêñ bêterbiye

remildaran peyitandin
divê dê gelek bêñ kuştin li Kurdistan'an
ka xencera xwe bîne celat
li min biceribîne hezar carî
bigirî hibira pênûsa min, nagirî

kesa bengî wê bûm
di kevalan de; mercan, lal disûtîne canan
dengê mirinê ji bêdengiya min té
aya tu li ser min distirêyî operayêñ malwêran

di bin desthilatdariya împeratoriyyêñ xezebperest de
ez nuxuriyê dîroka jînbî
bigirî hibira pênûsa min, digirî

RÊNAS JIYAN

HEVIND

CELADET ALİ BEDİR-XAN

Temaşa (1) Perde

SERWER BEG Ji torinêñ Serhedan

LEWEND AXA Serekê eşirekê

XURŞİD AXA Serekê eşirekê

BIJÜKek Pisaxakî Madenê

GURGIN Pisaxayek

FELEMÊZ Birayê wî

QESEM Destgirtiya GURGIN

MENÎJE Destgirtiya FELEMÊZ

QUBAD Xulamê SERWER BEGê

HEVIND Sêwiyekî diwanzde salî

Qasidek, zar û zêç, kalek, pîrejinek, birîndarin, Segman û xelk

[*Di vebûna perdeyê de pehnava [navsera] çiyakî Kurdistanê xuya dibe. Dûre devî û zinar in. Cih cih şikêr û ferş, di alîkî de holikek, di ser holikê re aleke Kurdi li pêl dibe. Ji aliyê rojavayî şiverêyek dirêj dibe û pehnavê digihîne newâlê. Ji dûr ve serên çiya yêñ bi berf diyar in. Di ber devê holikê de QESEM û MENÎJE (Menice) rûniştîne dihênijin.*]

Civanok - 1

QESEM, MENÎJE

QESEM – (*Di xwe ditîne der û ji MENÎJE re*) Xwehê dinivî?

MENÎJE – (*Bi hilfirînekê çavêñ xwe vedike*) No, lê nizanim ci li min qewimiye.



Serê min giran bû, dilê min borî.

QEŞEM – (*Dikene*) Ji xwe xew ci ye?

MENÎJE – Ne xwehê, xew li ku, ma divê demê de ez çawan binivim. Birîndarên me çawan in?

QEŞEM – Dengê wan nayê. Bawer ke rahet in. Ê sêvanok şikestî heta sibehê dina-
li û ji pesnan xeber dida. Ci xoretekî delal e, dibêjin ew çend jî mêt e. Birî-
nên wî cedar in. Ne yek ne dido. Heft heştek in.

MENÎJE – Ji xwe berê sibehê de, tu ne li hir bûyî, birîndarinin din dianîn û dibi-
rin şikeftê. BIJÎJK bi wan re bû. Kete holikê lê nihêrt, serê xwe hejand û ji
min re got: Bê fêde ye halê wî ne tu hal e, gelek namîne.

[*Ji dûr ve dengênek wek guregura ezmanan têne bikhîstîn.*]

QEŞEM – Guh bide, top dîsan dest pê kirine. Mala minê yên me, hesin û agir dî-
san dê bibarin ser serê wan. Topên me ji hebuwana ne xem bû. Dudo ji dij-
min standibûn lê gule nemane. Mîtralyozên me hene lê ci fêde, şûna topê
nagirin.

[*Ji holikê nalînek têt, keçik dibezin û dikevinê. Paş gavekê nalîn nizim dibe û
li şûna wê xirexirek tête bikhîstîn, pêleke din ne nalîn e ne xirexir e. Keçik ji ho-
likê derdikevin, çavêن wan hêstir dikin.*]

MENÎJE – Çû, reben çû. Me nizanîbû ji ku ye, ji kîjan eşîre ye. Tenê digotin
xelkê Dêrsimê ye. Dêrsim li ku, Serhedan ku. Reben hatibû mirîna xwe.

QEŞEM – Ne xwehê hatibû şerê welatê xwe.

MENÎJE – Belê şerê welatê xwe, rizgariya welatê xwe. Welato! Welato!

Welatê xopan, neyaren te zehf, dostêne te kêm in. Dostêne te tenê em in, keç
û kurên te. Em ji qels bêçek, bê tu tişt. Çarmedora me girtî; ji heralî rîya
me birî, ji hermilî dijmin. Çarnikar neyar, neyarê xurt, herkes yarê neyar,
dostê zexm. Belê MENÎJE welê. Me ci digot reben çû, gelo di dilê wî de ci
hebû. Ma tiştekî wî nîn bû ko bibêje.

QEŞEM – Hebû, di dema paşîn de, wekî ketibû cankêsiyê, tiştek digot.

MENÎJE – Belê dil dikir ko bibêje, lê nikaribû lêvên wî nedigihan hev. Navek di
ser lêvên wî re digeriya, lê ne dihate der.

QEŞEM – Bawer bike navê keçikekê bû.

MENÎJE – Bi min digot Zîzê.

QEŞEM – Bi min Zînê.

MENÎJE – Navê destgirtiya xwe digot. Kî zane destgirtiya wî ji ci keçikeke delal û
çeleng e. Ax dinya, hêj serê xwe nekiribûn balgehekî. Herê herhal delal e.

Ma nabêjin keçen Dêrsimî gellek sipehî ne, kej in, çavbelek in. Ax heke yên me jî di vê dem û saerê de...

QEŞEM – MENİJE çire holê dibêjî, Xwedê mekit.

MENİJE – Ma Xwedê mekit jî heye. Tu nabînî gule ji xwe re kiriye adet hima xort û zava û destgirtiyan dibijere. Li xwe danayine dest bide pîr û kokiman.

QEŞEM – Te xêr e **MENİJE**, çire îro holê bêmade yî û tiştinin ne qenc û ne bixêr dibêjî?

MENİJE – Tu dibwazî ji te re rastiyê bibêjim, lê nizanim çawan bêjim te. Dilê min de tiştek heye. Belê tiştek ji min re dibêje...

QEŞEM – Ax li min...

MENİJE – Ax...

[Keçik dikevin hembêza hev û bi deng digirîn. Demekê di hembêza hev de dimînin. QEŞEM xwe ji hembêza MENİJEyê vedike hêstiran ji ruyê xwe dimale. MENİJE ecêbmayî lê dinihêre.]

QEŞEM – Megri xwehê megrî. Ji me re şerm e ko em ji yên xwe re bigirîn. Herçî ko di şerî de ne tevda birayên me, mîrên me ne. Hemî yên me ne. Girîn hebe divê em ji bona hemiyan bigirîn. Liberketin hebe divêt em li ber wan bikevin ko di mîraniyê de ji ên dîtir kêmtür bûn. Belê li ber wan bikevin ko di cihê xwe de xwe nedane kuştin, ji mirinê revîn, ruyên xwe reş kîrin û sax man. Yên me di pêşıya hemiyan de diçin. Ji mirinê narevin. Heger heta ni-ho sax mane û sax in jî, ne ji wê ye ko xwe nedane kuştin, lê mirinê nedî-wêrî dest bide wan.

Civanok - 2

Ên berê û HEVIND

HEVIND – (ji şerî li wan derdibe. Li dora xwe dinihêre, dikeve holikê, derdikeve, ji keçikan re) Keçinon penbû li ku ye? Ka çend pakêtan bidin min.

QEŞEM – Nik me nema. Here şikeftê, li wê heye. [HEVIND bâzdide ber bi şikeftê diçe.]

Civanok - 3

QEŞEM, MENİJE

MENİJE – Belê, belê xebera te ye QEŞEM. Xwedê meke, yên me nemerdî bikin, ji xwe kê kiriye, ma nayê bîra te di şerî Zerkerê de topa di nav neqebê kê sitandibûn. Ne herdu biran, ne yên me, GURGÎN û FELEMÊZ.

QEŞEM – Çawan nayê bîra min. Ma tenê hingê, di herşerî, di herderavê teng de
xwe bi méraniya xwe nedane naskirin
[*Dengê topan xurtir dîbin*]

MENÎJE – Guh bide QEŞEM, dengê topan nêzing dibe.

QEŞEM – Top di cihê xwe de ne, ba guhêriye, ji lewra.

MENÎJE – Heke hêj nebûye jî dê bibit. QEŞEM ez welê dibînim ko di van çiyayan de ava me nemaye. Ma tu nabînî tenê di rojêñ paşîn de balafirêñ dijimnan ji deh caran bêtir li me fîriyan û guleyên xwe avêtine heta pehnava me. Ma nexuyaye, vê carê fikra wan xirab e. Bîne bîra xwe. Ev bûne çar sal em di van çiyayan de asê ne. Belê hergav teq û req e şer e. Lî ne holê, çend roj şer, paşê çend rojêñ din jî rahetî. Vê carê ji çar mehan bêtir e êrîşa dijiminan dest pê kiriye weqt nizane bisekine. Berê şer di quntarêñ çiyê de dibû. Dijimin hêdî hêdî hilkişıya û xwe gîhandîye bilindcîhan. Ma berî deh rojan berikêñ dijiminan qet li pehnava me diketin. Lî niho pehnava me ji çeperê xerabitir bûye. Ji aliyê din mezinan digotin zad ji xwe yekcar nemaye, berikêñ segmanêñ me jî ne gelek in. Hero kêm dibin.

Civanok – 4

Ên berê, HEVIND

HEVIND – (*Di destê wî de çend pakêt penbû dîkeve diyarê. Li keçikan dînihêre, bi ken dibêje wan*) Keçinon we xêr e, ez dibînim hûn herdu jî madekirî ne. Ba-wer bike tirs geleb gîhaye we. Metirsin, ez kekê we me.

MENÎJE – Dê, tu jî biqeş...

[*HEVIND dî severê de winda dibe.*]

Civanok – 5

Ên berê, ji HEVIND pê ve

QEŞEM – Çire dixeyidî MENÎJE, bi Xwedê zarokekî delal e.

MENÎJE – Belê, ez jî dizanîm, ma dema yariya ye.

[*Jî dûr ve guregura balefiran tête bîhistin*]

QEŞEM – Eve dîsan Dêwêñ Guhderzî û balafir, herwekî di çîrokan de digotin.

MENÎJE – Fedikre [fedikre] QEŞEM, rast bi rast bi ser me de têñ.

[*Keçik li exmîn dînihêrin, balafir nêzing dibin, li dorê gule dîkevin. Paş bîste-*

kê li pehnavê ji. QEŞEM û MENİJE xwe li erdê dirêj dikan. Sê çar bombe ser hev dikevin holikê. Dinya toz û tarî ye. Çav çavan nabîne. Balafir heta qedan-dina bombeyê xwe di ser pehnavê re digerin. Gaveke din vedigerin qerargeha xwe. Dinya hêdî hêdî vedibe, holik hilweşiyaye, di cihê wê de çalin xuyane. Ji birindaran yek ji nemaye. Di nav şikêr û zinaran de bin serî, mil û bestî têne dîtin. Ji newalê ve dengê tevingan. Desterêjeke xurt. Ji severê çend peya derdi-kevin, di nav şikêran de disekinin, GURGÎN û FELEMÊZ di nav wan de ne]

Civanok - 6

QEŞEM, GURGÎN, FELEMÊZ, çend segman û esker

QEŞEM – (Ji cihê xwe) GURGÎN tu yi, FELEMÊZ.

GURGÎN – Qet melive, cihê xwe de bimîne.

FELEMÊZ – MENİJE li ku ye?

QEŞEM – Ew ji li hir e di nav keviran de

GURGÎN – Xwe dirêj bike (ji hevalên xwe re) kanî esker, dabûn pey me

FELEMÊZ – Ev e têن.

[Ji severê qederê deh panzdeh eskerê reş derdi-kevin, segmanên Kurdan û esker dikevin bêdarê hev. Li hev dixin. Ji eskeran sê çarek têne kuştin. Eskerên din ji têن. Herdu ali xwe ditelînin, şer e. Paş pêlekê piştîmîren Kurdan e.]

Yekî ji piştîmîran – Hey guhpehninon min hesp bere ser mîlaka dêya we da o... .

[Çend desterêjên din, esker direvin, segmanên Kurdan didin pey. Dengê tivin-gan hêdî hêdî dûr dikeve. Diyar vala dimîne. Cendekê Kurdan û eskeran tevlî hev li erdê ne]

Civanok - 7

QEŞEM paşê MENİJE

QEŞEM – (Ji cihê xwe serê xwe hildide û ban dike) MENİJE, MENİJE (ji xirexira miriyan pê ve tu deng lê venagerine. Careke din ban dike) MENİJE, MENİJE, keçê (xwe bi xwe) mala minê çi lê qewimîye, mebe ko. . . (dikeve nav cendekan lê digere. MENİJE di nav keviran de deverû vezeliyaye. QEŞEM wê dibîne. Xwe lê ditewîne û dikişine hembêza xwe. Ruyê MENİJE bi xwîn e. QEŞEM ruyê wê dişot. MENİJE hêdî hêdî xwe dilivîne. Birîna wê sivik e. MENİJE radibe ser xwe.) Ax keçê dijminan tu nekuşî te ez kuştim. Hindik mabû ez dîn dibûm. Bê te min ê çi bikira, ax keçê ax. . .

MENİJE – Dilê xwe runîne, tu tiştê min nîne, birîneke sivik. Lê min ji te re nego-

tibû halê me ne tu hal e. Tu nabînî dijmin xwe gihandiye heta pahnava me. Ma ji hir wê ve çi heye? Em ê herin ku. Çar sal tivav. Ew çend şer û xebat ew çend xwîn. Jin, mêt, pîr, zar û hewqas kuştî û mirî. Ma hemî ji bona vê paşiyê. Ji bona ko em pehnava xwe berdin destê dijminan. Ji xwe destê me de ev gir, ev gir maye. Geliyê Zilan û Tendûrek ketine destê dijminan. Di nav Kurdistanê de tenê ev gir maye ko di serê wê de em di dora wê de dijmin têne kuştin.

QEŞEM – Hêj rastir di destê me de tenê ev der maye ko em dikujin û lê têne kuştin. Di derên din de Kurd nayêne kuştin. Lê wek pez û dewaran têne şerjê-kirin

Civanok – 8

En pêşin, HEVIND

HEVIND – (*Ji severê derîtê*) Bûkinon, ji we re kefaret be (*ji Menijê re*) mala minê birîndar i (*madê wî diguhêre*) birîna te ne xedar e?

MENİJE – Tiştekî sivik

HEVIND – (*Li dora xiwe dînihêre*) Ka ala me xuya nake, çû ku? [tevda li alê digerîn, ji nav keviran derdixînin; diedilînin û ji nû ve dadiçikînin serê şikere-kê]

HEVIND – Bi vê bimbardumanê dijmin em gelek eşandin, min digot qê tenê di çeperan de, lê dibînim ev der ji. Divêt ez herim nik QUBAD (*xwe dide se-verê*)

Civanok – 9

QEŞEM, MENİJE

QEŞEM – Belê me çi digot.

MENİJE – Min ê bigota, ji xwe naye bîra te, berî çend rojan ew xortê bi cilên teng ko dibêjin li Ewrûpayê xwendîye, rojnameke dijminan dixwend û ji dora xwe re digot: "Belê xebera wan e. Ev şerê ha, şerê me digel wan ne wek şerên zemanê berê ye. Berê, me li ser qemçûr an mîriyê şer dikir. Carin hebûn ji bona xwîniyekî ji. Lê îro ji bona welêt û heyina xwe şer dikin, diqe-wimînin. Belê ev şerên ha ko çend sal in di welatê me de dîbin şerinîn bi armanc in. Ew xistine serê xwe mala me ji destê me bibin. Ew mala ko ji mêt ve ji pênchezar sal ve em tê de ne. Ew mala ko gelek neyar û dijmin hewan-dine, lê tu car nehiştiye ko ew tê de cih bibin û warêن me ji me bistînin. Bi-

yanî, wekî dihatin welatê me vedigirtin me xwe dida çiyan. Û ji jor ve li çûn û hatina wan dinihêrt. Lê îro ne welê ye. Hildikişin çiyayêن me ji, nahêlin em di ser wan de ji bisekinin. Ji lewra, ji bona me du rê ninin. Rêyek heye. Divêt em dijminê xwe ji mala xwe derînin û xweyiye mala xwe bibin”

QEŞEM – Belê MENÎJE welê digot. Xebera wî ye ji. Qesta wan qelandina me ye. Dilê wan heye navê me ji dinyayê rakin.

[*Ji şeverê pêjna lingan têt. Keçikan xwe ker dikin û ber bi pêjnê ve diçin. Birek birîndar xuya dibin. Hin di dar û bestan de hinin din di pişta mîran de hilgirtî. Dar û bestan pêşî didênen erdê, keçik diçin ser. Li birîndarî dinihêrin û wek mihînê veciniqi xwe didin paş]*

Civanok – 10

Ên pêşîn, SERWER BEG, du segman û peyayêن din

Herdu keçik bi hev re – Ax, ew e, xortê cilteng.

(*Birîndarîn din dibin şikeftî û cendekan ji diyarî kaş dikin*)

Segmanê pêşîn – SERWER BEG bi xwe ye.

Segmanê duwem – Qurbana mîraniya xwe ye.

Segmanê pêşîn – Berberê hezar mîri bû.

Segmanê duwem – Serek bû, serekân re serî bû.

Segmanê pêşîn – Xwenda bû, zana bû.

Segmanê duwem – Bi her awayî hêja bû.

Segmanê pêşîn – Xelk pê disekinîn.

Segmanê duwem – dijmin jê dilerizîn.

Segmanê pêşîn – Ruhniya çavên Kurdistanê bû.

Segmanê duwem – Ne mîrê gornistanê bû.

Segmanê pêşîn – Ji bona mîraniye ji bona qewmandinê ji dêya xwe bûbû.

[*Di wê demê de peyayek dikeve diyarê, bi destê xwe re dûrebin û şesderba SERWER BEGê digire, xwe digihîne dar û bestê û ser ejnuyêن xwe disekine.*]

Civanok – 11

Ên berê, QUBAD, paşî HEVIND

QUBAD – (*Bi dengekî bi girîn*) Ax ez benî, ez gorî min digot xwe ew çend mede pêş. Ma em seyên te nizanim ji bo çi bûn. Te keriyê xwe çawan bê serî hişt. Ez gorî min digot ez goriya serê te bibim, te ez kirim kêla gorna xwe. Bego! Bego! Begê zirav mirin ji bo te hêj gelek zû ye. Dinya din tahetî ye. Tu ne

mêrê rahetiyê yî. Tu mêtê şer û qewimandinê yî. Ev çiya gir û gaz tenê bi deng û navtêdana te şen û set xwe ne. Bê te çiya nizim, rûbar zuwa, ezman bê roj û tav e. Tu bi mirina xwe gelek tiştan ji me dibî ko îro ji her demê bêtir ji me re gerek in. Tu qîma xwe bi mirinê ditinî lê em nayînin. Tu ne yê xwe yî tu yê me yî. Mirovên wek te ne qesr in, karwanseray in. Heqê rûniştina herkesî lê heye. Bego! Bego! te hertiş, dê û bav zar û zêç ji bona we latê xwe hiştin. Niho welatê xwe ji bona ci û kê dihêli? Ma naye bîra te wekî em bi rêdiketin, dotmama te ji te re ci digot: "Tu min ji bona welatê xwe dihêli û diçî, ma ez te ji bona kê bihêlim û herim ku? Welatê min jî tu yî, berde ez jî herim welatê xwe, ez jî bi te re bêm"

HEVIND – (*HEVIND dikeve diyarê, li dora xwe dinihêre, li ber dar û bestê ser ejnuyan disechine, herdu destêne SERWER BEGê maçı dike û bi dengekti zîz*) Ax min nizanîbû ko mirov dikare du caran jî sêwî bimîne.

QUBAD – Ax ez ci dibêjîm. Ma zanim ci dibêjîm. Bego! Bego! Begê zirav rabe se-re xwe hilde.

SERWER BEG – (*Çavêne xwe nîv bell dike, li dora xwe dinihêre, çavê wî li QUBA-Dî dikeve. Bi dengekti nizim*) QUBAD tu li hir ?

QUBAD – Belê ez benî, ji bê fihêtiya xwe hêj heme û li hir im. Hêj nemirime

SERWER BEG – Memire jî. Da ko kirasê min ê bi xwîn bibî mal, bidî dotmama min, kurê min tê de bi xwedî bikin, zû bigîhînin û bêxîn xizmeta milletî. Millet nikare gelek li hêviyê bimîne. Jê re canfeda û canbêzarîn divêtin. Ji diya wî re holê bêje.

QUBAD – Ma çire ez benî, Xwedê hez bike tu bi xwe kurê xwe bi xwedî bikî û bigîhînî. Birînên te ne xedar in

(*Jî devê SERWER BEGê xwîn têt û dîsan ji ber ve diçit*)

QUBAD – Xwezî min ev negotana, xwezî min ev dem nedîtana, ditirsim pê dilê xwe xira kiriye

SERWER BEG – (*Dîsan çavê xwe vedike û li HEVINDî*) HEVIND kurê min tu jî li hir ?

HEVIND – Belê ez benî li hir im. Emrekî te heye.

SERWER BEG – Ne kurê min, lê herwekî min jî te re berê jî gotibû, serê xwe ji çeperê gelek dermexîne, te seh kit?

HEVIND - Belê ez benî dernaêxînim.

Civanok - 12

Ên berê, LEWEND AXA, BIJÜK û çend peyayên din

LEWEND AXA – Beg çawan e?

QUBAD – (Bê herndê xwe) Rahet e.

SERWER BEG – Hûn bi xêr hatine axanon. Segmanêñ şikeftê çawan bûne? Ditirsim dijmin li wan hatiye hev, dîl ketine.

LEWEND AXA – Belê ez benî dijmin li wan hatibû hev, lê dîl neketine. Ji xwe di şikeftê de bîst û pênc peya hebûn. Qederê dused eskerê dijminan bi ser wan de girtibûn. Yêñ me vê paşiyê du mitralyozen dijminan xistibûn destê xwe. Bi êrifşekê li dijminan bûne der. Ji du saetan bêtir bi hev çûn, dawî dijmin şikiya û xwe da paş. Segmanêñ me xwe gihadine çeperên me. Vêca dijminan dîsa berê xwe dan şikeftê. Lê şikeft edî li wan ranedibû. Hatin û ketinê. Şikeft û hijde cendek ketine destê wan.

SERWER BEG – Di newalê de.

LEWEND AXA – Dijminan eskerê xwe bi şûnde kişandin. Newal weke berê ye. Tu deng û pêjn jê nayê. Sih miriyêñ me û qederê sed cendekên dijminan lê miqate ne. Di Girê Şêran de ji ber ko tu sîngêñ segmanêñ me nemane, dijmin gule û berikên xwe davêje ruyê ax û keviran. Me serê kaniyê ji destê dijminan derxistibû. Vê paşiyê dîsan ji me zemt kirine. Lê me ew çend cendekên wan xistine navê ko devê kaniyê ritimiye av sor diherike...

SERWER BEG – Di herderî de mîranî, di herderî de kurdanî. Lê dijmin serdest, em di herderî de qels û bêkeys, ji lewra di herderî de bindest. Belê mîranî qenc e, di hertişî, nemaze di şerî de mîranî şertê pêşîn e. Belê mîranî giyan e. Lê ji bona ko giyan bilive, tev bigere jê re dest û ling û ji wan destan re şûr û rim divêtin. Ne peya ne ne çek. Çar meh di vî girî de dorgirtî, hero peya û çek kêm dibin. Li şanû [şûna] wan tu nayê. Ava ko serê xwe nedaye kaniyekê, rojekê dê biçike. (*Dengê wî diguhêre, bi vîn û hişkî*) Axano! Qerara we ci ye? Edî dem e, divêt hûn qerareke xwe bidin.

LEWEND AXA – Beg esil tu yî. Heke qerar divêt, dîsan tuzanî. Te çawan emir kir em ê welê bikin. Ma kengê me bêemriya te kiriye.

SERWER BEG – Lê heye ko ez nemam.

[*Hemîyan xwe ker dikin, deng ji tu kesî nayê. BIJÜK dikeve nêzingî SERWER BEGê, zenda wî dibe destê xwe. BIJÜK bêmad e*]

LEWEND AXA – Belê Beg tu ci emir dikî?

SERWER BEG – Yê min, divêt hûn xelk ê çekhilgir ji yê ne çekhilgir vejetînin.

Zar û zêç bi rê xin bila bikevin deşta Ecemîstanê herin nav Kurdên Erdelanê. Ên çekhilgir ji vî girî derbasî girê din bibin û heta paşiyê lê bimînin. Xwe giran bifiroşin. Belê xwe rind biparêzin zû zû xwe medin koştin. Ji hergavî bêtir mîrê mîrkuj bibin û ne xwekuj. Da ko dijminê xwe bê dijmin mehêlin û di erdê Kurdistanê de agirê serxwerabûnê medin temirandin (*dengê wî iête birîn, nema diliye*)

BIJÎJK – (*Xwe digihîne wî, serê xwe dike singa wî, çavêن wî hêstir dîkin*) Çû, herê serwerê me çû, stûna me a blind û xurt hilweşîya.

[*QUBAD û HEVIND xwe davêjin lingêن wî, keçik digirîn, çavêن xelkê hêstir dîkin. Pêlekê di vî halî de dimînin*]

LEWEND AXA – Hevalno! Serwerê me çû. Herwekî BIJÎJKÊ me gotiye bayekî ne bi xêr stûna me a bilind û xurt hilweşand, konê me di ser serê me te xist, lê divêt em konê xwe rakin, vedin û şopa serwerê xwe winda mekin.

Birano! Ne ji min ne ji ji kesekî din têt, herwekî divêt pesnê SERWER BE-Gê bidit û li ber bikevit. Heke em dixwazin giyanê wî şâ bikin divêt em bixebitin û wesiyeta wî bînin cih. Di jîna wî de em bi emrê wî ve diçûn, paş mirina wî divêt em bi wesiyeta wî ve herin. (Alê ji şikêrê dibe û bi Serwer Bagê dadike) Bego! Di jîna xwe de te ew hildigirt, di mirina te de divêt ew te hilgirit.

[*LEWEND AXA, BIJÎJK, QUBAD û peyayêن din dar û bestê hiltînin, datînin ser piyêن xwe, hêdî hêdî diçin, xelk didin pey wan. QESEM davêje ser.*]

Way li min, way li min, porkurê ax û ez ê
Serwerô! Serwerô! Serwerê qewmekî
Şehîdê, bilind î, şehîdê Bihuştê
Li te xist ne bi çav berikê korekî
Serwerê, geram î ax li me way ez ê
Bextreşê dayikê! Dotmamê porkurê
Reşa xwe girêdin, Serwer çû gorinê
Lê bêyi! Rebenê! Dotmama xwelîser
Lê bigrî! Lê bigrî, delal ! Torin î
Way li min, way li min porkurê ax ezê

[*Diyar pêlekê vala dimîne. Ji eniya şer dengê top û mitralyozan têt. Hêdî hêdî deng nêzîng dibin. Qasid ji severê de tê û dikeve diyari li dora xwe dinihêre ke-*

si nabîne pêşve diçe. Dengê tivingan hêj nêzingtir û xurttir dibe]

Civanok - 13

LEWEND AXA, BIJÎJK, qasid, HEVIND, QEŞEM, MENİJE, Û peyayên din vedigerin

LEWEND AXA – (*Ji qasid re*) te digot cih li yên me teng bûye. Dijmin ketiye newalê û dikişine pehnavê [*Deng û pêjn hêj nêzingtir dabin. Çend berik li pehnavê dikevin. Segmanek birîndar dibe û dikeve BIJÎJK lê ditewe, yekî dîtir ji...*]

LEWEND AXA – Herçend em ê vî girî vala bikin lê niho nikarin. Me hêj kar û barê xwe nekiriye. Jû pê ve di vî halî de em ê çawan pişta xwe bidin dijminan û derbasî girê din bibin. Ji lewra divêt em bi êrşekê dijminan ji çeperan hilkin û bavêjin rûbarê din. Dê xortino! Zarono! Herçî ko ziravê wî tenik e bila li paşiyê bimînit, êrşî zarono êrşî . . . [*Tevda xwe didin severê. LEWEND AXA dikeve pêşiyê. Peya dibezin dîkin ko ji hev derkevin. Birîndar gihane cankışiyê*]

BIJÎJK – [Li dora xwe li keçikan dînihêre. Radihêje tivinga kuştiyekî] ez ko dizanim birînan derman bikim divêt bizanim birînan jî vekim. (*Dide severê*)

Civanok - 14

QEŞEM, MENİJE, pêşde terxelkekî tevlî hev

QEŞEM – Dijmin dîsan har bûye

MENİJE – Emrê seyê har ne dirêj e

[*Dengê tivingan li ser hev têt. Gule dikevin dorê, guregura balefiran jî dikevin navê. Qêrin, ax, û nalîn. Ji aliyê rojavayî xelkekî tevlî hev, jin û zaro, kal û kokim, çend birîndar dikevin diyarê. Hin li ser lingan in. Hin jî bi zikişkê xwe digihînin hevalên xwe. Ji newalê ve deng têr. Geh nêzing dabin, geh dûr. Balafir têr, diçin, bomban davêjin. Gurînek... balafirek berbijêr dibe û dikeve newalê . . .*]

MENİJE – Ma em çire sekinîne. Birîndar nemane em li wan miqate bibin. Piranî bi birînen xwe ketine. Ên mayî bê me jî dikarin. An ewê sax bibin an xwe bigihînin hevalên xwe. Ë dî cihê me jî çeper e, eniya şer e (radihêje tivinga segmanê mirî û dide severê)

QEŞEM – Ma ez te kengê bi tenê dihêlim (*dide pey we*)

Pîrejinek – Keçê! Keçino! Ku ve? Ku ve? Xwelî li serê we mebit. Mala min ê . . .

Civanok - 15

Ên berê ji du keçikan pê ve

KALEK – (*Ji pîrejinê re*) tu ji dengê xwe bibire.

PÎREJIN – Ji xwe min tiştek negot. Eve min dengê xwe ji birî.

KALO – Xwedêo! Tu bi rehma xwe bike. Li ber vî halî çawan hedara te têt. Heke te mirovên dîndar divêtin, em in. Heke te mîrênen qenc, xudan bext û rûmet divêtin dîsan em in

PÎREJIN – (*Bi dengekî nizim*) xebera te ye bira. Lê kes bi şolê Xwedê nizane.

KALO – (*Ew ji bi dengekî nizim*) Belê Xwehê welê ye. Lê ev şol bi darê çavan e.

[*Dengê tivingan hinekî dûr dibe*]

BIRÎNDAREK – Hey, ez qurbana dest û lepêñ we bim. Yêñ me pêş ve diçin. Dij-min pişta xwe da wan.

PÎREJIN – Ma tu ji ku zanî xorto? Tu ji wek me li hir î, tu kesî nabînî. An nav di me didî.

BIRÎNDAREK – Yadê, ma tu nabihîsi ko dengê tivingan dûr dikeve.

PÎREJIN – Ko dengê tivingan dûr dikter

BIRÎNDAREK – Ko dengê tivingan dûr dikter, jê dixuye ko dijmin bazdidin û yêñ me didin pey ..

KALO – Xebera wî ye xwehê. Niho tu nizanî çi kêf e. Dijmin di re ve, yêñ me di-kevin pey. Carin hene bi seriyan bi sîngê li hev diqelibin. Hingê tiving wek çô ne. Tenê zîqeziqa şîfa xenceran e (*bi dengekî nizim dinihurîne*.)

Lê xencerê lê xencerê

Qevdresê kalanezerê

Ez li te geriyam delalê! çavresê delalê! Tu kanê, enî zêrê kanî.

Jina KALO – Ma min negotibû tu xuruşî yi, ma dema berdolaviyê ye?

KALO – Pitê tu ker be, tu ji ku bizanî, belê berdolavî mazîçinê, ma tu ji ku bizanî wekî dengê top û tivingan dibihîsim çawan dilê min hildavêje. Herê mirin hebiwa kalbûn nebiwa. Xwezî! Xwezî! Li wan wextan, li wan zemanan. He-ta ko em nedigihan sîngêñ hev me tiving bernedida hev. Ne ji paş talde û nav çeperan. Hertişt kurdmancı bû. Ji xwe eskerê reş yekcar bi me nikaribû. Ji heft bavê wan zêde bû ko hilkişin çiyan û bîkevin warêñ me. Ko me xwe digihand quntara ciyê ewan ruyê xwe hadidan. Ji me vedibûn, heta sala din,

heta hingê ko em dikerin deşte.
[Dengê tivingan yekcar dûr dikeve]

Civanok – 16

Ên berê, QEŞEM, MENİJE, GURGİN, FELEMÊZ û pêşdetir HEVIND

[Tevde ji severê derdikevin. MENİJE birîndar e, FELEMÊZ ew hilgiriye. GURGİN jî birîndar e, QEŞEM ketiye bin çengê wî. Birînên wan ne xedar in]

KALO – Axanino xêr e?

GURGİN – Xêr e apo.

PÎREJIN – Mala min ê keçik jî birîndar e, min digot meçe, lê guh neda min.

BIRÎNDAR – Ma min negotibû dijmin şikiyaye.

FELEMÊZ – Belê şikiyaye.

GURGİN – Şikiya û kişiya rûbarê din, yên me dane pey, heta ko wî bibin bajon hinda newala din.

FELEMÊZ – Dijmin gelek êşıya, di newalê de bikare xwe biparêze jî, heta ko xwe bi edilîne jê re çend roj divin.

KALO – Ji yên me pir hatine kuştin.

GURGİN – Kuştiyên dijminan bêtir in.

KALO – Ji piran pir ji hindikan hindik.

BIRÎNDAR – Pîsmam, gelo niyeta mezinên me ci ye? Ma ji me re jî tevdîrek naye ditin. Ez biketam piştê kevirekî min dikaribû tivingê bişolnim. Lê çawan xwe bigihînim heta wê derê.

FELEMÊZ – (Bê hemdê xwe) Ko Xwedê hezkir, ew jî dîbit (ji MENİJE re) çawan gelek diêşê.

MENİJE – Ma ez kengê di destê te û di hilma canê te de diêşim, tenê ditirsim.

FELEMÊZ – Ji ci ditirsî?

MENİJE – Ne ji tu tiştî, ko ez bibêjim, mebe ko bixeyidî.

FELEMÊZ – Naxeyidim, ka bêje ci ye?

MENİJE – Ma tu nizanî, belê ditirsim ko tu min dîsan berdi, em dîsan ji hev veqetin. Ma çire ji min veqeti, te nedîr rex te de min jî şer dikir. Te bi xwe digot, berikên min qet şas nedibûn, digihan armancê, êdî em ji hev veneqetin ne?

FELEMÊZ – Nizanim keçê! Kar zane, derb zane. Ez ci bêjim, dinya şer e, şer hero bi awakî ye.

HEVIND – (*Bi deng û qîr ji şeverê derdikeve bi destê wî re çend bombe hene*) Baş êvar axano! Hûn çawan in, rahet in, êdî metirsin, dijmin gelekî dûr ket. Pişta wî şikiya, zûzû nikare vegere (*bomban şanî wan dîde*) ev sêvîn ha jî ji we re rîkirine.

[*Xelk dikenin*]

GURGÎN – Te ev ji ku peyda kirine?

HEVIND – Keko heke naxiyidî ez ê bêjim te.

GURGÎN – Qet naxeyidim, hema bêje.

HEVIND – Wekî dijmin bazda û hûn ketin paşila destgirtiyên xwe kofî û guliyêñ wan diedilandin ez jî ketim hembêza çeperên dijminan û ev dane hev.

[*Xelk tevde dikenin*]

QEŞEM – (*HEVINDî hembêz dike û radimise*) Tu ci xortekî delal î.

HEVIND – Keçê welê mebêje GURGÎN Axa dê bidexise.

[*Xelk dîsan dikenin*]

PÎREJIN – Xwedê tebihêle kuro di vî halî de te em kenandin

HEVIND – Di halê me de ci heye, me dijmin kevand, guhpehn revand, bûkêñ xwe civand. Ji xwe talaniya tevê êlê dawer e. Ez herim li BIJJIKÊ xwe bigerim. (*Xwe dide şeverê*)

QEŞEM – Ci lawikekî delal û bi dil e.

MENÎJE – Xwedê wî bihêle (ji QEŞEMê re) birfîna GURGÎN çawan e?

QEŞEM – Ji halê wî xuyaye, tu nabînî halê wî ne tu hal e.

GURGÎN – Guh mede xwehê, ma tu nizanî QEŞEM e, ji xwe re dibêje. Tu tiştêm nîne, niho dikarim tivingê hilgirim.

MENÎJE – Xebera QEŞEMê ye, tu ê çawan bikarî tivingê hilgirî, tu nikarî xwe hilgirî.

QEŞEM – Tu nizanî ci xwîn jî te çûye

[*Jî şeverê pêjna lingan û dengên mîran tête bihîstin. LEWEND AXA û hevalen*

wî

Civanok – 17

Ên berê, LEWEND AXA, XURŞİD AXA, BUÜK, HEVIND

û peyayêñ din û pêşdetir QUBAD

LEWEND AXA – (*Li xelkê dînihêre û ji havalê xwe re*) me tu wext nîne ko em winda bikin. Divêt tavil dest bi xebata xwe bikin.

XURŞİD AXA – Belê, hima niho.

BIJÎJK – Dê rûnin, em biaxivin. [*Xwe ji xelkê vediqetînin û didin quncikekekê*]

LEWEND AXA – Ji xwe rehmetî rêya me şanî me dabû.

XURŞİD AXA – Ma jû pê ve rê heye.

BIJÎJK – Hingê ez û Xurşid bikevin nav peyan. Xelkê çekhîlgir ji yê neçkîlgir ve-
qetînin û karwanê neçkîlgiran bi rê xin.

LEWEND AXA – Ji xwe ev e, tu şêwr û müşêwra din nîne.

XURŞİD AXA – Tenê, divêt qederê deh panzdeh peyan ji bişînin ber bi eniya şer,
arîkariya Filît bikin.

LEWEND AXA – Ne ji xwe.

XURŞİD AXA – Bi peyan re tu ê kê bişînî?

LEWEND AXA – Bila GURGÎN bi wan re here.

BIJÎJK – GURGÎN birîndar e, bila ew bi te re bê.

LEWEND AXA – Hingê FELEMÊZ, herdu jî hêja ne, yek ji ê din çêtir e.

MENÎJE – Ax.

LEWEND AXA – (*Li xwe dizivire*) ev ci deng e?

FELEMÊZ – Ne tu tişt e ez benî, dengê birîndarekê (*ji Menîje re*) dîn mebe.

MENÎJE – Dengê birînekê.

FELEMÊZ – (*Devê MENÎJE digire*) keçê, dîn mebe.

XURŞİD AXA – Tu zanî, lê bi min ez biçûwama çêtir dibû. Tu li pêş ez li paş. Tu
segmanên me bigihînî girê din ez jî herim pêşıya dijmin bi Filît ra heta sibe
êvarê pêşıya dijmin bigirim û paşê digel peyan bêm xwe bigihînim we.
[BIJÎJK û LEWEND AXA li hev du dinihêrin]

LEWEND AXA – (*Ji Xurşid re*) keko tu gelek westiyayî. Di her deravê teng de tu.

Lê heke te dil heye.

XURŞİD AXA – Dilhebûn jî heye. Ji bona selametiya tevayiyê divêt ez herim.

BIJÎJK – Pezê nêr ji bo kêrê ye.

MENÎJE – (*Ji FELEMÊZ re*) Te dît ji te mêtir hene.

FELEMÊZ – (*Bi ern*) Ji min mezintir hene.

XURŞİD AXA – Êdî divêt em dest bi karê xwe bikin.

LEWEND AXA – (*Ji xelkê re*) jinino! Mîrnino! Ev bûne çar sal em tevda di van
çiyayan de ji bona azahî û serxwebûna welatê xwe dixebeitin. Di nav van çar
salan de me gelek tişt dîtine. Lê çavêن me ji tu tiştî netirsiyane û di ber her
dişwariyê de dilên me xurttir û zekmtir bûne. Em tevda malek bûn. Jin û
mîr zar û zêç nav hev da diman. Herkesî karê xwe, wezîfa xwe kiriye. Tu

kesî nehiştiye ko loma jî bibit. Di mîranî û fedakariyê de hûn ji hev derke-
tine. Rojin hebûn em birçî diman. Şevin hebûn em ji sermayê diqefilin. Lê
gilî û gazind nedihat bîra me. Nedihat bîra tu kesî. Herkesî ji bona welat û
milletê xwe her zehmetî dikişand û pê şadibû. Ji ber ko herkes bîrewerê kar
û xebara xwe bû.

Kurdinon! Em ê îro mala xwe biguhêzinin. Em ê mala xwe a çar salîn ber-
din, jê derkevin. Lê di vê guhastinê de em ê bibin du ber. Xelkê çekhilgir
derbasî girê din bibin, yên ne çekhilgir xwe bidin deşta Ecemîstanê, nav
Kurdên Ecemê. Ko Xwedê hizkir pêşdetir em ê dîsan hev du bibînin. Di vê
navê de herçî ko ji me mitine dibin hîmê avahiya serxwebûna me. Herçî ko
dimînin sitûn û dîwarên wê. Avahiya bê hîm nikare bisekine, hîm bi tenê bi
ser erdê nakeve. [*Xelk xwe ker dikin û li hev du dînihîrin. XURŞİD AXA pe-yan dibi-jêre. BIJİJK bi birîndaran mijûl dibe*]

BIRÎNDAREK – Ma çire? Ez bi çekhilgiran re naçim, birîna min sivik e.
Yekî din – Heke xwîn ji min diçe ez herim kuderê jî bi tê ve bimirim.

LEWEND AXA – Zarono! Wextê me hindik e, dev ji kurt û pistan berdin. Peya-
yên ko divêt bêne hilgirtin ji me re ne gerek in. Dirêj mekin, divêt herkes
qîma xwe bi qedera xwe bînit.

QEŞEM û MENÎJE – (*Ji LEWEND AXA re*) Ma Axa em jî ne çekhilgir in. Te bi
çavêن xwe dît, me çawan şer dikir.

LEWEND AXA – (*Keçikan hembêz dike*) Belê xebera we ye, min bi çavê xwe dît,
hûn çekhilgir û segmanin rind in. Lê xortin hene bê tiving in. Em ê tivin-
gên we bidin wan.

KEÇIK – Ma em ne xort in. Tu me pîr dihesibîni. Tu ji ku zanî ko em hingê
xorten te ne mêt in. Ka kî ne, wan şanî me bide.

LEWEND AXA – Çavêن min canê min bê fêde ye
[*Keçik vedigerin nik destgirtiyêن xwe, xatir dixwazin û dikevin nav neçekhilgi-
ran*]

HEVIND – (Ji destê XURŞİD AXA direve xwe li pêşıya LEWEND AXA dadiçikî-
ne) Axa, ez dikim ji te re du pirsan bikim.

LEWEND AXA – Tu hêj nikarî tivingê hilgirî, hîn neh, deh salî yî.

HEVIND – Hûn jî ecêb in lo! Ez ji we re canê xwe pêşkêş dikim. Hûn ji min sa-
lêñ min dipirsin. Ma hûn hatine hire tenê ji bona kuştinê, heke welê ye rabe

min jî bikuje. Ne heger we mirin jî daye çavê xwe hingê ez bi kêtî kuştinê meyim jî ma bi kêtî mirinê jî nayêm. Dema ko tu bimirî ez dikevîm şûna te dimirîm û te dîhêlim ji bona ko tu bikuji û welê bi kêtî we têm. Te seh kir Axao!

BIJÎJK – Ji xwe ew berdestiyê min e.

HEVIND – (*Direve nik Bijîski*) Apo ez xulamê destê te me, min mehêle, ev LEWEND AXA zalimek e, dixwaze min bişîne deşte.

BIJÎJK – Metirse, tu ê bi min re bêyi.

[*Karwanê neçekbilgiran bi rê dikeve, xelk jî hevdu xatir dixwazin. QEŞEM ketiye bin çengê Menîjê*]

QEŞEM – (*Ji Menîjê re*) Xwezi em keç nebiwana.

MENÎJE – Ma hingê em ev çend bi van ve girêdayî dibûn.

Jinek – Hûn keç nebiwana, em jin nebiwana kê camêrên ha dianîn.

QEŞEM – Yêñ ko anîne.

Jinek – Yêñ ko anîn an mirine an nema ditînin, divêt sibe hûn jî ji bona dusibê bînin.

MENÎJE – Yadê dev ji me berde.

[*Paşıya karwanî ji diyarê kuta dibe*]

LEWEND AXA – Êdî dem e, divêt em jî bi rê kevin.

BIJÎJK – Ne ji xwe.

[*Segman dibil du ber û çare çar rêz digrin. Berê XURŞİD AXA serê xwe daye severê. Berê LEWEND AXA aliye rohilati*]

LEWEND AXA – Hevalnon! Ma gerek e ez nav di we bidim. Hûn hemî mîr in şerdîtî û karê xwe bîrbirî ne. Tenê ji îro pêda [dê] şerê me ji şerên borî gitantir û dijwartir bibin. Ji lewra divêt hûn jî ji berê xurtir û zexmtir bibin. Dilên we dido û gurçikên we çar. Hevalnon! Bila çavên me hergav li pêsiyê bibin, wekî em pêş ve diçin didin pey mirinê û gava ko em xwe didin paş mirin dikeve pey me.

Lê herwekî rehmetî gotiye, herçend ji me têt divê em canê xwe biparêzinin û zû zû xwe medin kuştin, da ko dijminên xwe bê dijmin mehêlin. Pêşve zarono pêşve, Xwedê bi me re ye.

[*Segman tevda marşa jêrîn dixwînin û bi rê dikevin*]

Marşa Segmanan

Em bira ne tevde kurd in
Enîbilind serevraz
Cihêن me ne şehar, zinar
Em êlo ne, teyrê baz
Welatê me dêya me ye
Em tev jê re gorî ne
Hişyar bûne herçî Kurd in
Demêن tarî borîne
Daxwaza me heqê me ye
Doza me ye serxwebûn
Em dixwazin serxwe bibin
Demêن dîlî neman, cûn
Me sond xwarî ser bextê xwe
Bi rûmet û bi xencer
Welatê me aza bîbit
Em bibin jî kerbiker
Mîrin, mîrin, mîrin hebit
Vê jînê re bê serî
Edî bes e, dîlî bes e
Şerm e Kurd re hesîn
Top lê dixin, tiving teqîn
Deng e ceng e to! To!
Şer e, şer e lawno şer e
Teq e req e lo! Lo!
Di şerî de wekî şerî in
Kes namîne paş... paş
Pêşve diçin xortêne me tev
Yek du sê çar marş marş

QUBAD – (*Dikeve diyarê. Xwe dîghîne paşıya segmanên LEWEND AXA. Tiving bi milê wî, dûrebîna SERWER BEGê bi stuyê wî ve ye. Destê wî de kirâs*) ev e kirâsê wî ê bi xwîn.

[perde datêt]

HAWAR, hejmar 20, 1933

NAME

Şorbenîsk min ji bîr kir
tilşewitî, hevrêk û meyir...
xweziya
tasek dims li ber min bûya
nuha li wir...
lo esker ci dikir bila bikira...

bî min te ma
-newê gorê baş e-
hişreta qeraş aş e;
ya min şal û şapik...
di talda tahtekê Gebar de nuha
min pal dabûya;
nanekî tenûrê jî hebûya
azad bûma hê çêtir;
jî xwe bindest im...

ez bêjim -têm çavêن te-
nuha şil in...
û destên te binmil in, xuşka min
-silavan ragihîn xwarziyê min
bêje -xalê te radimise
têr têr tê eniya te...

û li ber nekeve
li ber min jî...
ma ez xalê kê me?
ne, te digot -ci mîr e-
-berkê nêr ji bona kêr- e
êsa xwe nexe dilê xwe
sibhekê rabe, xuşka min
bi ser wî bajarokî de bidêre,
birayê te...

ARJEN ARÎ

Not: Di hejmara 27an de ev şîra A. Arî bi şası mîna şûreke Yılmaz Odabası hatüb pêşkeshînn. Em rast dikin û ji herdu şâhîn xwe leborînê diwazîn.

FELSEFE Ú EDEBIYAT

N. ZAXURANÎ

Mîna ku tê zanîn, bi giştî huner û bi taybet û mîna şaxekî edebiyat, bîreweriyeke bi reng civakî ya mirovatiyê ye. Ji ber vê yekê jî, edebiyat di nav kultura mirovatiyê de xwedîyê cihekî girîng û bi reng jiyanî ye. Ji bilî vê yekê jî, edebiyat mîna her şaxê huner dibe alîkar jî bo ku mirov bikaribe rastiya jiyana civakî ligel hemû xeml û xêza wê ya rengîn ji nêzîk ve binase. Hema bibêje, ji aliyê hemû kesî ve tê pejirandin ku dîsîplînên bi reng zanistî di derbarê mijarênu ku serçavîyên xwe ji xweza an jî ji jiyana civakî digrin, lêkolînên zanyarî li dar dixin û bi alîkariya vê yekê mirov dîbin xwedî agahdarî di derbarê xweza û serpêhatina jiyana civakî de. Lê, hinek kes an jî alîgirênu hinek tevgîrên edebî yên ku serê xwe li ser kar û xebata bi reng hunerî di serpêhatina dem û dewranan de têşînin, fonksiyona huner ya bi reng ûnformatîkî pesend (qabûl) nakin. Bi ya min, heger mirov li ser vê yekê kar û barekî hêja li dar bixe, hingî dê mirov bikaribe cudabûnên di navbera huner û dîsîplînên zanîstiyê yên ji hev cuda de qanc têbîgihe.

Di destpêkê de, divê mirov destnîşan bike, ku dîsîplînên bi reng hunerî diyardeyên (fenomenên) bi reng xwezayî û civakî li gor metodênu xwe yê xas zelal û şirove dikin. Anglo, huner jiyana mirovatiyê ya bi gelek alî ku di çerçeweya netewî de bi xwîn û can dibe, li gel hemû bûyer û nakokiyênu wê yên alozî ji hev cuda dinirxîne. Bêguman, gava ku mirovê hunermend vê yekê pêk tîne, hewl dide ku, têkiliyên ji jiyana civakî yên ku bi awyekî nêzîk bi xwezaya dorbera wî re rapêçayî ne, di prosesa berhemkirina berhema xwe de li gor pîvanên bi reng estetîkî vebêje. Bi alîkariya vê vegotina bi reng hunerî ya ku mirovê hunermend di serpêhatina berhemkirina berhemên xwe de bikar tîne, hewl dide ku ji bo xwendevan, bîner an jî guhdarênu xwe

re tiştekî bibêje, diyardeyên bi teng civakî ji wan re şirove bike, bi gotineke din wan di derbarê sepehatiyênetewî û navnetewî de ronî bike. Ji bili vê yekê ji, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku hinek bûyer û diyarde di jiyana civakî de hene, mirov bi tenê bi alîkariya vegotina bi teng hunerî dikare wan ji mirovatiyê re şirove bike. Bi qasî ku tê zanîn, dê ji ber vê yekê be ku mirovantiyê herdem berhemên bi teng hunerî parastin. Ji vê yekê wîrdetir, mirovatiyê bi qasî ku imkanen wê mecal danê, bi awayeki tekûz li berhemên bi teng edebî xwedî derkeriye.

Baş e, taybetmendiyêni dîşiplinêni bi teng hunerî bi ci awayî ji xislaten xas yêni dîşiplinêni bi teng zanistî têne cuda kirin? Bi peyveke din, xweseriya huner bi ci awayî ji ya zanistiyê tê cuda kirin? Bi ya min, cudabûna herî serekî beriya hertiştî bê nave-roka berhemên bi teng zanistî û naveroka berhemên bi teng hunerî bi kîjan alet û materyali têne ronî kirin de ye. Bela vê yekê ji, mirovê ku bi kar û barê bi teng zanistî dilebike, berhemên xwe yê bi teng zanistî bi alîkariya mefhûmên abstrak, lê heçî mirovê ku bi kar û barê hunerî dilebike, berhemên xwe yê bi teng hunerî bi alîkariya îmajan dihûne.

Mîna ku tê zanîn, beriya niha bi du hazar salan filozofen grêkî yêni mîna Platon (Eflaton) û Arîstoteles ku huner mîna "taqlîd" a diyardeyên bi teng xwezayî destnîşan dikirin, nerastûrê be ji, wan bal dikişandin ser xweseriya huner ya ku bi alîkariya îmajan tê hûnandin. Bêguman, ji serdema wan ta roja me, nerîna mirovatiyê ya di derbarê huner de bi gelek ali hatiye guhertin. Di prosesa vê guhertinê de, huner bi her awayî bi saya keda mirovên hunermend yêni ku mensûbên kulturên ji hev cuda ne, mîna kulîlkîn biharê şax û per da. Bi qasî ku tê zanîn, dema wan behsa xwezayê dikir, amanca wan bi xwezayê ew bû ku jiyana civakî ya ku ji diyardeyên bê hijmar tê meydanê, bi xwe ye. Li gor filozofen grêkiyan mirovê hunermend bi alîkariya berhemên bi teng hunerî diyardeyên jiyana civakî "taqlîd" dîkin, ango, mirovê resam bi alîkariya resamtiya xwe diyardeyên bi teng xwezayî yêni ku di nav jiyana civakî de bi cih û war dibin, resm dike. Herweha mirovê şair ji bi alîkariya şârtiya xwe bûyer û diyardeyên jiyana civakî ji nû ve diafirîne, bêguman mirovê şanoger ji bi alîkariya xwenîşandana xwe ya li ser dikê, diyardeyên jiyana civakî ya rojane şanî bîneran dike. Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xwiyakirin, li gor filozofen grêkiyan mirovê humermend bi alîkariya qabiliyeta xwe ya bi teng hunerî diyarde, bûyer û serpêhatiyêni jiyana civakî "taqlîd" dike.

Nerîna filozofen grêkiyan ya ku huner mîna "taqlîd" a xwezayê destnîşan dikirin, ta dawiya sedsala 18 an ji aliyê gelek ororîteyên huner ve hate parastin. Mînak, yek ji wan otorîteyan nûnerê ronahiya Fransî Denis Diderot digot, ku her berhema

huner ya ku xwezayê "taqlîd" dike, layiqî pesindariyê ye.

Bêguman, heçî Hegel bû, bi metodeke din nêzî kar û barê bi reng hunerî dibû. Lewra, wî ev sistema terman di tasawûra xwe ya bi reng hunerî de bi kar tanî: Li gore wî, huner ji ramana mutlaq tê meydanê, an jî tê afirandin. Ango, Hegel nave-roka huner "ramana mutlaq" bi xwe didît. Forma huner jî mîna "îmaj û hisan" destnîşan dikir. Lâ, divê neyê jîbirkirin ku gava mirov "ramana mutlaq" mîna bingeh ji naverokê re û herweha li "îmaj û hisan" jî mîna bingehê forma ku naverokê radipêce, pesend bike, bi çi awayî dibe bile bibe, divê ev her du fenomenên hunerî bi hev re biguncin. Lewra, Hegel di vê baweriyê de bû ku mirov bêyî vê yekê weha bi hêsanî nikare hunerê "ideal" biafirîne.

Ji aliyê din ve jî, gava ku mirov li ser dîroka huner di serpêhatina dem û dewranan de mijûl dibe, mirov dibîne ku şagirtên Hegel yên mîna Belinskî bi vê yekê tenê qîma xwe neanîne û peywendiyêni di navbera felsefê û huner de weha bi vî rengî karekterîze kirine: "Mirovê filozof bi alîkariya hîpotezan kar û barê xwe yê felsefi birêve dibe, heçî mirovê şâr e, bi alîkariya îmajen hunerî kar û barê xwe yê hunerî birêve dibe, lê tiştê ku herdu jî dibêjin, yek in. Mirovê ku li ser teoriya eboriyê ya politîkî kar dike, bi alîkariya statistikan hewl dide ku li ser mîjîyê bîner an jî xwendekarêni xwe bandorekê deyne. Heçî şâr e, bi raxistina rastiyê ya bi giyan û can hewl dide ku li ser tasawûr. û xeyala xwendevanêni xwe bandor bike û vê yekê bi alîkariya îmajan yên ku bi rastiyê re diguncin, pêk tîne. Yek ji wan îsbat dike, yê din jî şanî mirov dike, lê herdu jî bawer dikin, bi tenê bi ferqekê: Yek bi alîkariya şêwr û rayêni mantiqî, yê din jî bi alîkariya îmajan."

Mîna ku bi hêsanî jî Bilinskî tê têghiştin, bi kurtî huner tê vê watayê (manyakî): His û pêjnîn bi wate û kûr ku ji aliyê hunermendî ve ji bo mirovan têne pêşkêş kirin û li dorbera nerîn û ramanen yên bi reng felseftî, olî , welatperwerî û dîrokî tê rapêçan, bi xwe ye. Bêguman, mirovê hunermend vê yekê weha bi hêsanî bi awayekî rast û rê nake, bi alîkariya îmajen ku bi jiyana civakî re hatine xemlandin, dike. Ji xwe, mirovê ku haya wî ji kar û barê bi reng hunerî hebe, rind dizane ku taybetmendiya herî serekî ya ku huner ji bîreweriyêni din yên bi reng zanistî cuda dike, di îmajen wê de ye.

Baş e, dikare bê pirs kirin: Ma gelo çi cudabûn di navbera îmaj û delîlan de yên ku di xizmeta mefhûmîn abstrak de ne, hene? Ango çi cudabûn di navbera îmajen bi reng hunerî û mefhûmîn abstrak de heye?

Bi qasî ku tê zanîn, îmajen bi reng hunerî û mefhûmîn abstrak di destê pêşî de jiyana civakî ya ku li dorbera diyardeyêni bi reng dîrokî tê rapêçan, aks dikin. Li vir,

amanca ji akskirinê ew e ku rastiya civakî ji aliyê bîreweriya mirovatiyê ve bê raxistin û nirxandin bi xwe ye.

Vêca, mîov dikare bi hêsanî bibêje ku mirovê zanyar bi alîkariya mefhûmên abstrak taybetmendiyêner serekî yên diyardeyêni bi reng civakî û dîrokî li gel nivş û xislaten wan di ramanê xwe de tasawûr dike, li ser ferdiyeta diyardeyêni tipîk muşxes dike. Ji xwe, mirovê zanyar bi saya vî kar û barê xwe ji mirovê ku di jiyana rojane de kar û barê xwe bi awyekî aseyî birêve dibin, tê cuda kirin.

Mînak, gava ku rezvanek ji herema Torê di jiyana xwe ya rojane de ji xwe re mîjûl dibe: Heger ku îsal baran mîna ku mirov dixwaze li rezan bibare dê rez bi bertir bin. Herçiqas, tasawûra wî di derbarê rez û baranê de hebe jî, amanca wî ji baranê ev e, ku baraneke konkret / mucyyen ya ku dê li rezê wî bibare, bi xwe ye. Lî, qet ew narame bê baran fenomenekê meteorolojîkî ye, an na. Ma gelo ci cudabûn di navbera berf, teyrok û baranê de hene û ev fenomenen bi reng xwezayî berhemên proseseke bi ci awayî ne? Herweha, rezvaniyê torî qet narame, bê rezê tîfî bi ci awayî ji werz / mixti, xerzikê meywe (fêki) û ji bexçê şînayîyan / zebzan tê cuda kirin û di navbera berhemên wan de ci cudabûn hene. Bi peyveke din, mirov di jiyana rojane de, di nav serpêhatinê jiyana bi reng ferdî de liqayî xeml û xêza jiyana giştî ya tengîn tê, lê wesfîn diyardeyan yên bi giştî li ser wasfîn wan yên ferdî muşxes nake, bi tenê cudabûna wan ya serekî ji hev cuda dike. Bêguman, gava ku mirov vê cudabûnê dike, rastûrê li ser wasfîn wan yên bi giştî serê xwe naêşîne, bi tenê mirov li ser wasfîn wan yên ferdî kar û barê xwe li dar dixe. Dikare bê pirs kirin: Ma gelo, ji ber ci mirov weha di serpêhatina jiyana rojane ya civakî de li ser diyardeyêni bi reng civakî dirame?

Ji ber mirovê ku bi alîkariya mefhûmên abstrak dirame, awayê ramandina wî ji ramandina mirovê ku di jiyana rojane de bêyi ku mefhûmên abstrak di prosesa ramandina xwe de bi kar bîne, bi zehf alî cuda ye. Lewra, di destê pêş de tiştêni ku ji bo wî herî girîng in, wesfîn diyardeyan yên bi giştî ne. Mirovê zanyar bi saya wan, wesfîn diyardeyan yên bi giştî kategorize dike. Amanca wî ji vê kategorizekirinê ew e, ku peywendiyêni di navbera prosesêni bi reng dîrokî û diyardeyêni bi reng civakî li gel peywendiyêni wan yên bi hev re bi awayekî zelal bêni nirxandin. Ancax, bi alîkariya vê yekê, mirovê zanyar dikare fenomenen ferdî di nav hûnandina wesfîn bi giştî de wek mînak ji xwe re bineqîne.

Ji aliyê din ve jî, divê neyê jibîkirin, ku wasfîn diyardeyan yên bi giştî pirê caran xwedîyê hûnandineke alozî guherbar in. Ji ber vê yekê jî, naveroka mefhûmên fel-sefi, edebî û zanistî ji aliyê pisporê van şaxan ve bi alîkariya şirovekirinekê bi tenê

nayêne analîz kirin, ji berevajî bi alîkariya çend şirovekirina têne nirxandin. Bêguman, di vî warî de gelek mînak hene ku mirov dikare serê xwe li ser wan biêşîne, lê bi ya min, mînaka herî berbiçav ya di vî warî de mefhûma îstfareyê (metapher) ye. Ji bo ku mirovê edebiyatzan wêjeya îstfareyê bi xwendevanên xwe bide nasandin, pêşiyapêşî wê bi nivşê ku nêzîkî wê ye, muqayese nake, ji berevajî bi nivşen ku parîki di ser de ne, muqayese dike. Bi alîkariya muqayesekirineke weha ya bi vî rengî mirovê edebiyatzan wêjeya îstfareyê weha didin nasandin; Îstfare, aletê vegotina bi reng hunerî ye. Piştre, mirovê edebiyatzan bi nivşen ku dereceyekê di bin re ne, muqayese dike û dibêje: Mîna peyveke mecazî ku ji bilî wateya wê ya asasî ji aliye hunermendant ve bi wateyên mecazî jî tê bi kar anîn, wê ronî dikan. Bela vê yekê jî, mirovê edebiyatzan bi alîkariya mefhûma îstfareyê vegotinên xwe yên bi reng hunerî bêtir bi heyecan û wate dikan. Lewra, wêjeya îstfareyê îmajên bi reng hunerî bêtir bi heyecan dike.

Mîna ku tê zanîn, mirovê ku bi felsefê, zanistiyê, teknolojiyê yên cur bi cur mijûl dibe, ji bo birêvebirina kar û barê xwe bi awayekî sistematîkî mefhûmên abstrak diafirêne. Pirê caran, afirandina mefûmên abstrak yên ku ji aliye mirovê filozof an jî mirovê zanyar ve têne afirandin, ji nav xezîneya wêjeyan ya zimanekî kevnar (mînak, weke zimanê latînî, yewnanî û erekî) li gor sîstemeke termînolojiyê têne hilbijartin.

Bêguman, ji bo ku mirov bikaribe sîstemeke mefhûmên abstrak yên ku ji bo birêvebirina kar û barê felsefi, edebî û zanyarı têne bi kar anîn, peyde bike, divê ku mirov xwedî nerîneke pispor be. Ji xwe, mirovê ku di vî warî de haya wî ji karê pispor hebe, rind dizane ku ev kar di warê hemû jiyanê de zehf pêwîst e. Bela vê yekê jî, mirov bi hêsanî dikare bibêje ku mirovê zanyar bi alîkariya mefhûmên abstrak dirame, ango kar û barê xwe yên zanyarı birêve dibe. Li himberî vê yekê, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku mirovê hunermend bi alîkariya îmajan dirame, ango kar û barê xwe yên bi reng hunerî birêve dibe. Ji xwe, ev cudabûna herî serekî ye di navbera birêvebirina kar û barê hunerî û yê bi reng zanistî de. Baş e, mirov dikare pirs bike: Ma gelo îmaj ci ne? Ci cudabûn di navbera îmaj û mefhûmên abstrak de he-ne?

Mîna ku tê zanîn, ji bo mirovê filozof "îmaj" ew e ku jiyanâ civakî ya bi reng dîrokî bi awayekî ji awayan di bîreweriya mirovî de bê aks kirin, ango rastiya civakî di şiklê diyardeyan de di bîreweriya mirovî de bê aks kirin. Beguman, hingî mirov dikare vê akskirina diyardeyan mîna îmajan bi nav bike. Bi ya mirovê filozof têgi-hıştina diyardeyeke bi reng civakî ji aliye bireweriya mirovî ve û di hemû demê de

peydebûna tasawûreke konkret ya wê diyardeyê di bîreweriya mirovî de, li gel tasawûrên ku li ser hîs û pêjnan şax û per didin, mirov dikare bi carekê hemûyan mîna îmajan bi nav bike.

Lê, ji bo mirovê hunermend peyve "îmajê" tê wateyeke din. Ji ber vê yekê jî, gava mirovên hunermend bahsa gotina "îmajê" dîkin, ji wê bi tenê akskirina fenomenike jiyana civakî ya ku ji aliyê bîreweriya mirovî ve tê aks kirin, tê nagihijin, lê, di hemû demê de ev fenomenên ku ji aliyê bîreweriya mirovî ve hatiye aks kirin, bi alîkariya hinek aletên bi reng materyalî, mînak bi alîkariya peyv, xêzik, reng û sistemeke işaretan ji nû ve aks kirine.

Ji xwe, ev îmaj jiyana civakî bi diyardeyên wê yên ferdî, ango ya ku ji bo fenomenen rastiya jiyana civakî bi her awayê xwe karekterîstîkî ye, him bi aliyê wan yê ferdî û him jî aliyê wan yê giştî dikare li gel pêywendiyên wan yên bi hev re aks bikin. Bêguman, mirov dikare bi hêsanî xislatên mirovatîyê yên ku wê ji nivşen din bi giyan û can cuda dike di serdemêke dîrokî ya konkret de tasawûr bike. Lê, ci heye ku mirov nikare weha bi hêsanî îmajeke ku, bi tenê tê wateya bi reng mirovî, ango îmajeke ku bi tenê tê wateya mirovekî Çînî an jî mirovekî Hindî heme bibêje ne mumkun e. Heger ku mirov tiştekî weha di kar û barê xwe yên hunerî de bi kar bîne, bivê-nevê dê mirov pirsgirêkê şematîze bike. Lewra, îmaja bi reng mirovî di warê hunerî de ancax bi alîkariya fenomenike ferdî ya bi reng mirovî di nav serdemêke konkret de li gel hemû aliyên wê mirov dikare destnişan bike.

Ji aliyê din ve jî, divê baş bê zanîn, di bingehê xwe de kar û barê edebî çalekiyeke bi reng civakî ye. Ji ber vê yekê jî, edebiyat û felsefe xwediyê peywendiyên bi reng organîkî ne. Lewra, mijara kar û barê felsefi hemû cure pirsgirêkên ku serçaviyên xwe ji jiyana civakî digitin, bi xwe ne. Bê çawa mirovê filozof bi alîkariya çalakiyên xwe yên bi reng civakî hewl didin ku pirsgirêkên jiyanê di çaxekî bi reng dîrokî de şirove bikin, herweha mirovê edebiyatzan jî, bi saya çalakiyên xwe yên bi reng edebî hewl didin, ku jiyana netewî li gel hemû pirsgirêkên wê yên cur bi cur li gora hinuk pîvanen estetikî raxînin ber çavêñ xwendevanen xwe.

Ji bîft vê yekê jî, hema bibeje hemû babetên bi reng edebî bi saya zimên, raman û pîvanen bi reng estetikî têne afirandin. Bêguman, ev pîvanen estetikî mirov dikare di formen ji hev cuda bi kar bîne. Ji xwe, gava ku mirov li kar û barê hunerî bi giştî dinere, mirov vê yekê bi hêsanî dibîne. Bê çawa mirovê şâîr bi alîkariya çarînen xwe hewl dide ku rewşa jiyana serdema xwe bi alîkariya pîvanen estetikî zelal bike, herweha mirovê romannîvîser jî, bi alîkariya metnên xwe yên edebî hewl dide ku serdema xwe bi alîkariya ramanen xwe lê bi kirasekî estetikî raxîne ber çavêñ

xwendevanê xwe. Heme bibêje di hemû cure tekstên edebî de ideolojî, felsefe, dîrok û jiyana netewî heye. Ji xwe, mirovê hunermend bi alîkariya van ramanê bi reng felsefi, dîrokî û civakî sempati an ji antîpatiya xwe li pêşberî bûyer, hêz û serpêhatiyê bi reng dîrokî li dar dixe. Bêguman, mirov dikare di vî warî de li ser gelek mînakan raweste, lê bi ya min mînaka herfî berbiçav ya di vî warî de "Mem û zîn" a Ehmedê Xanî ye. Xanî, xwestiye, ku di desetê pêşî de bi alîkariya vê berhema xwe ya bi rûmet pirsgirêkên civata me kurdan ya serdemâ xwe bi alîkariya ramanê xwe yên bi reng welatperwerî, felsefi, dîrokî û tasawûfî li gor normê estetîkî taxîne ber çavan. Bi rastî ji, gava mirov "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî dixwîne, mirov dibîne ku, Ehmedê Xanî bi raman û xeyala xwe ya kûr mirov dibe serdemâ xwe ya ku welatê me Kurdistan tê de jiyaye. Vêca, kî dikare bibêje ku di nav çarînê Ehmedê Xanî de felsefe, tasawûf û welatperwerîyeke bêhampa nîne. Heger, yek ji me li ser navê huner vê yekê bibêje, ewê di desetê pêşî de xwe bixapîne. Lî, bêguman, yên ku xwe di nav me de dixapînin, ne hindik in. Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xwiyakirin, peywendiyê felsefê û yên edebiyatê mîna giyan û can bi hevdu re bi gelek alî rapêçayîne.

Ji aliyê din ve ji, tiştekî pir eşkere heye ku divê mirov li ser kûr mijûl bibe. Pirsgirêka felsefê û pirsgirêka metoda xebatê gelekî ji nêzîk ve bi hevdu re girêdayîye. Lewra, neqandin û nirkandina gelek bûyer û tîpên bi reng civakî di kar û xebata edebî de bi alîkariya metoda xebatê û nerînê felsefi têneqîsandin. Mirovê edebiyatzan, bi alîkariya metoda xebatê û nerînê felsefi hinek raman, dîtin û pîvanê estetîkî dipejirîne. Bê çawa mirov li Kurdistanê di dema bênderan de bi alîkariya metoda dêranê genimê sor jin av qîş, zîwan û kayê diveqetîne, herweha mirovê filozof û yê edebiyatzan ji bi alîkariya metoda xebatê û ramanê bi reng felsefi paqîjiya ramanan pêk tînin.

Ji aliyê din ve ji, divê neyê jîbirkirin, ku yên berhemên edebî diafirînin, mirov bi xwe ne. Bela ku mirov di nav jiyana civakî de mîna endemekî dijî, bivê-nevê mijarîn jiyana civakî ya bi reng dîrokî û çînayetî ji berhemên xwe re dike mijar. Di vî warî de gava mirov li dîroka huner - ci ya kevnar û ci ya nûjen - dimeyzêne, mirov dibîne ku devera ku jiyana civakî lê peyde bûyiye, bêguman, li wê derê ji hilbijartina bi reng edebî ji tê kirin. Herçiqas li vir an ji li wir hinek kes bibêjin em tu carî hilbijartinan nakin ji, lê gava mirov li praktîka wan ya di jiyanê dinêre, mirov dibîne ku ew kes dîsa ji hinek bûyer û tîpan dihilbijêrin. Vêca, mîna ku bi hêsanî ji mirovî re tê xwiyakirin, hilbijartina van bûyer, tîp û ramanê bi reng felsefi bi alîkariya metoda xebatê û hinek pîvanê bi reng estetîkî têneqîsan. Naxwe, mirov

vê yekê weha bi kurtî dikare formule bike; Bê ziman ji bo kar û barê edebî çiqasî pêwistî bi reng jiyanî ye, bêgiftûgo ramanên felsefi jî wilqasî ji bo birêvebirina kar û xebata edebî girîng in. Heger mirovê edebiyatzan bikaribe pêywendiyêñ di navbera ramanên bi reng felsefi û normên estetîki de bi awayekî organîki girê bide, dê hingî bi evîndariya felsefi ya ku zanyariyê ji hev dineqîne, şah bibe.

Di wî warî de, gava mirov li rewşa edebiyata me ya netewî dimeyzêne, mirov bi çavê serê xwe dibîne ku edebiyata me jî hêdî bi hêdi bi saya kar û xebata rewşenbîrên me ber bi başbûnê ve diçe. Lewra, di warê standartkirina wêje û mefhûmên abstrak de - herçiqas mirov nikare edebiyata me bi gelek aliyêñ xwe bi ya netewên din re muqayese bike jî - gavêñ pîroz ï zêrîn têne avêtin. Bi ya min, tişte ku îro ji me tê xwestin, bi ci awayî dibe bile bibe, divê em di vî warî de kar û xebata xwe di warê hemû jiyanê de bêwestan bidomînin, da ku bi alîkariya vê yekê edebiyata me ya îroyîn- mîna ya kevnar- li pêşberî hevçaxêñ xwe stûxwar nemîne. □

XUMAM

Cara çendan bû
Şûv hiştibû dil
Bayê res
Bi wê de nebiribû tu ewrê baranê

Li ser lêvên ricifokî
Hêşiran
Xwe digihandin tskeiskan
Keser
Li çarde bû

Ma kê zanibû
Eş ci qasî kûr e
Ü xunav çawa têñ xwaiê
Gava ku çav
Xwe ewr girêde

Du caran
Qala yek tiştî kiribûn jê re
Bextê wê
û
Yê welatê wê

CEMİL DENLİ

OLOF PALME (3)

MIHEMED DEHSIWAR

Palme hê di xemgîniya diya xwe de bû, pê hisiya ku balafirên amerîkî dîsa Vietnamê bombebaran dikirin. Bi sedan balafirên B-52 yên Amerikayê di 18yê kanûna 1972an de seranserê Vietnamê dabûn ber xwe û dida ber bombeyan. Gelê bajîrên Hanoî, Haiphongê û gelekên din di bin bombeyan de hatibû qirkirin. Ev êrîşen kesnedîtî zêdeyî heftiyekê dom kir. Leşkerê amerîkî ji berê ve van kiryaran pêk dianî, lê vê carê pîrr bi xedarı dicûn ser gund û bajaran û gel bi çekên kîmyevî qır dikirin.

Her çiqas Amerikayê şerê çekdarî wenda kiribû û lihevhatin nêzîk bûbû jî, dîsa dixwast bi vî awayî hêza xwe nişan bide û xofa xwe têxe ser gelên bindest. Tevî ku li Parîsê Henry Kissinger û Le Duc Tho lihev kiribûn daku şer bête sekinandin û leşkerê amerîkî xwe vekişne jî, dîsa bombeyan ji nişka ve dest bi teqandinê kiri-bûn. Amerîka jî dizanibû ku dê rewş neguhire lê bi vî awayî dixwast namûsa (!) xwe xilas bike.

Rojek piştî van êrîşan, wezîrê derive yê swêdî Krister Wickman bi daxwuyaniyekê van êrîşan protesto kir û ji Dewletên Yekbûyî bidawîanîna "şerê kor û metodên şer ên qirkirinê" daxwaz kir.

Palme bi van êrîşan pîrr diêsiya. Tiştên ku li Vietnamê dibûn ji berê ve ew diêşandin, lê vê carê rewş cuda bû. Di odaya xwe de bêsebir dicû dihar û ji der-dora xwe dipirsî bê dikare ci bike. Pişt te wezîfe da sekreterê xwe Anders Ferm ku daxwuyaniyekê jê re amade bike. Evarê piştî kar tevî nivîsa Ferm çû malê û ta şeveqê li ser wê xebat kir. Di dawiyê de daxwiyaniya xwe bi awayekî şîrûkî nivîsand û pêşkêşî medyayê kir:

Divê ku mirov tiştan
bi navê wan ê rast binav bike.
Tiştê ku niha li Vietnamê dibin
şeklekî işkenceyê ye...
Lewra bombekirin qirkirin e

ku dîroka nûjen ji wan tîjî ye.
Ew bi pirranî bi navê
-Guernica, Oradour, Babij Jar,
Katya, Lidice, Shaperville û
Treblinka têñ binavkirin.
Şiddet qêfina serfiraziyê dike.
Lê dadgeha dawî zor daye
ser berpirsiyan.
Niha navekî din jî heye ku
ketiye rêzê - Hanoî, Cejna zayinê 1972.

Ajansa TTyê (Tidningarnas Telegrambyrå) vê daxwuyaniyê bi şeklekî kintir pêşkê-sî medyayê û guhdaran kir. Lê ajansa Reuterê wê li çaraliyê dinyayê bela kir.

Kissinger li Nikson digeriya û jê re wiha digot: "Me bi nazîstan re qiyas dikin!" Lê bersiva Nikson ji yên berê ne cudatir bû: "Ax ji derdê wî qûnekê swêdî!" Kissingerê ku bi eslê xwe yahûdî bû, ji daxwuyaniya Palme fêm kiribû û pê gelek eşiya bû. Ev pişt re di nivîsên wî de jî eşkere dibûn.

Piştî vê xeberê, serokkomarê Amerîkayê û wezareta derva bityar dan ku hem ji hêla aborî û hem jî ji hêla siyasî ve ambargo deynin ser Swêdê. Tevî ku Fransa û Hollanda ne kêmî swêdiyan bûyerê protesto kiribûn jî, ji wan re tu ceza tune bûn.

Aleksis Johnson, wezîrê derve yê nû çend saet piştî bityarê hukûmerta xwe, ji sefirê swêdî ku hazırlıya xwe dikir vegere welêt re "tiştîn ku Palme dibêjin me gelek dişinin" digot. Bersîva sefirê swêdî Hubert de Besche jî wiha bû: "Hûn dibêjin ku daxwuyaniya me we dişîne, lê bawer bikin ku bombeyên we jî me dişînin."

Sefirê amerîkî ku dê biçûna Stockholmê venegeriya Swêdê û yê swêdî jî ku dê biketina dewsa hemwelatiyê xwe, heta demekê "nedihat qebûlkirin."

Palme berî Cejna zayinê ji Nikson re nameyekê rê kir. Di nameya xwe de, wî bi bîra Nikson dianî ku Amerîka di jiyanê de çiqas tesîreke pozitif li ser wî kiribû:

"Ez bi taybetî û baweriyêñ dilpak spasi wan dîtin û hêviyêñ ku demokrasiya Amerîkayê dabû min û li ser min tesîreke mezin kiribû, dikim. Lê bi şerê Viênamê re di hundirê min de eşike giran dest pê kir û ez ji wan baweriyen hêvişkestî kirim. Ya herî girîng jî ciwan ketin rewşike wisa ku hêvi û baweriyêñ wan ên demokrasiyê hatin ber şikestinê."

Li gorî kes û hêzên dewlemend, ev name bi paş ve gavavêtin bû. Lê dîrokzanan vê weke gazincênu ku DYAyê ji bingehêñ tradisyonêñ azadî û idareya qanûnî bidûrketî dînirxandin.

Di 30ê heyvê de bombeyên ku Viênamê û bi taybetî jî Hanoiyê şewitandibûn,

piştî 12 rojan bi dawî hatibûn. Sedemê bidawîanîna vê terora balaşiran jî nebaşbûna hewayê bû. Ji % 15 balafirên amerîkî ji teref vietnamîyan ve hatibûn daxistin. Sede-mekî din jî protestoyêن hundurî û navneteweyî bû, li gora dîtinêن Palme.

Li ser pîrsa ku ci tesîra axaftin û protestoyêن wî di bidawîanîna bombebarankirina Vietnamê de hebû, Palme wiha bersîv dida: "Em nikarin tesîra Swêdê bi xeyalan mezin bikin, lê ji ber parastina mirovantiyê protestokirina me pêwîst bû û ne bêmane bû."

Gava meriv bala xwe didê, eşkere dibe ku ev prensîb di daxuyaniya wî de cîhekî bingehîn girtiye. Çaxê palme pêsgotina nivîsa xwe ya li ser şerê Vietnamê ku di sala 1967an de çap bû, ji bo senatoya Amerîkayê nivîsand, ji Albert Camus hevokekê girtibû: "Tu ruh nikarin kuştiyên bêguneh biparêzin."

Palme di vir de ji kuştiyên şewitî nexweşxaneya Bac Maiyê qesd dikir. Wekî din ji Palme gelek caran ji Camus gotinêن girîng û bimane ku hîssêن wî dianî zimêن, werdigirt.

Salek piştî dawiya şerê Vietnamê, di 1976an de wezîrê derva Henry Kissinger Stockholmê bi awayekî resmî ziyaret dikir. Kissingerê ku ji ber gotarêن Palme eşiyabû û wî gelek rexne dikir, wê rojê pîrr bi kîf bû. Tevî dîtinêن cuda jî Kissinger pesnê Swêdê dida û siyaseta Palme dipesinand. Tevî vê jî Kissinger ji bo başkirina rewşa navbera herdu dewletan, gavekî nû neavêt. Lê piştî vê ziyaretê, di navbera Palme û Kissinger de nêzikahiyek peyda bûbû.

William Fulbright, serokê komîsyona derva ya senatoya Amerîkayê, yek ji wan mirovîn herî dijberê şerê Vietnamê bû. Wî rewşa Amerîkayê ya van salan di pirtûka xwe de wiha dinivîsand:

"Du Amerîka hene: Yek a Linkoln û Adlai Stevenson e, ya din jî ya Teddy Roosevelt û ya superpatriotên modern ên Amerîkayê ye. Ya pêşî merd û humanîst e, ya din çavteng û egoîst e. Yek xwe rexne dike, ya din xwe xwedîyê her selahiyetê dibîne. Yek dilşewat e, ya din ji nava xwe razî ye û daxwaza mezintiyê dike."

Di sala 1979an de cîgirê serokkomar Walter Mondale hatibû Swêdê û di siyaseta Vietnamê de yekemîn car poşmâniya xwe diyar dikir. Amerîkayê yekemîn car bi vî awayî xwe rexne dikir û ev di siyaseta navneteweyî de gavekî gelek girîng bû. Mondela bi kurtayî wiha digot: "Demek berê Swêd û Amerîka di şerê Vietnamê de ne weke hev difikirîn. Lê ez bi dilpakî dixwazîm bêjîm ku hûn rast bûn û em şas bûn."

Her wiha Robert McNamara, wezîrê wê demê yê ewlekariyê û yek ji wan mîmarî şerê Vietnamê bû, di sala 1995an de pirtûkekê bi navê In Retrospect: The Tragedy and Lessons of Vietnam da çapkîrin. McNamara di vê pirtûka ku li Amerîkayê û li dînyayê weke ku bombeyek biteqe de, bi kurtayî wiha dinivîsand: "Em şas

bûn, bêhesab şaş bûn. Wekî din jî şerê Vietnamê gelek zerar da Amerîkayê..."

Palme ne tenê bi name û daxuyaniyan bombekirina Vietnamê protesto kiribû. Li ser daxwaza wî û kesên mîna wî li Swêdê nêzî sê mîlyonan imze berhev kiribûn û nerazibûna xwe diyar kiribûn. Ev rewş û propogandaya li dijî şer, bû yek ji wan bernameyên sosyaldemokratan ên hilbijartinê. Berî hilbijartinê 1973an Palme û partiya wî bi bernameyeke giran xwe amade dikirin. Her wiha reformên girîng ên weke sîgortaya betaliyê, ya diranan, a dêûbavan û nemaze ya nexweşiyê bernameya wan dewlemendit kiribûn.

Di 26ê tîrmeha 1973an de bala hemwelatiyên xwe bi ser partiyên burjuvayan ve dikişand. Hêza aborî di destê wan de bû û pirraniya medyayê jî di bin hukmê wan de kar dikir. Ger wan hukmê siyasi jî bixista destê xwe digot Palme, dê balansa civakê ber bi xerabiyê ve biçûya û karker jî bêînsiyatîf bimana.

Ji aliyê din ve partiyên rastemalî li dijî Palme û sosyaldemokratan propagandeyeke dijwar dimeşandin. Li gorî moderatan û serokê wan Gösta Bohman ger Palme dîsa qezenc bikira, dê gelek meriv ji welêt bireviyana. Lewma jî ev hilbijartin gelek girîng bû û belkî jî ya azad a dawî bû, li gorî wan. Bohman wiha digot: "Tu welat tune ye ku tê de sosyalizmê û demokrasiyê li hev kiribin." Palme jî bersîva wî wiha dida: "Welatê ku em tê de dijîn xweş e, lê em dikarin wê hê bêtir xweş bikin."

Hilbijartinê 1973an ji Palme û partiya wî re baş neçûn. Partiyên sosyalist 175 û yên burjuvayan jî 175 kursî kar kirin. Tevî vê jî dîsa sosyaldemokratan hukûmetê damezrandin. Gava di biryareñ meclîsê de li ser tiştekî li hev nedikirin, çîtik dikişandin. Lê Palme mirovekî dîplomat bû, dikaribû di gelek rewşan de, bi gelek kesan re kompromîs bike û karê xwe bimeşîne.

Heta niha Palme ji bilî çend kesan bi hukûmeta Erlander wezîfe dimeşand. Wî dixwast êdî hukûmeta xwe nû bike û li gora dilê xwe endamên hukûmetê bineqîne, nivş û hêzên xurt wezîfedar bike. Lewra jî Palme di hukûmeta nû de cî da gelek navêñ nû.

Di vê demê de bala Palme çû ser du bûyerên nû yên navneteweyî. Yek jê cuntaya leşkerî li Şîleyê hatibû ser hukûm û Allendeyê sosyalist ku bi rayên gel hatibû ser hukûm, pêşî xistibû zîndanê û pişt re jî xeniqandibû. Di vê pêvajoyê de bi dehhezaran kas hatibûn girtin, bi hezaran hatibûn kuştin û gelekan jî xwe ji welat dabûn alî. Vê rewşê li ser Palme tesîreke mezin kiribû û ew gelek eşandibû. Palme dê li hember vê jî bêdeng nemana û cuntaya leşkerî û Pînoşet bi her awayî protesto biki-ra. Her wiha bi hezaran penaberên siyasiyên şîleyî xwe avêtibûn Swêdê û li vir bicî bûbûn.

Bûyera din jî şerê di navbera Misir û Îsrâîlê de bû. Ev şer ji hêla aborî ve tesîreke mezin li ser dinyayê dikir û Swêdê jî ji vê bêpar nedîma. Bihayê nefte wisa bilind

bûbû ku aboriya dinyayê xistibû krizeke mezin.

Bûyereke din jî ku rewşa Palme nexwêş kir, ji teref polis ve girtina rojnamevanen çep Jan Gullio û Peter Bratt bû. Herdu rojnamevan ji ber sedemê ku hinek kiryarêñ leşkerê parastinê eşkere kiribûn, hatibûn girtin. Kovara FiBê (Folket i Bild) bi navê herdu nivîskaran nivîsandibû ku FRAyê (Försvarets Radioanstalt) kodên hinek sefirêñ biyanî li Stockholmê (japonî, çekî, brazîlî û turk) wergirtibûn û axfânen wan guhdarî dikirin. Li ser vê polisên SÄPOyê herê şeveqê herduyan ji malên wan û çend kesan jî ji redaksiyona kovarê girtibûn û xistibûn hepsê.

Tevî ku pêwendiyêñ Amerîkayê û Swêdê jî hêla siyasi ve pirr xerab bûn jî, di warê parastin û danûstandina ıinformasyonê de, di teknolojiya parastin a leşkerî de her weke berê dîmeşıya. Ev rewşa dawî jî dida nîşandan ku polisên parastinê çiqas bi yên rojavayê ve girêdayî bûn. Palme ji vê rewşê gelek aciz bûbû lê nedixwest ji ber sedemek wiha rewşa navbera Swêdê û Amerîkayê xerabtir bibe.

Her wiha Parastina Leşkerî (IB) jî bi salan kesen çep û komunîst bi dizî guhdarî kiribûn û pirraniya wan xistibûn dosyayên xwe. Gelek ji wan di bin çavan de bûn û gelek cihêñ kar ên dewletê ji wan re qedexe bûn.

Dadgehê herdu rojnamevanan û karmendekî IByê ne li gora qanûnên azadiya çapemenî, lê li gora ajaniyê ceza kiribûn; li gora vê paragrafê her yekê salekê ceza dabûn wan.

Palme ji vê bûyerê nerihet bû. Wî nedixwast ku ev bûyer eşkere bibe lê nedixwast ji bo herdu rojnamevanan rexneyên giran ku ji her hêlê ve dihatin, bibihîze. Çaxê iddiyayê ku Palme piştgiriya polis û kiryarêñ leşkerê parastinê dike zêde bûn, Palme eşkere diyar kir ku tu haya wî ne ji guhdarîkirina avahiyên sefran û ne jî ji girtina rojnamevanan heye. Çerxa huquqî bi serê xwe bû û di biryarêñ xwe de azad bû, digot Palme.

Li gorî hinek iddiyayen SAPO (Spionaja Partiya Sosyaldemokratan) di navbera şerê sar de, di salên 1950an de bi IByê re alîkarî kiribû. Ev alîkarî li karxaneyan, ji tesbîtkirina mirov û rêxistinêñ çep pêk dihat. Li gorî dihat gotin ev xebat û hêz di sala 1969an de bidawî hatibû û niha tiştekî wiha nemabû. Herçî Palme û meclîsê biryar dan ku ev bûyer û rewşa IByê ji teref komîsyonekê ve bête lêkolînkirin jî, rexneyên nivîskar, rojnamevan, hunermend, mamoste û ji çaraliyên civakê kêm nebûn.

Li gorî hinekan vê bûyerê dida xuyakirin ku Palme jî mirovekî siyasetvan bû û ji yên din ne zêde cuda bû. Li gora van kesan îdealîzm û gotinêñ humanîstî ku Palme bi her wesîleyê bikar dianî, êdî têr nedikir.

Not: Ev nivîs hê xelas nebûye, wê di rojîn pêş de mîna kitêb derkeve

MA DIBÊJIN MİRÎ

EDİP CANSEVER

Jî bo Apê min Brûsk / Abidin

Ma niha ji wan re dibêjin mirî
Sekiniye dilê wan ji zû de
Ma niha ji wan re dibêjin mirî
Nalîvin bîbikên wan
Erê ma dibêjin mirî¹
Li lîmanên herî mezin lenger avêtibûn
Wek keştiyên herî mezin
Nalîvin bîbikên wan
Mma niha ji wan re dibêjin mirî.

Ruyê wan şidiyayî
Ruyê wan bi biryar
Diyar e zêde li bende wê sibeha
Wek pirtûqaleke ku ji qalikê xwe
derkeribe û hatibe mane

Ruyê wan şidiyayî
Ruyê wan dişibe meydaneko ser
Lêvîn wan bi rewâ
Cara dawî goşte xwe maçî kirin
Yanî cara dawî bi rasî goşte mirov
Wisa bi xweşî hatibûn girtin
Sañî di laşê wan re derbas nabe
Germî ji derbas nabe
Ü çimên wan mîna du çemên ji hev
Dihirîkin bêdawiyê
Ma niha ji wan re dibêjin mirî.

Bila kes xemgîn nebe
Hîn ne dora xemgîniyê ye
Rojekê li meydana bajarekî
Li çavê loda mermereki
Ger pelê çinarê bikeve ser milan
Bila wê demê ên din ji xemgîn bibin
Hîn ne dora xemgîniyê ye.


Ewçend şidandî ne kulmên wan
Bila baştır bisidin kulmên wan
Loma vesartîn ev hişkiya wek diyariyê
Ewçend şidandî ne kulmên wan
Bila kes xemgîn nebe
Ji bo kes xemgîn nebe
Hîn ne dora xemgîniyê ye

Bila bê jibîkirin hesreta daxwaza laşekî
Bila bê jibîkirin ev xwestekên adetî
Evqas sade, evqas bi geremol e ku
Hêjâyî jibîkirinê ye laşê wan mirovan
Ü divê ji bir bibe
Ji bo tiji dilan bibin
Tiji rehan bibin


Ma dibêjin mirî²
Ma niha ji wan re dibêjin mirî

Wergera ji tirkî: ABIDİN

Jİ SERHAD BAPİR ÇEND GIRAFİKÊN NÜ



MÜSA ANTER, 1997, 30,5X22,5 CM



CEGERXWIN, 1997, 30X23 CM



İSMAİL BEŞİKÇİ, 1997, 30,5X23 CM

SÎWAN

GUY de MAUPASSANT

Xanim Oreille gelekî çikûs û heyâ bi bîhayê tiştê piçûk jî hayîdar bû; di xerckirin û komkirina pereyan de xwediye gelek prensibên hişk bû. Keçika xizmetkar ya ku li mala xanimê kar dikir, bi dijwarî xerc û pereyên mesrefê li hev derdixistin. Heçî mîrê xanimê bû bi hezar qeda û belayê ji jina xwe pereyên bêrikê bi dest dixist. Ji hêla aborî de rewşa malbatê gelekî baş û çu zaroyên wan jî tune bûn. Lê xanim Oreille, destê wê tije garis ba, te tifing berda libek jê nediket. Her cara ku ew mecbûrê, çiqas pêwist ba jî, mesrefekê giran bibaya, wê şevê xewa wê direviya.

Mîrza Oreille hertim ji bo jina xwe tekîr dikir:

– Tu bi rehetî dikarî hinekî din destvekîrî bî. Em ne li ber iflasê ne.

Xanimê:


– Mirov qet nizane ka dê sibeyê çi biqewime; hebûna pir ji ya hindik çêtir e.

Ew jineke hûr û cil salî, jîndar, rû qermîçî û bi rîkûpêk bû û pir zû aciz dibû.

Ji ber ku jina wî ew neçarê kêmixeriyê dihîst, wî hertim gazind dikir. Û hin caran gelekî li ber xwe diket, ji lewre xurûra wî dihate şikandin.

Li dâfreya wezareta şer wek mudirê buro kar dikir; di wî karî de tenê ji bo xatirê ji na xwe mabû; ji lewre wê dixwest, heta mimkin be, mîrê wê xwediye meaşekî herî baş be.

Ev du sal bûn ku ew bi eynî sîwana pînekirî diçû karê xwe, welê lê har ku sîwan bû sebebê zimandirêjiya hevalên wî, yên kar. Ji ber liberxweketina henekpêkirina wan, wî jina xwe îkna kir ku jê re sîwaneke nuh bikire. Wê çû sîwanek -li mexazeyeke mezin ji bo reklamê dihate firotin- kirî. Gava hevalên wî, ew sîwana ku jê bi hezaran li Parisê hatibûn firotin, dîr; henekên wan cardin dest pê kir. Sîwan gelekî bêqalîte bû.



Di sê mehan de ji hev ket ku nema dihat bikaranîn û ev ji bû sebebê kure-pistê li temamê daîtreya şer. Stranek li hev anîbûn û sibe heta êvarê geh li jér geh li jor li hemî qatan ew stran dinuhurandin.

Şasbûyî û jixweçûyî wî doz li jina xwe kir ku jê re sîwanekê nuh ji hevrîsim bi bîhayê zo frankan û ji bo garantî tevî mekbûzê bikire.

Wê çû sîwanek bi hejdeh frankan kirî û ji hêrsan sorbûyî ji mêtê xwe re got:

– Bi kêmâsi divê tu pênc salan vê sîwanê bi kar bînî.

Oreille bi serbilindî çû karê xwe û bi rastî ji serkerî bû.

Gava êvarê hat malê, jina wî bi şik awirek da sîwanê û got:

– Divê te sîwana xwe

bi lastîkî ewqas neşidanda; bi vî awayî hevrîsim diqete, ji hev diçe. Divê tu baş lê bifîkirî, ji lewre heta demeke dirêj ez nema tiştekî nuh dikirim.

Wê sîwan ji destê wî girt, lastîkê wê sist kir û sîwan ji hev vekir. Welê li piyan mit û mat ma. Quleke girover, bi qasî bîşkojekê, di sîwanê de xuya dibû. Ji ber cixareyê wişa bû bû.

Zimanê wê li hev digeriya:

– Çi... ew ci ye?

Mêrê wê bi awayekî sakın bersiv da, bêî ku li hêla wê binêre.

– Xêr e? Tu behsa ci diki?

Xanimê ji hêrsbûnê bi dijwarî nefes digirt û berdida, bi zehmetî dipeyavî.

– Te... te... te sîwana xwe şewitandiye! Ma te... ma te.... aqilê xwe winda kiriye? Ma tu difikirî ku mala me xira bikî?

Wî berê xwe zivirand û hîs dikir ku çawa spîçolkî dibû.

– Tu ci dibêjî?

– Ez dibêjim te sîwana xwe şewitandiye, qulek lê ye! Mêze bike!

Bi bayê bazdanê ber bi wî çû mîna ku difikirî li wî bide; ji xwe çûyî bi hîdet sîwana qulkirî da ber çavên wî.

Mit û mat mayî li sîwanî mêze kir û ji xwe ne bawer bû miz-miza wî.

– Ew... ew... erê ew ci ye? Ez nizanim... Min tiştek nekiriye, sond dixwim... çu hayî û gumana min jê nîne ka ci bi sîwanê hatiye!

Ew bi ser wî de qêriya.

– Ez dikarim bi şert bigirim ku te li daireyê dînitîne kirine, ji bo xwe nîşandanê te qureti û qesmerî kiriye!

Wî got:

Bi tenê carekê ji bo ku nîşan bidim çiqasî xweşik e, min sîwan vekir. Ewqas. Ez sond dixwim...

Ji hêrsê piyên xwe li erdê dixist; wê tofanek welê li malê rakir ku mirov xweziya xwe bi gulebarana qada şer dianî.

Pâşê, xanim rûnişt da ku ji sîwana hevrîsimî ya kevin ku rengê wê cida bû zuhêlekê jê bike û ya nuh pîne bike. Serê sibeyê bi awayekî mutewazî ew tişte pînekirî li ser piyê wî çû karê xwe. Wî, ew li dolaba cilan danî û nema lê fikirî.

Lê êvarê ji derî bi ketina hundir ve, jina wî dest avêt sîwanê, ew vekir da ku bibîne, lê ci bibîne; li pêş afetek bêçare di nav dehşetê de sar ma. Sîwan, mîna seradekê, quqlî bû; eşkere bû ku bi cixareyê hatibû şewitandin. Te digot qey qelûnek tije û pêxistî bi ser sîwanê de rijandine. Sîwan nema bi kêt dihat.

Wê miderekê li sîwanê mêze kir bêî ku tiştekî bêje, ji lewre pir qeherîbû û nedikarî gotinkekî jî bêje. Mêrê wê ji li xisarê difikirî; mit û mat mayî.

Pâşê li hev mêze kirin. Çavên wî li hember awirêن jina wî şikestin. Piştre, wê sîwan ber bi serçavê wî avêt. Bi şêweyekî xurt û bi dengekî bilind û jihêrsbûnê hêzgirtî bi ser wî de qêriya:

– Ey xebîs, ey xebîs! Te bi zanebûn wisa kiriye! Lê tu dê ceza xwe bibinî! Tu hew...

Xircirê ji nû ve dest pê kir. Pişti êriş û gotinan bi saetekê, fersendek ji wî re çê bû da ku ew karibe izahetekê bide. Wî sond xwar ku hayê wî ji tiştekî tune; heye tune mizir an hesûdekî ji bo tolhildanê wisa kiriye.

Dengê lêdana derî ew ji izahetên zêde rizgar kir. Yê ku hat dostekî malbatê bû ku ji bo bi hev re şivê bixwin hatibû.

Xanim Oreilleyê bûyer ji mêtven re got. Herçî kirîna sîwanekê nû, ne mimkin bû; mêtî wê nema yeke nuh bi dest dixist.

Mêvan îtîraz kir:

– Lî belê xanim, wê gavê dê cilê mêtî te telef bibin; ku ji sîwanê geleki bihatir in.

Jina hûrik bersîv da; hîn jî bi hêrs bû:

– Wê gavê bila sîwana mitbaxê bi kar bîne. Ji lewre ez yeke nuh ji hevrîsim jê re na-kirim.

Bi vê fîkrê re mîrza Oreille nerazibûna xwe eşkere kir.

– Madem welê ye, ez dê ji kar ıstîfa bikim! Ne mimkin e ku ez bi sîwana metbaxê herim daireya kar!

Mêvanê wan pêşniyar kir:

– Mirov dikare rûyê sîwanê biguhere; ez ne bawer im ku zêde biha be.

Xanim Oreilleyê bi zimanekê giran û şasbûyî:

– Ji... ji bo guhertina rûyê wê bi kîmasî heş frank dê lê biçe. Heş frank lêkom hej-deh dike bîst û şes! Bîst û şes frank ji bo sîwanekê, ne karê aqilan e, dînîti ye!

Dostê wan yê ku bajariyekî feqîr bû, weha got:

– Madem wisa ye bila şîrketa sigortayê xisarê bide! Ew tezmînata tişten şewitî di-din, bi şerrê ku xisar li malê çêbûbe.

Vê şîretê, xanîma hûr sakîn kir. Pişti deqîqeyekê lêfikirînê, ji mêtî xwe re got:

– Sibe serê sibê gava tu biçî kar, rîya xwe li şîrketa sigortayê bixe, vê sîwanê nîşanê wan bide û dawa tezmînatê bike.

Mîrza Oreille îtîraz kir:

– Qet ne mimkin e, ez cesaret nakim herim! Wan hejdeh frankan ji bîr bike we selam. Herhal ji ber vê yekê em namirin.

Roja dinê bi gopalekî xweşik çû kar. Ji siûda wî re dunya xweş bû.

Li malê, bi tena serê xwe, ji ber xisara hejdeh frankan, Xanim Oreille, aciz dibû, sebra wê nedihat. Siwan li eywanê, li ser maseya xwarinê danibû; li dora maseyê digeriya bêtî ku karibe biryarekê bide.

Fikira şîrketa sigortayê ew bêhizûr dikir; lê wê bi xwe jî cesaret ne dikir, ku xwe li kêmnenînê karmendêن şîrketê bigire. Bi rastî, ew yeke şermoke bû, bêtî sedem rûsor

dibû û gava ji mecbûriyetê bi kesên nenas re biþeyîviya şas dibû.

Lê kula wan hejdeh frankan, mîna êşa birîneke vekirî, ew diêsand. Êdî nedixwest bifikire, lê bîranîna xisara hejdeh frankan bêwestan ew diêsand. Ma divê ci bike? Saet bihurîn. Nedikarî bîryarê bide. Ji nişkê ve çawa ku yên tîrsonek bi curet dîbin, wê bîryara xwe da.

– Ez dê herim wê derê. Ka em mîze bikin ci dibe!

Ji bo ku karibe bi awayekî serbest bazara xwe bi şirketê re bike, ewîl xisara li sîwanê mezin kir. Kibrîtek ji kîleka oçaxê hilda û heryek bi qasî kefa destekî di navbera şîşen sîwanê de gelek qu! çêkirin. Paşê bi diqet sîwan li hev pêça û lastîk lê şîdand; şala xwe avêt ser milên xwe û bi lez berê xwe da şîrketa sigortayê, li rue de Rîvolî.

Lê bi nêzîkbûna şîrketê re, lezbûna gavêن wê sist dibûn. Dê ci bigota? Wan dê ci bersîv bida?

Li numareya xêni mîze kir hîn bîst û heşt avahî li pêşıya avahiya şîrketê bûn. Pir baş e, wê gavê dikarî bifikire. Hêditir, hêditir diçû. Ji nişkê ve li xwe varqîlî. Deriyê avahiyê û navê şîrketê ku bi herfîn zêrîn û dibiriqîn li pêş çavêن wê bû: şîrketa Sigortayê Maternelle. Ci zû! Mideteke kurt rawestiya, paşê ji avahiyê bihuri, vege riya, paşê cardin di ber re derbas bû; û ji nû ve vege riya.

Li dawiyê xwe bi xwe got:

– Çawa be ez mecbûr im herim hundir; çiqas zûtir be ewqas çêtir e.

Lê bi ketina hundirê avahiyê re bû kulpekulpa dilê wê.

Har eywaneke mezin ku li çar aliyêن wê li dîwaran şibakêن piçûk hebûn. Û li her şibakekê mirovekî ku serî tenê xuya bû, hebû.

Mirovekî ku hin kaxez di destê wî de bûn; nêzîkê wê bû. Xanim sekînî û bi dengekî şermoke jê pîrsî:

– Li min bibore, gelo li kû derê mirov dikare ji bo tiştêن ji şewatê xisardîti, miraca-ata tazmînatê bike?

Wî mirovî bi şêweyekî xurt û awazxweş bersîv da:

– Qatekî jor li milê çepê, beşê xisartanzîmkirinê.

Vê gotinê yekcar tîrs xiste dilê wê. Dil dikir ku bireve di rîya xwe de here, qet tiştêkî jî nebêje, wan hejdeh frankan feda bike. Lê hizira wan pereyan cardin piçekî cesa-ret da wê, di derencyê re çû jor, lê welê bêhn lê çikiyabû ku, di her gavekê de radi-westiya û bêhna xwe dida.

Gava ku gihaşt qata ewil deriyek dît. Li derî xist; dengekî bilind û zelal bersîv da.

– Fermo werin hundir!

Wê derî vekir û ket hundirê odeyeke mezin ku sê zilam lê, li piyan bi rûyeke cidî bi

hev re dipeyîvîn.

Yekî ji wan pîrsî:

– Xanim, fermo daxwaza te?

Çu gotin nehatin bîra wê, lalbûyî:

– Ez... ez ji bo... xisareke şewatê hatime.

Bi şêweyekî nazikane sandalyeyek nîşanê wê da û got:

– Fermo rûne. Bi izina te, tenê çend deqîqeyên din...

Piştire berê xwe da wan herdu zilaman û sohbera xwe domand.

– Geliş began, şîrket difikire ku zêdeyê çarsed hezaran xwe nexistiye bin bar. Ji lewre çi mixabin ku, daxwaza we ya sed hezarê din nikare qebûl bike. Qîmet jî nîşan dide...

Yekî ji wan mirovan gotina wî birî:

– Baş e, bila dadgeh biryarê bide. Tiştekî ku em karibin lê zêde bikin tune.

Bi şêweyekî nazik û rîzgirtî ji odayê derketin cûn.

Ax, heke ew jî kariba bi yên din re biçûya! Ji dil û can wê dê welê bikira, dev ji her tişti berda û bireviya! Lê çi mixabin nedikarî. Ew zilamê nazik ber bi wê ve hat û serê xwe xwar kir:

– Fermo xanim, ez dikarim di xizmeta te de bim?

Bi dijwarî got:

– Ez ji bo vê yekê... hatime.

Mudirê daîreyê ecêbmayî li tiştê ku wê dirêjî wî kir mîze kir. Wê bi desten xwe yên lerzokî hewil dida ku sîwanê ji hev veke; piştî cefayeke dijwar sîwana xisardîti ji hev vekir.

Mudir bi şefqet got:

– Belê, xuyaye ku pir xisar dîtiye.

Piştî lehzeyeke bi teredut wê got:

– Li ser min bi bîst frankan bûye mal.

Mudir ecêbmayî dixuya.

– Nebêje. Rastî. Ewqas pir.

– Belê, sîwanekê mikemel bû. Min xwest bi tenê xisarê nîşan bidim.

– Belê belê, ez dibînim. Lê... bi rastî tênagehîjim, gelo çi pêwendîya min bi vê heye?

Bêhizûrî bi wê girt. Xwe bi xwe fikirî, heke şîrket ji bo xisarên weha tazmînatê nedel? Got:

– Wek tu dibînî şewitiye!

Wî inkar nekir:

- Rast e, ez ji dibînim.
 - Devjihevçûyî nedizanî ci bêje. Ji nişkê ve hat bîra wê ku divê ci bogota û bi lez:
 - Navê min xanim Oreille ye. Sigortaya min û mêtê min li şirketa La Maternelle heye. Ez hatime vir da ku tazmînatê ji bo vê zirarê werbigrim.
- Ji tîrsa ku tazmînat bête redkirin bi lez axaftina xwe domand:
- Ji bili nûkirina rûyê sîwanê tiştikî din naxwazim.
 - Pir ecêbmayî, mudir weha bersiv da:
 - Lâ... Xanima delal, em ne sîwançêker in. Ne mimkin e ku em karekî weha bikin.
 - Xanima hûr xwe bi hêz his dikir û baweriya wê bi wê xurt dibû. Divê têbikoşa. Dê bi mêtixasî têbikoşa. Nema ditirsîya. Domand:
 - Ez bi tenê mesrefa ku lê biçe dixwazim. Karê tamîratê ez dê bi xwe bikim.
 - Mudir nedizanî ci bêje, şermezar dixuya.
 - Bi rastî ji pereyekî piçûk û hêja ye, xanim. Lê ci mixabin tu car naqewime ku ji bo xisarek weha mirov tazmînatê dixwaze. Em nikarin, tu bi xwe ji têdigihî, tazmînatê bidin ji bo destmal, lepik, melkis, pêlavêن kevin, ûhwd. ku herroj dîbin qurbana agir û pêti.
- Rûyê wê sor bû; û hîs dikir ku kela hêrsbûnê ji nû ve lê radibû.
- Beg, par di meha kanûnê de, ji ber kuçikê me şewat li malê çêbû, bi kêmâsi em pêncsed frank xesirîn û mêtê min doza yek qiruşî ji li we nekir. Vêca ma ne heq e ku şirket zirara sîwana min bide?
- Mudir dizanî ku derewa dike, bişîrî û got:
- Divê tu qebûl bikî ku gelekî ecêb e; mîrza Oreille çu tazmînat nexwest, gava ku bi bîhayê pêncsed frankan zîtar dît, lê niha pênc an şes frankan tazmînat ji bo xisara sîwanê dixwaze?
- Xanim ji ya xwe daneket:
- Li min bibore, ew pêncsed frank ji kîsê mêtê min çûn, lê ev hejdeh frank ji berîka min, kîsê min xerc bûne; diyar e ku ne eynî tişt e.
- Mudir fam kir ku roja wî li ber têkçûnê ye û ew nikare xwe ji jinikê xilas bike. Teslimbûyî pîrsî:
- Gelo tu dikarî bêjî ka qeza çawa çêbû?
 - Belê, li malê... li çardaxê cihê ji bo sîwan û gopalan heye, tu dizanî. Gava çend roj berê ez hatim malê, min sîwan li wê derê danî. Li ser cihê sîwanan refikeke piçûk ku ez find û kibrîtan dañînim heye. Min destê xwe dirêjî kibrîtan kir û çar heb jê hildan. Yê yekê pêneker; yê dido û sisêyan ji pêneketin.
- Mudir bi henek got:

– İhtîmala mezin kibrîten dewletê bûn?

Wê tinazê wî fêm nekir, domand:

– Mimkin e welê be. Werhasil min yê çaran hilda û find pêxist. Paşê ez çâm odaya razanê da ku rakevim. Lê piştî çarîkekê bêhna şewatê hat. Ez ji agir û pêtiyê gelekî ditîrsim, panîk bi min digire! Belê, heke li mala me şewat çêbe herhal kes nikare min súcdar bike! Dehşet bi min digire, bi taybetî piştî wê bûyera kuçikê ku min hinek berê behs kir. Ez tavil rabûm, li her derê geriyam, mîna segekî ez li pey bêhnê bûm. Li dawiyî min fêm kir ku ji sîwanê tê! İhtîmala mezin kibrîtek ketibû nav sîwanê û dişewitand... Belê, vaye tu bi xwe ji dibînî ci bi serê sîwanê hatiye!

Mudir bi temannî teslîm bûbû. Pirsî:

– Bi ya te bi çiqasî zirar çêbûye?

Lehzeyekê bêdeng ma, cesaret nedikir hejmarekê bêje. Paşê bi carekê ve bi destfirehî weha got:

– Şîrketa sîgortayê dikare tamîr bike. Hûn bi xwe biryara zirarê bidin.

Wî ev pêşniyar red kir û got:

– Nêxîr xanim, em nikarin welê bikin. Tu ya xwe bêje, tu çiqas tazmînat dixwazî?

– Ez... ez nizanim... ez naxwazim tiştekî zêde qezenc bikim... Lê gelo mimkin e em tiştekî weha bikin, ez dê sîwanê bibim dikanekê, bila rûyê wê biguherin, bi hevrîsimê baş, paşê ez meqbûzê tînim vir. Ma ne mimkin e?

– Belê, belê dibe. Pir baş e. Em wek tu dibêjî bikin. Vê kaxezê li kaseyê dayne ew dê mesrefê bidin.

Wî qertek dirêjî wê kir, xanim Oreilleyê spas kir, tavil rabû ser xwe ji odayê bi derket, ditîrsiya ku mudir poşman bibe.

Bi gavên sivik li kolanê meşîya, çav li dikanekî sîwanan, yeke luks digerand. Gava dikanekî biha û luks dixuya, dît, çû hundir û bi xwe bawer got:

– Sîwanekî min heye, dixwazim rûyê wê, bi hevrîsim, bête guhertin. Divê hevrîsimê pir baş be. Ji yê herî hêja hilde. Bihayê wê qet ne fikire, bi ci dibe mal bila bibe. □

Wergera ji swêdî: SERDAR ROŞAN

Guy de Maupassant (1850-1893) nivîskarekî bi nav û deng i frensiye. Li dora sêsed çîrok û şes romanên wî hene. Yek ji romanên wî *Bel Ami* ye. Ev çîroka Maupassant ji swêdî, *En Novel Samling*, hatiye wergerandin.

ŞIROVEYA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ (2)

MELE EHMEDÊ ZİVİNGÎ / ji erebî: EMİN NAROZÎ

Îsmê te ye Mektûb-i di dîwanê qîdem da
'Herfek, qelemî 'ilmê bi teqwîmê reqem da

Encama maneyê: Ey Muhammed navê te ye ku di dîwana kevnare [lew'h el-me'h fûzê] de nivisandi ye. Xameya zaniyariya wî [Xwedê] yê pak bi delaltrîn û qenctrîn reqaf-tin û rîzkirinê herfek nivisandiye ku ew jî ew nav e; ji xwe pişî wî cîhan hemî ji nûra wî [navî] hatiye afirandin.

Eşkal û xetên daîreyê nuqteê 'ilm in
Ev neqş û mîsalên di xeyalatê 'edem da

Encama maneyê: Ev nexş û nimûş û xetên ku di xeyalêne nebûnê de hene û ji wan he-bûnêner gerdûnî yê alema jorî û xwarî pêk hatine, tev ji şekl û xetên wê dorchixêza xala (nuqteya) zaniyariya Xwedayı ya kevnare peyda bûne; lewra ew li gor zanîna Xwedê ya herhebûyî (ezeli) hatiye holê. {Mebest ji alema jorî alema manewî, yanî ya semawî ye ku stêr, stêrên geroke, (gerdiş, pergar), çerxa felekê û melaiketên ber wan in û mebest ji alema jorî ji alema maddî ya ser ruyê erdê ye ku em dibînin - Narozi}.

Mîm metle'ê şemsa e'hed ayînesîfet kir
Lami' ji Ereb berqê li fexxarê Ecem da

Encama maneyê: Pêxemberiya Muhemed - mehrîvanî û aştiya xwedê lê be - bû ci-hê avêtina roja yekîti û wehdaniyeta (tenhabûna) Xwedê. Ew ji bo kesen ku Xwedê xwest bênen ser riya rast weke neynikeke zelal û bi rohnî diyar bû, wan jî erê kir û iman pê anîn. Ew nûra muhemmedî ku li nav diyarê Ereban şewq vedaye, tûrêjên xwe avêtine nav wan welatên Eceman yên ku diwarên avahiyêwan bi acûran lêkirî ne. Çawa ku hatiye gotin dema çebûna wî [Muhemed] aşti lê be, tûrêjên nûra wî avêtine qesren Busrayê ku bajarek ji yên erdê Şamê bûye û hingê di destê Bizansiyen de bû ye.

Da şahidê esma' bi hemî wechî binasin
Yek mestê Semed kir bi yekî neqşê senem da

Encama maneyê: Bê guman Xwedayê pak, bi afirandiyênen (mexlûqatê) xwe re dan û sitandinên curbicur kir da ku em [afirandiyênen wî] wan nav û xesiyetnavênen wî yên ku li gor daxwaziya wî hukum li gerdûnê dikan, bibînin û binasin. Ew Xwedayê pak li gor vîna xwe hukum li yekî dike û wî tîne ser riya hizkirinê ya rast û bi evîna bêniyaziya xwe serxweş û mest dike, lê yekî din jî şâş dike, wî dixe ser riya çewt û wêneyênen pûtan tîne pêşberê, wan pê delal û şêrîn dike ta ku ew jî wan pûtan diperêse (ji wan re ibadet dike) û ji riya rast averê dibe. Bêşik ji bo afirandinê li nik Xwedê rewş û sedemên cuda û girîng hene.

Yek girtiye zulfê we yekî xalê numâ û
Ayîne bi Îskenderî û camê bi Cem da

Encama maneyê: Dîsa ji şanê diyarkirina (tecelliya) wî Xwedayê pak e ku evîna kakul û zulfîn dildarê daye yekî û wî jî zeft pê girtiye û herweha xalênu ruyê evîndarê jî şanî yekî din daye û wî kiriye dilketiyê wê. Wî neynika fiqzelal a wek dûrebin daye melik Îskender û piyaleya badeyê ya kesnedî jî daye şah Cemşîd. Ew Xwedayê pak, ji bo hin şarezahiyênen (hikmetê) hêja yên ku aqil nagihîje bingehê rastiya wan, dan û sitandinê di şolê beniyênen xwe de dike. Teserufkarê rastî her ewê pak î mezîn û qedîşînas e.

Erwa'hê muqeddes şebê qedran te dixwazîn
Nûra te ye mîsba'h-i di qindîlê 'herem da

Encama maneyê: Canikên pîroz î paqîj di şevênen leylet ul-qedran de divênu ku leqayî te bibin û bênen hizûra te, da ku bi şerefa dîtinâ te payedar bibin Ji xwe nûra te ye ku bûye

rohnî û çira di wan qendilên ku li Mekkeya rûmetibilind daleqandî ne. Ji wê bonê ji dûr û nêzîk ve mirov tev qesta wê dîkin.

Da weqtê lîqayê bi te 'hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da

Encama maneyê: Min dil û canê xwe li cihê nemanê (fenayê) bi selef da û ew tfirot, yanî min dirav pêşin dan û mal bi deyn hişt da weku dawiyê wextê hatina ba te ya ji bo hevdîtinê ez bi te şâ bibim, li cem te jiyanê sermedi bijim û bi xêra te bigihijim cihê mayinê (beqaê) ku meqamê herî bilind e.

Yaqûtî-firoşan di kef elmasî şikestin
Ev sef'heê elmasî ku neqqaşî reqem da

Encama maneyê: Gava wênekêşê pergariya (qudreta) Xwedê ruyê dildarê yê wek el-maseke spî û paqîj bi nexş û nîmûş gerand û bi çav û birûyan, bi dêmên sipehî û yêñ din ediland, hingê kevirên yaqûtî di destêna yaqûtî-firoşan de şikestin û li ber wî ruyê delal î bedew bê rewac man.

Ya reb ji ci rû, leb bi senaya te kuşayem
Sub'haneke len u'hsîye fi şe'nîke 'hemda

Encama maneyê: Ey Xweda ma bi ci rûyî û kîja rê û dirbî ez dikarim devê xwe ji bo rewşa şolêن te vekim; na ez nikarim ci ku cw ji karîna mirovan der e. Bêguman tu pak û parastî yi û hejmartina pesn û wesfîn derbarê rewşa te de zêdeyî qewera min e.

Minnet ji Xudayî ku bi 'ebdê xwe "Melayî"
iksîrê xemê 'îsqê, ne dînar û direm, da

Encama maneyê: Gelek minêkarî û spaskarî ji wî xwedayî re be ku kul û derdêñ wê evîna wek nasûta sıfirkel daye koleyê xwe Melê û ne diravêñ ji zîv û zêr. Yanî evîna Xwedahî kire rizqê wî û pertalêñ vê cîhana gemarî para wî nexist.

Meşşateê 'Husna ezel çengalê zulfan tabî da
Da 'îsqî hilbit pêli pêl, qelbê me bê cellabî da

Encama vê ev e: Çi dema evîn ji tabî û kemînên xwe derket û li ser laşê me bandorî kir hingê bi alîkariya ribatê nêçirkêş dilê me bi ser wê dafikê ve dahf (tam) da ku dildar wî bigre û bike dilê ber destê xwe.

Cellab ji kewê gozel î kedîkitî re tê gotin; ev kewê han di wextê nêçirê de ji rikêba (qefesa, rikêwa) xwe derdikeve diçe serê dareker* nêzî dafan datîne û dibe qebe-qeba wî dixwîne. Gava kewên kovî dengê wî dibihîzin ew jî bersîva wî didin, dixwînin û bi ser ve diçin. Ku ew diçin nêzî kozikan li wit kewekî din jî ku jê re "ribat" tê gotin, di rikêbê de dibînin. Ew di cih de êrîşî ser kewê rikêbê dikin û di nav wan de şerekî hijbirî derdikive. Ger ku ribat jêhatî û xurt be ew kewê kovî diherişi-ne û bi ser dafan ve tam dide, hingê nigê wî li xilpokêñ dafan dieliqe û dikeve wan. Edî ew nikare bifire û nêçîrvan jî diçe wî digire.

Ev li wan çiyayêñ welatêñ me feneke seydê ye ji bo nêçîra kewan ku bi vê helbes-tê Şêx [Melayê Cizîri] bi bal ve işaret kiriye û gotiye: "Bedewkira delaliya bêdestpêk - mebest jê aferînende [Xwedê] ye - wan baqêñ guliyêñ dildarê yên bi ser ruyê wê ve berdayî şeh kirîye û serê wan baqan mîna dafen nêçîrê xilpoq kirîye da ku evîn jî fena ribatê rikêbê yê kemîndayîyê ber kewê kovî, ji kemîna xwe derkeve û dilê me bi ser dafen xwe ve bikişîne û têxe wan ta ku dildar jî were wî bigre. Bes ferqa wan ew e ku evîn bi tenê bê alîkariya ribatî jî ji heqê vê nêçîrê derdikve lê kewê ribat hewceyî alîkarîya ribatekî din yê nêçirkêş e.

Dibe ku peyva "tab" a farîst ji "tafetin" be û bi maneya lefandin û tewandin be; peyva "hilbit" bi maneya heyecan û hilperikîn be; "pêl" bi maneya dem be û ya duduyan ji bo domandinê be yanî dem bi dem, timî; peyva "bê" jî "pê" be yanî bi zulfan; peyva "cellab" jî ji "celb" a erebî be û malika pêşî sedem be ji bo ya duye-mîn.

Li gor vê encama maneyê dibe ev: Bê guman bedewkirê ezelî (bêdestpêk) dildarê edilandiye û serê guliyêñ wê mîna tîpa lam (l:v) a erebî xwarkiriye, kiriye mîna xe-lek û qulpêñ çengelan û berdaye da ku dilê me were heyecanê û evîna me hertim bilihîte û qet sist nebe. Herweha ji bo ku ew bi wê rindiya bêhempa ya wan biskan dilê me bi ser dildarê ve bikişîne ta ku bi evîna wê ve bê girêdan û jê danegere. Heke ne ji xerakirina peyva "celb" ê bi ya "cellab" ê be ev mane xweşîr e û nêzîktirî fehmê ye, lê ev yek jî (xerakirina gotinan) ji bo helbestan rewa ye û zerar nake.

‘Husna ‘hebîb û lutfi yar, avête dil ‘ışqa xedar
Lew selb-i kir jê ıxtiyar, wê ‘husnê ev ıcabî da

Encama maneyê: Delali û nazikiya dildarê evîneke pirr dijwar avête dil ta ku bû sedemê sewsibûn û bengibûna wî û mafê vînê û azadiyê jê sitand. Her ew bedewî ye ku vê rewşê xwestiye û anîye holê, çiku bes bedewî ye ku evînê radike û wê dixe heyecanê.

Min dî seher zulfên di mest hatin sema î‘hram-i best
Çûn secdeya xalê bi qest, lew ‘haciban mî‘hrab-i da

Encama maneyê: Di dema sewgurê de min dît ku ew gulangên ku mîna serxweşan dişewişin û di hejhejin, bi reqs û govend têñ. Wan li pêşberî xalên ruyê yarê dest kemend kir û çûne secdeyê; a ji ber vê yekê ji biruyêñ dildarê xwe jê te kirin wek mîhrab.

Rûh û rewanê min hebîb disa bi telbîsa reqîb
Rencîde kir miskîn xerîb, terka dilê ehbabî da

Encama maneyê: Ev dildarê ku wek rih û canê min e disa bi sedem sizûlî û sesadiyêñ hemberan min rebenê biyanî êşand û dilê min şikand; ji xwe wî dildarî qet li dilên dos-têñ xwe ji ku ez ji yek ji wan bûm, nenihêrt.

Me‘hbûb û reyhan purgulav, kerkir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav, lew saqî ew cullab-i da

Encama maneyê: Gulangên dildarê yên wek reyhanê reş i bîhnxwêş û pirr gulavkirî hinav û cergên min erçiqandin û kirin parî parî; ji xwe ji ber ku jehriya xweşkuj li gula-vê hatibû kirin loma meygêr ji min pê av da ji bo ku min bikuje.

Wan dest û zend û sa‘idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrgiza sîrab-i, da

Encama maneyê: Dest û zend û bazûyêñ dildarê bûn ku araqê yanî evîna rastî, gerandin û dane şex û zahidan ('abidan) bê we ku dilpeynewan. Yani ya ku av da ew bû û ne kesekî din. Her ew çavêñ yarê yên ku mîna nêrgiza têrav bûn ku mestî û serxwşiyê da-bûn çavêñ jinêñ delal i nazenîn; ew çavêñ narîn yên fena nêrgizêñ têrav mestî û sêra xwe ji çavêñ dildarê girtine.

Miskê reşandî ez dibêm, wan nuqteyan hin bûne kêm,
Lê xettê reyhanî li dêm katib ji nû 'îrabî da

Encama maneyê: Ez texmîn û hesab dikim ku ew nuqte û şanikên reş ên ser ruyê gulover ê dildarê misk e lê hatiye reşandn û ew deqandiye. Hinek cih û nuqte ji ruyê evîndarê [bê misk] mane lê ew xeta rihanî yanî ew xala reş i dirêj ya di rû de, katib ew zêr û ziber kiriye û piştî wê reşandinê ji nû ve xetên delal lê kişandine da ku piçek jî ji ruyê yarê ci ji reşandina miskê be û ci ji ji ser û berkirina nivîskarê şıyan û quđretê be, vale û ne lihevhatî nemîne.

Nazikqeda nûrînbeşer, ew bû li min neqşê beser
Dîna xiyâlî herseher nav dîdeyê, bêxwabî da

Encama maneyê: Her ew dildara beiñzirav û rûgeş bû ku bû nexşê çavêن min yanî bû wek mirova nava biboka çavêن min û wêneyê nimûşê wê li çavêن min hate kişandin. Dîtina xeyala wê ya ku hersibe tê ber çavêن min û dikeve navê wan bê xew dihêle. Yanî ji ber ku xeyala evîndarê herşev li ber çavêن min e û ew ji ber bînahiyêن min qet naçe êdi xew nakeve çavêن min û ez ranakevim.

Ew tiliyên nazikreqîq purr da me fîncana 'eqîq
Ew badeya nûrînre'hîq minnet bi min Wehhabî da

Encama maneyê: Ew tiliyên dildarê yên nazik i zirav gelek caran qedehêن mişt araq dane me, lê yê ku bi wan tiliyên narîni ew fîncana heqîq a tije araqa xalis û safî gîhiştandiye ber destêne me û me pê avdaye, pêşkêşkarê rastî Xwedê ye. Digel ku gîhiştandina berbiçav bi destê evîndarê be jî lê ji bo vê pêşkêşkirina giranbiha ez minêkarî û sipasiyêن xwe ji herwekarê (hubbekarê) rastî Xwedê re pêşkêş dikim.

Da xef nebit bejna ferî, mey hate şekkasa sîrrî
Minnet ku îro dêmdurê dîsa şeraba nabî da

Encama maneyê: Araq rijiya ser wê sirra ku mîna ye piyaleya şahîyane û di ser re qeli bî da ku ew bejna dildarê ya giran i xurt û bi xeşm ji ber çav û bînahiyêن me wenda nebe. Yanî evîna rastî ya xwedahî dilê me zeft kir ku şexsê dildarê rastî ji bînahiyêن me dûr nekeve, lewra daxwazkarê gîhiştinê heyâ ku bi araqa evînê sergêj nebe û ji cîhana

mînandî (mecazî) dûr nekeve ew nagîhîje cihê dîtinê [dîtina Xwedê]. Şêkir û spasî ji Xwedê re be ku iro evîndara rûdurra şeraba saflî û zelal daye me, me pê serxweş kiriye û gihiştandiye hizûrê û cihê dîtinê.

Mey hate fincana sedef, kes dê vexwit iro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûriya mehtabî da

Encama maneyê: Piyaleya sedef ji bo badevexwiran ji araqê hate dagirtin û badegêr ji bi dengê çeng, ney û defê re îskana ferfûri ku wek tavehîvê rohnî dida da ber wan. Vêca ma di vê rewşê de êdî kes dikare vê badeyê nihêni vexwe? Na herê, di vê xirecirê û di nav van dengên bilind de ti kes jî nikare.

'Îd e w hebîbê nezr e lê yan dê bi qurban bî "Melê"
Ya Rebb bibînim roj hilê sikkîn di dest qessabî da

Encama maneyê: Roja cejna qurbanê nêzik bûye û dildarê jî li xwe nezir kiriye ku di şûna beran de dê Melê ji xwe re bike gori. Ey Xweda, xwezi ez bibînim ku roja roja cejnê hilkişê, cihê qurabanan hazır bibe, kéra tujkirî û amade jî di destê quesabî de li benda serjêkirinê ye û dildar jî fermana serêjêkirina min bide ta ku nezra wê bê cih; a ev daxwaza min a dawî ye.

Dûmahik di hejmara bê de

Noteke biçûk: Me di hejmara Nûdemê ya 27an de ji bili şiroveya şîrîn Melê, fethengokê jî amade kiribû. Lê ji ber nebûna cih, em bi tenê qîma xwe bi şiroveyê tînin û fethengokê ji kitêbê re dihêlin. Bi hêviya ku wê xwendevan maqûl bibînin.

DI ROMANÊ DE XEYAL Û TESWÎR

DILBİXWİN DARA

Zîndan, ji bo xwendin û nivîsandinê belkî cihekî baş be. Wekî din di tu lîteraturan de tu nikarî navekî baş ji zîndanê re bibînî. Ev dîwarên mirî, weke dîwarên zîndanên Kurdistanê nabin bîranîn jî. Ne bi te re dikenin, ne bi te re digirin û ne jî dikarin bi te re biaxivin û hinekî sebra te bînin.

Di nava van çar dîwaran de, çiqas zor be jî nivîsandin pîr bi te xweş tê û pênuşa di nava tiliyên te de ji hemû derd û êşen te re dibe derman. Wê demê, ji her demê zêdetir tu bi hezkirina pênuşê, bi bedewî û germaya wê dihesî.

Eve cara yekemîn ji nava sermaya zîndanê lê bi germaya dilê xwe vê nivîsê dînivîsinim.

Ev çend meh in ku berhemeye kurdî neketiyê destê min, berî çend rojan birêz Fîrat Cewerî Nûdem ji min re şand. Spas dikim!

Di hejmara Nûdemê ya 23an de gelek nivîsên hêja di derbarê xwendin û nivîsandinê de hene, wek xwendevanekî ji bo min jî balkêş hatin.

Nivîskar ji xwendevanê xwe çi dixwaze, xwendevan ji ji nivîskarê xwe çi hêvî dike? Di xwendina berhemeye edebî weke romanê xwendevan bêhtir ji çi hez dike? Çi xwendevan bi xwe ve girê dide; cih, qehreman, teswîr, fantazî, xeyal, diyalog... Lê babet? Li gora vê yekê romana ku em dixwînin û dînivîsinin wê çawa be, em çawa dixwazin...

Hefteya derbasbûyî nameyek ji min re hat. Ji ber ku naveroka wê girêdayî pîrsên jorîn in, loma ez qala wê dikim. Weke ku birevînim min ew name ji destê gardiyân girt. Kesek tu caran nikare weke mirovîkî girtî bi xweşîya xwendina nameyan ku ji derveyî hucreyê tê bihese. Di nameya xwe de nivîskar behsa romanê dike. Bihîstiye ku min dest bi xebateke weha kiriye û dixwaze bi hinek pêşniyaran alîkariya min bike.

Ji nameyê hinek paragrafên girêdayî van pîrsan ji we re dixwînim:

”...Ji edebiyata rûsî û îngilîzî min gelek roman xwendine. Ji edebiyata tirkî jî ez bi piranî yên Yaşar Kemal dixwînim. Çi bibêjim vê dawiyê min Çiyayêñ bi xwînê avdayî ya Bavê Nazê xwend. Çiyayêñ bi xwînê avdayî ji romanekê zêdetir çîrokek e.

Bavê Nazê tenê ji bo kesên Omerî ew nivîsandiye. Yanî kesê ku Omerya nas neke, tiştekî ji wê fêm nake...”

Di nameyê de nivîskar hest û êşen xwe di dema romanê de tîne zimên. Roman mirov bi ci dihesîne? Kijan aliyê wê bêhtir te nêzîkî xwe dike û dersa ku tu ji xwendina wê romanê distînî ci ye?...” Xwendina nameyê berdewam dikim:

... Min çar cildên *Durgun Don* xwendin, Şoloxov ew nivîsandiye. Belkî te berê ew xwendibe... te xwendibe ji dîsa bixwîne. *Durgun Don* xelata Nobelê ya edebiyatê stendiye. Uslûb û teswîrên ku nivîskar bi kar anîne pir hêja ne. Bavê Nazê ji di *Çiyayen bi xuînê avdayî* de Omeriya teswîr dike. Lê belê mirovekî ku Omeriya nedîtibe, bi riya teswîra Bavê Nazê tu caran nikare Omeriya nas bike... Dema ku mirov *İnce Memed* dixwîne, mirov herêma Çukurovayê gav bi gav nas dike û bi qehremanên pirtûkê re diçe wê derê... Dema ku min *Durgun Don* dixwend min digot belkî ez li gundekî derdora Donê hatime dinyayê. Yanî di romanê de teswîr pir gitîng e...”

(...)

” Dema ku min cildê duwemîn yê *İnce Memed* qedand ez tırsiyam ku dest bi cildê 3 û 4an bikim. Min ji xwe re digot eger Yaşar Kemal di dawiya romanê de *İnce Memed* bikuje, ez tu caran nema pirtûkên wî dixwînim... lê tiştekî weha çenabe, baş e...”

Nameyê careke din berê min da wan şaheseran. Min bi awayekî ew roman peyda kirin û xwendin. Lê min ew ne weke berê xwendin. Niha ez dixwazim Çukurova, Don û insanên wan deran nas bikim.

Du nivîskar û du berhemên mezin. Her yek ji wan behsa herêm û bûyereke taybetî dike. Cih cuda, qehreman cuda, ziman cuda, nav, paşnav, şekil, tip... ji her alî ve ji hev cuda. Tevî van cudabûnan ji mirov dibîne ku her du nivîskar ji gelek hêlan ve teşbihî hev dibin. Belkî rastiyeye weha hebe; nivîskarên mezin weke hev difikirin, weke hev xeyal dikan, weke hev li bûyeran, li insanan û li tebietê dinerin. Ji axê gelekî hez dikan, pêwîstiyeye mezin didin teswîirkirina cihê bûyeran, xurtbûna fantazî û ferehbûna xeyala wan mirov mecbûr dikan ku ji qehremanên wan û cihê ku lê dijîn hez bike.

Bi rastî ji gava ku mirov *İnce Memed* dixwîne, bê ku pê bihese xwe insanekî ji wê herêmî dibîne. Qet tiştek ji mirov re xerîb nayê. Tu dibêjî qey te di hemû kesên di romanê de hevalî kiriye. Ew te nas dikan, tu wan nas dîkî, ji hinekan hez dîkî, hînek ji te hez dikan, ji hinekan ji nefret dîkî û bêguman li tipolojiya Topa Alî ecêbmayî dimînî.

Bi wê hunera xwe ya bilind Yaşar Kemal te mecbûr dike ku tu ji gundê xwe zê-



Yaşar Kemal



Şoloxov

detir Çukurovayê nas bikî û bi kêmanî bi qasî diya xwe ji Huru Ana, bi qasî evîndara xwe ji Hatçê û Seyranê hez bikî.

Kuştina Hatçê te pir diêşîne. Lê belê derketina Seyranê ispat dike ku tu caran tiştek nikare evînê bikuje. Ji xwe berî ku ew di şikeftê de were kuştin ji Înce Memed re Înce Memedekî tîne. Lê pişt re Yaşar Kemal diyar nake û xwendevanan di meraqê de dihêle: "Gelo çi hatibe serê Înce Memedê zarok?"

Teswîtkirina zivistan, bihar, havîn û payiza herêmê; ax, av, ba, çem û cobar, dar û berên wê, û heyâ bi heyy û stêrkên li ser wan xaniyên gundan... û çûk û çivikên li ser şaxan, te bi xwe te dibin dinyayeke din. Xurtbûna nivîskar jî hinekî di vir de ye; bi destê te bigire û te bi qehremanê xwe re bigerîne. Hisî be jî te bi xwe ve girê bide. Di dema xwendina *Înce Memed* de mirov bi vê yekê dihese. Û weke ku nivîskar di nameya xwe de ji min re dinivîsîne, ez bi xwe jî li pirseke weha rast hatim û bi tirs nêzîkî dawîya romanê bûm. Min di dilê xwe de got: "Lê ku di dawiyê de Înce Memed were kuştin, ez ê çi bikim?!" Te digot qey birayê min an jî yek ji malbatâ min e. Weha ez bi êşa wî diêşiyam. Sebeba ku heta niha berhemên klasîk zindî mane jî, belkî yek jê ev e.

Şoloxov jî wiha ye. Bi destê te digire û te gav bi gav li Donê digerîne. Hewce na-ke tu biçî di pirtûkên cografyayê de li nexşeya Donê binêri. Bi rastî jî tu dibêjî qey tu li gundekî Donê hatiyî dinyayê. Piştî *Durgun Don*, de her du berhemên xwe

yên din de *Uyandırılmış Toprak û Don Kiyisinda Hasat* ku hev temam dikan, Şoloxov teswîreke pir bilind dide bûyerên ku li herêmê çêdibin. Hûn dizanin li dawiyê qehremanê wî Davîdov tê kuştin. Di nêrîna min de ji destpêkê ve Davîdov şexsiyeteke mirî bû. Di nava probleman de wenda bûbû. Li aliye kî zora partiyê li aliyê din jî zora gundiyan. Nikarîbû tiştekî bike. Şoloxov belkî bi zanebûn tîpekî wiha peyda kîribû. Ji ber ku ew ne ji Stalin ne jî ji sistemê razî bû.

Her xwendevanek bi awayekî romanê dixwîne û dinirxîne. Ev bêguman e. Çi romanên dîrokî dibin, ci yên evînî, ci yên şer, ci jî yên civakî; lê belê hernû xwendevan babeta romanê ci be jî piştgiriya qehreman dikin. Ji ber vê yekê hilbijartina kesen ku rola sereke dilizîn gelekî pêwîst e. Loma jî di romanên klasik de tîpêñ ku rola sereke dilizîn taybetî ne.

Kurdistan bi bûyerên ku her yek bi serê xwe romaneyeke welitekî dewlemed e. Di bin her kevirekî de destanek, li ser her çiyayekî qehremaniye heye. Di devê her birînekê de eşek, di her eşekê de helbesteke şer, çrokeke evînî heye. Di şer de evîn, di evînê de jî şer heye. Em serê xwe deynin ser dilê insanê xwe û li şerê di navbera jiyan û mirinê de guhdarî bikin, wê demê em ê bikarîbin baş binivîsinîn.

Berî niha, bi nîvîsan, min nêrîna xwe li ser romanê anîbû zimên. Weke gelek nivíkarên kurd ez jî ditrisiyam ku rahêjîm pêñûsê û nêzîkî wê bibim. Li ber çavê me bûbû weke bombekeku pîma wê hatibe kişandin.


Madem em xwe hinekî xwedî xeyal û fantazî dibînin, madem me ev pêñûs ji xwe re kiriye bar, em binivîsinîn. Ji yên ku hatine nîvîsandin istifade bikin û gava xwe biavêjin. Ma şert e ku em bi *Dayik, Şer û Aşî û Zengîl ji kî re lêdikevin?* dest pê bikin? Qet nîvîskarekî jî şertekî weha nedaye pêşıya xwe û dest pê nekiriye. Ez bawer dikim em çiqasî xwe û hev bitirsînin, ewqasî jî em ê ji pêşkêşkirina berhemeye weha bi dûr bikevin, ev jî bê sûd û fêde ye. Bi taybetî gava ku ez hatim girtin, ez gelekkî li ser vê pîrsê fikirîm, ji xwe li derve jî projeyeke weha di serê min de hebû. Bi rastî jî weke ku mirov lingê xwe deyne ser mayinekê û ji ser rake, li min jî wiha hatiye. Her roj li bûyerékê û li hinek kesan rast têm. Her tiştek tiştekî bi xwe re tîne, di navbera min û vê pêñûsê de bi dehan kes diçin û têñ, qet bi tenêbûnê nahesim. Di vê hucreyê de ji nale nala jîna ku diwelide bigire heya qehremanen ku sed carî ji nav mirinê derdikevin û xwe li bedena jiyanê dipêçin, bi min re radibin û rûdinîn, digirîn û dikenin, diaxîvin û dilê xwe ji hev re vedikin, li derd û eşen hev guhdarî dikin.

Hêviya min pir bilind e ku hûn ê jî sibe bi destê van qehremanan bigirin, ji wan hez bikin, xwe yek ji wan, wan yek ji xwe bibînin û belkî bi wan te bigirîn jî, lê ji bîr nekin, wê di wî giriyê wê de kenekî pir şérîn hebe. □

Almanya, zîndana Rheinbachê, 28.01.1998

XELATA NOBEL YA ÎSAL BÛ MALÊ PORTEKÎZÊ

Xelata Nobel ya edebiyatê ku ji sala 1901 ê û vir ve li Stockholmê, ji aliye Akademiya Swêdê ve tê dayîn, îsal bû malê Portekîzê. Heta niha 95 nivîskarên dînyayê bûne xwediye vê xelatê. Herçî Portekîz e, ev cara yekem e ku dibe xwediye vê rûmetê. Xwediye xelata îsal José Saramago mîna zarokê malbateke belengaz, li gund tê dînyayê. Ew di maleke bêkitêb de tê dînyayê, lê paşê dibe gurekî xwendinâ. Ew di pêvajoya jîyana xwe de ferqiyetên sinifa, newekheviyên cîvakê û berberî û nakokîyan dibîne û loma cihê xwe li ba hejaran digire. Di sistemeke kapitalist



Xelata Nobelê ya edebiyatê îsal gihişt José Saramago

de ji, hejar xwe li îdeolojiyên çep digirin û loma José ji dibe komunist û ji bo azadiya çîna karker têdikoşe. Lê digel militaniya xwe ji ew dibe yek ji nivîskarên Portekîzê yê heri navdar. Ew di berhemên xwe de ji berberiyên cîvakî bigire, hera li ser dirok û din ji dinivîsîne.

Mîna tê zanîn her sal li ser bîryara komîteya Akademiya Swêdê reaksiyon û rexneyên cihê tête kirin. Lê bîryara îsal hem ji aliye xwendevan û edebiyatvanen Swêdê ve, hem ji ji aliye rexnegir û çapemeniya dînyayê ve erîni hate dîtin. Herçî li welatê wî ye, rewş hebekî cihê ye. Li gora rojnameya Dagens Nyheterê, hin ji hewwelatiyên wî kîfîxwêş bûne, hinan ji ew rexne kirine. Yêñ ku kîfîxwêş bûne çep û komunist û yêñ ku di çapemeniya xwe de rexne li Saramago girtine ji, çapemeniya rast bûye. Li gora rexnegir û çapemeniya rast, Saramago demekê pişgiriya diktatoriya Stalin kiriye. □

BEŞEK JI ROMANA SÊ ŞEVÛ SÊ ROJ

LALEŞ QASO

SALA 1969AN. Qereqola hidûd di sala 1958an ji hêla başûr di berpala girê Qesra de hatibû ava kirin. Di serê gir de ji wextê ku qereqol hatibû ava kirin pênc dîrekên dirêj çikandibûn. Bi van direkan ve daliqandî gelek mirovan can dabû. Li hawêrdorêن gir bi kevirên bestan, boyax û kilsê wiha hatibû nivîsin:

"Tirkek bedelî cîhanê hemî ye! Her tirk leşker çêdibe! Ev welatê me ye! Welat yekperce ye!"

Di rohilat û roavayî gir de dîsa ji kevirên bestan bi qasî deriyêن sûr û dêrên kufarî mezin rengareng du wêneyêن leşkerêن tirk hebûn. Wêne bi haweyekî pir balkêş hatibûn çêkirin. Mirov ji wan heybet digirt! Serê leşkeran bi mîxfer, newqên wan yekser bi rext û fışek û bomban rapêçayîbûn. Potînên wan ên bi niçik, bi qasî tabûtên zarokan dirêj û mezin bûn. Mîxên kubikî ku seranser di qiraxêن potînan de çikandibûn; mîna quesnaxêن cenceran xwe dabûn der. Desîn xwe ên çepê kiribûn kulm û danibûn ser sênga xwe. Tivingêن wan ên bi qezetore di destêن wan ên rastê de bûn û berê tivingan ji bi bakur ve bû. Qezetore heta ku digiha lûla tivingê bi carêkê ve ji boyaxê sor bûn. Ji serikên qezetoran mîna ku xwîn binisile bi lez dilopên boyaxê xwe berdidan. Di nav şeqêن wan de kelaxekî bêserî, ji kelax hinekî dûr di bin lingê çepê de seriyeğî devjihev û zimankîşiyayî hebû. Li jêra gewdê serjêkirî ji boyaxa sor bi tîpên mezin ji wilo nivîsibû:

"Xwezî bi dilê wî ê ku dibêje ez tirk im! Tirk mezin e!"

Gava mirov bi terempêlê ji Kızıltepê ber bi Nisêbînê û ji Nisêbînê ber bi Kızltepê de diçû û nêzîkayî li gir dikir, gir ji leşker û termê insen di çavên mirov de bi

qasî çiyayekî bêper bilind dibû. Ji sawa ku vî girî dida, Reşo her ku diçû Nisêbînê xwe berdida ser rêya Menderê û li vegevê dîsa di rêya vî gundî re dihat malê. Gir, ji gundiyyêñ derûdor bêtir tesîra xwe li ser qesirîyan dikir. Remoyê qesirî di rojêñ ku wê ber bi derekê de biçuya, ji gund heta ku dihat ser rêya Îpekê, da ku gir nebîne, şîfqa xwe dixist nav çavêñ xwe, ziq li erdê dinerî û dimeşıya. Dû re jî ji ber gir mala xwe bar kir û li Zorava bi cih bû.

Li vê qereqolê sih û şes leşker diman. Ev serhejmar carinan bilind jî dibû. Li hewşa qereqolê seraqet cîb û cemsek û panzêrek sekinibûn. Leşkeran bi van terempêlan hidûd saxtî dikirin û didan pey qaçaxçıyan. İcar di şevêñ ku teqîn dibû û bi qaçaxçıyan re remî dikirin, jî qereqola Kewke û Nisêbînê jî hewar bi qereqolê ve dihat, hejmara terempêl û leşkeran bilind dibû. Li vê qereqolê wekî din jî di hindurê heftê de bi kêmânî sê, çar caran terempêlên ku ji hêla Nisêbînê ber bi Mêrdînê û Kiziltepê de diçûn, saxtî dibûn.

Qereqolê keriyek pez xwedî dikir. Li vir her roj du pez ser jê dibûn. Qesabiya qereqolê jî Cimoyê zoravî dikir.

Besta Zorava ji aliyê rohilat di ber gir re dirêjî nav mayinan dibû; binya hesin derbas dikir û xwe bi nav erdê binxetîyan de berdida. Best heta bi çend sal berê jî seraqet diherikî; lê di dû re hêdî hêdî av ji ser qut bû û best ku lehî raneba, di zivistanan de jî nema herikî. Di jêra gir re rêya Îpekê derbas dibû. Deriyê qereqolê li rê dinerî. Di qiraxa rê de pêşberî hev du qılübêñ leşkerî hebûn. Bi tîpêñ mezin li ser hêtêñ qılübê hatîbû nîvîşîn ku Tirk bahoz e! Tirk birûsk e! Li jêr hema bi rê ve dîrekên têlîn erda mayînkirî ji hindama qereqola Kewke heta ku diçû Nisêbînê, yek di ber yekî de çekandîbûn. Gundê Qesra li jêra Îpekê dima. Navbera gund û qereqolê latek erd ne digit. Dêrûdorêñ gund bi têlîn ristîn rapêçayîbûn. Ji vî gundî te-nê rîyek derdiket. Rêya gund di ber deriyê qereqolê re derbasî ser Îpekê dibû. Li jêra têlan mayin û li jêra mayinan jî rêya trêñê bû. Trêñ di hidûdê Binxetê re derbas dibû. Li binya hidûd gelek gund hebûn. Leşkerêñ Sûrî têkilî hidûd ne dibûn. Leşkerêñ tirk hidûd diparastin. Di vî warî de selahiyeta wan bêşînor bû. Heta yekcarinan xwe berdane gundêñ binya hesin, di van gundan de bi mebesta qaçaxê hin mirov girtine û di nava mayinan de kuştine. Leşkerêñ Sûrî şelû ne dibûn. Di sala 1967an de gava leşkerêñ tirk êrîşî ser qereqola Doda dikin, Hemîdê hezexî digirin û di qereqolê de dikujin, ne leşkerêñ Sûrî desthiltînin û ne jî dewleta Sûrî bersivekê dide dewleta Tîrkiyê. Gelek bûyerêñ wiha çêbûne. Ü leşkerêñ Sûrî jî tu carî li xwe ne qewimandine.

Zorava û Sirêçkê diketin bakurê qereqolê. Besta ku ji Herbê destpê dikir, di bin-

ya Cinata re xwe berdida Hebîsê, Kurikê, Sitilîlê û di ber Atxê re dihat, di navbera van herdu gundan re derbas dibû. Gund di nêzîkî hev de hatibûn ava kirin. Di roavayî Sirêckê de tibabê kilometrekê dûr, oda axayê sarinciyan xuya dikir; hema bi Sarincê ve Pîrebokê an jî Gundik û Kuçûka dihat. Şêxderbik, Gundikê Evdirehman, Gundikê Semho, Domiza û Darê jî li roavayî Pîrebokê û Kuçûka dima. Gund hemû bi ser hev ve bûn. Menderê li jêra Zorava ji aliyê rohilat hinekî ber bi başûr de dima û bi qasî beza yextiyarekî nêzîkî hev bûn. Çûva tam di rohilatî Menderê de ava bûbû. Herdu gund jî hema hema bi hev ve bûn. Şivanekî temam, bi kevirê koçanîkê xwe ji Menderê dikarîbû çûvayıyek birîn bikira. Dêrê, Dala, Cibil-tînê, Bamidê, Xirbê Hinarê, Xirbê Zil û Eferê diketin rohilatî Zorava. Di nav van gundan de gundên ji hidûd herî dûr Xirbê Hinarê, Şahbanê, Xirbê Zil û Eferê bû. Pênc, şes kilometran ji hidûd dûr bûn. Zivingê, Atxê, Qûzo û Gurik li rajorî Zorava di çiyê de diman. Gundê ku ji hidûd hinekî dûr diket Gurik bû. Ew jî qey hemû heft, heyst kilometre digirtin. Bi tevayî xelkê van gundan hemû jî xal û xwarzê, ap û birazî, dotmam û pismamên hev bûn. Ên mayîn jî pisêpismaman bûn. Bi giştî ji hev dizewicîn. Dotmam a pismêm bû. Bira dimir, jinbir bi birayê din dima. Zilamekî dikarîbû bi deh, duwanzdeh pîrekan re bizewiciya. Lêbelê herçi pîrek bû, tu carî nikarîbû bi du zilaman re bizewiciya. Zilamê ku zewaca xwe nuh dikir, co-tek qundere û bedlek jê re dihat kirîn. Ü pîreka ku li ser zewaca bi du zilaman re hema piçikekî bifikiriya, demaçe di serî de vala dibû. Çimkî li gor wan a ku zilêm dikir exlaqî û a pîrekê jî bêexlaqî dibû. Di civatê de navê zilamê ku li dor pîrekê digeriya bi tolazî û ê pîreka ku li dor zilêm digeriya jî bi qûnekî derdiket. Herdu jî sûc bû. Lêbelê zilam bi çend qurûş pere cîrm dibû û pîrek jî dihat kuştin. Zilêm di civatê de dikarîbû bi haweyekî serbest behsa çûna xwe a kerxanê bikira, lê pîreka ku di ber deriyê kerxanê re derbas bûba, di devê wê de demaçe vala dibû. Dema la-wik çêdibû dawet li dar diket; ku keçik çêdibû şîn û giribû. Li vê herêmê mirovên xwedî çar jin gelek û ên xwedî duwanzdeh jin kêm hebûn. Civatê ji ber ku li dîn-ayê nêr temaşe dikir, diruvê pîrekê bi hertiştî dixist û bi lebatekî wê bi nav dikir. Civak nêr û dînê civakê nêr bû. Heta li ba wan navê Xwedê jî nêr bû. Lêbelê ev jî hebû:

Di nav xelkê ormeriyan û bi giştî jî di nav bûblaniyan de pîreka ku bi ser pêncî diket, wek her zilamî dikarîbû di civatê de rûnişa. Li gor terbiya islamê, pîrekê tu carî nikarîbû di nav koma zilaman de cih bigirta û wek zilaman biçeyiviya. Mihemmed û xelîfê wî ev yeka ha li ser navê Xwedê lê qedexe kiribû. Lêbelê sitilîlê û bûblaniyan jî ev zilma islamê tu carî qebûl ne kirin û bi pîrekê te rûniştin. Heta li

Zivingê di sala 1955an de Fesla Enter kiribûn muxtarê gund û li gundê Gurik ji Emîna Ehmê bûbû mela gund. Ji %90ê stilîlî û bûblaniyan tu carî tam misilman ne bûne. Ya jî mirov bibêje ku wan li gor xwe misilmaniye saz kiribû, belkî bêtir di cih de be. Mizgeft çedikirin mele ne dianîn gund. Mele bianîna, mizgeft çenêdikirin. Merş û alavêni di mizgeftan de didizîn. Diçûn hecê nîv-softî, ji hecê vedigeriyan limêj ne dikirin. Bi Xwedê û pêxember re li ser sicadê dikufirîn. Û dû re jî limêja xwe dikirin. Şêx dianîn gund, tobe ne dikirin. Rojî digirtin, limêja eydê ne dikirin. Di civatê de devjenga li ser islamê serbest bû. Herkes bi melan re dikarîbû li ser qencî û xerabiya islamê û xwedayê wê bi rehetî bi peyivîya. Li gor islamê zekat li mitirbêni kurd ne diçû, ew jî ji bo ku muzîk, govend û dîlana kurdî li ser ligan dihiştin. Lêbelê xelkê herêmê jî ji feqe û melan bêtir zekata xwe dida mitirban. Bûblanî ji êzîdiyên derûdora Wêranşahîrê bûn. Li dor sê sed salêni wan çêbûbûn ku habîbûn herêmê. Li vir dibin du beş, beşek misilman dibe û beşê din jî misilmaniye qebûl nake û ber bi çiyayê Şingalê de koç dikan. Heta pêncî sal berê jî têkiliyên axê bûblaniyan û êzîdiyên Şingalê bi hev re hebûn. Ji hev re digotin, "pismam." Pisê pismamên Sarê jî di nav wan êzîdiyên Şingalê de hebûn. Taybetmendiyek din a sîtilî û bûnlaniyan, pir henekî û ewqasî jî xeberokî bûn. Û xeberên wan jî wek şekir şêrîn bûn. Di vî warî de hin ji wan pir li pêş bûn. Ewqasî xweş digotin, pîrekên yextiyar û zilaman ew bertîl dikirin ku bi wan re hema siqêfekê bikin.

Wek li temamê gundêni herêmê, li Zorava jî berberî hebûn. Ji gundêni din tenê belkî ferqa zoraviyan ew bû ku berberî bi haweyê du bendant digeriya. Çimkî bi giştî di her gundî de sêbendi, çarbendî û pêncbendî hebûn. Û hemiyan jî bi hev re xirecir û şer dikirin.

Pizûrî hemû li taxa jorê diman. Gund sê tax bû. Rêyên kolanan ji ser hev qut kîribûn. Ne ji jorê kesek dikarîbû daketa jêr û ne jî ji jêrê kesek hilkişıya jor. Mercen ku Circîs û Heso danîbûn pirole dijwar bûn. Li vî gundi têkilî û hevkarî qedexe bû. Pîrekên terefan nikarîbûn digel hev biaxiviyan; qedexe bû ku zarokan pev te bîlistana. Her hêlekê çend tenûrêni xwe hebûn. Du gavan û sê şivan di gund de hebûn. Heta bi ava ku ji Sitîlî diherikî birka gund, li hev hatîbû parkirin. Birka avê ji danê sibehê heta ku saet dibû duduyê rojê di mista benda pizûran û saet ji duduyan heta sibehê jî di mista benda hûran de bû. Gol û sarinca gund ew jî bi dorê di hate bikaranîn. Pez bi dor dianîn ser avê. Bi dor diçûn cilço yê. Tahta birxulan havînan herhefte wê dest biguherra bûba malê bendekê. Her hêlekê du cot destaratîn xwe hebûn. Berî ku terempêl têkeve gund, heta bi aş û darterasen Sitîlî li hev pişkiribûn. Yanî benda ku dan û sitendina wê bi kîjan aşî û darterasî re bûbûya, ben-

da din têkiliyên xwe ji wan dibirî. Elba gund bi tevayî bi kar ne dianîn. Herdu bendant jî elbek xwe hebû. Di vî gundi de yekaheng, tu tişt tune bû. Dema elba genim li taxa jor bi bîst û heft wereqanbihata firotin, taxa jêr wê ev sér têk bibira, elba genim daxista bîst û şes wereqan. Çiyayıyan jî vê qayışê fêde dikir û qerfîn xwe bi berîvaniyan dikirin. Lîbelê berîvaniyan jî ji qayışa nav wan fêda xwe didît û henek û laqirdiyên xwe bi wan dikirin. Mewîj, dims, bastêq û êzing erzan dikirîn. Heso CHPî û Circîs jî APî bû. Li ser van herdu partîyan jî di rojêñ hilbijartînê de çend carekî şer kiribûn. Heso paşnavê xwe û malbatê kiribû "Kaplan," Circîs jî ê xwe û malbatê kiribû "Aslan." Tiştekî wan ne dişibiya hev.

Bacanfiroşen Newalê ji ber ku bi rewşa gund dizanibûn, bi çar cembiyan ve zozo dihatin gund: Yekî barê xwe li taxa pizûran, yekî jî li taxa hûran datanî. Bacan û tişfiroşen Newalê mîna kose û berkosan li xelkê gund dikirin. Dema koseyekî ji taxa jorîn bang dikir û digot, "Ha werin bacana ser bi ser!" Kosê din li taxa jêr bang dikir, "Ha werin bacana, du ser genim bi serek bacan!" İcar kosê ku li taxa jor bû wê dev biguherta, sêra berê betal bikira û wî jî dikir du ser genim. Kose û berkosan carinan bayê sêrê pir radikirin. Li vî gundê serpiçûk, gelek carî serek bacan bi çar ser genim firotine. Terbiya Circîs û Heso rê dida hemû babetên şelihandinê. Xwe mecbûr didîtin. Gava li gor sêra kosan bi kosan re nemeşiyana, bêguman kose wê li taxekê biciviyana. Lîbelê kêmânî dihat ser taxa din. Nemaze ev kiryara ha jî, wê di nav benda din de, destûra peyrewî çıkışûs û qelsokbihata dîtin. Bi kurtî, li vî gundi hertiş di rengê belayê û xerabiyê de ava bûbû.

Heso û Circîs bûrayên hev bûn. Pêşdestiya malbata pizûran di destê Heso û a hûran jî di destê Circîs de bû. Gotinê van herdu mirovan di nav malbatê de wek ên pêxemberan bûn. Malbat ji gotinê wan dernessketin. Tarîxa dijminatiya malbatan ji kevin de dihat. Kalikkalikên Circîs û Heso pisêñ pismaman bûn. Li gor ku digotin, ev mirov rojekê bi siwarî digel hev diçin nêçîra xezalan. Li hindama Amûdê di nav qendirxan de xezalekê dikujin. Laş tînin malê û li hev pişk dikin. Hûr û pizûr li aliyekî goşt û serûpê li aliyekî goşt datînin. Hûr û pizûr pişka Xido dikeve. Xido li gotina xwe diqulipê vê yekê qebûl nake û dibêje, "Hûr ji min re pizûr ji te re" Xido bi xwe ne xweş tîne. Gotin gotinê dikişîne, radibin hev. Xido Kido dikuje û dijminayî dest pê dike. Xelkê herêmê ji bavikê Xido re, "Pizûran" û ji bavikê Kido re jî "Hûran" dibêjin.

Li herêmê gelek navêñ wilo hebûn. Navêñ wek "Mala Kezebo, Mala Serûpêyan, Mala Çermo, Mala Simo, Mala Teneko, Mala Qerase, Mala Zirzopan, Mala Şotiran, Mala Hotiran, Mala Dimso, Mala Mewîjo, Mala Meyiro, Mala Masto, Mala

Terîşo" û hwd. bi giştî li nav omerî û toriyan civiyabûn.

Bi kuştina Kido re, kuştin ji kuştinê vedikeve heta ku digihê bavê Heso Rûto û bavê Circîs Şûto.


Rûto û Şûto bi armanca ku neyariyê ji nav xwe rakin, qîzên xwe berdêlî dabûn hev. Xweha Heso Perîxanê jîna Circîs û xweha Circîs Sarê jî jîna Heso bû. Lê mi-xabin wê ev dostaniya wan dom neke û li ser çîma ku mirîşk û elok ketine ziyanan, Şûto Rûto bikuje. Bi kuştina Rûto re sereketî derbasî Heso û Circîs dibe. Van herdu malbatan ji dewra kalikkalikan heta dewra Heso û Circîs bêwestan bi hev re berberî kirine. Di vê berberiyê de bîst û heft mîr birîndar dîbin û nozdeh mîr jî têñ kuştin. Ji bîst û heft kesêñ ku birîndar bûbûn, sêzdeh jê ji ling, zend û piştê seqet dîbin û neh jê jî, ji derba ku ji serî xwaribûn tirodînî dîbin.

* * *

Şeveke reş û pir tarî ye! Ji reşaya şevê, çav tiliyên destan ji hev nafesilînin. Hawêrdor ba û bahoz dixurbile. Rewşa şevê ji êvar de xuya kiribû. Bi êvarkî re teyr û tilûr li şenîyan vehewiyabûn; di kulek, derî û taqan re xwe avêtibûn hinduran. Çilapekên baranê rû çipîsk dikin. Dar û devî dihejhijin. Tayik tewiyane, şaxêñ tayikan taht û latan dimalin. Ewrên weke qîrê reş di ser hev re dikelin, perên ewran xwe berdane ser kavîlên gundê Zorava û her der di nava reşayê de xerq kiriye. Ji qir û seqemê, guve guva bayê reş û bapêşkêñ ku li borangehan dixînin, kevokan xwe bi ser hev de qurnisandine. Gur paşpûk bûne û di ber pêlên bagerê de disûrikin. Hirç, keftar û çeqelan di qorzîbirêñ kunan de xwe qoçandine. Kûçikan gasîn û kola-nîn gund ji guran re berdane û xwe avêtine taldêñ tenûr, tiflik, pang û hefşoyan; serê xwe xistine nav lingêñ xwe, dinya biqşire jî ew taqet nakin ku ji cihê xwe rabin. Dizêñ herî bi nav û deng di vê şeva reş û tarî de nikarin sewêl ji hewş û axuran bidizin. Di bejayede, ne çirûskek xuya dike û ne jî pêjina rihberekî tê. Ezman bêwestan pêdikeve û vedimire. Li jêr mîna ku hertiş sekiniye û li jor jî hertiş herâli di hereketê de ye. Ezman erdê dilerizîne. Tu dibêjî qey du ordî bi balaşiran li hev didin, gire gir bi ezmîn ketiye û agir bi ser dinyayê de dirije. Dinya bi temamî teslîmî ezmîn hûye.

Heso hîn ji êvar de dilerizî, ketibû tayê. Bûka wî Meyro li ber sobê doşeka herî qalind jê re raxistibû û du lihêfîn hîrî bi ser dakiribû...

MÊRXASIYA MÜSO



ŞEREFXAN CİZİRİ

Li herema Omeriya dawiya havînê hatibû. Wex-ta miştanax hindik mabû. Xelkê xwe ji bona karên giran amade dikirin. Ji nava rezan xilbexilbek dihat û di ber re jî firte firtek hebû. Eşkere xuya dikir ku ew ê di demeke nézik de guherînên mezin pêk bêñ. Li Kevreza, li bin dara hirmiyê cih ji bona miştaxê hatibû çêkirin. Erd ji kevir, kêstek, darik, qılçix, pûş û gîhayê hatibû paqijkirin. Diva bû ku şuna erda miştaxê rast û nerm bibûya. Ji ber ku tiriyyê Kerkûş, Zeytî, Qirfok, Dirêjik, Merzone ew ê li ser vê erda nerm bihata raxistin. Mewîjên herema Omeriyan ku li welêt bi nav û deng bûn, ew ê li ser vê erda nazik bistewiana. Helbet hemû babetên tirî nedibûn mewîjên xweş. Tiriyyê Kerkûş û Qirfok ji bona çêkirina mewîjan, tiriyyên sereke bûn. Tiriyyê Merzone tenê ji bona dimsê bû. Lê ji bona meraq, kêf û ceribandinê, gelek caran gundiyan hinek tiriyyên teham jî dikirin mewîj. Di vî warî de ceribandin ji bona pêşketinê dibû gava helî pêşî. Bêyî ceribandinên nû, jiyan weke herdem dubare dibû. Îsal dibû weke par û par jî dibû weke pêrar...

Li çiyayêñ Kevreza kewên ribat dixwendin. Di newala Kevreza de, kewên ribat bi qewmê xwe re şer dikirin. Kewan bi xurtî davêtin ber hevdû. Dengê kijanî xweş

ba, ewê din aciz dibûn. Nêrkew, mêkew û çêlkew bi hevdû re diketin qayışê. Ji hevdû re bi zimanê xwe digotin; dengê min xweş e an yê te? Ez xweşik im yan tu? Li ser vê yekê wan li hevdû nedikirin. Di tasiya xwe de dengê wan bi hevdû re xweş bû. Lê belê kewên qure hebûn ku dengê xwe ji yên hemû kewan bêtir dieci-bandin. "Li vir ez tenê kewê ribat im", "Ji min pê ve kewên ribat li Kevreza tune-ne" digot, yekî ji wana. Na, "esil kewê ribat ez im" digot, yekî din i qure. Qaqûb-xewa kewan li ser vê yekê bû. Di vê qayışê de ew gelek bi kêf bûn û di şerê navxweyî de jî, ew gelek bi eşq bûn. Kew jî dişibîyan gelê Kurdistanê. Tiriyê Omeriyan, vê salê pir bi kêfî van Kewan hatibû. Her yek ji wan, wekî mirîşkên malan mezin bûbûn. Nêçira kewan vê salê bûbû nesîbê hemû kesan. Naşîyan, kalan, jinan, seqetan; erê, mirovên kerr û kor jî vê salê, ji nêçîra kewan destevala venedigeriyan. Şerê kewan yên navxweyî karê nêçîrvanan hêsanî kiribû...

Li bin siya dara hirmiyê tifikek hatibû avakirin. Li ser vê tifikê gundiyan distek mezin danîbûn. Beroş û satilên xwe jî danîbûn derdora wê. Li tenîşa tifikê wan dar û berên xwe danîbûn cem hevdû. Selik, mekeb, zembîl û qatûfên vala jî li vî alî û wî alî belav bûbûn. Wextra ku tirî dihate çinîn, ew dixistin qatûfan, mekeban, zembîlan, selikan û dibirin li ba distê datanîn. Dista miştaxê tijî ava kelândî bû. Pelqe pelqa avê weke kaniyek avgerma xwezayî dikeliya. Ariya êzingan tevlî vê avê hatibû kirin. Dûv re ev av, hatibû parzûnandin. Ariya êzingan mewîj diparastin û tahm dida wan. Tiriyê stewrayî di vê avê de dihate dakirin û dûv re jî li ber rojê dihate raxistin. Piştî çend rojan li ber roja dijwar, hêdî hêdî mewîj distewiyan...

Ber bi êvarê de, Ehmed Gêl ji miştaxa xwe ya Kevreza, vedigeriya mala xwe. Palûta wî jî pê te bû. Palûte li nav eşîra Omeriya tiştekî xas bû. Gundî bi dorê diçûn alîkariya hevdû. Qeflek zilam bi hevdû re diketin nava kar û bar. Bi hêza xwe wan mirovan keleb dikaribûn fetih bikirina. Weke çûkê similmil, wan bi dûv xwe de tiştek nedîhiştin. Her der dihate safîkirin. Hemû karên giran tar û mar dikirin. Bi vê tempoya kar jî, keda mirovan zû berê xwe dida.

Divabû her malbateke gundî çend kesên xwe bişandina palûtê. Roja palûtan kef, qerf û eşq, bi hemû haweyî dikete nava mirovan. Qiymet ji keda mirovan re hebû. Li vir mirovên karker dibûn weke sembola jiyanê. Karkeran bi karê xwe çerxa cîhanê dizîvirandin. Di civata eşîrî de, bi alîkariya palûtê karê kollektîf derdikete pêş. Hevkariyê li ba mirovan tov dida û jiyana sosyal jî hîna xurtir dibû.

Ehmed Gêl lawê Hiseynê Sarê bû û li gundê Kaniya Şêx rûdinişt. Gundê Kaniya Şêx hemû bavikê Mala Sarê bûn. Mala Sarê li nava eşîra Omeriyan, bavikekî naskîrî bûn. Him bi mîraniya xwe û him jî bi diziya xwe kesî nikarîbû berberî bi Mala

Sarê re bikirana. Li herema Omeriya Ehmed Gêl weke mirovekî mîrxas, merd, dilovan û xwedî bext dihate naskirin. Ew dostê dostan û dijminê dijminan bû. Şerê xwe eşkere dikir. Ehmed Gêl mîrê heyfa bû. Heyfa xwe ji kesî te ne dihişt. Wî ne-heqî û çavşorî tu caran qebûl nedikir. Li hemberî zulmê wî li berx we dida. Teorî û pratîka Ehmed Gêl weke ya gundiyyen jêhatî bû. Qedir û marîfet li ba wî hebû. Ke-sên derdora wî jê re digotin "Gêlo". Ehmed Gêl tenbûrvan jî bû. Gelek caran wî ji min re strana "xanimê lê xanimê, tu bûka mala bavê minê" digot.

Gêlo xwarziyê malbata Axayêن Omeriyan bû. Diya wî qîza Brahîmê Atman Axa bû û Brahîmê Atman Axa jî birayê Mihemedê Cizîrî bû. Du xuhêن Gêlo dûv re bi kesên ji malbata Mihemedê Cizîrî re zewicî bûn. Ferha bi Brahîmê Osman re û Sarra jî bi Mihemedê Ehmed re zewicî bû. Bi kurtasî Ehmed Gêl him dibû xwarziyê Axayêن Omeriyan û him ji dibû xalê wan. Ne tenê xalê Axayêن Omeriyan bû Ehmed Gêl, lê belê her wilo ew xalê Apê Mûsa (Musa Anter) jî bû. Diya Mûsa Anter Fesla, ew bi xwe jî xuha Ehmed Gêl bû. Weke ku baş tê zanîn, Apê Mûsa hergav pesnê xwe bi mala xalanêن xwe dida...

Vê êvara hanê mîvanên Ehmed Gêl hatibûn. Dengbêjê hêja Mihemed Eliyê Kercosî li Kaniya Şêx bûbû mîvan. Mihemed Elî xwediyê hespek Şînboz, bi bedil û bi qerewat bû. Wî weke maqûlekî eşfran tevger dikir. Mihemed Elî ji bav û kalên xwe de ji malmezinan bû. Hinekî qapaniya Kercosiyân pê re hebû... Piştî şîvî, ni-mej û bêhnvekirinê gundî hemû li mala Ehmed Gêl civiyan. Rê û rîwanî di oda Ehmed Gêl de nema bû. Ewê işev Mihemed Eliyê Kercosî strana Mûso ji civatê re bigota. Şevbuhêrka oda Ehmed Gêl wê işev bi epopên mîrxasiyê bihata xemilandin. Ji ber ku kiryara mîrxasiyê, yek ji wan stûnên ideolojîkî yê helî giring bû, ku hemû civatên eşîri avaniya xwe ya jorîn li ser vî esası bilind dikirin. Hemû eşîr mîrxasên wan hebûn. Navê van mîrxasan bi cûreyekî dihatin guherandin, lê belê karakterên wan yên sosyal gelekî dışibîyan hevdû. Ji bona hinek sixletên başiyê, eşfran navê mîrxasiyê li hinek kesên xwe dikirin. Ev navê mîrxasiyê ketûber li hinek ke-san ne dihatin kirin. Kiryar û sixletên kesan dibû bingeh ji bona vî navî. Herkes li gora praktîka xwe dibû xwedî nav.

Ez bi hêsanî dikarim bibêjim ku gelek sixletên Mûso û Ehmed Gêl dışibîyan hevdû. Ehmed Gêl mîrxasê dem, civat û eşîra xwe bû. Wî li nava eşîra Omeriyan tu caran cilika bêxîretiyê qebûl ne dikir. Weke ku tê zanîn, di nava civata eşîrî de, mîrxasî li hemû deveran dihat pesinandin. Di huner û edebiyata kurdan de ev rastî hergav heye. Heta mirov dikare bibêje ku hemû edebiyat û kultura devkî li Kurdis-tanê, babetekî mîrxasiyê tê de heye...

Mihemed Eliyê Kercosî li qorziya odê keysa xwe xweş kir, ribaba xwe kok kir û bi dengekî nerm, hûrik hûrik dest pêkir û got;

Hey hê, hey hê...
Ax begê min wê çawa be
Li vê dewra pîs
Hakimê min wê çawa be
Li vî zemanî
Van mîrekan şêwir danîn
Ax begê min nabe, mîrê min nabe
Şêwir giran e ra lê nabe.

... Heçî Mihemed Beg bû di welatê Botan de bû. Xulamekî wî hebû, mîrov bigeriya li Himisê, li Hemayê, li Kerkûkê, li Bexdayê, li Ruhayê, li çar nîkarê Botan, li nava Rûs û Misqofan, heft qonaxan ji mala Xwedê û bi wê de, Xanekî jî Xanê Dewlan, Xanê Teteran, keseñî xortêne weke wî nedîtibûn û nebihîstibûn. Xortêne wilo nehatibûn ser rûwê vê dinyayê, ji xeynî wî û pê ve.

Digotin; sê pîrekên Mihemed Begê Botî hebûn, hineka digotin xulam li dor wan digerîyan, hinekan jî digotin fitneyî di navbêna Misûr Begê û Erdeşêr Mîrê Botan de dikir. Mihemed Begê Botî got; bi rebê alemê mecalâ min nagîhêje kuştina vî zilamî. Ma ne vî heyamî kîlîka bêbextiyê hatiye. Bi Xwedê ez ê kelemekî bavêjîm nava lingêن wî, ku ew bi serî û lingan ve jê xelas nebe.

Mihemed Begê Botî şand dû Zeynal Begê maqûlê Mûsiyan, Hesen axa maqûlê Hekariyan, Sadûnê Nûhê Gergerî, Hecî Ebasê Mîrekê Kelaha Pozreşa, Erdeşêr, Misûr Begê û Şaqûlê Berwarî. Timamê gîrgirek û Mîrekêne welatê Botan li xwe ve hewandin. Şêwra kuştina yek xulamî di oda xwe de, di meclîsa xwe de danî.

Xanimê, biçûka her sê pîrekên Mihemed Begê Botî bû. Di ber xwe de digot; bi Xwedê wî zilamî gelek mîr ji me re kuştine, gelek terş û talan li me vegerandine, gelek tadeyên me ji zikê dijminan derxistine. Ez ê işev ji bona Xwedê xeberekê bigîhînimê. Bera ew işev neyê odê, ev ode lê nayê. Bi Xwedê ku ew ji vir ve here, ew ji wê de nayê. Mûso bi rastî zilamekî nesitêye. Ma ci heqê me û Xwedê lê heye?

Xanimê daw û delingên xwe çikandin. Berê xwe da mala Mûso. Geh li vir û geh li wit. Deriyê malê vekir û dît ku Mûso li ser doşek û maxfüran rûniştiye. Hayê wî ji bayê felekê qet nîne, mîrov dibêje qey evqas dinya hemû bijewite, baqekî pûşê wî di nav de tuneye. Evqasî bê xem e. Wexta ku Mûso Xanimê dît, ew ji ser doşek û

maxfûran rabû û pêrgî Xanimê de hat. Mûso ji Xanimê re got; ha Xanimê Xwedê xêr bike? Ma Ecem di Bexdayê re derbas bû? Ma dinya ketiye rengekî din? Ka derdê te, kîna te, êsa te û mereza te ci ye? Xanimê, tu ji siyê neçûye ber rojê. De ka ji min re bibêje...

Xanimê ji Mûso re got; ma hey malxerabo te hîna tiştek nebihîstiye? Mûso lê ve-gerand û got; na Welleh. Xanimê gotina xwe her berdewarm kir. Got malmîrato heçî Mihemed Begê Botî ye, li oda xwe şêwra kuştina te daniye. Mihemed Beg işev hemû gîrgirekên Botan li oda xwe vehewandine. Mûso de wayê, bi Xwedê ku tu işev herî odê, tu ji wê de nayê.

Mûso fikirî... Kelehek ava kir û yek ji xera kir. Ji xwe re got; li vê ecêbê, ez Mûso me, Bavê Xelef im. Dengê min li odêni ciwamêran belav bûye. Him bi diziya xwe û him ji bi méraniya xwe, pîrek pêçekên xwe bi min ditîrsînin. Dibêjin hisin vaye Mûso hate we, heta ku ew zarokên xwe di xew re dibin. Sibehekê ez û gîrgirekên welatê Botan em ê rastî hevdû bêñ. Di dora ku ez tê de derbas bibim, divê wî çaxî ez serê xwe bitewînim. Bi Xwedê ez Mûso me, ez Bavê Xelef im, ez cilika bênamûsiyê di Welatê Botan de tahmûl nakim...

Mûso bangî Xanimê kir; got Xanimê wa xanimê, bejna te zirav e weke dara ri-mê, gotina ku tu pêhatiye ez ê herimê, heger ku serê min têkeve ber qewêrê û ber kuştinê.

Mûso û Xanimê ji hevdû re gelekî gotin birin û anîn. Heta berê sibehê wan li ber hevdû dan. Hevdû ji piir aliyan de westandin. Xanimê kir û nekir Mûso qanî nekir. Mûso bîryara xwe dabû, ew divabû biçûya oda Mihemed Begê Botî. Xanimê ji Mûso re got; Mûso tu xortekî nesitêle yî, çavên eşîrê li bejna te ye, dilê eşîrê li cem te ye, de ka işev nere dîwanê. Ma ew ê ci bibe? Mûso ji gelek tiş li aqilan xisti-bûn, ew baş fikirî bû, gelek piyanê exlaqî di bêjingan re derbas kiribûn û dûv re ji bi zanebûn bîryara xwe ya çûnê dabû. Kesî êdî nema karîbû ew ji vê bîryarê bida vegerandin. Ji ber ku Mûso mîrxasekî Botiyan bû...

Mûso dîsa ji Xanimê re got; ez Mûso me Bavê Xelef im, ez ribatekî bi def û lef im. Ji odêni began û mîrekan ez ne direvim û ne ji dibezi, yê ku namûsê dike her û her ez im. Ez Mûso me xortekî pakim, ez tu qanûnan qebûl nakim, cilika bêxîretiyê di welatê Botan de ez tu caran tahmûl nakim...

Çiqasî Xanimê singek kura, Mûso cûherék pê vekir. Gotinê wan îcar nema bi serê hevdû de diçûn. Xanimê ji Mûso re got; heyran va melê sibehê azan da, heger tu ê here oxir û felekên te yên xêrê bin. Na heger tu neçe ji, dîsa tu bi kêfa xwe yî. Xanimê ji dîwana Mûso derket û bi lez vegeriya mala xwe...

Piştî tibabekî du xulamên Mihemed Begê Botî hatin mala Mûso. Bangî Mûso kirin; Mûso, Mûso... Ji Mûso re gotin ku işev hemû gîgirekên Botan wê li dîwana Mihemed Begê Botî bicivin. Ev çardeh panzdeh salên te û Mihemed Begê Botî ye ku hûn bi hevdû re naşitexilin. Ji hemû şevan hema işev were odê, qehweyekê an çıxareyekê bide destê hinek maqûlên Botan. Kurebab an jî xwedî wijdan hene ku dikarin di nav we de du gotinan bêjin. Heger ku tu işev were dîwanê, belki hinek di nav we de biaxivin, dilê we bi hevdû xweş bikin û rûwê we bi hevdû geş bikin. Dikare madê we disa bi hevdû re xweş bibe. İşev wê şeva lihevhatinê be...

Mûso bi kurtî bersiva xulaman da. Ew jî xwe berê amade bû. Ji xulaman re got; erê xebera we ye, rast e. Ez ê işev bêm dîwana Mihemed Begê Botî. Mala we jî ava be... Xulam di cih de vege riyan cihê xwe û zû xeber gîhandin Mihemed Begê Botî. Mûso jî qama xwe de rabû ser piyan. Ew derbasî aliyê malê bû. Mûso etfiyeke Misrî kirîbû. Nav û dengê etfiya Mûso li dînyayê belav bûbû. Mûso etfiya Misrî xiste ber bejna xwe. Di nava pişta Lahor de etfiya Misrî, bi qapanî disekeñî û bejna Mûso dixemiland. Etfiya Mûso di nava şal û şapêñ Botanî de, esterîkek bedew çedîkir. Cil bi rastî li bejna Mûso dihatin, yên ku Mûso didîtin bi dengen bilind di-gotin; maşelleh ji te û ji bejna te re! Di bin cilan de, li ser taziyê xwe jî Mûso etfiyek Soranî edilandibû. Wê Mûso xwe ji êrîşan bi du etfiyan bihimanda. Mûso bi tedbir riya dîwana Mihemed Begê Botî girt û meşîya. Hîna di devê deriyê odê de Mihemed Beg cih nîşanî Mûso da, wî jî silav li dîwana Beg kir û çû li cihê edeba xwe rûnişt..."

Oda Mihemed Begê Botî tije mêvan bû. Mêvanan li gora qiyemet û statuyê sosyal, di oda Mihemed Begê de cihêن xwe girtibûn. Di oda Mihemed Begê de struktura (avaniya) civata kurdan ya eşîri hemû dihate temsîlkirin. Her kes li gora giraniya xwe bi cih bûbû. Hiyerarşıya civata eşîri di oda Mihemed Begê de, geleki zelal derketibû pêş. Misûr Begê û Erdeşîr ku birayên hevdû bûn, ji ber mîrekiya xwe, ew li cihê desthilatê rûniştî bûn. Balîf û doşeka wan ji ya hemû kesan mezintir û bilindtir bû. Mazûbanê wan Mihemed Begê Botî jî li teniştâ wan bi cih bûbû. Li teniştâ Mihemed Beg ya çepê jî, Mûso xwe pal da bû. Li aliyê mîrekan i rastê, gîgirek û maqûl li teniştâ hevdû rûniştî bûn. Li gora giraniya siyâş mêvan hatibûn bicikirin. Kî derecakê nêzîkî mîr runiştiba, ew di mîrekiya Botan de xwedîyê cihêkî payebilind bû. Xeleka desthilata mîrekiya Botan, di rîzana rûniştina civatê de, derdikete pêş. Ji rîzkirina mêvanen di odê de, avaniya civata eşîri bi hemû hawayêñ xwe, xwe dida destan. Odê jî mêvanan re digor; li min binêre û cihê xwe baş nas bike!

Oda Mihemed Begê Botî, odayek tekûzkirî bû. Li aliyekî odê xaliyên bijarte, li aliyekî din kulav û merşen neqandî bi dûv hevdû de hatibûn raxistin. Li cihê mîr doşek û maxfûr hebûn. Her rengê xaliyekê, her rengê kulavekî, her rengê mersekê cihê cihê bûn. Ji balîfan bigire heta perdên odê, ji aliyên rengande hevdû timam dikirin. Di raxistina oda Mihemed Begê de, estetika rengan hebû. Her rengekî warêk, navçeyek, gundek, eşîrek, malbatek li welatê Botan temsîl dikir. Hemû mîvanen Mihemed Begê Botî xwe di civîna wan rengan de nas dikirin. Rengan û însanan silav li hevdû dikirin. Ew bûbûn destbirakên hevdû.

Di nîvê odê de jî, maseyek fireh danibûn. Li ser vê masê, di selikên biçûk de hejîrên Şingalê, bastêqa Çermûgê, mewijen Omeriyan, gûzên Hekariyan, fisteqên Entabê, benî û qetîtkên Toriyan, Hinarê Bilalan; erê hemû tahmtîkên Kurdistanê li ser vê masê hebûn. Li ser qorziya masê tûtina Xursê, Mûşê û Bedlîsê ya neqandî hebû. Li cem vê tûtinê qeflek pelê Şamî danibûn. Li qiraxa odê tifika qehwê li dar xistibûn. Qehwa Yemenê ya bijarte li mîvanan dihate belavkirin. Di oda Mihemed Begê Botî de xulam û xizmetkar diçûn û dihatin...

Atmosfera odê her ku diçû xweş dibû. Lê di nav vê xweşiyê de jî, bêhizûriyek hebû. Di hewa odê de hûrik hûrik guhertin çêdibûn. Ba diqlipî...

"Mihemed Begê Botî hema bi carekê re bangî Mûso kir û got; Mûso deya sed car deya, lawo işev ji evqas gîrgirekên Botan, tu li ser çavên min û yêñ bayê min hatiye. Mûso, işev bêhna min gelekî bi te derketiye. Malmîrato ev çardeh pazdeh salêن te qedîyan. Te li miqabilî min xwe tije kîn, xerez û tehdît kiribû, dibêje. Mûso jî herna bi carekê re li Mihemed Begê Botî vedigerîne; axa dem e sed car dem e, tu şehîdê li dëwsa xeman. Bi kuştinê û bi pevçûnê ez ne barê te me, ez ne qama te me. Axa; bîstika ku biqewime ez xulamê te me, lê rojêن qewamê jî ez li xwe ewle me. Axa; ez ji qalibê xwe zêde me.

Mihemed Begê Botî di dilê xwe de got; "Kûçik kurê wî satûli. Min jî wî zilamî re çi got ewî ci li min vegerand. Tu dibêjî qey ew kesî bi zilaman na hesibîne. Mirov dibêje qey zilam li ber çavên wî weke kevir û kuçikan in. Weleh ku ez hergav nezera xwe bidim ser wî û pê re biştexilim, ewê dilqetandin jê re çêbibe. Mihemed Begê Botî dîsa li mîvanen xwe vege riya û bi wan re kete şitexaliyan..."

Pîstî ribabekî Mihemed Begê Botî, Mûso dîsa xalî kir û di kerika guhê wî de got; Mûso deya sed car deya, lawo ji evqas gîrgirekên Botan, işev bêhna min bi te derketiye. Mûso, min bihîstiye ku te etfiyeke Misri kiriye. Lawo kanî, em ji xwe re li etfiya te binêrin, bê ma bira ka etfiya te Misri ye. Mûso wê gavê bersiva Mihemed Begê Botî da; Axa, ez ne har im û ez ne dîn im. Ez xortekî zirav im, lê ez mîran di-

xapînim. Ez bi eniya Mîrekêñ Ezîzan bikim, li odê tu ciwamêran û tu lawê bavan vê etfiyê ku ne li xwînê be, ez nakişînim...

Erdeşêr, birayê Misûr Begê li Mûso kir qêrin û gazî; eman Mûso dilê min xemgîn e, dûrî vê hizûrê, di nav evqas zilaman de, lawo ez te bi pîrekan dişibînim. Agirmalo ka em li etfiya te binêrin, belkî em ji xwe re yekê didiwa jê bistînin.

Mûso li Erdeşêr vegerand; axa waye, sed car waye. Teqla te ji ya hemû Begêñ Botan zêde ye. Axa, bera tu bizanibî ku ew etfi bi ruhê zilamên weke te ye.

"Mûso wayê, sed car wayê
Mûso min ji te re got;
Neçe dîwana Mihemed begê Botî
Dîwan li te nayê,
Mûso ku tu ji vir de herê
Tu ji wê ve nayê"...

Piştî tibabekî îca Zeynal Begê Mûşî li Mûso kir qêrin û gazî. Got; Mûso lawo tu ne har i û tu ne dîn i, tu xortekî zirav i lê civatxapîn i. Agirmalo ka em li etfiya te binêrin. Belkî em ji xwe re yekê didiwan jê bistînin.

Mûso got: Axa wayê sed car wayê. Pêşiyêñ me ji paşiyêñ me re gotine; em silehên xwe tu caran bêyi xwînê nadî destêñ tu kesan. Axe dilê min dixemînê, aha waye tu etfiyê di ber bejna min de dibîne...

Evqase gîrgirekêñ Welatê Botan tiştek ji Mûso, Bavê Xelef fahm nekirin. Hema wê bêhnikê zilamek ji nav evqas zilaman rabû ser piyan. Ew çû û li Mûso, Bavê Xelef sekînî. Wî nemerdî nekir, got mirç û çû rûwê Mûso. Got; Mûso malmîrato ma nûra çavêñ te rijiyaye? Ma qey te ez ji binî de nas nekirim? Ez destbirakê te Şaqûlê Berwarî me. Mûso, ma nayê bîra te, min û te me bi hevdû re heft salan feqetî kir. Tûrikêñ Quran û Kitêban milêñ me qetandin. Mûso, min û te bi hevdû re heft salan rastî kir, got Şaqûl. Mûso ji nemerdî nekir, wî ji rûwê Şaqûlê Berwarî maçî kir û Şaqûl ji dûv re çû li cihê edeba xwe rûnişt.

Gîrgirekêñ Welatê Botan, dîsa tiştek ji Mûso Bavê Xelef fahm nekirin. Dor zîvirî û zîvirî heta ku dîsa hat ser Şaqûlê Berwarî. Şaqûl got; Keko nabe, bi min nabe. Melek daxîlî erdan bin. Keko ez dibêjîm ku, ma ji nav evqas gîrgirekêñ Welatêñ Botan tu li destbirakê xwe ji amîn nabe...

Mûso di dilê xwe de got; "Li vê ecêbê. Min û vî malixerabî heft salan bi hevdû re feqetî kir. Welleh tûrikêñ Quran û Kitêban milêñ me qetandin. Me bi hev re heft

salan rastî kir.", got û ponijî. Mûso hema wê gavê nemerdî nekir. Rabû etfiya tazî da destê Shaqûlê Berwarî...

Şaqûlê Berwarî etfiya Mûso qiliband vî alî û aliyê din. Got keko Mûso etfiya te pîroz be, xalis Misri ye. Dûv re Shaqûl etfi da destê Hecî Ebasê Keleha Pozreşa li teniştâ xwe. Hecî Ebas etfi qiliband vî alî û aliyê din. Got; Mûso haye, sed car haye, ez bi eniya Mîrekên Ezîzan bikim, min bala xwe baş daye. Ew etfi ji xeynî Mûso û pê ve, bi kêrî tu lawêن bavan, tu cara nayê. Dûv re Hecî Ebas etfi da destê Sadûnê Nûhê Gergerî, siwarê Şilha kekê Nûrê li teniştâ xwe. Sadûn etfi qiliband vî alî û aliyê din. Got; Mûso eman te kir, sed car te kir. Bila tu tenê bêjî min ji xwe re sîleh peyde kir. Ji devê te dibare barek şekir û xorstan li bejna te meyze kir...

Etfi dîsa li civatê zîvirî û zîvirî. Dûv re hat ket destê Erdeşêr birayê Misûr Begê li teniştâ wî. Erdeşêr etfi qiliband vî alî û aliyê din. Di bin hûrikên çavan re li Mûso nêrî. Rehê xezebê li ber çavên Mûso bel bûn. Di ber qeytanê simbêlan re kef herikî. Çavên Mûso weke du gulên topê, di nava serê wî de sor bûn. Mûso bûbû weke gayekî şerabvexwarî ku mirov du qedehêن xwînê berde ber çavê wî. Erdeşêr bi vê yekê tirsîya û etfi da yê teniştâ xwe.

Etfi dîsa li civatê zîvirî û zîvirî... Vê carê etfi kete destê Mihemed Begê Botî. Mûso xwe ber bi Mihemed begê Botî de livand. Ji pişta Mûso, etfi ji destê Mihemed Begê Botî de ket erdê. Li pişta şibakan pîrek bi Mihemed Begê Botî kenîyan...

Etfi dîsa zîvirî û zîvirî, du carî bû. Vê carê etfi hat û dîsa ket destê Shaqûlê Berwarî. Shaqûl ji Mûso re got; Ma keko te ev etfi bi çiqasî kiriye? Hema bi carekê re, hîna gotina wî di devê wî de bû, Mûso lê vegerand û got; keko li ser min sekînî bi şo zêrên Osmanî ye. Hîna gotina wî di devê wî de bû, Shaqûl etfi dawêşand xalka Mûso. Shaqûlê Berwarî şelişî û etfi di laşê Mûso de hişt û bi lez xwe gîhande deriyê dîwanê...

Birîn û nalîn bi Mûso Bavê Xelef ket. Hema bi carekê re destê xwe avêt etfiya Soranî ji bin taziye xwe kişand. Bi awira xwe li vî alî û li aliyê din î odê nerî. Dora xwe baş saxtî kir. Şad û şûdê Mûso hebûn, hema di wê bîstikê de çend gîgirekên Botan bi ser hevdû de qilibandin. Çavên xwe li Mihemed Begê Botî digerand. Mûso dîr ku Mihemed Begê Botî xwe, hema hema gîhandiye deriyê dîwanê. Wextî xelas bibe. Di vê navê re ji Mihemed Begê Botî dixwast ku baz bide. Lê Mûso vê gavê berda ser pişta wî, ew di devê deriyê mala wî de girt û da ber etfiyan.

Mûso mîrxasekî bi nav û deng bû, hema wê gavê cendekê Mihemed Begê Botî bi ser xwe de qiliband. Mûso di vê navê re germ bûbû. Destê xwe avête gurzên simbêlan bi ser pêlîn xwînê de, ba da. Mûso nav di xwe da;

"Ez Mûso me Bavê Xelef im
Ez xortekî bi def û lef im
Ji odên Began û Wezîran
Ez ne direvîm û ne jî dibezi..."

Li oda Mihemed Begê Botî, Mûso çû vî alî û hat aliye din.

Pirekan li ber şibakan li vê bûyerê temaşe dikirin. Pirekek ji yên Mihemed Begê Botî ji hevalên xwe re got; bi rebê alemê min bi çavên serê xwe dît ku derb li Mûso ket. Mûso li odê dîsa çû wî alî û hat aliye din. Pirekê dît ku tiştek weke xilçekî di teniştâ Mûso de çikandiye. Pireka Mihemed Begê Botî xwe avête etfiyê ji teniştâ Mûso derxist. Lê heyfa mêtê çê, wê gavê jî bi carekê re xwîna Mûso beliqî ser erdê. Mûso hema bi carekê re bi ser laşê Mihemed Begê Botî de xiliya û ket. Mûso bi vê birînê re çû ser heqîya xwe. De bera serê hazır û guhdaran jî sax be..." Got Mihemed Eliyê Kercosî.

Baş xuya dike ku epopa Mûso, bi haweyekî trajedî xelas dibe. Îcarn mirov dikare ji pir aliyan de li ser vê epopa hêja biskekine. Ji pir aliyan de mirov dikare li ser ziman, li ser kiryar, li ser avaniya epopê, li ser qerekterên civakî, li ser mîrekî û eşiretiya li Kurdistanê; li ser rîzana civatî ûhw, hûr û kûr bibe. Lê beriya hemû tiştî, ez dixwazim li ser gotina mêtixasiyê hinek piyvanañ bînim zimên.

Navên ku dişibin gotina mêtixasiyê li Kurdistanê gelek in; egît, qehreman, fêris ûhw. Ev gotin hemû manayêñ wana gelekî nêzîkî hevdû ne. Gotin û manêñ wan li gora deman, welatan, kulturan, civatan dikarin werin guhertin. Bi vî haweyî jî navêñ mêtixasiyê pir dibin. Ev navên hanê kêm an jî zêde, di eynî manayê de têne bikaranîn. Ev nav ji bona hinek kiryarân têne gotin. Kesêñ fêris ji ber kiryarên xwe dibin fêris, kesêñ egît jî wilo ne. Heger di fêrisiyê de kiryarî tunebe, navê fêrisiyê jî wê gavê tuneye. Mêrxasê ku tiştekî neke, ma ew dikare bibe mêtixas? Na. Mêrxasî, egîti, fêrisî û qehremanî hemû bi kiryarên mirovan re pêk tê. Ji bona ku hinek mirov van navan karibin qezenc bikin, di vî warî de kiryarî şertê yekemîn e. Ma nivîskarekî ku pirtûkan nenivîsîne dibe nivîskar? Mêrxasî, fêrisî, egîti tu caran nikare bibe helwesteke teorîkî. Helbet li ser çilobûn û çawabûna mêtixasî, egîti û fêrisiyê jî teorî hene, lê belê ew tenê li ser ronîkirina mêtixasî, egîti, fêrisiyê hatine nivîsandin. Kiryara mêtixasî ji gelek aliyan de dikare were zefalkirin, norm û qiymetên wê jî werin berbiçavkirin. Dem hene ku gotin ji naveroka xwe dûr dikeve. Ji bona vê ye-kê jî pêwîst e mirov hergav, gotin û kiryarân ji aliye semantîk de, piralî û gelek ca-

ran bide tefsilandin. Bêyi tefsilandina gotinan, di nava mirovan de dikare hergav sergêji çêbibe. Em dizanin ku tixûbên mîrxaşî û tirsonekiyê ji carinan dikevin nava hevdû. Ev ji divê ji hevdû werin veqetandin. Gelek caran di dîroka gelan de kesên tirsonek xwe weke kesên mîrxaş nîşan dane. An ji mîrxasiya ku hinek ciwamêran kirine, dikan para xwe. Ew babetên kesan, mîrxaşen ji kîsên xelkê ne. Di dema feodal de li gelek welatên Ewropa, hinek esilzade hebûn ku sifata mîrxasiyê, egitîyê, fîrisiyê bi peran dikirin! Ew kes qehreman, mîrxaş, egit û fîrisên bêyi kiryarî bûn! Anglo ew nekirkêr bûn. Lê li welatê kurdan tu caran kesî mîrxaşî bi peran nekiriye. Di civata kurdan ya feodal û eşîri de, pere û mîrxasiyê li hevdû ne dikirin. Kesên mîrxaş gelek caran bê mal û bê pere bûn. Mîrxaş ji li hemû deveran, herdem weke civata xwe bûn. Mîrxaşê civata kurdan bi piranî ji grûbêñ kedkar derdiketin. Mûso Bavê Xelef, Derwêşê Evdî û Hemê Gozê mîrxaşen grûba kedkar in. Helbet ji serdestên kurdan ji mîrxaş hebûn. Ew ji bi nav û deng bûn. Lê mîrxaşen civata kurdan yên navdar, ji aliyê sosyal de bi taybetî ji çîna kedkaran dihatin. Li dijî zulma axan, li hemberî bêbextiyê, li ser neheqiyê, li ser namûsê, li hemberî xayîntî û müxbiriyê hergav wan serê xwe rakirine. Li hemberî mercen zehmet ew tu caran çîz nebûne. Ji desthilanîn neketine. Xwe teslimî dijminê xwe nekirine.

Li gora hemû tarîfîn ferhengî kesê mîrxaş yekî wilo ye ku; ew ji tehlükê natirse, neheqiyân qebûl nake, xwedî li namûs û şexsiyeta xwe derdikeve, serê xwe li ber zulmê danayne û li gora civata xwe piyanen exlaqî yên baş diparêze. Bi kurtî kesên mîrxaş li gora îdealên civata xwe dijîn. Heger civata kurdan desthilanînê bipesinîne, divê mîrxaşen kurdan bi desthilanîn bin. Heger civata kurdan comerdîyê bipesinîne, divê mîrxaşen kurdan comerd bin, heger civata kurdan zilamtiyê bipesinîne, divê mîrxaşen kurdan zilam bin, ûhw. (Helbet mîrxaşî ji bona pîrekan ji derbas dibe, lê bêle ev mijarekê din e). Mîrxaşıya kurdan tu caran fen û sextekariyê qebûl nake. Mîrxaşen kurdan şerê xwe eşkere dikan. Di kultura kurdan ya bi devkî de bi milyonan mînakên hêja di vê mijarê de hene.

Di tevgirêdana civata eşîri de mîrxaş kesekî bi tenê ye. Mîrxaş, ji hinek tevgirêdanen sosyal û çînayetî xwe piçekî azad kiriye. Ev azadî ne mutlaq e lê belê relatiif e. Tevgera kesên mîrxaş xweser e. Tişten ku hemû kes nikarin bikin, ew dikan. Mîrxaş, derdora xwe fireh dikan û sêncen li pêsiya xwe ji yeko yeko belav dikan. Xwe ji civata xwe re didin îsparkirin û şexsiyeta xwe ji di kiryarên xwe de didin diyarkirin. Weke min li jor ji got kiriyâyen mîrxaşan mohra wan bûn. Mohra sosyal ji bi fen û sextekariyê çenêdibû. Heger biba ji ew ê temenê wê pir kin bûya.

Helbet mîrxaşî ne tenê bûyerên sosyal in. Ne tenê şer û pevçûn e. Bi qasî kiri-

nan, di gotinan de jî mîrxaşî heye. Kesên ku xwediyyê gotinên xwe derkevin, rastiyê biparêzin, li hemberî derewan tekoşînê bidin, sozên xwe xerab nekin û li gora exaq û wijdanê xwe tevgerê bikin, ew jî dibil mîrxaş. Dem heye ku gotin ji kiryaran gitîngitir dibe. Heta mirov dikare bibêje ku gotin û nivîsandin di hinek demê berbiçav de, dibe weke zêr. Desthilatdarî pir caran ji gotin û nivîsandinê ditirse, lê belê ji kiryarêne sosyal zêde natirse. Weke tê zanîn gotin û nivîsandin ji babetekî kiryariyêne. Li ser gotin û kiryariyê gotineke kurdan heye, gotin wilo tê gotin; "Ewê ku bêje û neke, nekirkêr e, ewê ku bêje û bike, mêt e, ewê ku nebêje û bike, şêr e". Li vê derê mîrânî an jî mîrxaşî weke him gotin û him jî kirin bi hev re tê fahmkirin. Heger mirov hinekî din li ser vê mijarê kûr bibe; ewê eşkere bê xuyakirin ku gotin bêyî kirin, kirin jî bêyî gotin, li ba civata kurdan ne mîrxasiyek îdeal e. Mîrxaşê îdeal ewê ku him bêje him jî bike ye...

Erê, Mûsa Bavê Xelef mîrxasekî kurdan bû. Di vê epopê de Mûso weke niwêne-rekî kedkarên mîrxaş tevger dike. Di welatê Botan de Mûsa cilika bênamûsiyê qebûl nekir. Serê xwe ji zulma axa û mîrekan re dananî. Mûso tixûb û sava axayê fenek, bi kirina xwe ji hevdû belawela dike. Mûso bi zanistî diçe dîwana Mihemed Begê Botî û weke kewekî ribat li hemberî fen, zulm û tada mîrek û axayên çavşor derdikeve. Ew li xwe gelekî amin e û bi tedbîr çûye dîwanê. Mûso namûs û şerefâ xwe di ser kuştina xwe re digire. Qîma xwe bi kuştinê tîne lê belê qîma xwe bi bênamûsiyê, bi stûxwariyê û bi jiyanekê bêrûmet nayîne. Heger ji vî alî de mirov li epopê binêre û bixwaze Mûso fahm bike; wê gavê Mûso weke mîrxasekî îideal yê civata kurdan derdikeve pêşberî mirovan. Di civata eşîrî ya kurdan de hinek sixtênen mîrxaşan hene ku li ba kêm civatên cihanê peyda dibin. Mîrxaşen civata kurdan ne kesên fenek, cambaz û durû ne. Lê li gelek welatên Ewropa kesên mîrxaş fenek û durû ne. Ev rastiya ha li gelek welatên din jî derbas dibe. Mîrxaşen welatan jî weke kultur, norm, exaq, îideal û piyvanên civata xwe, formên xwe yên dîrokî digirin. Weke ku em hemû dizanî naveroka mîrxaşiyê gerdûnî ye, lê belê formên mîrxaşiyê jî dîrokî ne. Mîrxaşen civatan bi hevîrê welatê xwe têne stiran û heyvanê wan jî dibe formekî etnîk. Yanî bi kurtî mîrxaşî û mîrxaş tu caran nikarin jî tevgirêdanên civata xwe werin izolekirin. Di tevgirêdanên sosyal de, di qiyemetên kulturî de, di avaniya civatan de kesên mîrxaş derdikevin meydana dîrokê.

Kuştina mirovan jî li gora welatan dikare were guhertin. Li miqabili çavê gelek kesan, di civatê de, di cihênu ku dostanî û nêzikayı lê çêdibe kuştina mirovan lidar-xistin, bûycerek kulturî ye. Armanç, çavtirsandina mirovan e. Ma gelo çîma Mihemed Begê Botî Mûso li dereke xalî nade kuştin? Ji bona çi kuştina Mûso li dîwana

Mihemed Begê Botî li miqabilî çavêن gelek mirovan tê pilankirin? Bersiva van pirsyaran ji nêzîk de bi kultura mîrek û axatiya kurdan ve girêdayî ye. Kuştina Mûso li dîwana Mihemed Begê Botî weke semboleke desthilatdariyê divê were fahmkirin. Mûso bi kirinêن xwe li hemberî desthilatdariya Begê Botan rabûye. Çavso-riya axan qebûl nekiriye. Li miqabilî vê kiryariya Mûso, divê Mihemed Begê Botî û hevalbendên wî, ji nû ve otorîta xwe tekûz bikin. Ew otorîte û desthilata ku Mi-hemed Begê Botî û hevalbendên wî ku demekê winda kiribûn, divabû sembolik be jî, disa li dîwana Mihemed Begê Botî were li darkistin. Bi kuştina Mûso ewê mîre-kan dîsa hefsarê civatê bikirana destêن xwe. Ji ber vê yekê jî Mûso dibû gorî ji bona tekûzkirina desthilatdariya Mîrekêñ Botan.

Tîştekî din ku li vir balkêş e ew e; hemû kes li kuştinê temaşe dikin. Pîrek, di penceran re li bûyerê temaşe dikin. Di Dîwana Mihemed Begê de herkes zane ku ewê iro xwîn birije erdê. Zanebûn li vir nikare têkeve pêşıya kuştina Mûso. Zane-bûn li vir rola xayîntiyê dilîze. Herkes bûyerê dizane lê belê bêdeng dimînin. Weke filmekî, an jî piyesekê herkes li bûyerê temaşe dike. Mirov li benda xwînê sekînî ne. Mûso divê li oda Mihemed Begê Botî, were qurbankirin. Lê ew qurban jî ne berxek e, ne karek e, ne mîhek e, ne dewarek e, lê belê mîrxasekî ku bi nav û deng e. Ew şer û mîrxasê welatê Botan e. Li oda serdestan Mûso pilan û şêwra mîrek û Begê Botan xera dike. Mûso qurbantiyê qebûl nake.

Di epopa Mûso de, Şaqûlê Berwarî rola helî xerab dilîze. Şaqûl bi dostanî û he-valtî dixwaze ku Mûso bîne lîstikê. Mûso bi tedbîr e. Lê li oda Mihemed Begê jî li tu kesî amin nabe. Lê wexta ku hevaltî, dostanî û nasîti dikeve holê, wê gave Mûso hinekî sist dibe. Bi kêmanî dixwaze ku li destbirakê xwe amin bibe. Ji ber vê yekê jî xwe bi destan ve berdide. Di nava atmosfereke dijminayetî û xayîntiyê de, Şaqûl weke dostekî destê xwe dirêjî Mûso dike. Şaqûl weke marê kor e. Hema ku keysa wî li Mûso bê, ewê derbê lêxîne. Mûso, ne li benda Şaqûl û xerabiyê ye. Lê Şaqûl mirovekî durû ye. Şaqûl, ilmê tûrik xwendîye, ew rastiya hanê jî li gora dema xwe îşareta paqijiyyê bû. Kesî di vê tevgerêdana civatî de hêviya xerabiyê ji Quran, Mis-hef û ilmê dînî nedikir. Şaqûlê Berwarî û Mûso bi hev re ilmê dîn xwendibûn. Wan nan û avê hevdû xwaribûn. Tûrikê Quran û kitêban milêñ wan qetandibûn. Lê di dawiya dawî de jî dîn û hevaltî bûn encam ji bona xayîntiyê. Li vir dîn hel-westâ xwe li ba desthilatdariya politîk datîne û ji ideolojiya xwe ya dînî bi dûr dike-ve. Rola Şaqûl ya eşirî, zora rola Şaqûl ya dînî dibe. Realîta civatê bi ser realîta dînî dikeve.

Tîpêñ weke Şaqûlê Berwarî di kultura kurdan ya devkî de gelek hene. Di hemû

epopên kurdan de mijara mîrxasiyê, fedakariyê û hevaltiyê, bi mijara xayîntiyê, bê-bextiyê û mûxbirtiyê re, bi hev re dimeşin. Kirbyar raserî hevdû pêşda diçin. Heger mirov hinekî din li ser vê mijarê hûr û kûr bibe, tehê vê yekê dikarin bighêjin Fel-sefa Zerdeş. Li gora vê felsefê di gerdûnê de xerabî û başî, tarî û tonahî li miqabilî hevdû, herdem tekoşînê didin. Hunermend jî dixwazin bi gelek cureyan praktika mirovan raxînin ber çavan. Hunermend ewê ku sixletên tipê civatî, bi haweyekî pîralî zelal bike, ji xerabî an jî başiya wî tu şikê nehêle. Ji ber vê yekê jî di epopên kurdan de karakterên sosyal pir xurt in. Kesê xerab bi rastî xerab e. Weke hunermendê hêja Mihemed Arifê Cizîrî jî di straneke xwe de dibêje; "xerabo, tu ji xeraba jî xerabitir î." Bi rastî, xerabê ku ji xeraban xerabitir bin, ma gelo ew çava ne? Ma gelo tu sıdletê mirovatîyê li ba wan mane? Di epopa Mûso de Kirbyarê Şaqûlê Berwarî xerab in. Mihemed Begê Botî bêbext e. Pîreka Mihemed Begê Botî Xanimê jî, baş û dilovan e...

Ma gelo cihê ku lê mîrxasî hebe, civat dikarin bêyi bêbext û xayînan bijîn? Bi baweriya min na. Him ji aliyê ideoloji de, him ji aliyê pratîk de û him jî ji aliyê exlaqî de ev bûyer û gotin bi hevdû ve girêdayî ne. Mîrxasî li hemberî bêbextî û xayîntiyê derdikeve meydanê û pêşde diçe. Di epopên kultura kurdan ya bi devkî de mîrxasî, egîtî, fêrisî, qehremantî, bi hawê avaniyeke sistematîk, bi bêbextî, bi xayîntî, bi durûtî û mûxbirtiyê re, hevdû timam dikan. Eynî weke herfîn elfabeyê, ew girêdayî hevdû ne. Yek bêyi ya din nabe. Yanî li aliyekî sixletê başiyê û li aliyê din jî sixletên xerabiyê, weke du stûnên exlaqî li raserî hevdû disekinin. Qayışe bi hevdû re dikişnin. Ew bi hevdû re pevdiçinin. Yek bêyi ya din nabe. Cihê ku xayîn lê hebin ewê hergav mîrxas jî lê hebin û cihê ku mîrxas jî lê hebin ewê hergav xayîn jî lê hebin. Ev yeka han di huner û edebiyatê de jî wilo ye. Ji xwe di civat û dîrokê de ev realîta han hîn baştir xuyanî dike. Civata ku xayîn tê de tune bin, mîrxas û qehremanîn wê jî tunene. Ev rastîyeke dîrokî ye. □

ŞEREFNAMEYA BI KURMANCÎ Û BÎRA ME YA MILLÎ

ROJEN BARNAS

Di vê bihara 1998 an de Şerefname "Tarîxa Kurdistanê ya kevn" a Şeref Xanê Bedlisî cara pêşin bi kurmancî çap û belav bû^(*). Kurdperwerê hêja û nefspiçük Ziya Avcı bi wergerandina vê pirtûkê ji xwendevanên kurmancî re xizmeteke mezin a bêhempa kiriye. Destê wî terr û hêşin be.

Şerefnameya bi hîmê xwe bi farisî nivisandî, piştî wergerên xwe yên bi fransîzî, erebî, tirkî û soranî çarsedsal şûn de bi kurmancî dikeve berdestê neviyên arkinciyan mîrityîyen hingê û bi kurmanciya gewî a ku serhedî jî, berriyî jî bikarin bi hêsanî jê fehm bikin û bi uslûbeke rewan ku ji xwendina wê meriv têr nabe, hatiye wergerandin. Werger Ziya Avcı bi rastî serê xwe di ber de gelek eşandiye, herçend wergera mamosta Hejar ji xwe re bingeh wergirtiye jî lê bi nusheyên herdu zimanê dinê re (farisî û tirkî) jî daye berhev, têvelî û neliheviyên ku hema rast lê hatibe, wan bi şandekan nîşan daye. Piştî vê kira hêja, Mîr Şeref Xan dikare êdî bi firêqetî û sersiqirandî di gora xwe de binive. Ragihandina wî winda nebû û niha gihişte zarûkên wî welatî ku wî tevî bêîmkanî an kêm-îmkaniyên bidestxistina pirtûkan ên dema xwe serê xwe di ber de gêj kir, canê xwe di ber de azirand, tarîxekê nivisand û ji me re hişt. Bi munasebeta çarsed û yek saliya nivisandina vê berherma hêja selam, hurmet û spasen xwe ji giyanê nivîskarê wê, Mîr Şeref Xan re pêşkêş dikim.

Bîra merivekî hişê wî ye: Merivekî bêhiş bibîr nayîne ku kengê li ku derê ci kiriye, ci gotiye, ci pirsîye an ci xwariye. Merivekî wisa li eynî derê, li eynî kevirî dikare sed caran biartile, ciyekî xwe bişîne û neyê bîra wî ku ev berê jî bi serê wî de hatiye. Ji ber bêbîrî an bêhişîya wî, ciyê wî li civatûcaxiyan tune. Merivên wî zûbizû wî nayinin nav civatan, herçend ew kes berî vê rewşê mîrxasekî bi navûdeng, alimekî bêhempa, xweşsuhbetekî yekta bûbe jî.

Bîra neteweyekî jî tarîxa wî ya nivîskî ye: Bêyî tarîxa nivîskî dîroka devkî wek ci-



roka Mala Zalê ye, yanî efsane û galegalâ vala ya li ser pesin û forta ye. Lê Şerefname tarîxa nivîskî ya perçeyekê ya bîra neteweyê me ye: Gava ew di pêş de bi tarîxa Ebû-l-Ezreq û yên dinê yên temamker bê temamkirin hingê bîra me ya neteweyî wê dest bi fonksiyona xwe ya xebatê bike.

Navê vê pirtukê "Şerefname Tarîxa Kurdistanê ya kevn" an li gora ya çapa St. Petersbourg - 1862 "Şerefname Tarîxa Kurdan" e. Lê bi rastî Şerefname ne tam tarîxa Kurdistanê ye û ne jî tam tarîxa kurdan e: Ew tarîxa xanedan û mîrîtiyên Kurdistanê ye. Bi qasî ku têkiliya wan bi mîr û xanedanan re heye behsa tişt, bûyer, eşîr, dever û kesan tê kirin. Behsa şairên mîna Melayê Cezerî, Feqiyê Teyran, Melayê Bareyî ku berî Şeref Xan jiyane an hemdemê wî ne nayê kirin. Lîbelê behsa şâ' irriya Yaqûb begê kurê Mihemed begê zirkî tê kirin û texmîna hebûna dîwanike wî ya şî'rên bi kurdî jî tê kirin ku heta niha kesî bi vî navî şâ'irekî kurd nebihîstiye. Herwisa eşîra Xerzan eşîrek mezîn û melbenda wê jî herêmek gelek fereh e, ji aliyê devok û kulturê ve jî xwedî ciyekî taybetî ye, lîbelê behsa wê nayê kirin. Bi tenê li

derekê, tekûtenê gotina "nahiya Xerzan" derbas dibe.

Şerefname erê tarîxa mîrîtiyên Kurdistanê ye, lê pê re ji rapora zanistî ya psîkolojiya kes û civaka kurd e. Tesbîten Şeref Xan û yên Şêx Ehmedê Xanî yên di xisûsa karakterê ferdî û civakî yê kurdan de eyñ wek hev in:

Ne bîst û çar kes, bîst û çar eşîr di rojekê de digihîşîn hev (ev mü' cîze ye), federasyonekê datînin [federasyona Rojkî] (ji bona me kurdan ev mü'cîzeya herî mezin e), lê derdê giran ev e ku ji nav xwe, ji xwe re mîrekî an sermiyanekî hilnabijêrin, ji Bedlîsê diçin Xelatê du birayêni bi eslê xwe nekurd tînin yekî dikin mîrê Bedlîsê, yekî ji yê Hezoyê.

Weyaxud yekî ebasî, emewî, tirkmen, xalidî filan tê deverekek tafilê li dora xwe çend qebileyêne kurd dicivîne, dibe mîrê wan. Ew herêm an eyalet bi erêkirina xelîfe, şah an sultan dibe mînitî an milkê wî kesî û nav an naznavê wî kesî ji li wê herêmê û eşirêne herêmê tê danîn; herweki [Behdînan (î), Şemzînan (î), Silêman / Silîvan (î), Zirkan (î)] û kurd ji li dijî vê bûyerê dernakevin. Heta di bin serekatiya wî kesê nekurd de heta Gurcistanê, Xorasanê an deverêni ji war û welatê wan dûr di Karin herin xwedênegiravî li hemberî dijminê xwe şer bikin. Lî li hemberî qebile û eşirêne kurd ên birayêni xwe serê xwe danaynin û mezinatiya yekî kurd qebûl nakin û şayet gumana tiştekî wisa ji wan bikin bêlêbûrîn bi şûr û xencer dibezin wan.

Şerefname neynika rûhiyeta me ye û bêy armanceke taybetî, nîşanî me dide ku em kurd çendî biyanîperest in. Em ne ku xeribdost in, lê xerîbperest in. Li alîkî dibîni Hulagû Xan, Tîmûrleng, Şahê Ecem, Sultanê Romê, Xelîseyê Şamê an Bexdayê aliyekeî Kurdistanê daye ber xwe serûbin xopan û kavil dike, li aliye dinê bala xwe didiyê ku hêzên wan ên herî dijwar û şerkar hin eşirêne kurd ên ji herêmeke dinê ne.

Rewşa rûhî ya xwenda û aliman ji ji kesen sade ewçend pir ne cuda ye. Mîr behsa heşt "mewlana" yên mezin ên ji Bedlîsê derketî dike: Mewlana Ebdurehmanê Bedlîsî, Mewlana Mihemed Berqel'î, Şêx 'Emmar Yasîr, Mewlana Husamedînê Bedlîsî, Mewlana İdrîsê Bedlîsî, Ebû'l Fadil Efendiyê kurê Mewlana İdrîs, Şêx Ebû Tahirê Kurdî, Şukrî Şâ'ir. Lî di nav wan de yekî ku ji bona Xwedê rîzek li ziman an kultura kurdî zêde kiribe tune. Xizmetkarê erebî, farisî, tirkî û tirkmenî bûne.

Piraniya mîr û serwerêne kurdan bi eslê xwe biyanî ne, ne kurd in: Li gora tesbîta Mîr Şeref Xan mîrekên Hekar, İmadiye, Mirdasî, Çemîşgezek (? selçûkî) û Kîlîsê ebasî, yên Boxtan (Botan) xalidî, yên Zirkan seyid, yên Dînewer-Şehrezor û Bîradostan hesnewî (?), yên Sohran û Dinbiliyan erebêne wekî dinê ku ev gişt. bi eslê xwe ereb in. Mîrekên Bedlîs û Sasûnê sasanî, yên Kelhûrî keyanî û yên Suwêdî bermekî ne ku ev ji faris (pars) in. Yên gelbaxî tirk in. Fermanrewayê Diyarbekir û

Cezîrê (merwaniyên Meyafarqînê yên dema Badê Dostik), yên Lora Mezin û Lora Piçûk, yên Erdelanê (ji merwaniyên Meyafarqînê ne), fermanrewayê eyûbiyan, melikên Hesenkêfê (eyûbi) ji kurd in. Eslê mîrekên Xîzan (Hîzan), Şîrwan, Baban, Mekrî, Baneyê ne binavkirî ne.

Gerçî ji edeba xwe ya bilind gava Mîr Şeref Xan behsa her mîr an fermanrewaye-kî dike bi sifetên wek aza, serbixwe, mîrxas pesnê wan dide, lêbelê tu yek ji wan jî bi maneya îro û heta ya wê demê jî azad û serbixwe nebûye. Gişt jî girêdayê hin merkezêni mîna xelîfetiyen (Bexda, Şam, Qahîre, di pey re Konstantîniye) an mîna yên şahîtiya Tebrîz û sultaniya Konstantîniyeyê bûne. Di nav wan de yê herî mezin û muqtedîr Selahedînê Eyûbî yê sultanê Misir û Şamê ye ku ji Nûredîn Mehmedî re qasid dişîne û dibêje: "Ne hewce ye ku tu heta vê derê cefa bikişinî, werî. Kolekî xwe bişîne bila were zincîrê bavêje stuyê min û min hetanî ber hizûra te li pey xwe bikişîne. Ez kolê te me." ("

Ku Sultan Selahedîn bi vî awayî be, hun werin li halê rebenên dinê bifikirin.

Mîrekêni dinê herwekî walî, qeymeqam, mudurê nahiyê; piçek guhartî lê mîna memûr in û li ser kîfa xelîfe, sultan, şah, wezîr û carina jî ya paşayê (mîrmîranê) Diyarbekir, Wan an Bexdayê ji mîrîtiyê têne avêtin an bi cî kirin. Mîrê Hekariyê, yê Boxtan (Bohtan), yê Kilîsê tayînî Bosnayê, Buxdan û Temeşwarê dîbin.

Mîrên me jî wekî me ji yekîtî û fikra yekîtiyê her dûrin. Li ser pêşniyara İdrisê Bedlîsî, Sultan Selîm dixwaze ku mîrên me di nav xwe de mezinekî hilbijêrin, ew kes bibe mîrîmîran an melikê Kurdistanê ku Sultan pê re bide û bisînê. Ji mîrên me heryek xwe pêşniyâr dike û ji xwe pê ve kesî qebûl nake. Li ser vê Sultan Selîm ji wan re Çawîşbaşiyê xwe "Biyıklı Mehmet (Paşa)" dişîne û dike mezinê wan û mîrên me jî ji vî derdî xelas dike.

Em fikra yekîtiya mîran li wê derê bîhêlin, ew bi xwe di nav xwe bi hev re xayîn in; de bira bi bira, kur bi bavê xwe re ne rast e. Heryek ji wan li pey payeya mîrîtiyê ye û ji bona wê payeyê jî dikare bav, bira, kur û mamê xwe li bejiyê bifroşe, bikuje an bide kuştin. An jî jibona ku her wisa mîr bimîne dikare dev ji mîrîtiya herêmeke mezin berde û bi ya bi qasî çend gundan qâl bibe. Mefhûma "welat" ji bona wan ew erdê di bin mîrîtiya wan de ye ku bi berat an fermana şah, sultan an xelîfe hatîye dayîn. Mefhûma "Kurdistan"ê jî yek jê di berat û fermanen resmî de bi tenê ji bona mîrîtiya Çemîşgezek (herêma Dêrsîma Îroyîn) tê bi nav kirin û ya diduyan jî gava kurd û mîrên kurdan ji welatê xwe dûr in; li Konstatîniye, li Tebrîz an li xerîbiyê ne; ji dêlva bajar û gund an eşîra xwe bi vî navî xwe didin nasîn an têne nasîrin.

Mîr Şeref Xan bi qencî, dilsozî û şîranî pesnê kurdan û mîrên kurdan dide. Di vê

nivîsê de tiştên ku dibe wek rexne bêne fêmkirin, ne gotinê camêr in; jêfamkirin û dershilanîna min a ji tarîxa me ye. Dibe ku ev dersjêilanîn li xweşä meriva, li xweşä meriva wek merivekî kurdê dilperitî neçe; lê xweşî tiştekî ye û rasî tiştekî dinê ye. Heta meriv nexweşîna xwe veştere meriv ne dermanê xwe dibîne û ne ji sax dibe. Hera meriv şâşıya xwe nebîne û li xwe daneyne, meriv ji şâşîkirinê nafilite. Ku meriv xerabiyê ji qencyê neniqîne çawa bikaribe qencyê bike?

Cî ji me kêm e?

Ji me sultan (yên merwanî û eyûbiyan) derketine, fatih derketine ku heta Hîcاز û Yêmenê kirine bin hukmê xwe (zarûkê Necmedîn Eyûb), mîrên me yên ji neslên tahir (seyid, ebasî, xalidî, emewî, keyanî) ji hebûne, xorren kurd hetanî Xorasan, Gurcîstan û deverên dinê çûne û canê xwe ji dane; yanî mîrxasên me yên canfedâ hebûne û hene. Xwenda û zanayêne me ji hebûne ku dîwanenê şah û sultanan xemilandine, di medreseyêne (zanîngehêne) paytextên herêmê de dersdar bûne. Li ser navê me ne tapo kiribe ji axa me ya bi nav kirî ji heye, ku em bac û xeraca wê ji didin. Lê wisa be cî kêm e?

Qewlî Xocê Mensûr ve lê wisa be em çîma helawê çenakin?

Em nikarin helawê çêkin. Em nikarin û ku wisa here emê nikaribin ji. Lewra tiştê hevdûgirtinê jê kêm e: Ruhê kurdîtiyê...

Roja ku em kurd wekî ferd bikaribin kurdbûna xwe ji eşîr, navçê, dîn, mezheb, terîqet, baweriya siyasî û felsefi, partî û serokatiya partiya xwe pêştit bigirin; menfe-eta kurdîtiyê di serdestî van hemûyan û helbet ya xwe ya kesî û malbatî de bigirin, hingê şefeqa me wê bavêje û sibeha me zelal bibe.

Roja wekî ferd em bikaribin bêjin: Ez pêşiyê kurd im û dûre bisilman im, ez pêşiyê kurd im dûre neqsebendî me, ez pêşiyê kurd im dûre alewî me, ez pêşiyê kurd im dûre êzidî me, ez pêşiyê kurd im dûre komunist im, ez pêşiyê kurd im dûre ateist im, ez pêşiyê kurd im dûre endamê partiya xwe me, ez pêşiyê kurd im dûre bendeyê serekê xwe me û vê di nav civakê de bidin bicîhkirin, di axaftin û nivisandinê, li mal û li derve, di karê rojane û yê entelektuelî de pêşîkî bidin zimanê kurdî û berhemên wê; hingê ewê rûhiyeta kurdî mîna çîmantoyê eşîr, mezheb, gundî, bajari, kurd û esîlkurdan bigihîne hevdû û ji gelê me yê bêçare re çareyê ji bûtika guliyê dara hêviyê mîna gul bîbişkifîne.

Berevajiyê vê hemû xewn û hemû derew.

Şerefnameya bi kurmancî bixwîne, carekî dîtir bixwîne û bi tenê ne rêzên nivisandî, navbera rêzan ji bixwîne. □

(*) Navîşana Çapxanê: Apec-Förlag, Box 3318 163 03 Spånga / SWEDEN

(**) Şerefname, rûp. 108.


DENGBÊJÊN MEHMED UZUN

ŞEREFXAN CİZİRİ


Li ser dengbêjên Kurdistanê kêm tişt tê-ne nivîsandin. Ev rastiya hanê pir caran hatiye dubarekirin. Ji ber vê yekê wexta ku pirtûka Mehmed Uzun ya bi navê "Dengbêjlerim" kete deste min, bi rastî ez pir kîfîxwêş bûrn. Bi hêviyeke mezin û coşke xurt min pirtûk xwend. Li gora navê pirtûkê diviyabû nivîskar zanebûna xwendevanan li ser dengbêjan zêde kiriba. Di derheqa denbêjan de agahdariyên hêja derxistina pêş. Min wilo hêvi dikir. Lê bêle nivîskar ji bo vê pirtûkê metodeke din hilbijartiye. Wî bêtir behsa xwe û pêwendiyêن xwe bi hinek dengbêjan re kiriye. Hilbet ew jî hawayekî nivîsandinê ye. Lê belê bi vî metodê nivîsandinê nivîskar mecbûr dimîne ku xwe û dengbêjan bi hevdû ve girêbide. Di vê pirtûkê de danûstandinê nivîskar û dengbêjan, bi hawayekî kesayetî derdikevin pêş. Mehmed Uzun di vê pirtûkê de bêtir tecrube, zanebûn, dilbijandin û piyvanêن xwe derdixîne pêşıya xwendevanan. Berhemên dengbêjan zêde roleke sereke naleyîzin. Ew jî kîmasiyeke mezin e. Ez dibêjim heyf e ku ew mijar wilo hatiye nivîsandin. Nivîskar

karibû giranî bida ser berhemên dengbêjan. Mehmed Uzun dikarîbû xwe hinekî bişşanda û berhemeke hîn baştır û bi kalitîter bi-asîfranda. Mirov hêvi dike ku Mehmed Uzun bi vê pirtûkê tenê qayil nebe. Weke xwendevan mirov li benda Mehmed Uzun û berhemên hîn bi kaltîter e. Ev heqê hemû xwendevanan e.

Di vê pirtûkê de dengbêjên balkêş Evdalê Zeynikê, Fermanê Kikî û Rîfîhetê Darî ne. Hilbet di pirtûkê de gelek dengbêjên din jî hene. Lê belê bi raya min ev hersê dengbêjên helî balkêşin di pirtûkê de. Li ser Evdalê Zeynikê Mehmed Uzun, ji xwe berê jî romanek nivîsandibû. Fermanê Kikî jî weke dengbêjê mala Celadet Bedir-Xan hatiye naskirin. Fermanê Kiki bêtirin bi riya Kovara Hewarê bû xwediyê navekî. Li ser Evdalê Zeynikê gelek kes dipeyivin, dîniyînin, dibêjin, lê belê hîna jî li ser Evdalê Zeynikê agahdariyên hêja pir kêm in. Car na fantazî û realîte dikevin nav hevdû. Evdal dibe weke kesekî xeyalî. Mehmed Uzun ne Evdalê Zeynikê ne jî Fermanê Kikî şexsi nedîtine. Ji ber ku ev herdû dengbêj, deng-



Pirtûka M. Uzun, *Dengbêjlerim*



Hunermend Rîfhetê Darî

bêjên heyamên kevnare ne. Danûstandinêن Mehmed Uzun, li gora agahdariyên pirtûkê, di derheqa Rîfhetê Darî de, bi haweyekî din bûne. Mehmed Uzun dibêje; ez hifdeh rojan li cem mala Rîfhetê Darî mame. Ew rastiya hanê divabû biba encamê ku Mehmed Uzun li ser Rîfhetê Darî agahdariyên rast bide xwendevanên xwe. Lê Mehmed Uzun di pirtûkê de, beriya hemû tişti xwe xistiye navenda bûyeran. Ji dengbêjan bêtriîrin, ew behsa serpehatiyên xwe dike. Beriya hemû tişti Mihemet Uzun, Rîfatê Darî (ne Rîfhetê Darê weke ku Uzun şas dînîvisine) dike malbateke Serhedî. Lê belê ev agahdarî ne rast e. Rîfhet ji gundê Darê ye. Ev gund ji di ser bajarê Amûdê re û dikeve bînya quntara Çiyayêن herema Omeriya. Gundê Darê girêdayî bajarê Mêrdinê ye. Gund di-

keve navbêna Mêrdinê û Nisêbinê. Darê berê bajareki antîk bû. Dibêjin navê Darê ji Şahê Farisa Darîus tê. Bi kurtî ez dibêjîm; Rîfhet dengbêjê herema Mêrdinê ye. Çima nivîskar Dengbêjên Mêrdîniyan dike dengbêjên Serhedîyan, bi rastî min baş fahm nekir. Heger Darî vê yekê bibîhîzin ewê xwe ji Mehmed Uzun pir aciz bikin.

Rîfhet di sala 1935 an de hatiye cîhanê û di 1990î de çûye rehmetê. Rîfhet ji malbateke xizan bû. Uzun dibêje ku Rîfhet di malbata xwe de lawekî bi tenê bû. Ez baş dizanim ku Rîfhet di malbata xwe de ne lawê bi tenê bû. Birayê Rîfhet iro li Amûdê dijî. Pêşî malbara wan ji Darê diçin gundê Xirbê Kerma, li nêzîka bajarê Amûdê. Hilbet ji ber xizaniyê. Dûra Rîfhet di hijdeh saliya xwe de li gundê Hazda bi cîh dibe. Pişti ku

dizewice mala xwe dibe Amûdê. Wî him rencberî û him şifertî (di şirketa Petrolê ya Rimelan de) kiriye. Du caran zewiciye û nozdeh zarokên wî hene. Yanzdeh law û heşt qîz. Rishet bi nexweşîya şekir çûye...

Pirtûka "Dengbêjlerim" bi zimanê tirkî hatîye nivîsandin. Ev jî kêmâsiyeke mezin e. Gelo çima Mehmed Uzun pêwîst dît ku mijara dengbêjan bi tirkî binivîsinê? Mehmed Uzun yek ji pêşengê edebiyata zimanê kurdi ye. Xwe wilo daye naskirin. Di navâ

pirtûka "Dengbêjlerim" de senteza du zimanân heye. Dengbêj bi kurdi û "lerim" bi tirkî bi hevdû ve hatine pinekirin. Çima? Ez hêvî dikim ku ev helwest nebe encamê ku nivîskarêñ kurd, weke zemanê berê, na-vê pirtûk, kovar û rojnamên xwe bi kurdi, lê belê naverokê jî bi tirkî binivîsinin. Tiş-têñ ku bi zimanê tirkî werin nivîsandin divê bi tirkî bin û kurdi jî divê bi kurdi be.

Bi taybetî divê Mehmed Uzun di van mijaran de hay ji xwe bike. □

JI WEŞANÊN NÜDEMÊ ÇAR KITÊBÊN NÛ

Evîn û Şewat

Beşekî biçûk ji romanê:

"Wê periya ji ciwaniyê tîrhabêj, dêmê wê yê gilovir yê wekî heyva geş ya çardeşî, hinarokên rûçikên wê yêñ sor û spî, wan reşçavêñ mezin û mestker, wê bejna dirêj û navtenga zirav, wê şepalê, şoxê, dilê Serdarî bi çavdîtina yekemîn dagîr kir..." □

EVÎN Û ŞEWAT

Sidqî Hirori



NÜDEM

ÇIROKA MALBATA EVDO

Ciroka Malbata Evdo ji çavkaniya bûyecreke rastî hatiye hûnandin. Navêner gernasen çirokê û navêner cih û deran jî rast in.

Gernasê vê çirokê Evdo, pismamê min e. Min bûyer bi çavêner xwe dîtiye û ez ji destpêkê heta dawiyê bi wan re bûm.

Min di sala 1979an de li welêt dest bi nivîsandina vê serpêhatiyê kiribû û di dawiya sala 1980yî de ew li Swêdê xelas kir. Min hingî ev çiroka ha nişanî R. Zilan jî dabû. Sîret û pêşniyazên wî yên di derheqa zimên de pir bi kîfî min hatibûn. Ez gelekî spasi wî dikim.

Paşê min di sala 1981ê de çiroka xwe bi deqtilo nivîsand û çend kopyayêne wê derxistin. Min dixwest ez çap bikim lê imkan tunebû. Di sala 1983an de min kopyayeke wê ji rehmetiyê Qanatê Kurdo re şand Le-nîngradê, da ku ew jê re pêşgotinekê binivîsine. Qanatê Kurdo bi nameyekê hezkirina xwe anîbû zimên û li ser jiyanâ min hin agahdarî xwestibû. Lê berî ku Qanatê Kurdo bigihîje pêşgotinê binivîsine, wî wefat kir. Çiroka min ma. Êdî min bêtir meyla xwe berdabû ser prosayê (nesrê) û min dev ji nivîsandina bi vî celebî berdabû. Paşê imkanê çapê çebû jî lê min nexwest ez çap bikim. Min nedixwest ez bi vî şiklî çap bikim. Ez demekê fikirîm ku wê mîna roman an jî piyes binivîsinim, lê ew jî nebû. Êdî min ew bi tenê weke bîranînekê hilanî bû. Pişti 17-18 salan, min îsal ew derxist û xwend. min xwend û min rojênu buhurî bi bir anîn. Rewşa karkerên pembo û bêçaretiya wan hat ber çavêner min. Di bîranîna salênu buhu-

ÇIROKA MALBATA EVDO

Firat Cewerî



NÜDEM


rî de resimekî salênu hefteyî di serê min de diyar bû. Gelek tişt hatin bîra min. Wê ji ber tesîra 18 salênu surgunê û dûriya ji welêt be, ez hisî bûm. Loma min bîryar da ku ez vê berhemê çap bikim û gernasen wê di bîranînan de zindî bihêlim. Ci di aliye zimên de ci jî di aliye naverokê de min tu guhertin di vê berhemê de nekir.

Bêguman ger min iro ev berhem binivîsanda min ê ew bi awayekî din, bi raman û felsefeyeke din, bi celebekî din ê edebî binivîsanda; lê ez ê tu carî evqasî realist nêzîki mijarê nebûma û ez bawer nakim ku min ê bikarîba zimanekî weha zindî û xwezayî bi kar bianiya. □

Firat Cewerî

LI MALA MİR CELADET ALİ BEDİR-XAN

Pıştî ku min navê Celadet Ali Bedir-Xan
bibistîye û Hawara wî xwendiyec ew li
ba dilê min şêrîn û li ber çavên min mezin
bûye. Fîkrêñ wî bala min kişandine, kurda-
yeta wî ya ji dil kurdبûyîn bi min şêrîn kiri-
ye. Îro, ci bigire Celadet ji aliye hemû kur-
dan ve tête qebûlkirin, hemû kurd ji ber ka-
pasîteya rewşenbîriya wî xwe serbilind hîs
dikin. Rojekê, min xwe kar kir û ez çûm
mala wî, an ji mala kevaniya wî Rewşen Xa-
nimê. Min li mala Rewşen Xanimê mîvan-
dariycke kurt lê tije derbas kiribû. Wê di
hundurê kurdedemekê de ji min re qala di-
rokekê kiribû. Hevdîtina Rewşen Xanim hê
bêtir bala min kişandibû ser Celadet û xe-
bat û dûrbîniya wî. Loma min dest pê kir
ku ez Celadet û xebatêñ wî bidim naskirin
û wî careke din di nava kurdan de zindî bi-
kim. Berî min ji hin camêran hewl dabûn
ku Celadet û Hawara wî bidin naskirin. Xe-
bata hevalên berî min ji ji xebata min re bû-
ne piştgir. Di pêvajoya ji nû ve derxistina
hemû hejmarên Hawarê de, fikrek hat min
ku ez bi riya diyalogan Celadet bidim nas-
kirin û portreyekî wî derxînim. Ez careke
din li berhemên wî vegeriyam, min hemû
hejmarên Hawarê (1932-1943), hemû hej-
marên Ronahiyê (1942-1945), Nameya ji
Mustefa Kemîl re, Pirsgirêka kurd û roje-
noten wî, ji nû ve xwendin û li gora bersi-
vân ku nêrin û felsefeya Celadet diyar dike,



pirs derxistin û bi Celadet re sohbet kir.
Bersivêñ di vê kitêbê de hemû rast in û hemû
ji berhemên wî hatine hilbijartin. Lê
belê pirs yên min in û bi riya pirsan min
Celadet daye peyivandin û xwestiye ramana
wî raxim ber çavan.

Kitêb bi awayê diyalogî hatiye nivisan-
din, bi xewnê dest pê dike, rastiyê tîne zi-
mîn, bi hişyarbûnê dawî tê. Lê diyalog li
mala Celadet, di odaya wan de dest pê dibe.
Ez diçim mala wan, piştî saloxdana odayê,
Rewşen Xanim du albuman ji kitêbxaneyê
derdixe, albuma ku resimên Celadet tê de

ne vedike û resim bi resim dide naskirin. Ez ji bi alfikariya resiman derdikevîm rîwîtiyekê dîrokî û ji dema niho bi dûr dikevîm. Pişti rîwîtiyekê ez ewqasî westiya me ku ez radizem û di xewnê de em li albuma duda dinêrin. Derengê şevê ji ber derî dengê kuxukêkê tê bîhistin. Ez ji Rewşen Xanimê pîrsa mîvanê bêwext dikim. Ew dibêje, apê te Celadet e. Ü Mir Celadet dikeve hundur:

"Mîr Celadet derbasî hundurê odeya me bû û bi devkenî got:

– Wey mîvanê delal, tu bi xêr hatiyî!

Min albuma di destênen xwe de danî ser masê û ez rabûm ser xwe ku herim destê wî, lê wî nehişt û em çûn rûyên hev.

Paşê wî destê xwe yê rastê danî ser milê min û ji min xwest ku ez li cihê xwe rûnîm. Ez rûniştim. Wî ji çakêtê xwe yê reş li ser pişta kursiyê bi cih kir û li kêleka min rûnişt. Ji kincen wî dixuya ku ew ji şâhiyekê dihat. Elegê gewr, gomlekê spî û qerewata belek pir lê hatibû. Simbelê wî û riha wî ya li ser çengê sivik bû. Bi dostanî destê xwe avê ser milê min û bi germî got:

– Min bîhistiye ko te daye ser riya Hawarê û te Hawar ji nû ve çap kiriye. Te bi vê yeka ha pir këfâ min anî. Xwedê emrê te dirêj bike. Ji xwe min Hawar ji bo we derdi-xist, şikir ji Xwedê re ko hûn bi hebûna wê hesiyane. Ëdi ez ê bi rehetî di gorê de bini-vim.

Gava cigare pêxist, ji bo ku dixana wî bi ser min de neyê, ji kêleka min rabû û li ser qoltixa hemberî min rûnişt. Min ji tavilê kasetek xist teyba xwe ya biçûk û xwe ji pîrsan re arnade kir.

Min dixwest ez bi wî re li ser her tişû bîpeyivim. Min jê pîrsi:

FIRAT CEWERÎ: Gava birayê te BedirXan dimire, rehmetiyê bavê te ji bo wî loriyekê dinivîsîne. Bi rasti ji ew şîra bavê te êgir berdi-de dilê mirou, mirou pir xemgîn dike. Min ê bixwesta ku tu ji me re wê şîrê bixwînî, lê ez naxwazîm derdêne te tev bidim, bîranînêne xwez zîndî bikim, ez dixwazîm tu hebekî behsa dê û havê xwe û malbata xwe biki. Tu bikaribî ji kerema xwe re pêşî bi çend gotinan kalikê xwe Bedir-Xan bi me bîdi naskirin wê baş bibe.

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Ew Bedir-Xanê ko ji bona yekîtiya Kurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tişînen xwe di vê reyê de feda kiriye û ji bona wê ji mîriye.

– Bavê te Emîn Alî ji dabû ser şopa bavê xwe, wî ji bo Kurdistanê şer û pevçûn kiriye. Gelo tu ê bavê xwe çawan bîdi naskirin?

– Ev bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanêne Botan de bi bayên bakuri honik dibû û di Cizîrê de di nav germiya lat û zinarêne Burca-belek de dikelîha, û her gav di meydanêne şer û rûmetê de ji singen dahatiyêne malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayêne wan vedimizt -lê ez bi dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê rîya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin."

Kitêb bi metoda pîrs û bersivan dom dike. Di kitêbê de li ser dîroka Kurdistanê, li ser tengen ala kurdan, li ser ziman û edebiyata kurdî, li ser şair û şexsiyeten kurdan, li ser nijadê kurdan, li ser zewacê û li ser gelek babetên din tête rawestandin. Ev kitêba ku mîna piyeskê dikare were listin, dikare bi hîsanî mîna kitêbeke nesirê ji were xwendin. □



FIRAT CEWERİ: Gelo miletên bindest bi çi awayî dikarin heyîna xwe ji serdestên xwe biparêzin?

MİR CELADET ALÌ BEDIR-XAN: Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi quweta du çekan diparêzin.


- Çi ne ew herdu çek?
- Ol yek, ziman dido.
- Baş e, mameste, heke ola miletê serdest û bindest yek be, wê çaxê divê miletê bindest kijan çekê li hemberî serdestên xwe bi kar bîne da ku bikaribe heyîna xwe biparêze?
- Heke ola miletê serdest û bindest yek be, hingê çek yek bi tenê ye û bend tenê ziman e.

ÇIROKÊN HEZAR Ú ŞEVEKÊ

Carek ji caran siltanek hebûye. Xatûne-ke siltên a pir spehî hebûye ku siltên ji her tişten li ser rûyê dinyayê bêtir jê hez dikir. Ji ber hezkirin û evîna wî ya li hemberî xatûna wî, ew ji welatiyên xwe re jî qenc bû, li hemberî wan dilovan bû û welatê xwe kiribû mîna buhuştekê. Lê belê rojekê xatûna siltên wî dixapîne, cezayê wê xapandinê ji dibe kuştin. Pişti wê bûyerê, dilê siltên dişikê, ew li hemberî jinan bi gir dibe û ji berdêla evînê dilê wî bi kîn û nefretê tê rapêçan. Herwcha ew li hemberî welatiyên xwe ji bi kîn û nefret dibe, jiyana wan ya buhuşti li wan dike mîna dojchê. Jinên ku paşê siltan bi wan re dizewice, ji şevekê pê ve li ba siltên namînin, dotira rojê tênu kuştin. Siltan nema dilê xwe dispêre jinan, baweriye bi wan nayne. Heta dor tê ser keça wezir Şehrezadê. Şehrezad keçkeke spehî û biaqil e. Ew şeva pêşî dest bi çirokekê dike, çirokeke pir balkêş û tijî fantazî. Gava tîrêjên rojê davêjin hundur û celad derî vedike ku Şehrezadê bibe û serê wê jê bike, siltan nahêle û dixwaze li dewama çiroka wê guhdarî bike. Şehrezad her şevê çirokekê dibêje, dawiya çirokê nayne û siltên di meraqan de dibêle. Bi vî awayî, ew hezar û şevekê ji siltên re çirokan dibêje. Di vê navê re ew ji siltên re la wekî tîne û dilê siltên yê şikestî disan dicebirîne.

ÇIROKÊN HEZAR Ú ŞEVEKÊ

Werter: Serdar Rojan



NÜDEM

Çirokê di vê kitêbê de hinek ji çirokê Hezar û Şevekê ne. Ev çirokê ku Serdar Rojan kirine malê ziman û edebiyata kurdi, di edebiyata dinyayê de xwedîyên cihekî taybetî ne.

Armanca Weşanên Nûdemê ew e ku biriya wergerê zimanê kurdî bike şîrîkê zimanen dinyayê û edebiyata kurdi bi term û formulasyonen edebî dewlemendit bike. □

HOZANVANÊT KURD



E v pirtûka klasik, ji aliye Sadiq Behaedin Amedi ve bi devoka kurmancî hatiye amadekirin û cara pêşî di 198oyî de bi tûpêñ erebî li Bexdayê çap bûye.

Zeynelabidîn Zinar pirtûk ji tûpêñ erebî wergeranidiye tûpêñ latînî û ji nû ve daye çapkîrin.

Pirtûk bi giştiya xwe 470 rûpel e.

Babeta pirtûkê li ser 19 helbestvanen kurd e ku wan bi kurmancî berhem nivîsandine. Herweha nivîskarê hêja Sadiq Behaedin li ser jiyana wan helbestvanan lêkolînine berfireh kirine û serpêhatiya wan bi dirêjî nivîsandiye, behsa berhemên wan kiriye û yên hinekan ji destnivîşen wan bi xwe bi dest xistine. Ew li pir devestan geriyye, guhdariya gellek pîremêrên li şax û çiya-

yên Kurdistanê ji kiriye û tişenê ku ji devê wan bihisitiye di pirtûka xwe de nivîsandine. Di pirtûkê de hin babet û çavkaniyê girîng hene ku hera niha pir hindik kurd pê agahdar bûne.


Nivîsandina pirtûkê li gora devoka Behdînan hatiye amadekirin. Di wergera wê ya bi tûpêñ latînî de ji, Z. Zinar têkil nebûye û pirtûk her wekî wê hiştiye. □

demê têne ber çavan. □

HEMDÎN Ü ŞEMDÎN



SÊKÊŞAN



E v pirtûka rengklasîkî, di 1963-64an de ji aliye Mele Evdilhadiyê Comanî ve bi kurmancî (bi kêt, qafîye û kîtejîmar) hatiye nivîsandin.

Pirtûk ji du awayan ve gişting e; a) Di wê demê de li Bakurê Kurdistanê kesî nedîwêri bi kurdî/kurmancî binivîsîne. b) Forma nivîsandina melayêñ kurd a wê

Yek ji destanên folklorî ya bi navûdeng ji serpêhatiya Hemdin û Şemdin e ku li Zozanê Şerefînê rûdaye û heta niha ji tenê bi stiranî ji aliye Rîshetê Darî ve dihate gotin. Lî navero ka bûyerê ji aliye Zeynelabidîn Zinar ve hatiye berhevîkirin, nivîsandin û wek pirtûk di havîna 98an de ji dâye çapkîrin. □

Navîşana Xwestinê:
Pencinar
Box 3088, 161 03 Bromma/Stockholm-SVERIGE

ŞEŞ PIRTÊKÊN NÛ JI ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Enstituya Kurdi ya Brukselê di neh mehêne pêşin yên sala 1998 an de şes pirtûkên nû weşandin. Rapora Delegasyona Beljîku ku di dema Newrozê de çûbûne Kurdistanê jî ji aliyê Enstituyê hate weşandin.

Berhemênu ku hatine weşandin:

RAPPORT van de Belgische Delegatie naar Turks koerdistan van 18 tot 26 maart 1998


(RAPORA Delegasyona Beljîku ku di tarîxa 18 26 Adar de çûbû Kurdistanê, bi zimanê hollandi, 26 rûpel e.)



Naveroka vê raporê pirs û bersivêndamên delegasyonê yên li ser pirsâ kurdî ne. Delegasyon bi mehan xebata amadekirina vê ziyareta Kurdistanê kir, li ser vê mijarê rojêna axastin û minaqşê amade kirin. Amanc ew bû ku pirsâ kurdî pêş çûwina xwe baştıri bi-zanin.

Paş vegera xwe ji Kurdistanê hemî endamên delegasyonê, ku pirraniya wan rojnamevan in, di kovar û rojnameyên Beljîka de pirsâ kurdan weke ku dîtin nivîsandin. (Ev nivîsar û hevpeyvinên wan di kovara Enstituyê ya sê mehî de bi temamî hatine weşandin). Di vê raporê de jî bi kurtayî dîtinê xwe, bersivêndamên pêşniyazên xwe ji bo Wezareta Karêne Derve ya Beljîka nivîsandine û ev rapor hem dane wezareta Beljîka û hem jî li sedan rîxistin û kasan belav kirin. □

DIGIR, Mihemed ABBAS, helbest, 86 rûpel.




Mihemed ABBAS di vê pirtûka xwe de bi awayekî nû, xisûsî û sivik helbesten xwe pêşkêşî kurdan dike. Awayê serbest bi kar anî ye. Lî disa mirov dibîne ku ew ritmîk in. Ji sitrana kurdî re amade ne.

Dema mirov helbesten wî dixwîne mirov pê dihese ku ew jî dûriyê hatine nivîsin. Yan jî ew di nava xwe de ji her tiştê Kurdistanê, ji hebûna ax û gelê xwe xwe dûr dibîne. Ji rûhê kurdî

gazinan dike. Bang e. Daxwaz e. Hêvi ye? □

LETİF HELMET, helbestvanê tepeser û hejaran, Xelîl Duhokî, 124 rûpel




Berhemeye balkêş li ser huner û jiyanâ helbestvanê kurd ji Kurdistan Başûr Letîf HELMET, ku ji aliye Xelîl DUHOKÎ hatiye nivîsandin. Mîna tê zanîn Letîf Helmet şairekî kurd i bijarte ye. Ew ji başûrê Kurdistanê ye û berhemên xwe bi zaravayê soranî û bi alfabeşa erekî dînîvîsine. Xelîl Duhokî bi pêşgotineke şiroveyî Letîf Helmet û şîrîn wî daye naskirin û herweha hin şîrîn wî ji wergerandine tipen latînî.

Helbesten wî tiji rûhê kurdi û serbixwe ne. Kritik in. Ew di nava helbesten xwe de diji. Ji nivîsandina wan şehwert stendiye. Di gotinê xwe de sererast e.

Evin û hezkirina welat û azadiyê bi gotinê xweşik, bi rêzê neqîşandi danîne ber xwendevanan.

Bi weşana vê berhemê Enstituyê amanca hevnasîn û nêzikbûna kurdêñ ji na-vçeyêñ cihê da ber xwe. Daxwazek û gaveke di ciyê xwe de ye. Bê nasîn û hevbîhistin, bê diyalog û hevkari, yekabûn jî zehnet e. Edebiyat jî rola xwe ya giring divê bilîze.

DÎWANA REŞ III, helbest, Feqîr AHMED, 216 rûpel.



Di helbesten klasik yên Feqîr Ahmed de bîna kurdîya bav û kalan tê. Ew çawa diaxive û çawa difikire weha ji dînîvise. Helbesten xwe rîtmîk nivîsandine û ji ber vê yekê ye ku pirraniye berhernêñ wî ji aliye dengbêj û hozanêñ me dibin sit-

ran.

Di helbesten Feqîr Ahmed de derd û kulêñ kurdan, gazin û hêviyêñ xwe bi awayekî xwe anîne ziman. Di her gotin û di her rêza helbesten wî de bîna daxwaza ji hev hezkirinê, diyalogê, yekbûnê tê.

Xuya ye ku Feqîr Ahmed, hem di jiyanâ xwe de û hem jî di helbesten xwe de mirovhiz e aşîbwaz. Evîndar e. Ji azadiyê hez dike. Weke ku ji xwe re ji azadiyê hez dike, ji derdora xwe re, ji cîhana mezin re ji bê şert û şîrût azadiyê dixwaze.

Ji sî salan zêdtir e ku Feqîr Ahmed li Kôlnê, bajarê Elmanya diji. Di xerîbiyê de diji. Ji welatê xwe dûr, ji ax û ava bav û kalan re hesret e. Di mala xwe de, di rabûn û rûniştina xwe de ade-dêñ kurdî dide jiyanê. Û ev xasleten wî di helbesten wî de jî xuya dikin. □

DE KOERDEN, Een volk op weg naar zelfstandigheid, Veerle VAN BECK, 200 rûpel.

(KURD, Neteweyekî di reya azadiyê de, lêkolîn, bi zimanê holandî


Di vê pirtûkê de ku ji aliye Veerle VAN BECK hatiye nivîsin, pîrsa



H LİN, roman, Mahmut BAKSÎ û Elin CLASON, wergera bi zimanê Hollandî, 112 rûpel.

IK WAS EEN KIND IN KURDISTAN, roman, Mahmut BAKSÎ, wergera bi zimanê Holandî, 80 rûpel.

(LAWIK XERZAN, roman, Mahmut Baksî)



kurdî bi hemî aliyên xwe ve bi awayekî kurt tê axaftin. Tişte ku Veerle Van Beeck giranî daye ser pîrsa kurdî û tewra cîhana Rojava ye. Wê di vê lêkolîn de axaftin û bîryarên Hikûmeta beljîka, axaftin û bîryarên Parlementoya Ewropa û daxwazîn kurdan bi hev re miqeyese kirine.

Balkêsiya vê berhemê ew e ku vê pîrsê di roja iro de bi awayekî pîr fereh dinivîse. Ew wekce kesekî ne kurd li pîrsa Kurdî dinêre û objetivîtiya xwe diparêze. Hem ji bo kurdan hem ji ji bo Cîhana Rojava zimanekî dijwar bi kar anîye.

Pîrsa kurdî bi pîrsa gelên din re ji miqayese dike. Dema ew vê miqayesê dike şertîn navçeyî, ekonomik û siyasi ji dide ber çavan. Ev ji giringiya vê berhemê girantir dike. □

Enstituyê di nava weşanen xwe de ciyekî teybî dide wergeran. Hem ji kurdî û zimanên din werdigerîne zimanê holandî û frensizî û hem ji ji zimanên din werdigerîne zimanê kurdî.

Berî niha ji Pirtûkêni bi navê *Binêr & ez mezin dibim, Bîna Gezo ji Hêlin dihat, Kurden Tirkîyê, Zindana Nr. 5, Dr. Kasimlo, Nasionalîzma di Mem û Zina Ehmedê Xanî* de hatibûn wergerandin û weşandin.

Hêlin û Lawikê Xerzan, du romanên M. Baksî ku bi kurdî bûn ji bo zimanê holandî hatine wergerandin û weşandin.

Di her du romanen de ji serborfnêñ kesekî kurd li Kurdistanê û reva ber bi xerîbiyê, mîna pirraniya kurdan, bi zimanekî xwes hatîye nivîsandin. Di wergera zimanê holandî de ji ev yek bi awayekî paqîj hatîye kîrin.

Amanca Enstituyê du aliye: bi rîya wergeran nasîn û dîtina edebiyata kurdan ji bo xwendevanên ne kurd. Bi rîya wergerê ji zimanên din ji nasîn û dîtina bir û bawerî, kultur û edebiyata xerîb ji bo kurdan. Bi rîya wergeran cîhana edebî, siyasi, civakî, aborî û bir û bawerî nêzî hev dibin. Hevnasîn zêde dibe û ew ji dibe sebeba hevhezkirinê. □

Zinarê Xamo
hindik-rindik



Hindik rindik

E v kitêba han ji pêkenînên Zinarê Xamo pêk hatiye. Cara pêşî ev pêkenin di sala 1986an de di rojnameya Ar-

mancê de hatine weşandin. Zinarê Xamo hem pêkenînên ku di Armancê de hatine weşandin hem jî hin pêkenînên din lê zêde kirine û mîna kitêb di nava weşanên Apecê de derxistiye. Em li vir mînakelê ji kitêbê pêşkêşî xwendevanan dikan:

"Di raxistina Pablo Picasso de camêrek ji temaşa risman zêdetir bi navê tabloyan mi-jûl dibû. Li ber rismê bi navê "masî" sekînî, piştî ku dirêj dirêj lê nerî, ji yê kîleka xwe re got:

– Ma tu bi qedrê Xwedê dikî kudera vi masî ye?

Di wê bîskê de Picasso ji kîleka wan derbas dibû, bi nezaket got:


– Ew ne masî ye.

– Ë heger ne masî ye, le çi ye?

– Rîsim e!"

Evîna Qedexe

D i van çend salêن dawî de li Tirkîyeyê weşanxaneyêن kurdan dest bi weşandina kitêbêن kurdi jî kirine. Di nava van ki-



têbêن ku têne weşandin de hejmareke mezin şîr in. Ev kitêba ku vê dawiyê gihiştiye me ji ji şîran pêk hatiye. Nivîskarê kitêbê A. Sîvar Yalçın

e. Di kitêbê de tu agahdarî di derheqa şâr de tuneye. Lê xuyaye şâr li surgunê diji. Loma ji şîran bêhna evîn, hezkirin, hesret û bêrikirinê difûre.

Ji te hez dikim

Hez dikim ji te

Çavên te

Porênen te

Kenê te

Tu jî wek min

Bi hêvî

Tu jî wek min

Bi evîn î

Germîtiya te

Narîniya te

mîna pelek payizê ku diweşe

Tu jî wek min tenê

Bê helbest û bê xwedî

Belkî jî ji ber ku tu yî

Nizanim çîma

Lê hez dikim ji te.

A. Sîvar Yalçın
Evîna Qedexe
Weşanen ASO

HUNER KOVAREKE NÛ YA XWERÛ BI KURDÎ



Di van salên dawiyê de di warê çapemeniya kurdî de hin gavên baş têne avêtin. Hejmara weşanên bi zimanê kurdî roj bi roj zêdetir dibin. Ev yeka han ji xwendevan û nivîskarên nû bi xwe re digihînin. Yek ji van mînakan kovara HUNERê ye. Vê payîzê bi navê HUNER kovareke xwerû bi kurdî gîhîst me. Ev kovara ha ji aliyê Akademiya Çand û Hunera Kurdî ve li Almanyayê derdikeve. Li gora agahdarîyên kovarê wê ji sê mehan carekê derkeve. Berpirsiyarê kovarê Kakşar C. Oremar e û redaksiyon ji ji Kakşar C. Oremar û Sebîr Agir pêk tê.

Di hejmara Hunerê ya yekê de li ser huner, muzîk û edebiyatê nivîsên balkêş hene. Hejmara yekê bi sergotara Esat Faraşîn *Rojbaş* dest pê dike. Esat Faraşîn di gotara xwe de behsa kovara Hunerê, armanca derxistîna wê û pêwîstiya wê dike. Berpirsiyarê kovarê Kakşar C. Oremar ji bi navê "Bilbilê çiya û zozanê Kurdistanê: Kawîs Axa" nivîseke balkêş nivîsandiye. Mîna tê zanîn Kawîs Axa yek ji dengbêjîn kurdan yê ku Kurdistanî bûye û ji aliyê piraniya kurdan ve tê hezkirin e. Oremar di nivîsa xwe de li ser jiyana Kawîs Axa, li ser hunera wî ya dengbêjiyê û li ser naverok û stîla stranê wî radiweste. Hunermend Dr. Xemgîn Bîrhat bi nivîsa xwe "Kilamên kurdî di civaka kurdan de" bêşdari li vê hejmara Hunerê kiriye. Bîrhat di nivîsa xwe de girîngiya kilaman a di civaka kurdî de tîne zimên. "Huner, şoreş û siyaset" ji navê nivîsa Fehmî Balayî ye. Balayî di nivîsa xwe de li ser dîroka hunerê radiweste û girîngiya hunera şoreşger tîne zimên. Faysal Dagli bi nivîsa xwe "Ronakbîr û Têgehiştin" li ser ronakbîriya kurdî û berpirsiyarê ronakbîriyê radiweste.

Hin nivîsên din yên balkêş ku kovara Hunerê xemilandine ev in: Baqî Hemdullah li ser Mehemed Şêxo bi navê "Jiyana evînadarekî dilşikestî", Seîd Dêreşî li ser Meryemxanê û gelek nivîsên din di vê hejmara Hunerê de cih girtine.

Nûdem bixîrhatînê li Hunerê dike û jê re jiyanekî dirêj hêvî dike. □

ÊDÎ GAZINA NEBÛNA KITÊBÎN KURDÎ MEKE, NÜDEMË Û WEŞANÊN WÊ BIXWÎNE!

- Bingehêن Gramera Kurmancî / Celadet Ali Bedir-Xan
- Dê û Dêmarî / Egîdê Xudo
- Keskesor/ Nûredîn Zaza
- Di Folklorâ Kurdî de Serdestiyeke Jinan / Rohat
- Hêz û Bedewiya Pêñûsê / Mehmed Uzun
- Mîrza Mehemed / Medenî Ferho
- Milkê Evînê / Rojen Barnas
- Zaroka Şevê/ Jack London / Werger: Mustafa Aydogan
- Biyani/ Albert Camus / Werger: Fawaz Husêن
- Mîrzayê Biçûk / A. de Saint-Eksupéry / Werger: Fawaz Husêن
- Gotin / Yaşar Kaya
- Antolojiya Çiroka Nû ya Kurmancê Başûr / Xelîl Duhokî
- Şevêن Spî / Dostoyevskî / Werger: Firat Cewerî
- Mişk û Mirov / John Steinbeck / Werger: Firat Cewerî
- Bexçeyê Vişne / Çexov / Werger: Firat Cewerî
- Li Benda Godot / Samuel Becket / Werger: Firat Cewerî
- Gotinê Navdaran / Firat Cewerî
- Girtî / Firat Cewerî
- Kevoka Spî / Firat Cewerî

- **Kultur, Huner û Edebiyat / Firat Cewerî**
- **Dara Hinarê / Yaşar Kemal / Werger; Firat Cewerî**
- **Dîwar / Sartre / Werger; Firat Cewerî**
- **Çiroka Malbata Evdo / Firat Cewerî**
- **Li mala mîr Celadet Alî Bedir-Xan / Firat Cewerî**
- **Xezal / Sîma Semend**
- **Evîna Reben / Derwêş M. Ferho**
- **Banga Hawarê / Medenî Ferho**
- **Kultur û Raman / Şerefîxan Cizîrî**
- **Kurê Zinarê Serbilind / Sidqî Hirorî**
- **Şîrîn Bijarte / Mayakovskî / Werger; Süleyman Demir**
- **Pêlên Bêrikirinê / Mustafa Aydogan**
- **Şerefa Wendabûyi ya Katharina Blum / H. Böll / Werger; Ş. B. Sorekli**
- **Hingê / Rojen Barnas**
- **Sorê Gulê / Süleyman Demir**
- **Pêşmerge / Rehîmê Qazî / Werger; Ziya Avcı**
- **Keça Kurd Zengê / Cemşîd Bender / Werger; F. Cewerî û S. Demir**
- **Epîlog / Hesenê Metê**
- **Sultanê Filan / Yaşar Kemal / Werger; Mustafa Aydogan**
- **Evîn û Şewat / Sidqî Hirorî**
- **Çirokên Hezar û Şevezî / Werger; Serdar Roşan**
- **Nûdem WERGER**
- **HAWAR 2 cild**